T.C.
Zanîngeha Dîcleyê Enstîtuya Zanistên Civakî
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Doktorayê

REXNEYA CIVAKÎ, SÎYASÎ Û DÎROKÎ DI ROMANA KURDÎ YA DÎYASPORAYÊ DA

Roger ACUN
18940301

Şêwirmend
Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU

Diyarbakır 2024

T.C.
Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Doktora Tezi

KÜRT DİASPORA ROMANINDA SOSYAL, SİYASAL VE TARİHSEL ELEŞTİRİ

Roger ACUN
18940301

Danışman
Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU
Dr. Öğr. Üyesi İlyas SUVAĞCİ

Diyarbakır 2024

TAAHHÜTNAME

SOSYAL BİLİMLERİ ENSTİTÜSÜ
MÜDÜRLÜĞÜNE

Dicle Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum "Kürt Diaspora Romanında Sosyal, Siyasal ve Tarihsel Eleştiri" (Rexneya Sîyasî Civakî û Dîrokî Di Romana Kurdî ya Dîaporayê da)" adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu, her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder; tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim Yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

23/ 01 /2024
Roger ACUN

PÊŞGOTIN

Edebîyat bi saya ziman barê dîrok, çand, huner û bîrewerîya civakan hildigire û neqlî nifşên nû dike. Mîrateya mirovahîyê ya edebî ku bi sedan salan di hiş û gîyanê mirovan da kemilîye di formên wek destan, helbest, çîrok û romanan da li ber xwîneran tê raxistin. Cureya romanê, derfetên herî zêde pêşkeşî nivîskaran dike ku asoyên hizir û ramana xwîneran berfireh bike. Jîyan bi dewlemendîya dîmenên romanan ji yekrengîyê xelas dibe û mirovan daxilî dinyayên xeyalî dike. Carinan tevna xeyalan di atolyeya hişê romannûsan da ew qasî bi hostatî tê hûnandin ku lempeya rastîyê li ber çîroksazîya romanê ditefe.

Romana kurdî ji sala 1935an û vir ve di nava mercên nêyênî û guftugoyên civakî, sîyasî û dîrokî da hewldide di nivîna çemê zimanê kurdî da bi aramî biherîke û bigihêje zeryaya romanên cîhanê. Romannûsên kurd, piranî ji ber sedemên sîyasî bêgav mane û dev ji welatên xwe berdane; xwe li wargehên bîyanî ango dîyasporayê girtine û kul û keserên kurdên dîyasporayê bi çîrokên jîyana xwe ra kelijandine. Xebatên edebî yên nifşên nû li Ewropayê ekoleke romanê ava kirîye ku ev ekol, wek romana dîyasporaya kurdî tê pênasekirin. Mahmut Baksi, Mehmed Uzun, Firat Cewerî, Hesenê Metê, Jan Dost û Helîm Yûsiv hin romannûsên di çarçoveya vê ekolê da derdikevin pêş. Di romanên wan da bêhna jîyana dîyasporayê û heyf û mixabinîyên civak û dîroka kurdan wek motîfên hevpar bal dikêşe. Nivîskarên navborî di romanên xwe da li ser civak, dîrok û sîyaseta kurdan gelek rexne kirine. Armanca vê tezê tespît, tesnîf û tehlîlkirina van rexneyan e.

Di destpêka vê xebata ku ji çar beşan pêk tê, roman û romana kurdî hatîye nîqaşkirin. Di beşa yekem da têgeha dîyasporayê, romana kurdî ya li diyasporayê teşe girtîye û romanên nivîskarên ku di çarçoveya vê tezê da hatine nirxandin bûye mijara vekolînê. Di beşa duyem ya vê xebatê da di romanên nivîskarên navborî da rexneyên civakî wek gundîtî, axatî, xizanî, adet, perwerdehî, mirov û bawerî hatine tehlîlkirin. Di beşa sêyem da jî rexneyên mîrên kurdan û partîyan sîyaseta dewletên wek Osmanî, Îran, Îraq, Sûrîye, Tirkîye, Îngilistan, Fransa û Rûsya di çarçoveya

meseleya kurdî da hatîye vekolîn. Di peywenda rexneyên sîyasî da di bin serenavên wek nasname, asîmîlasyon, sirgûnî, bîrdozî û mafên mirovan rexneyên romannûsan tên analîzkirin. Di beşa çarem da jî rexneyên li ser hişmendîya dîrokî ya kurdan dîsa di peywenda dîroka dewletên wek Osmanî, Îran, Îraq, Sûrîye û Tirkîyeyê da rewş û bûyerên dîrokî, kesayet, peyman, şer û serhildan tên tesnîf û tehlîlkirin.

Her çi qasî xebatên akademîk bi kedeke kesîdeyî tên afirandin jî di xwendin, nirxandin û serrastkirina wan da keda şêwirmendan jî xwedî cihekî giring e. Ji ber vê çendê di amadekirina vê tezê da berîya her tiştî ez dixwazim spasîya şêwirmendê xwe mamosteyê hêja Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU bikim ku derîyê odeya wî û telefona wî hertim ji min ra vekirîbû. Mala wî ava be. Dîsa ji bo şêwirmendê min yê duyemîn Dr. İlyas SUVAĞCİ ra gelek spas ku wî jî teza min xwend û nirxand. Bi saya pêşnîyazên wî ev xebat kemilî. Dostê hêja mamoste Serwet Ornek jî teza min bi hûrgilî xwend û di warê rastnivîsînê da bi hin pêşnîyazên xwe rênîşandarîya min kir. Mala wî ava be. Herî dawî spas ji bo Merala hevsera min ku di pêvajoya domdirêj ya vê xebatê da dem bexşî min kir da ku ez bi dîsîplîn binivîsim.

Roger Acun
Diyarbakır-2024

NAVEROK

Rûpel No:

PÊŞGOTIN ..... **I**

NAVEROK ..... **III**

ABSTRACT ..... **VIII**

KURTEBÊJE ..... **X**

DESTPÊK **1**

ÇARÇOVEYA GIŞTÎ **6**

1.1. Mijara Tezê 6

1.2. Armanc /Angaşt: 9

1.3. Naverok 9

1.4. Rêbaz 10

BEŞA YEKEM **12**

ROMANA KURDÎ YA DÎYASPORAYÊ **12**

1.1. Dîyaspora 12

1.2. Romannûsên Kurd ên Dîyasporayê û Romanên Wan 17

1.2.1. Mahmut Baksi û Romanên Wî 17

1.2.1.1. Hêlîn (1984) 18

1.2.1.2. Gundikê Dono (1988) 18

1.2.1.3. Serhildana Mala Elîyê Ûnis (2001) 19

1.2.2. Mehmed Uzun û Romanên Wî 19

1.2.2.1. Tu (1985) 20

1.2.2.2. Rojek Ji rojên Evdalê Zeynikê (1987) 20

1.2.2.3. Mirina Kalekî Rind 1989) 20

1.2.2.4. Siya Evînê (1991) 20

1.2.2.5. Bîra Qederê (1995) 21

1.2.2.6. Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê 1998) 21

1.2.2.7. Hawara Dîcleyê (I û II) (2001-2003) 21

1.2.3. Firat Cewerî û Romanên Wî 22

1.2.3.1. Payiza Dereng (2005) 23
1.2.3.2. Ez ê Yekî Bikujim (2008) 23
1.2.3.3. Lehî (2013) 23
1.2.3.4. Maria Melekek Bû (2013) 23
1.2.4. Hesenê Metê û Romanên Wî 24
1.2.4.1. Labîrenta Cinan (1994) 24
1.2.4.2. Tofan (2000) 25
1.2.4.3. Gotînên Gunehkar (2007)....25
1.2.4.4. Li Dêrê (2011) 25
1.2.4.5. Hefsar (2018) 26
1.2.5. Helîm Yûsiv û Romanên Wî....26
1.2.5.1. Sobarto (1999) 26
1.2.5.2. Tirsa bê Diran (2006) 27
1.2.5.3. Gava ku Masî Tî dibin (2008) 27
1.2.5.4. 99 Morîkên Belavbûyî (2015)....27
1.2.5.5. Wehşê di Hundirê Min de (2018) 28
1.2.5.6. Firîna bi Baskên Şikestî (2019)....28
1.2.6. Jan Dost û Romanên Wî 28
1.2.6.1. Mijabad (2004) 29
1.2.6.2. 3 gav û 3darek (2007) 29
1.2.6.3. Mîrname (2008) 30
1.2.6.4. Pîrewerger (2018) 30
1.2.6.5. Naqosên Romayê (2019) 30
1.2.6.6. Kobanî 31

BEŞA DUYEM 32

REXNEYA CIVAKÎ DI ROMANA KURDÎ YA DÎYASPORAYÊ DA 32

2.1. Gundîtî.... 33

2.2. Axa û Beg 38

2.3. Şerê Eşîrî / Berberî.... 47

2.4. Xizanî 53

2.5. Hesûdî / Fesadî / Sîxurî.... 58

2.6. Rexneya li Însan 61

2.6.1. Însan....61
2.6.2. Mêr 65

2.6.3. Jin 72
2.7. Rexneya li Çandê 76
2.7.1. Orf û Adet 76
2.7.2. Cehalet 80
2.7.3. Perwerde 85
2.8. Rexneya li Dîn 89
2.8.1. Xweda û Pêxember 92
2.8.2. Rexneya Îslamê 98
2.8.2.1 Şêx 104
2.8.2.2. Mele 109
BEŞA SÊYEM 112
REXNEYA SÎYASÎ DI ROMANA KURDÎ YA DÎYASPORAYÊ DA 112
3.1. Mîrên Kurdan 113
3.2. Partîyên Kurdan 116
3.3. Dewleta Osmanî 124
3.4. Komara Tirkîyeyê 129
3.5. Sûrîye 133
3.6. Îraq 138
3.7. Îran 140
3.8. Sowyet / Rûsya 143
3.9. Îngilistan 145
3.10. Fransa 146
3.11. Rexneya Sîyasî ya Giştî 147
3.11.1. Nasname 147
3.11.2. Ziman 154
3.11.3. Bêdewletbûn 164
3.11.4. Sirgûn 166
3.11.5. Êşkence 169
3.11.6. Asîmîlasyon 174
3.11.7. Dîktatorî 184
3.11.8. Îdeolojî 186

3.11.9. Binpêkirina Mafên Mirovan 189

BEŞA ÇARAN 195

REXNEYÊN LI DÎROKÊ DI ROMANA KURDÎ YA DÎYASPORAYÊ DA ... 195

4.1. Rexneyên li Hîşmendîya Dîrokê 196

4.2. Rexneyên li Dîroka Osmanî 200

4.2.1. Melîk Ehmed Paşa û Evdal Xan 200

4.2.2. Sefera Rewanê û Siltan Mûradê IV. 201

4.2.3. Siltan Evdilmecîd.....202

4.2.4. Qetlîama Keldanî û Nastûrîyan.....203

4.2.5. Mîr Bedirxan Paşa û Osmanî.....205

4.2.6. Partiya Îttîhad û Teraqqîyê 207

4.2.7. Cenga Cîhanê ya Yekem (1914-1918).....208

4.2.8. Peymana Agirbesta Mondrosê (1918).....211

4.2.9. Bûyera Tehcîrê (1915) 212

4.2.10. Peymana Sykes Picotê (1916).....215

4.2.11. Peymana Lozanê 217

4.2.12. Cenga Cîhanê ya Duyem 220

4.3. Rexneyên li Dîroka Komara Tirkîyeyê 222

4.3.1. Serhildana Şêx Seîd (1925).....222

4.3.2. Serhildana Agirî (1927-1930).....227

4.3.3. Bûyera Dêrsimê û Seyîd Riza (1937/1938) 231

4.3.4. Cuntaya 12 Îlonê (1980) 234

4.4. Rexneyên li Dîroka Îranê 238

4.4.1. Komara Mahabadê (1946).....238

4.4.2. Serhildana Simko Axayê Şikakî (1918 -1922) 241

4.5. Rexneyên li Dîroka Îraqê 243

4.5.1 Serhildana Şêx Mehmûdê Berzencî (1919).....243

ENCAM 246

ÇAVKANÎ..... 251

EK 1 (TEZİN GENİŞ TÜRKÇE ÖZETİ)..... 258

ÖZET

Kürtler 20. yüzyılın başlarından itibaren sosyal ve siyasal gelişmelerden ötürü yabancı ülkelere iltica etmek zorunda kalmıştır. Kürt diaspora romanı da ana vatanlarından ayrılmak zorunda kalmış yazarların, Sovyetlerde ve çoğunlukla Avrupa ülkelerinde yarattıkları bir ekolü ifade etmektedir. Avrupa Kürt diaspora roman ekolünden gelen Mahmut Baksi, Mehmed Uzun, Firat Cewerî, Hesenê Metê, Jan Dost ve Helîm Yûsiv; romanlarında doğrudan ya da dolaylı olarak eleştiriler yapmışlardır. Çalışmamızla Avrupa Kürt diaspora romanı üzerine yapılan tematik eleştiri tasnifi ve tahlili sahasına katkı sunmayı amaçladık. Bu tez çalışması, adı geçen romancıların 1984-2020 yılları arasında yayımlanan romanlarında yer alan sosyal, siyasal ve tarihsel eleştirilere odaklanmaktadır. Çalışmamızda bu eleştiriler tasnif edilmiş ve eleştirilerin arka planında yatan nedenler üzerinde durulmuştur. Edebi eserin, dönemin sosyal, siyasal koşullarından etkilendiği tezinden hareketle Kürt diaspora romanı bağlamında altı romancının toplam otuz bir romanında yer alan sosyal, siyasal ve tarihsel eleştiriler, tarihî ve sosyolojik eleştiri kuramları doğrultusunda ve edebiyat sosyolojisi bağlamında analiz edilmiştir.

Kürt diaspora romanında romancılar, köy ve köylü gerçeğine eğilmiş feodalite, fakirlik, gelenekler, cehalet, eğitim, insan ve din gibi konularda eleştirilerde bulunmuşlardır. Siyasi açıdan yönetim kaynaklı sorunlar, Orta Doğu ülkelerinin Kürt politikaları, dil, kimlik, asimilasyon, ideoloji ve insan hakları ihlalleri gibi meseleler çokça eleştirilmiştir. Siyasi sorunlar, diaspora romanlarında sosyal meselelerin de kaynağı olarak görülmüş ve eleştirilmiştir. Kürt mirliklerinin yerel iktidarlarından modern zamanlara kadar olan süreçte yaşanan siyasi krizler da eleştirilerin hedefi durumundadır.

Kürt diaspora romancıları, Osmanlı ve Türkiye tarihi ile Irak, İran tarihi ve bazı Avrupa ülkeleriyle ilgili tarihî olay ve kişileri de eleştirmişlerdir. Romanlarda geçen siyasi eleştirilerin pek çoğu tarihsel nedenlere dayanmaktadır. Romancılar, yetiştikleri ülkelerin ve kültürlerin, üzerlerinde bıraktığı olumsuz etkileri yarattıkları karakterlerin kolektif hafızalarına aktarmış böylece farklı zaman ve mekanlarda geçen roman kurguları, Kürt sosyo-politik realitesinin eleştiri galerisini oluşturmuştur.

Anahtar Sözcükler: Diaspora, Kürt Romanı, Eleştiri, Sosyal, Siyasal, tarihsel.

ABSTRACT

Since the beginning of the 20th century, the Kurds had to seek asylum in foreign countries due to social and political developments. The Kurdish diaspora novel also expresses a school in the Soviet Union and mostly in European countries created by writers who had to leave their homeland. Mahmut Baksi, Mehmed Uzun, Firat Cewerî, Hesenê Metê, Jan Dost and Helîm Yûsiv, who came from the European Kurdish diaspora novel school; have made direct or indirect criticisms in their novels. With our study, we aimed to contribute to the thematic criticism classification and analysis on the European Kurdish diaspora novel. This thesis focuses on the social, political and historical criticisms in the novels of the aforementioned novelists published between 1984 and 2020. In our study, these criticisms were classified and the reasons behind the criticisms were emphasized. Based on the thesis that the literary work was influenced by the social and political conditions of the period, social, political and historical criticisms in a total of thirty-one novels by six novelists in the context of Kurdish diaspora novel were analyzed in line with the historical and sociological criticism theories and in the context of literary sociology.

In the Kurdish diaspora novel, the novelists focused on the reality of the village and the peasant and criticized the subjects such as feudalism, poverty, traditions, ignorance, education, people and religion. Issues such as political problems arising from the administration, Kurdish policies of Middle Eastern countries, language, identity, assimilation, ideology and violations of human rights have been widely criticized. In diaspora novels, political problems have been evaluated and criticized as the source of social issues as well. The political crises experienced in the process from the local governments of the Kurdish emirates to modern times are also the target of criticism.

Kurdish diaspora novelists also criticized historical events and people related to the history of Ottoman and Turkey, the history of Iraq, Iran and some European countries. Novelists transferred the negative effects of the countries and cultures they grew up on to the collective memories of the characters they created, so that the fictions of the novels set in different times and places formed the criticism gallery of the Kurdish socio-political reality.

Keywords: Diaspora, Kurdish Novel, Criticism, Social, Political, Historical**.**

KURTE

Kurd ji serê sedsala 20an û vir ve ji ber sedemên civakî û sîyasî bêgav mane ku koçî nav dewletên bîyanî bikin. Romana kurdî ya dîasporayê jî nivîskarên ku ji welatên xwe veqetîyane û li Ewropa û Sowyetan ekolek avakirine tîne ziman. Nivîskarên ku ji ekolê romana diasporaya kurdi tên: Mahmut Baksi, Mehmed Uzun, Firat Cewerî, Hesenê Metê, Jan Dost û Helîm Yûsiv di romanên xwe da rasterast an jî nixumandî rexneyên civakî, sîyasî û dîrokî kirine. Me bi xebata xwe hewl da ku em tevkarîyekê ji bo qada analîz û senifandina rexneyên tematîk ên li ser romana kurdî ya dîyasporaya Ewropayê bikin. Ev xebata tezê li ser rexneyên civakî, sîyasî û dîrokî yên romannûsên navborî ku romanên wan di navbera salên 1984-2020î da derçûne, disekine. Di xebata me da ev rexne hatine senifandin û li ser sedemên paşxaneya wan hatîye sekinandin. Bi angaşta ku berhemên edebî di bin bandora mercên serdema xwe ya civakî, sîyasî û dîrokî da dimînin, di peywenda romana kurdî ya dîyasporayê da rexneyên civakî, sîyasî û dîrokî yên di sî û yek romanên şeş romannûsan da li gor teorîyên dîrokî û rexneya sosyolojîk û di çarçoveya sosyolojîya edebîyatê da hatine analîzkirin.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da romannûsan, bala xwe dane rastîya gund û gundîtîyê û di mijarên axatî xizanî, orf û adet, cehalet, perwerde, însan û dîn da cih dane rexneyan. Ji alîyê sîyasî ve meseleyên wek pirsgirêkên rêvebirî, sîyaseta dewletên rojhilata navîn, ziman, nasname, asîmîlasyon, bîrdozî û binpêkirinên mafên mirovan gelekî hatine rexnekirin. Pirsgirêkên sîyasî di romana dîyasporayê da wek çavkanîya meseleyên civakî jî hatîye dîtin û rexnekirin. Krîzên sîyasî ku ji pêvajoya desthilatdarîya herêmî ya mîrektîyên kurdan û heta serdemên modern ve qewimîne jî bûne armanca rexneyan.

Romannûsên dîyasporaya kurdî, dîroka Îran, Îraq, Tirkîye û Osmanîyan û hin kesayet û bûyerên dîrokî yên bi dewletên Ewropayê ra têkildar jî rexne kirine. Gelek rexneyên sîyasî yên di romanan da derbas dibin ji sedemên dîrokî ve dizên. Romannûsan, bandorên neyênî yên çand û dewletên ku lê gihaştine, transferî bîra kolektîf a lehengên xwe kirine. Bi vî awayî çîroksazîyên romanên ku di dem û deverên cuda da derbas dibin, galerîya rexneyên rastîya sosyo-polîtîk a kurdan ava kirine.

Bêjeyên Mifteyî: Dîyaspora, Romana Kurdî, Rexne, Civakî, Sîyasî, Dîrokî.

KURTEBÊJE

ABD : Amerika Birleşik Devletleri

ANAP : Ana Vatan Partisi

BZ : Berîya Zayînê

c. : Cild

CHP : Cumhuriyet Halk Partisi

Çev. : Çevirmen

DAÎŞ : Dewleta Îslamî ya İraq û Şamê

Dr : Doktor

h. b. : Heman Berhem

hwd : Herwekî din

İst. : İstanbul

ÎTC : İttihad ve Terakki Cemiyeti

j. : Jimare

KT : Komara Tirkîyeyê

KDP : Partîya Demokrat ya Kurdistanê

PKK : Partîya Karkerên Kurdistanê

Prof : Profesor

r. : Rûpel

TBMM: Türkiye Büyük Millet Meclisi

TİP : Türkiye İşçi Partisi

TSK : Türk Silahlı Kuvvetleri

Wer. : Wergêr

wd : Wekî din

Weş. : Weşanxane

DESTPÊK

Roman cureyeke sereke ya edebîyata modern e. Bûyereke qewimîye, dikare biqewime an jî bi temamî fîktîf e, bi şêwazeke têrhûrgilî û bi regezên şexis, mekan û wext li hember xwîneran radixe. "Ji Ronesansê vir ve wek meyleke bi îstîqrar 'jîyana takekesî' diket şûna realîteya berê. Ev yek parçeyekî giring ê wan mercan bû ku romanê pala xwe didayê. Şexsîbûna karakteran, derdora wan a biteferûat, zeman, hişmendîya dîrokê, kûrahîya psîkolojîk, tîrbûna jîyana rojane, çavdêriyên rasteqîn filan têrî dikir ku roman bibe vegêrana herî tîpîk a vê dewrê."[1] Berîya vê cureya têr-derfet, di edebîyata cîhanê da valahîya romanê hin cureyên dîtir ên wek mît/mitos, destan, çîrok, mesnewî û romansan dadigirt. Demên kevnar ji alîyê bihurandina şevên dirêj ve stûyê xwe li ber gotinê tewandîye.

Remezan Alan, derheqê cureya romanê da weha dibêje: "Pêşketina kapîtalîzma matbû, zêdebûna rêjeya xwendayan (xasma zêdebûna jinên xwenda), pirbûna rojnameyan, profesyonelbûna weşangerî û nivîskariyê, erzanbûna kitêbên edebî, çêbûna rexneya edebî, ji bo nivîskar zeîfbûna hamitiya arîstokrasiyê û ji alîyê kitêbfiroşan ve dagirtina valahiya navbera xwendevan û nivîskar tesîrek kirine."[2] Di sedsala 19 û 20an da li gor van ekolên navborî gelek roman ketin nav wêjeya cîhanê. Bi vê boneyê roman bû cureya herî giring.

Medenî Ferho derheqê romanê da weha dibêje: "Roman, kultur û felsefe ye. Çi ye ev kultura bi rêkûpêk û felsefe? Kultura ku ji alîyê nifşan ve û bi sedan sal hatîye komkirin e. Dîrok e, sosyolojî ye, herîya organîk û astarzanî ye, qîr û teşqeleyên civakî ne. Roman di dema me da 'cîhanşumûl' e û her cure zanistê di nava xwe da diragire."[3] Romana ku ji cureyên wek tragedya, destan, çîrok, mesnewî û draman welidîye di sedsala 20an da rola miqnatîzeke entelektuelî girtîye ser milên xwe. Edî romannûs tenê çîrokekê nabêje di nava wê çîrokê da endîşeyên felsefî, arîşeyên civakî, rûdanên sîyasî û bûyerên dîrokî di parzûnkê hişmendîya serdema xwe ra dadiwerivîne û bi gotara edebî mohra mejî û dîlê xwe lê dixe.

---

[1] Remezan Alan, *Destpêkek ji bo Zanista Edebîyata Modern*, Peywend, Stenbol, 2015, r. 69.
[2] Remezan Alan, *Fantazmaya Romana Kurdî*, Zarema, Sal:7/Hejmar:14/2021, r. 152.
[3] Medenî Ferho, *Rewşa Romana Kurdî*, Weş. Do, Îstanbul, 2011, r. 47.

Roman xwîneran derdixe rêwîtîyekê. “Exlebê teorîsyenên romanê tînin ziman ku di derçûna romanê da rêwîtî metafora bingehîn e.”[4] Teorîsyenê macarî Georg Lukacs (1885-1971) îdîa dike ku roman “Jiyaneke parçebûyî û rêwîtîya ber bi xwe ve ya takekesekî xwedî arîşe ye.”[5] Li gor Remezan Alan “Roman, vegotina serboriya şexsan e û di vê pêvajoyê de destnîşankirina guherînên wan e. Du tiştên wê bivênevê ne: Bilêvkirina dinyaya derûnî û derveyî ya şexsan û merhale merhale çavdêrîkirina tekamul an têkçûyîna wan!”[6]

Romannûs, her çi meselêyê vedibêje bila bibêje di tûrikê wî da derdên wî û civaka wî hene. Di her fersendê da di çîroksazîya romanê an jî di herikîna axaftina karakterên xwe da cih dide dengê gîyanê xwe. Vê çîroka gîyanê xwe deyne alîyekî û behsa cih û warê ku bûyerên romanê lê diqewimin bike jî dê rewşa welat û hemwelatîyên wî wek dîmenên sînematografîk di rûpelên romana wî da cih bigire..

Romana kurdî ya yekem *Şivanê Kurmanca* di sala 1935an da çap bû.[7] Ev, romaneke otobîyografîk e. Bi vê romanê, zimanê kurdî ji dezgeha sitran û kilaman hat hilgirtin û li ser dezgeha tevneke nûjen hate raxistin. Roj bi roj li ser vê tevnê xem û xeyal, dîrok û jîyana kurdan hate neqişandin. Rehîmê Qazî (1925-1991), Îbrahîm Ehmed 1914/1915-2000), Elîyê Evdirehman (1920-1995), Hecîyê Cindî (1908-1990), Seîdê Îbo (1924) peyrevên Erebê Şemo yên heman demê bûn. Piştî vê ekola Sovyetê gelek romannûs, ji dîyasporaya Evropayê derketîne û agirê romana kurdî gwîr û geş kirine: Mahmut Baksi, Mehmed Uzun, Firat Cewerî, Hesenê Metê, Helîm Yûsiv û Jan Dost ên herî zêde têne zanîn. “Lê mixabin ji ber erdnîgariyên ji hev dûr, alfabeyên ji hev cuda, rewşên siyasî haya nivîskarên kurd ji hev çênedibû.”[8]

Romana kurdî li wargehên dîyasporayê derketîye holê. Kesên kêm zêde ji ber heman sedêmên zor û zextan ji welatên xwe derketine û li erdnîgarîyên dîyasporayê hevûdin dîtine ji ber têkilî û girêdanên hemşehrîtî, nasnameyî, zîman û çandî li hev civîyane, naxwazin ji hev belav bibin. Kesên ku ditirsin di civaka dewleteke bîyanî

---

[4] Jale Parla, *Don Kişot'tan Bugüne Roman*, İletişim, İst., 2012, r. 144.
[5] Georg Lukacs, *Roman Kuramı,*(Wer.) Cem Soydemir, Metis, İst., 2003, r. 63.
[6] Remezan Alan, *Li Dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyîn Folklor û Roman*, Peywend, Îst., 2013, r. 87.
[7] Haşim Ahmedzade, *Romana Kurdî û Nasname*, Avesta, Îstanbul, 2011, s. 12.
[8] M. Zahir Ertekin, Mehmet Yıldırımçakar, *Destpêka Romana Kurdî*, Peywend, Stenbol, 2020, r. 15.

da winda bibin an bihelin li kok û esasa xwe vedigerin, li çavkanîyên çanda xwe li dewlemendîya zimanê xwe xwedî derdikevin. Ev tevger jî dibe wesîle ku hin ji wan, çîroka sirgûnî an jî bîyanîbûna xwe bînin zimên. Edebîyat û cureyên edebîyatê wek helbest, kurteçîrok û roman, ji vê derbirînê ra dibin qada çalakîyeke hunerî. Xebatên bi vî rengî di nava gengeşîya nasname û neteweyan da dibin îspata hebûna takekes an jî neteweyekî.

Civaknasê amerîkî Prof Craig Calhoun îdîa dike ku: "Mirovên dîyasporayê ji yên li welêt bêtir mihafezekar in derbarê çanda neteweyî de (…) Yanî ew xwe bi çandeke neteweyî ya îdealîzekirî re girêdayî dibînin. Mirovên ku li derveyî welatê resen li dereke din in, jîyana xwe û ya civaka li derdora xwe didin ber hev û dixwazin nasnameye xwe û çanda xwe ya neteweyî biparêzin."[9] Kurdên ku derfeta jîyana ser xaka xwe ji ber mercên dîrokî, sîyasî û civakî winda kirine lî erdnîgarîyeke bîyanî li kok û rehên xwe gerîyane û masûmîyeta jîyana bextewar a zarokatîyê an jî kul û keserên jîyana ciwantîyê ji tevna romanên xwe ra kirine benikên rengorengo. Bi saya van romanan edebîyata kurdî ji sînorên edebîyata klasîk derketîye û fersenda belavbûneke qada berfireh a modernîteyê bi dest xistîye. Bi vê boneyê îro em dikarin bi şanazî behsa romana kurdî bikin lê dîsa jî "Mirov nikare romana kurdî ya temen-ciwan bi xetên stûr wek realîst, modernîst û postmodernîst li serdeman dabeş bike. Ev meyl û bizav hîn ji salên 1980yî di nav hev de xuya bikin jî, ji salên 1990î pê ve rengvedana postmodernîzmê di romana kurdî de berbiçavtir bûye."[10]

Cihê ku roman lê hebe teqez dê rexne jî hebe. "Rexne di sedsala 20an da bûye mijara edebîyatê."[11] Rexne wek termeke edebîyatê li ser nîvîskar û berheman bi awayekî mîkroskobîk disekine û ji gelek alîyan ve kêmasî an serkeftîyên nivîskar yaxût berheman destnîşan dike. Bi vê xizmetê di navbera xwîner û nivîskaran da pireke mihim saz dike. Rexnegir, vî karê bi qedir û qîmet li gor hin qayîdeyên dîsîplîna cureya rexneyê dikin. Rexneya zanistî, rexneya subjektîf, rexneya

---

[9] Barzoo Eliassi, *Neteweperestî, Kozmopolîtanîzm û Bêdewletî, Hevpeyvînek ligel Craig Calhoun*, (Wer.) Umran Aran, Zareme, Sal: / Hejmar: 2 / 2014. r. 21.
[10] Ümran Altınkılıç, *Rengvedanên Postmodernîst di Romana Kurdî de*, Zanîngeha Dîcle, Enstîtuya Zanistên Civakî, Teza Doktorayê ya Neweşandî, 2022, r. 79.
[11] Terry Eagleton, *Eleştirinin Görevi*, (Wer.) İsmail Serin, Weş. Ark, Ankara, 1998, r. 101.

sosyolojîk, rexneya dîrokî, rexneya marksîst, rexneya nû her yek ji van dîsîplînên rexneyê, li gor kanonên xwe nêzîkî berhema edebî yan jî nivîskaran dibin.

Nivîskarê ku romanek derxistibe holê helbet dê li gor regezên rexneyê bê rexnekirin. "Romana ku bi hêsanî nayê nivîsandin ewqasî bi erzanî jî nayê rexnekirin. Divê ku dewla rexnegir, xurcik û xurcezîn, têr û cembîyên rexnegir, tûrik û bendekên rexnegir teva dagirtî bin."[12] Heger karê rexneyê bibe karekî keyfî û rexnegir nîkaribe tespîtên xwe îspat bike dê ev çalakîya karîger, bibe ayîneke medhê an jî bîbe qafikê verişandina kîn û xerezê. Her du rê jî mirina edebîyatê ne.

Rexne ji bo famkirina edebîyatê çawa karîger be ew qasî jî wek çekeke bitesîr di destê romannûsan da ji bo rexnekirina gelek kes an tiştan roleke sereke dîlîze. Wek mînak nivîskarê îtali Umberto Eco (1932-2016) di romana xwe ya postmodern a navdar *Navê Gulê* (*Il Nome Della Rosa*) da bi awayekî dûr û dirêj rexneya teolojîk dike. Nivîskarê tirk Orhan Pamuk (1952-) ku xwedîyê Xelata Nobelê (2006) ye, di romana xwe ya sîyasî *Kar* (*Berf*)ê da ji gelek alîyan ve rexneya dewletê û partîyên sîyasî dike. Nivîskarê rûs Lev Nikolayeviç Tolstoy, di romana xwe *Herb û Silhê* (*Война и мир*) da rexneyên tund li arîstokrasî û bûrjûvazîya rûsî dike. Ev lîste bi sedan mînakên giring dikare dirêj bibe. "Her nivîskar ji civakekê derdikeve û arîşeyên civaka xwe bi civaka xwe ra dijî, hîs dike û dibîne. Ji ber vê jî gelek caran berhemên xwe ji van pirsgirêkan dihûne. Afirînerîya xwe li ser vanan diceribîne. Nivîskarên kurd jî di berhemên xwe da li ser civaka xwe, pirsgirêk, pevçûn û şerê di nava kurdan û yê di navbera kurd û dewletên desthilatdar da disekinin û vana wek mijar û tema bi kar tînin." [13] Romannûsên kurd ên ku piranî berhemên xwe li dîyasporayê nivîsîne wek Mahmut Baksi (1944-2000), Mehmed Uzun (1953-2007), Hesenê Metê (1957-), Firat Cewerî (1959-), Helîm Yûsiv (1967-) û Jan Dost (1965-) di piranîya romanên xwe da li bûyerên dîroka kurdan, li rûdanên sîyasî gelek rexne kirine dîsa berê tîrên rexneyên xwe gelek caran dane civaka kurdan û bi gotinên tûj rexneyên xwe di romanên xwe da bi cih kirine. Ev romannûsên navborî qismekî jîyana xwe li bajarên Ewropayê derbas kirine. Hin ji wan wek penaber hin ji

---

[12] Ahmedzade, h., b., r. 42.
[13] M. E., Purçak, *Di Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê , Ez ê Yekî Bikujim û Lehîyê de Tezahurên Biyanîbûnê*, Nûbihar Akademî, 4 (13), 11-12.

wan bi sirgûnî li dîyasporayê mane û romana kurdî ya dîyasporayê bi xebatên xwe yên nivîskî geş kirine. Romanên wan, kurtejîyana kurdan e. "Dema behsa edebîyata kurdî tê kirin bêjeya ewil tê hişê mirov 'sirgûn' e. Bi maneyeke din edebîyata kurdan edebîyata sirgûnê ye."[14] Di mercên sirgûnîyê da Mahmut Baksi bi giştî di romanên xwe da dixwaze vê yekê bide zanîn: "Welatên kurdan ji çar parçeyan ava bûye û kurd miameleya herî xirab li parçeyê Tirkîyeyê dibînîn. Çawa li Tirkîyeyê polîtîkayên turkîfîkasyonê hene li Sûrîyeyê jî polîtîkayên erebîfîkasyonê hene. Lê carinan vê yekê dîrekt nabêje bi awayekî endîrekt rawe an jî teswîr dike."[15]

Mehmed Uzun bi heft romanan di romana kurdî ya dîyasporayê da navdar e di romanên xwe yê piranî jînenîgarîya navdarên kurdan e bi karakterên romanên xwe heyf û mixabinîyên gelê kurd û qedera wan ya parçebûn û belavbûnê li ber xwîneran radixe û hewl dide hebûna kurdan a tê înkarkirin bi xebatên xwe û romanên xwe pûç bike. Di van heft romanan da dîrok, sîyaset, civak bi gelek dirûvên rasteqîn ji alîyê Uzun ve tê rexnekirin. Rexneyên wî jî carinan ji devê karakterekî rasterast, carinan jî bi şêwazeke alegorîk ango nixumandî tê vegotin.

Nivîskarên ku di çarçoveya vê xebatê da cih digirin, xwedî tecrubeya dîyasporayê ne û jîyana dîyasporayê gelek bandor li ser wan û hunera wan kirîye. Hesenê Metê ku bi salan e li dîyasporayê dijî di romana kurdî da ji alîyê resenîyê û teknîka romana modern û postmodern ve bal dikêşe. Metê, di atmosfera mîstîk û xumamî ya romanên xwe da gelek caran cih dide rexneyên civakî, sîyasî û dîrokî. Di romanên Metê da rexneyên tund li hember dîn û bawerîyan hene. Metê, van rexneyên tûj bi saya şêwaza îronîyê dike. Gelek caran gotara Metê ya îronîk ew qasî qehîm e ku tîrên rexneyê di atmosfera vê îronîyê da şewş dibin.

Firat Cewerî bi romanên xwe navekî mihim e ji bo edebîyata dîyasporaya kurdî. Romanên wî çîroka penaberîya kurdan e. Trajedîya dîroka kurdan e û drama herî bi şewat ya sîyaseta kurdan e. Kul û keserên dîyasporayê di romanên Cewerî da ji lehengên wî ra dibin xusûsîyetên kesayetê. Cewerî, "Keserên wextên borî yên kû ji

---

[14] Abidin Parıltı, Özlem Galîp, *Kürt Romanı Okuma Klavuzu*, Sel Yayıncılık, r. 19.
[15] Parıltı, Galip, h., b., r. 53.

niha ve li welatê jibîrbûyînê yê bi konfor nişteciih bûye, bi bîr tîne. Ji alîyekî ve panoramaya başûrê rojhilat a berîya 1980yî pêşkêş dike ji alîyekî ve jî çîroka kurdan a piştî 1980yî bi serborîyên karakterên xwe vedibêje."[16]

Helîm Yûsiv ji parçeyê Sûrîye ye û bi salên direj li Almanyayê maye. Di romanên wî da hem jîyana bextewar a warê bav û kalan hem jî zor û zehmetîyên jîyana dîyasporayê bi zelalî xuya dibin. Yûsiv, piranî di bin bandora realîzma efsûnî ku derfetên çîroksazîyên fantastîk dide nivîskaran, romanên balkêş dinivîsîne. Di van romanan da gelek rexneyan li parçeyê Sûrîyeyê dike.

Jan Dost ji parçeyê Sûrîyeyê ye û bi salan e li dîyasporayê dijî. Romanên wî bi giştî di çarçoveya postmodernîteyê da cih digirin. Jan Dost, çîroksazîyên romanên xwe piranî ji jînenîgarîya navdarên dîroka kurdan digire. Romanên Jan Dost bi tevahî rexneya civak sîyaset û dîroka kurd û Kurdistanê ne. Romanên wî yên *3 gav û 3darek, Mijabad, Mîrname* li ser dîroka kurdan rexneyên tund dihewînin.

Xebata me li ser rexneyên civakî, sîyasî û dîrokî disekine û van temayên sereke di sî û yek romanên şeş romannûsên dîyasporayê da dinirxîne. Bi vê taybetmendîya xwe teza me bi sîwaneke berfireh nêzî romana kurdî (kurmancî) a dîyasporayê dibe û rexneyên li ser gelek têgehan analîz dike. Herweha mantalîteya rexneya romannûsan ku di romanên xwe da bicih kirine, gelek caran bi awayekî berawirdî hatîye pêşkêşkirin û sedemên cudahîya rexneyên wan hatîye rawekirin.

ÇARÇOVEYA GIŞTÎ

1.1. Mijara Tezê

Mijara teza me di navbera salên 1984 û 2020an da li dîyasporayê di romanên Mahmut Baksi, Mehmed Uzun, Hesenê Metê, Firat Cewerî, Helîm Yûsiv û Jan Dost da rexneyên civakî, sîyasî û dîrokî ne. Ev navên ku ji bo vê tezê hatine hilbijartin, qismekî jîyana xwe li dîyasporayê derbas kirine û ekserîyeta romanên xwe li

[16] Parıltı, Galip, h., b., r. 102.

dîyasporayê nivîsîne. Kul û keserên dîyasporayê kişandine û ji wextekî û pê ve bi çavekî rexneyî li rewşa welat, civak, sîyaset û dîroka xwe nêrîne.

Ev xebat ji ber ku derheqê rexneyên romana kurdî ya dîyasporayê da ye di beşa yekem a vê xebatê da têgeha dîyasporayê, derçûna dîyasporaya kurdî ya Ewropayê, xisûsîyetên romana kurdî ya dîyasporayê û cihê romana dîyasporayê, di romana kurdî da dê bibe qada mijara me. Dîsa di vê beşê da wek binbeşekê em dê li ser romannûsên ku me sînorên teza xwe bi wan û romanên wan xêzkirîye bisekinin. Jînenîgarîya van romannûsan û taybetmendîyên romanên wan, cihê wan di edebîyata kurdî da dê bihê nîqaşkirin.

Beşa duyem a teza me li ser rexneya civakî ya romana kurdî ya dîyasporayê ye. Rexneya civakî di metnên edebî da xwedî roleke giring e. "Rexneya civakî bi formeke ku berhemê di nava peywenda wê ya civakî da dihesibîne tezahur dibe û edebîyatê wek îfadeya çandê dibîne."[17] Rexnegir, çawa ku "backrounda bandorê li ser nivîskar û berhema wî dike derdixe holê."[18] Nivîskar jî civaka ku di romana xwe da behs dike bi derfetên şayesê li ber çavên xwîneran radixe. Xwîner, bi arîkarîya van şayesên civakî daxilî atmosfera romanê dibe. Her romannûs, li gor feraseta xwe ya hunerî û têkilîya xwe ya bi civakê ra hin rexneyên civakî di tevna romanê da bicih dike. Ji alîyekî ve rêzebûyerên romanê diqewimin ji alîyekî ve jî qisûr û arîşeyên civakê di mejîyê xwîneran da dikemilin. Bi vî awayî xwîner, derheqê civaka xwe da difikire û nêrîneke rexneyî bi dest dixe. Di van romanên navborî da rexneyên li ser gundîtîyê, rexneya axa û began, şerên navxweyî yê eşîran, rexneyên aborî, fesadî, gelacî û sîxurîya di civaka kurdan da, rexneya însan di civakê da (rexneya mêr û jinan), wek binbeşekê rexneya çandî, rexneya orf û adetên kurdan, cehalet û perwerde dê bibin mijara analîzên me.

Di beşa sêyem da di romana kurdî ya dîyasporayê da rexneya sîyasî dê bihê nîqaşkirin. Wek tê zanîn sîyaset qadeke ku bandora wê li hemû jîyanê heye. Di romanan da nivîskar gelek caran ji bo atmosfera romanê avabikin û binesazîya

---

[17] Alice Templeton, *Sociology and Literature Theories For Cultural Critisizm,* College Literature, Volume 19, Issue 2, 1992.
[18] David Daiches, Critisizm and Sociology in Critical Approaaches to Literature, Longman, Newyork, 1981, p. 357.

bûyerên ku diqewimin di hişê mirovan da tekûz bikin dest diavêjin meseleyên sîyasî û di vê navberê da hin meseleyên sîyasî rexne dikin. Rexneyên sîyasî hem civaka ku tê behskirin dişayesîne hem jî têkilîyên polîtîk di navbera do û îro da datînin.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da gelek rexneyên sîyasî derdikevin pêşberî me. Bi vê boneyê rexneya mîr û partîyên kurdan, rexneya dewleta Osmanî, Komara Tirkîyeyê, Sûrîye, Îraq û Îranê bi giştî dê bihê analîzkirin. Di vê beşê da di bin sernavê rexneya sîyasî ya giştî da nasname / netewe, ziman, bêdewletbûnî, mafên mirovan, sirgûnî / tehcîr, êşkence, asîmîlasyon, dîktatorî, îdeolojî û rexneyên li ser dadwerîyê dê bibe qada nîqaş û analîzên me.

Beşa çarem ango beşa dawî ya vê xebatê li ser rexneya dîrokê di romana kurdî ya dîyasporayê da ye. Dîrok ji bo cureya romanê fersendên hêja dihewîne. Kemal Me'ruf dîyar dike ku: "Rexneya dîrokî yekem rê û rêbaza rexneya edebî ye."[19] Jixwe bûyerên her romanê di heyamekê da diqewimin û romannûs gah li gor kronolojîyekê behsa van bûyeran dike gah bi teknîgên edebî di nava dem û dewranan da derdikeve geştekê. Carinan jî dîrok bi xwe dibe mijara romanê û romannûs hewl dide bûyereke dîrokî bi derfetên edebîyatê vebêje. Nivîskar di vê heyama vegêrana bûyerên dîrokî da dikarin rexneya dîrokê jî tevî romana xwe bikin. Bi saya rexneyên dîrokî asoya xwîneran a derheqê dîrokê da berfireh dibe û dîrok ji bo dema ku em tê da ne dibe neynika ku bûyerên îbretê nîşan dide.

Di romanên ku me mijara tezê bi wan sînordar kirîye rexneya hişmendîya dîrokê, rexneye dîroka Osmanî, Qetlîama nastûrî û keldanîyan, Serhildana Mîr Bedirxan Paşa (1803-1868) Cenga Cîhanê ya Yekem, Peymanên dîrokî, wek binbeşekê rexneyên dewleta Tirkîyeyê Serhildanên kurdan, Cenga Cîhanê ya Duyem û Cuntaya 12 îlonê hatîye analîzkirin. Bi van çar beşan me xwest ku romanên wek sînorên vê tezê hatine dîyarkirin, ji alîyê rexneyên civakî, sîyasî û dîrokî ve bên nirxandin û panoramayek rexneya di romana kurdî ya dîyasporayê da derkeve holê. Hêjayî gotinê ye ku mebesta me ne rexneya romana kurdî ye. Rexneyên di çarçoveya

[19] Kemal Merûf, *Mîtodî Rexney Mîjûyî*, K. Mêrîg, J. 62, Weş. Dezgehê Mêrîg, Hewlêr, 2010, r. 92.

vê xebatê da wek amûreke nîşanger a hest û ramanan roleke giring hilgirtîye ser milên xwe.

1.2. Armanc /Angaşt:

Di akademîya kurdî da tezên rasterast li ser tema yan jî serdeman kêm in. Armanca me tespît û şîrovekirina rexneyên civakî, sîyasî û dîrokî yên romana kurdî ya dîyasporayê û herweha bercestekirina bandora dîyasporayê li ser nivîskar an jî karakterên romanan e. Di heman demê da rexneyên civakî, sîyasî û dîrokî yên di van romanan da, dê bibin mijara analîzên me.

Angaşta teza me ew e ku di romana kurdî da bi taybetî di romana kurdî ya dîyasporayê da mijar her çi dibe bila bibe rexneyên civakî, dîrokî û sîyasî ji perspektîfa romannûsên kurd carinan dîrekt carinan jî endîrekt tevî romanê dibe. Armanca me li gor hin serenavan pêşkêşkirina van rexneyên civakî, sîyasî û dîrokî ne. Di heman demê da em ê hewl bidin ku ji pênûsên şeş romannûsên kurd çi rexne derketibe, analîz bikin. Bi saya van analîzên rexneyî em dixwazin dupat bikin ku romana kurdî ya modern a dîyasporayê ji hêza rexneya edebî sûd wergirtîye.

Romannûs, hewl didin ku serdema xwe û civaka xwe bi ramanên xwe yên rexneyî biguherînin. Bi vê boneyê her romannûs, xwe li hember serdem û civaka xwe berpirsyar dibîne û dixwaze di guherîn û veguherîna civaka xwe da roleke dîzaynker bilîze. Em dê hewl bidin bi nimûneyên rexneyî yê romanên van kesên ku me çarçovaya teza xwe bi wan û romanên wan xêzkirîye, nîşan bidin ku romannûsên kurd, bi rêya rexneyê xwestine civakeke çawa dîzayn bikin?

1.3. Naverok

Di vê xebatê da romannûsên dîyasporayê û berhemên wan ku me çarçoveya teza xwe bi wan sînordar kirine ev in: Romanên Mahmut Baksi: Hêlîn (1984), Gundikê Dono (1988), Serhildana Mala Elîyê Ûnîs (2001). Romanên Mehmed Uzun: Tu (1985), Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê (1987), Mirina Kalekî Rind (1989), Sîya Evînê (1991), Bîra Qederê (1995), Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mîrînê (1998), Hawara Dîcleyê (2001-2003) Du cîld. Romanên Firat Cewerî: Payiza Dereng (2005), Ez ê Yekî Bikujim (2008), Lehî (2013), Maria Melekek bû (2013), Romanên Hesenê

Metê: Labîrenta Cinan (1994), Tofan (2000), Gotînên Gunehkar (2007), Li Dêrê (2011), Hefsar (2018). Romanên Helîm Yûsiv: Sobarto (1999), Tîrsa Bêdîran (2006), Gava ku Masî Tî Dibin (2008), 99 Morîkên Belavbûyî (2015), Wehşê di Hundirê Min de (2018)

Firîna bi Baskên Şikestî (2019). Romanên Jan Dost: Mijabad (2004), 3 gav û 3darek (2007), Mîrname (2008), Kobanî (2017), Pîrewergêr (cîld 1 / 2018) Naqosên Romayê cîld 2 / 2019).

1.4. Rêbaz

Xwendin û lêkolînên ji bo vê tezê hatine kirin di bin sîwana xwendina akademîk da pêk hatine. Sî û yek romanên ku bi awayekî tematîk em li ser xebitîne, berhemên edebî ne. Ji ber vê yekê xebata me xwe dispêre çendîn zanist û dîsîplînên civakî: Edebîyat, dîrok, sîyaset û civaknasî dîsîplînên bingehîn in ku arîkarî ji vê xebatê ra kirine. Bi arîkarî û têkilîya van dîsîplînan em dê hewl bidin rexneya civakî, sîyasî û dîrokî di romana kurdî ya dîyasporayê da bi awayekî înterdîsîplîner li ber çavan raxin.

Civaknasî ew dîsîplîn e ku li ser civak û têkilîyên ferd û civakê disekine. Ji ber ku nivîskar aîdê civakekê ne di berhemên xwe da yan behsa civaka xwe dikin yan jî civakeke kêm zêde wek civaka xwe ava dikin û çîroka xwe di nava têkilîyên vê civakê da dihûnin. Ev rastî, di navbeyna edebîyat û sosyolojîyê da dîsîplîneke navber ava dike: sosyolojîya edebîyatê. Ev dîsîplîn dê ji xebata me ra rênîşanderîyê bike. Dîsîplîneke din ku teza me xwe bi awayekî tematîk dispêrê, dîrok e. Dîrok ku li ser bûyer û kesayetên rabirdûyê ji alîyê sedem û encaman ve disekine hem ji bo romanên dîrokî hem ji bo romanên civakî û sîyasî dê bingeha rexneyên romannûsan ronî bike. Rexneya dîrokî ku şaxekî rexneya edebî ye dê ji me ra bibe rêber. Dîsîplîneke din ku xebata me li ser ava bûye sîyaset e. Bi têkçûyîna împaratorîyên pirnetewî û derketina holê ya netewedewletan, sîyasetê wek dîsplînekê cihê xwe di rojeva ronakbîran da çêkirîye. Sîyaset bi gelek alîyan ve bandorê li ser civakê dike û civak jî dergûşa edebîyatê ye. Di vê têkilîya pirşaxî da bandora sîyasetê ya li ser edebîyatê bivênevê ye. Ji ber ku kakilê vê xebatê, romanên dîyasporaya kurdî ya Ewropayê ye, em dê ji alîyê rexneyên civakî, sîyasî û dîrokî ve van romanan lêbikolin û bi jêderên tematîk û tesnîfkirî van rexneyan şîrove bikin. Bi vê boneyê em dê di xebata xwe da bibin peyrevê rêbaza rexneya dîrokî û civakî.

Prof Berna Moran (1921-1993) dibêje ku: “Ji bo xwendevan bikaribe berhemeke di demên borî da hatîye nivîsîn fam bike bigihêje çêja wê û karibe wê binirxîne divê mercên wê dema ku berhem tê da hatîye afirandin, tradîsyon û zîhnîyata wê demê ya hunerî bêyî zanîn.”[20] Moran, destnîşan dike ku li gor rexneya civakî edebîyat tena serê xwe di civakê da nawelide berhem, neynika civakê ye. Tê pejirandin ku vê rêbaza rexneyî cara ewil ji alîyê Hippolyte Taine (1838-1893) ve hatîye bikaranîn.[21] Mikhail Bakhtin (1895-1975) derheqê têkilîya roman û heyamê da diyar dike ku roman tekane cureye ku heta dawî bi heyama xwe ra di nava têkilîyeke kûr da ye.”[22] Ji ber vê çendê rêbaza rexneya dîrokî û civakî ji bo têgihiştina me ya rexneyên romana kurdî ya dîyasporayê dê rênîşandar be.

[20] Berna Moran, *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*, 8. Baskı, Cem Yay., İzmir, 1991, r. 70.
[21] Moran, h., b., r. 74.
[22] Mikhail Bakhtin, *Karnavaldan Romana*, Ayrıntı Yay., İstanbul, 2001, r. 165.

BEŞA YEKEM

ROMANA KURDÎ YA DÎYASPORAYÊ

1.1. Dîyaspora

Dîyaspora ji alîyê etîmolojîyê ve ji bêjeyên yûnanî "dia"ya bi wateya hundirîn û "speirin" a bi wateya belavbûnê tê. "Ev têgeh, qe nebe di peywenda Ewropî da bi taybet bi belavbûna Babîlîyan a piştî sirgûnîyên yahûdîyan tê têkildarkirin."[23] Wek têgeheke sosyo-politik dîyaspora ji ber çendîn sedeman kesên ku parçeyê neteweyekî ne bi awayekî şexsî an jî girseyî koçberî dewletan bibin û bixwazin hebûna xwe bi welatên xwe, çand û nasnameya xwe ra bidomînîn û di vê daxwazê da biqerar bin, temsîl dike.

Grûbên dîyasporayê ji ber ku meyla daxwaza jîyana bi ziman û çanda xwe nîşan didin, di bin banê partî an komeleyan da mekanên hevpar ava dikin û di van mekanan da bi awayekî çalak faalîyetên çandî, hunerî û sîyasî li dar dixin. Meşandina çalakîyên çapamenîyê, vekirina kûrs an dibistanan, lidarxistina aktîvîteyên çandî û hunerî, organîzekirina meş û civînên sîyasî, nasnameya dîyasporayan nîşan didin.

Dîyaspora ji bo jîyana "ez"ê, xwedîlêderketina hişmendîya "em"ê derdixe pêş û vê hişmendîya kolektîf ji bo afirandina cemaatên dîyasporayê bal dikêşe ser nasnameya hevpar, dîrok, ziman û çanda hevpar, zemqa ruhê dîyasporayê ye. Balkêş e ku meseleya dîn û bawerîyan ji bo dîyasporayan ne mefhûmeke mihim e. Kesên ji bîr û bawerîyên cuda ne jî heger ji heman ziman û çandê bên, dikarin bi hêsanî hevûdin li wargehên dîyasporayê bibînin û li hev xwedî derkevin. Bi gotineke din wargehên dîyasporayê ji alîyê bawerîyan ve navendên toleransê ne. Pêdivîya zimanê zikmakî di gengeşîya mîhrîcana deng û rengan da çend gavan derdikeve pêşîya bawerîyên bav û kalan. Kesek heger ji dînê we bawer meke jî bi zimanê we biaxife, dikare nêzîkî we bibe.

Minoo Alinia di kitêba xwe ya bi navê *Diaspora Mekânları* (Mekanên Dîyasporayê) da ji Robîn Cohen neqil dike ku Cohen, van cureyên dîyasporayê

---

[23] Minoo Alinia, *Diaspora Mekânları,* Avesta, İstanbul, 2007, r. 32.

dijmêre: “Qurbanî / penaber, emperyal / kolonyal, ked / xizmet, tîcaret / kar / kesên xwedî pîşeyên profesîyonel, çandî-melez/ postmodern.”[24] Li gor Cohen, grûbên dîyasporayê ji van alîyan taybetmendîyên hevpar nîşan didin: “1) Piranî bi awayekî travmatîk veqetîna ji welat û belevbûna yek an jî ji yekê zêdetir deveran. 2) Ji ber bazirganîyê an jî li ser rêya hewesên kolonyal dûrketina ji welêt. 3) Hafizayeke kolektîf a di derbareyê welêt da. 4) Îdealîzekirina warê bav û kalan û ji nû ve sazkirina ewlehî û refahê. 5) Erêkirineke kolektîf derheqê pêşvebirina fikira vegerê da. 6) Hişmendîyeke bihêz a qewmî, bawerîya dîrok û qedereke hevpar. 7) Bi bîranîna ji alîyê dewleta mazûban, nepejirandin an jî di vê peywendê da pêvajoyeke pirsgirêk an jî îhtîmala felaketeke dîtir. 8) Bi kesên ku li heman dewletê nişteciih bûne empatîyeke qewmî an hizira hevgirtinê. 9) Bi toleransa dewleta mazûban, derfeta dewlemendtirkirina jîyanê.”[25] Ev rewşên cîyawaz, kesên ku li welatên xwe di nava astengîyan da ne teşwîqî tevîbûna dîyasporayê dikin.

2.1. Romana Kurdî ya Dîyasporayê

Kurdên penaber wek derîyekî rizgarbûna ji zilm û zorê xwe li dîyasporayê girtine. “Li Tirkîye, Îran, Îraq û Sûrîyeyê rûdana cûnteyên leşkerî û polîtîkayên wan ên antîdemokratîk li ser kurdan, bûn sebebên koçberî û penaberîyeke mezin. Yanî li pey wan elametên nebaş li welatên cihê cihê yên Ewropayê di nav kurdan da tecrubeyeka dîyasporayê çêbû. Li wan welatan lê xasma jî li Swêdê edebîyateka hal û rewşa penaberîyê, temayên dîyasporayê qiset dike rûda.”[26] Barzoo Eliassi îdîa dike ku: “Dîyasporaya kurd li Swêdê, berhemeke bêparbûna siyasî û aborî ya li Rojhilata Navîn e. Bi xêra sîyaseta pirçand a comerd a Swêdê, bêyî ku ji civaka Swêdî qut bibin kurdan karine xwe mobîlîze bikin û têkildarî siyaseta welatê xwe bibin.”[27]

Penaberên kurd ên entelektuel, li bajarên Ewropayê berê pênûsên xwe dane cureya romanê. Romana kurdî ku em mînakên wê yên ewil li Sovyetê dibînin, di bin sîwaneya azadîyê ya dîyasporayê da mînakên kemilî dîyarî ziman û edebîyata

---

[24] Alinia, h., b., r. 102.
[25] Alinia, h., b., r. 102.
[26] Remezan Alan, *Keşkûl*, Peywend, Stenbol, 2019, r. 61.
[27] Barzoo Eliassi, *Texeyula Neteweyê li Dîasporayê*, (Wer.) Umran Aran, Zarema, Sal:2/ Hejmar: 4/ 2015, r. 128.

kurdî kirîye. “Romana kurdî ya dîyasporayê ji alîyekî ve hebûn û balavbûna zimanê kurdî dupat dike ji alîyekî ve jî romana kurdî ya salên piştî 1990î bi gelek nimûneyan dixwaze heyfa derengmayînê hilîne. Romana kurdî êdî hîn bi lez û bez e. Ji alîyê romana kurdî ve êdî dem ne dema îspatkirina zimanê kurdî ye dema îspatkirina romana kurdî bi xwe ye.” [28]

Romana kurdî ya dîyasporayê dikare wek romaneke mişextîyê jî bê binavkirin. “Kurdên ku ji welatê xwe sirgûn bûne û çûne dîyasporayê, nostaljiyên xwe û peywirên xwe yên neteweyî bi nivîsandinê xwestine telafî bikin. Bi vî awayî xwestine ku çanda xwe biparêzin û ji bo dahatûya gelê xwe bixebitin. Ev yek di kurdên Sovyetê da bi rehetî tê kifşkirin.”[29] Dema mirov li temayên romana kurdî ya dîyasporayê dinêre mijarên sirgûnî, hesreta welat, tenêtî, îzolasyon, bîyanîbûn, gengeşîyên çandî, tirsên dîasporayê, zor û zordestî, êşkence, sîyaset, fikira vegera welêt, wek mijarên sereke derdikevin pêşberî me. “Di romanên sirgûnîyê da tesîrên guvaşa 12 îlonê pir zelal in. Bi rastî jî piştî Cuntaya 12 îlonê gelek kurd, mecbûr mane derbasî Ewropayê bibin.”[30] Îbrahîm Seydo Aydogan weha dibêje: “Gava ku em bala xwe didin salên çapa romanan û bûyerên sîyasî em dibînin ku sîyasetê tim rê li ber wêjeya kurdî vekirîye. Lewra piştî 12ê îlona 1980ê ku cunta li Tirkîyeyê hat ser desthilatdarîyê, kurdên rewşenbîr û sîyasetmedar ên ku revîyan derveyî welêt, berê xwe dan nivîsandina kurdî û hemû romannivîsên wê demê jî ji tevgerên sîyasî dihatin.”[31] “Piştî cuntaya 1980yî sîyasetmedarên kurd, ên ku derfet peyda kirin xwe di ser Sûrîye û welatên din ên Rojhilata Navîn re gîhand welatên rojavayî bi taybetî jî yên Ewropî. Li van welatan nemaze li Swêdê hin ji wan sîyasetmedaran, dest bi nivîskarîyê kir û stara xwe di vî îşî de dît. Ji talaneke çandî û sîyasî dihatin û di dilê xwe de him negîhaştina mirazan û him jî ji hêvîya vegera welêt digihandin.”[32] Aydogan di heman kitêba xwe da destnîşan dike ku “Di romanên kurdî yên nifşê Ewropî de îdealîzmeke berbiçav jî xuya dibe ku di wêjeya kurdî de fenomeneke giring e. Ev îdealîzm bi hessasîyetên sîyasî ve jî tê dagirtin û

---

[28] Güneş Kan, Hacı Önen, *Kürtçe Romanın Doğuşu ve Gelişimi Üzerine Bir Değerlendirme*, The Journal Of Mesopotamian Studies, 7 (1), 103-127.
[29] Betül Çoban, *Îdeolojî û Partîzanî di Romanên Kurdî yên Sovyetê da,* The Journal of Mesopotamian Studies Vol 6 (2) Autumn 2021, r. 234-235.
[30] Abidin Parıltı, Özlem Galip, *Kürt Romanı Okuma Kılavuzu*, Sel Yayıncılık, İst., 2010, r. 174.
[31] Îbrahîm Seydo Aydogan, *Guman 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*, Weş. Rûpelê, İst., 2014, r. 114.
[32] Aydogan, h, b., r. 403.

di nava nivîskarên welêt de jî heye nivîskarên kurd ên li Ewropayê ku ji nifş û tevgerên sîyasî û bi taybetî ji yên marksîst dihatin, negihîştina xwe ya mirazan di xuyabûna nava berheman re aşt dikirin. Ji ber wê ye ku di berhemên wan de rasterast ew bi xwe nebin jî kesên bextewar hertim kesên xwende ne, kesên îdealîst in yanî dişibin nivîskarên wan berheman bi xwe."[33] "Nifşê duyem ew e yê ku li dor derbeya eskerî ya 12ê îlona 1980an pêk tê. Carinan wek nifşê mişextîyê tê binavkirin lewre behra pirtir ê nivîserên wî nifşî li derveyî Tirkîyeyê bi taybetî li Swêdê, dijîn. Jixwe gelek ji wan, çalak û endamên wan partî an rêxistinên kurd bûn ku ligel derbeya eskerî hatine qedexekirin an hilweşîyane. Li gel derbeyê ber bi Ewropayê ve direvin ku li wê ji mîlîtanîya sîyasî dadigerine xebata edebî û/an 'zimanî' hindek ji wan dibine nivîser. Nivîsîn bi xwe dibe şiklekî din ê têkoşînê, yê hebûn û berxwedanê."[34]

Abidin Parltı û Özlem Galip, di kitêba xwe ya "*Kürt Romanı Okuma Kılavuzu*" (Rêbera Xwendina Romana Kurdî) da weha angaşt dikin: "Berevajîyê romanên li Tirkîyeyê hatine nîvîsîn di romanên li dîyasporayê hatine nîvîsîn da, pevçûn û şer kêmtir e. Bêyî endîşeye îdealîzasyon û berz û balakirinê, çîrokên jîyana rojane hatine vegotin. Li gor romanên ku li Tirkîye hatine nîvîsîn romanên li sirgûnîyê hatine nîvîsîn ji alîyê cih û waran bêtir bi vegotineke rasteqîne hatine hûnandin. Bi gotineke din di romanên sirgûnîyê da gund û bajarên kurdan ji bilî nasnameyên wan ên sîyasî bi nasnameyên çandî derdikevin pêş."[35] Haşîm Ahmedzade dibêje: "Sedem, armanc û cureya koçberîyê her çi be, ew kengî biqewîme di navbera nifûsa herêmê û koçberan de hokerên ku wan ji hev dûr dihêle hene. Gelê heremê, li hemberî 'bîyanî'yan çi qas mêvanperwer, comerd û cîranperwer bin jî ji bo koçberan ji her alîyan ve gelek pirsgirêk hene. Ew ên ku terka welatê xwe kirine li cîyê xwe yî nû bi giştî xwe wek bîyanî dibînin. Ev hestên bîyanîbûnê bi taybetî di nav ên ku bêdîlê xwe welatê terikandine mezin dibe û (…) ji bo wan tevî tirsa jandar a binketinê û daxwaza serkeftinê hin hêvî û nostaljî hene."[36]

---

[33] Aydogan, h. b., r. 405.
[34] Remezan Alan, Engîn Öpengîn, *Tîr û Armanc*, Peywend, Stenbol, 2014, r. 73.
[35] Parıltı - Özlem, h. b., r. 180.
[36] Haşim Ahmedzade, *Romana Kurdî û Nasname*, Avesta, Stembol, 2011, r. 181.

Ahmedzade, diyar dike ku "Nivîskarên dîyasporayê tevkarîya rizgarbûna zimanê kurdî kirine. Wêjeya kurdî ya li dîyasporayê çavkanîyek baş a temsîla hişmendîya netewî û nasnameyê, amrazeke afirandina nasnameya etnîk û di heman demê de ji bo lêkolîna bandora dîyasporayê û sirgûnîyê ya li ser berhemên nivîskaran çavkanîyek biqîmet e."[37] Ahmedzade, weha didomîne "Ji ber ku romannûsên kurd ên dîyasporayê li sirgûnê demek dirêj derbas kirine bi awayekî nostaljîk û rexneyî nêzî meseleya welêt û kokên xwe dibin. Di heman demê de vegera hin kesên ji kurdên dîyasporayê bo 'welat' ji bo lehêngên romana kurdî peywendek nû derdixe pêşê.[38] Di romana kurdî ya dîyasporayê da ev tespîtên Ahmedzade hem di mijara romanan da hem jî di şayesandina derûnîya lehengên romanan û şayesa mekanan da şênber dibe.

Romana dîyasporayê di tradîsyona romana kurdî da rûpeleke nû vekirî ye. Romana kurdî bingeha xwe ya dîrokî ji xebatên romannûsên Sovyetê digire. Helîm Yûsiv di kitêba xwe ya bi navê *Romana Kurdî* da derheqê vê meseleyê da weha dibêje: "Çîroka pêvajoya romana kurdî li welatên Sovyeta berê çîrokeke dirêj û bi alozî ye. Hem bi tîpên kîrîlî û hem jî bi tîpên latînî roman hatin weşandin. Hinek ji wan romanan heta niha negihane ber destên xwendevanan û wendayî mane. Hinek ji wan jî wekû destnivîs li cem xwedîyên xwe mane û derfeta weşandinê nedîtine."[39] Erebê Şemo wek bavê romana kurdî derdikeve qada edebîyata kurdî û di serî da *Şivanê Kurmanca* (1935) wek romaneke otobîyografîk dinivîse. Piştî vê romanê *Kurdê Elegezê* (1958) *Berbang (1958), Jîyana Bextewar* (1959), *Dimdim* (1966) û *Hopo* (1969) ji pênûsa Erebê Şemo derdikeve. Heciyê Cindî (1908-1990) ku bi xebatên xwe yên akademîk mora xwe li dîroka xebatên folklora kurdî xistîye bi navê *Hewarî* (1967) romanek weşandîye. Eliyê Evdirehman (1920-1995) ku di sîyaseta kurdî da aktîvîstekî mihim e, bi navê *Xatê* (1959), *Gundê Mêrxasan* (1968) û *Şer Çîya de* (1989) sê roman li pey xwe hiştîye. Seîdê Îbo (1924), bi navê *Kurdê Rêwî* 1979) romanek nivîsîye. Egîdê Xudo *Dê û Dêmarî*; Ahmedê Hepo *Birîn* nivîsîye. Tosinê Reşîd (1941) *Mestûre Serê Hêjayî Tac bû* (2005) nivîsîye.

---

[37] Ahmedzade, h. b., r. 184.
[38] Ahmedzade, h. b., r. 31.
[39] Helîm Yûsiv, *Romana Kurdî*, Ronahî, Dîyarbakır, 2011, r. 60.

Li ser vê mîrateya hêja ya êwra Sovyetê romana kurdî ya dîyasporayê bi taybet li Ewropayê kete nava geşedaneke mezin. Ew kesên ku ji ber sedemên sîyasî koçberî Ewropayê bûbûn di nava mercên erênî yên çandî û hunerî da berê xwe dane xebatên ronakbîrî û hin ji wan bi karên kovargerî û romannûsîyê mijûl bûne. Bi taybet li Swêdê arîkarîya madî ya dewletê ji bo xebatên nivîskarîyê wêrekîyeke mezin da vî nifşê mişextîyê. Mahmut Baksi, Mehmed Uzun, Firat Cewerî, Hesenê Metê, Jan Dost, Helîm Yûsiv, Medenî Ferho, Bavê Nazê, Îbrahîm Seydo Aydogan û hin kesên din di vê êwrê da wek romannûs derketin pêş.

1.2. Romannûsên Kurd ên Dîyasporayê û Romanên Wan

Di bin vî sernavî da em dê -wek ku me berê jî di çarçoveya teza xwe da dîyar kiribû- li ser van romannûsan û hin romanên wan bisekinin: Mahmut Baksi, Mehmed Uzun, Firat Cewerî, Hesenê Metê, Jan Dost û Helîm Yûsiv. Ji bo ku em bikaribin perspektîfeke giştî bi dest bixin em dê van romannûsan bidin nasîn, bi kurtasî romannûsîya wan binirxînin û ew romanên wan ên ku me ji bo xebata xwe hilbijartine em dê behsa naveroka wan bikin. Bi saya van hûrgilîyan dê beşên xebata me yên din çêtir bên famkirin.

1.2.1. Mahmut Baksi û Romanên Wî

Mahmut Baksi di sala 1944an da li gundê Suphîyê bi ser Hezoya (Kozluk) Batmanê ve ye hate dinê. Dibistana Dîcleyê ya Momostetîyê temem nekir. Di sala 1967an da li Batman gazetesi da dest bi rojnamegerîyê kir. Di sala 1968an bû serokê Partîya Karkeran a Tirkîyeyê (TİP) a Batmanê. Xebatên wî yên sendîkavanîyê heta 1970yî dewam kir. Bi hinceta ku kurdîtîyê dike ji du pirtûkên wî 15 sal cezayê hepsê lê hate birîn. Di sala 1970yî da ji mecbûrî derbasî Almanyayê bû. Di sala 1971ê da li Swêdê bi cih bû. 22 kitêbên Mahmut Baksi hatine weşandin û li gelek zimanan hatine wergerandin. Baksi di rêwîtîya xwe ya nivîsê da kurdî, tirkî û swêdê bi kar anîye. Baksi di 19ê berfanbara 2001ê da li Stockholmê wefat kirîye.[40] Gora wî li Dîyarbekirê ye.

Mahmut Baksi di hevpeyvîneke li gel Mehmed Uzun weha dibêje: “Hin mirov, eçiqîna di nava xwe, bênasnametîya xwe, nefreta xwe bi stranan; hin mirov bi nivîsê,

[40] Mehmed Uzun, *Kürt Edebiyatı Antolojisi*, Gendaş Kültür, İstanbul, 2003, r. 200.

hin jî bi çekan didine der. Ez jî dinivîsim.” [41] Di heman hevpeyvînê da Baksi weha didomîne: “Ji bo ziman, roman metodeke hêja ye, weka otobanê ye. Pêşdêçûna bi her cure suratê mimkin e.”[42]

1.2.1.1. Hêlîn (1984)

Ev romana Mahmut Baksi di sala 1984an da hatîye weşandin. “Hêlîn di kurdî da romana yekem a kamilbûnê ye. Roman, jîyana keçeke bi navê Hêlînê ku ji xwedêdana wê û heta destpêka dibistana serate di nava mercên zext da ye qiset dike. Cîyawazîya di navbeyna jin û mêran a civaka rojhilat, xizanî, zor û zextên ji ber nasnameya kurdî tên jîyîn û koçberî di romana Mahmut Baksi ya *Hêlîn*ê da hatîye bênderkirin.”[43] Romana *Hêlîn*ê bi nêrîneke rexneyî cih dîde pirsgirêkên zarokên li gundan ji dayik bûne, orf û edetên kurdan, meyla civakê ya bi ser dîn ve. Bi taybet ji bo famkirina psîkolojîya zarokekî di dema cuntaya 12 îlonê da zarokatîya xwe derbas kirîye û gihîştîye heta dema niha alîkar dibe.[44] Di romana *Hêlîn*ê da civaka nezan, kevneşopîyên beradayî, asîmîlasyona piralî, teasûba eşîrî û dînî, zilm û zordestîya sîyasî, êşkenceyên li meydanên gundan li ber çavên jin û zarokan tên kirin, psîkolojîya koçberî û penaberîyê û herweha arîşeyên nasnameya çandî û nijadî bi bînfirehî di parzûnkê rexneyê da dawerivîye.

1.2.1.2. Gundikê Dono (1988)

Mahmut Baksi, romana *Gundikê Dono* di sala 1988an da weşandîye.. Ev roman bi giştî alegorîya rexneya civaka feodal e. Meseleya axatîyê, zilma axa kû li ser gundîyan kon vedaye pirsgirêka qelen, şêx û melayên ji bo berjewendîyên xwe dîn û dîyanetê berevajî dikin, usûl û esasên şerîetê li gor kêfa zaliman şîrove dikin, li ber çavan hatîye raxistin.

Gundikê Dono, romaneke realîst e, rastîya jîyana civakî ye. Xaleke giring vedibêje: Feodalîzma ku bi salan heye û kapîtalîzm nizilîye nav wê, ew kapîtalîzma ku însan kirine kole û bêçare û ew kirine ‘mirovên mecbûr’ vedibêje. Jixwe Filîto yê ku ji ber zilma axa çek hilgirtîye û derketîye serê çîyayan wek kopyayeke Ince

[41] Uzun, h. b. r. 200-2001.
[42] Uzun, h. b., r. 204.
[43] Abidin Parıltı, Özlem Galip, *Kürt Romanı Okuma Kılavuzu*, Sel Yayıncılık, İst., 2010, r. 50.
[44] Parıltı, Galip, h. b., r. 54.

Memed(ê Yaşar Kemal) disekine.” [45] *Gundikê Dono* di romannûsîya Mahmut Baksi û herweha di romana kurdî da merhaleyeke nû ye. Tevn ango çîroksazîya romanê, vegêrana qerfî, analîzên derûnîya lehengên romanê, bikaranîna dîyalogên di hedê xwe da, şayesa cih û war û kesan, bal dikêşe. Roman ji alîyê rexneya civakî ve têr û tije ye.

1.2.1.3. Serhildana Mala Elîyê Ûnis (2001)

Ev romana Mahmut Baksi, romaneke dokûmenter e. Roman bi boneya wesîyeta bavê Mahmut Baksi li ser Serhildana Mala Elîyê Ûnis hatîye nivîsîn. Dema nivîsîna romanê, Mahmut Baksi bi nexweşîya pençeşîrê ra micadele dikir. Ji bo amadekirina romanê ji rojnameger Salihê Kevirbirî arîkarî xwestîye û bi agahîyên ji derûdora xwe berhev kirine ev roman nivîsîye. Roman, “Behsa Malbata Elîyê Ûnis ê ji herêma Xerzan û serhildanên wan ên li dijî dewletê dike. Kitêb bi ser resmê Evdirehmanê Elîyê Ûnis ve vedibe ku yek ji serkêşên malbat û serhildanê ye.”[46] Ev roman li gel romaneke kurt e ji alîyê naveroka xwe û hûnandina rêzebûyeran ve dikare wek romaneke dîrokî jî bê pejirandin.

1.2.2. Mehmed Uzun û Romanên Wî

Mehmed Uzun di sala 1953an da li Sîwerekê hatîye dinyayê. Xwendina xwe ya ewil li Sîwerekê qedandîye. Li Enqerê Dibistana Mamosteyî ya Teknîkî a Bilind xwend. Di sala 1977an da derket derveyî welêt. Bi salan li Swêdê jîyana xwe domand. Berhemên xwe bi zimanê kurdî, tirkî û Swêdî nîvîsî. Heft roman bi kurdî nivîsî. Romanên wî, li gelek zimanan hatine wergerandin. Yekîtîya Weşangerên Tirkîyeyê, Xelata Raman û Ravekirinê da wî. Ji Enstîtuya Kurdî ya Berlînê, Xelata Edebîyatê wergirt. Ji bilî van xelatan, Xelata Torgny Segerstedt a bi navê Xelata Pênûsa Azadîyê û Xelata Akademîya Swêd a Xelata Erîk Lundeberg stand.[47] Herweha di sala 2005an da Hikûmeta Herêma Kurdistanê Xelata Rûmetê da Mehmed Uzun. Uzun, di 11ê çirya pêşî ya 2007an da li bajarê Dîyarbekirê wefat kir.

Mehmed Uzun, nûnerekî çalak ê edebîyata kurdî ya modern a dîyasporayê ye. Hemû jîyana berhemdarîya wî li dîyasporayê derbas bûye. Piranîya romanên wî

---

[45] Parıltı, Galip, h. b., r. 49.
[46] Remezan Alan, Engîn Öpengîn, *Tîr û Armanc*, Peywend, Stenbol, 2014, r. 82.
[47] Mehmed Uzun, *Kürt Edebiyatı Antolojisi*, Gendaş Yay., r. İstanbul, 2003, r. 1.

dîrokî û jînenîgarî ne. Uzun, xwestîye ku mijarên sîyasî û civakî di tevna romanên xwe da bi cih bike. Hestên dîyasporayê wek hesreta welêt, pirsgirêka veger an nevegera welêt, nasnameya neteweyî, fikarên entelektuelî, meseleyên çandî, hemwelatîya dinyayê û hwd di romanên wî da bi awayekî dûvdirêj tê nîqaşkirin.

1.2.2.1. Tu (1985)

Romana ewil a Mehmed Uzun *Tu* ye. Di vegêrana romanê da du form hatine bikaranîn: forma tu û forma ez. Uzun, ev roman di destpêka salên 1980yî da nivîsîye û hem ji tecrubeya xwe ya girtîgehê ya salên 1970yî îlham girtîye hem jî di bin bandora cuntaya leşkerî da maye. Lehengê romanê, ciwanekî kurd e û navê wî jî tune ye. Ev ciwan di serî da li hucreyeke girtîgehê piştî seanseke êşkenceya giran di nava êş û azarê da tê şayesandin. Roman bi stîla wegêrana "tu"yê bîranînên vî ciwanê girtî, ji wî ra vedibêje.

1.2.2.2. Rojek Ji rojên Evdalê Zeynikê (1987)

Roman, bi monologa dengbêj Ehmedê Fermanê Kîkî (Dengbêjê Kovara Hawarê) dest pê dike. Kelepora folklorîk di tevna romanê da bi awayekî berfireh cih girtîye. Uzun, tradîsyona dengbêjî û pîrê dengbêjîyê Evdalê Zeynikê di nava cureyeke modern wek romanê da vegotîye. Roman bi çîroksazîya rojekê hatîye vegotin. Di nava her wextekî da gelek serpêhatî hatine vegotin.

1.2.2.3. Mirina Kalekî Rind 1989)

Di vê romana Mehmed Uzun da felsefeya jîyana rindîtîyê li ber çavan tê raxistin. Rind kî ne, çawa bûne rind, taybetmendîyên rindan çî ne, têkilîyên wan bi hev ra û bi mirovên dîtir ra çawa ne? Bersivên van pirsan di tevna romanê da bi berfirehî tê îzehkirin. Mehmed Uzun wek romanên xwe yên din dixwaze pirekê di nava do û îro da ava bike. Di vê romanê da rexneya civakî û çandî cihekî fireh digire. Dî romanê da derheqê jîyan û hizirên dîyasporayê da gelek hûrgilî hene.

1.2.2.4. Siya Evînê (1991)

Roman, li ser jînenîgarîya Memdûh Selîm Beg (1880-1976) hatîye hûnandin. Ango romaneke bîyografîk e. Qonaxên jîyana Memdûh Selîm Beg Stenbol, Skenderûn, Beyrût, Şam û Helep têne şayesandin. Mehmed Uzun di serî da Memdûh Selîm Beg, wek nivîskar û berpirsyarê Kovara Jînê dide nasîn. Memdûh Selîm Beg di ber pêlên bayê qederê da û ji ber rewşa aloz a sîyasî di romanê da hertim cih û war

diguhere ev yek jî romanê ji alîyê hizira dîyasporayê ve xurttir dike. Di tevna romanê da neteweperwerî, nasname, sîyaset, asîmîlasyon, ziman, rewşenbîrî, feqîrî pirsgirêkên çand û çapamenîyê, kovargerî û pirsgirêkên civakî di rêzebûyerên romanê da bi berfirehî tên nîqaşkirin û li ser van meseleyên navborî nivîskar bi awayekî zimnî, rexneyên tund dike. Roman bi mirinê dest pê dike û bi mirinê diqede.

1.2.2.5. Bîra Qederê (1995)

Romana *Bîra Qederê* wek gelek romanên Mehmed Uzun romaneke bîyografîk e. Ev roman li ser jîyana Celadet Bedirxan (1893-1951) hatîye hûnandin. *Bîra Qederê* ji 15 dewreyan pêk hatîye her dewreyek bi fotografekî hatîye krîstalîzekirin. Ji weladeta Celadet heta wefata wî ya trajîk, aqûbeta Celadet Bedirxan bi hûrgilî hatîye vegotin. Jîyana li ber qiraxa bîrekê dest pê dike, dîsa di encama qezaya kolandina bîrekê ve bi dawî dibe. Ev bîr, Bîra Qederê ye.

Roman, derheqê Cenga Cîhanê ya Duyem (1939-1945) û hin bûyerên wê demê yên sîyasî da bi hûrgilî dîrokeke alternatîf li bar çavan radixe. Di heman demê da têkilîyên mala Bedirxanîyan û padîşahê Osmanîyan, sûîqesta Ridwan Paşa yê Şehremînê Stenbolê û dîsa sirgûnkirina Bedirxanîyan di romanê da bi berfirehî tê qisetkirin. Roman ji alîyê rexneya sîyasî, civakî û dîrokî ve dewlemend e.

1.2.2.6. Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê 1998)

Ev romana Mehmed Uzun, romaneke sîyasî ye û ji alîyê hûnandina rêzebûyeran ve ji tesadufan ra vekirîye. Heta carinan ev tesaduf, di atmosfera sîyasî ya romanê da li hember rastîya jîyanê derdikeve û roman di destê nivîskar da dibe pazilek ku hin parçeyên wê li şûna xwe nayên. Roman ji alîyê rexneya sîyasî ve hêjayî analîzeke kûr e.

1.2.2.7. Hawara Dîcleyê (I û II) (2001-2003)

Romana dawî ya Mehmed Uzun Hawara Dîcleyê ye. Ev roman jî wek exlebê romanên wî romaneke dîrokî ye. Roman ji devê Dengbêj Biro tê vegotin. Biro şahîdîya derketina ser textê mîrektîyê ya Mîr Bedirxan (1806-1869) kirîye û ji serî heta dawî ve şahîdî ji bûyerên qewimîne re kirîye. Roman, dem û dewranên qedîm ê bi xêr û bêr û hêz û bedewîya Mîrektîya Botan, dewlemendîya jîyana kurdan krîstalîze dike.

Ev roman ne tenê qiseta aqûbeta malbata Bedirxanîyan e. Di heman demê da şer û pevçûnên di navbera Mîr Bedirxan û asûrî - nastûrîyan, meseleya ermenîyan, têkiliyên Osmanî û kurdan bûyerên dîrokî, sîyasî û civakî di tevna romanê û rêzebûyeran da cihekî mihim digire. Roman ji alîyê vegotinê ve teslîmî şayeseke pir hûrgilî bûye. Roman gelek rexneyên sîyasî, dîrokî û civakî dihewîne.

1.2.3. Firat Cewerî û Romanên Wî

Fırat Cewerî di sala 1959an da li Mêrdînê ji dayik bûye. Bi eslê xwe ji Dêrika Çîyayê Mazî ye. Di dema ciwantîyê da koçî Nisêbînê kirîye. Di sala 1980yî da derbasî Swêdê bûye. Di adara 1992yan da dest bi weşana Kovara Nûdemê kiriye. Bêyî navber deh salan ev kovar derxistîye. Çîrok û kitêbên Firat Cewerî li gelek zimanan hatîye wergerandin. Firat Cewerî ku bi salan e li dîyasporayê dijî, di PENa Swêdê da bi salan Serokatîya Komîteya Nivîskarên Sirgûnê kirîye.[48]

Firat Cewerî ji edebîyata cîhanê jî hin wergêr kirine. John Steinbeck, Anton Çexov, Dostoyevskî, Astrid Lindgren, Hemmin Mankell û Yaşar Kemal ji wan nivîskaran in ku Cewerî berhemên wan wergerandine kurmancî.[49]

Firat Cewerî di roman û çîrokên xwe da rewşa penaberîyê, psîkolojîya penaberan, hest û ramanên li xerîbîyê bi mirovan ra peyda dibin, hesreta welêt, nostaljî û gelek temayên din ên dîyasporayê tîne zimên. Hemû romanên wî, tevna xwe ji jîyana modern digirin û trajedîya mirovên ji cih û warên xwe bûne bi awayekî realîst li ber çavan radixin. Sîyaset, civak, çand û huner di paşxaneyê berhemên Cewerî da hêmanên bingehîn in. Cewerî, karakterên xwe bi analîzên psîkolojîk ên kûr, dişayesîne û di her romana xwe da dikeve endîşeya şêwaz û afirandina karakterên nû.

Firat Cewerî di tevna bûyerên romanên xwe da rexneya civakî, sîyasî û dîrokî îhmal nake. Rexneyên Cewerî, piranî li civakê ne. Civaka ku tenê li berjewendîyên xwe dinêre û kesên ku ji bo wê têkoşane di hepsan da mane, sirgûn bûne nabîne û ji bo wan kesan tiştekî nake, rexne dike. Qe nebe dixwaze ku qedr û qîmeta van kesên xwe ji bo civaka xwe qurban kirine ji alîyê civakê ve bê zanîn.

---

[48] Abidin Parıltı, Özlem Galip, *Kürt Romanı Okuma Kılavuzu*, Sel Yayıncılık, İst., 2010, r. 99.
[49] h. b., r. 100.

1.2.3.1. Payiza Dereng (2005)

Payiza Dereng ji serî heta dawî jîyana sirgûnî û hestên dîyasporayê vedibêje. Fokûsa romannûs li ser jîyana Ferda ye. Vebêj diguhere carinan Ferda carinan jî Ferît mijarê vedîbêje. Vegera Ferda ya welêt û tevlihevîyên sîyasî û civakî dibe mijara rexneyan.

1.2.3.2. Ez ê Yekî Bikujim (2008)

Roman, bi xewnekê dest pê dike ango kabûsekê. Temoyê ku 15 salan di hepsê da maye û pişt ra hatîye berdan li mala xwe û dayika xwe vegerîyaye. Temo, jîyana xwe di ber gelê xwe da serf kirîye. Temenê wî bi sîyasetê, bi têkoşînê derbas bûye lê bajarê wî yê qedîm wî nasnake, kes guh nadê, kes bi qîmeta wî nizane. Edî ew jî ne vî bajarî nas dike ne jî gelê vî bajarî. Her tişt ji wî ra xerîb tê.

1.2.3.3. Lehî (2013)

Romana Firat Cewerî ya *Lehî* berdewama romana wî ya *Ez ê Yekî Bikujim* e. Di romana ewil *Ez ê Yekî Bikujim* da Temo, wek mirî be tê nîşandan. Di destpêka romana *Lehî*yê da Temo bi xwe dihese û dinêre li ser textekî di nava xwînê da ye û kes li dora wî nîn e. Romana *Lehî*yê beş beş ji devê Temo û Lehîyê ve hatîye vegotin. Karaktera ku di romana *Ez ê Yekî Bikujim* da bi navê Dîana derketibû pêşberî me, di romana *Lehî*yê da bi navê Lehîyê dikeve tevna romanê.

1.2.3.4. Maria Melekek Bû (2013)

Romana *Maria Melekek Bû* li Swêdê derbas dibe û ji çîroka Daniel û Maria pêk tê. Daniel bi esilê xwe ermenî ye û hekîmê dirana ye. Li Tirkîyeyê dema xortanîya xwe rastî êşkenceyên 12 îlonê hatîye û pişt ra berê xwe daye dîyasporayê. Psîkolojîya Daniel ne baş e. Di romanê da polîs bi boneya îfadeyê, li hin kesan digerin û bangî wan dikin. Bi îfadeyên Saqo Şelal, Ardan Turk, Nurî Almaz, Dîlhem Anaz û Lotta derheqê Danîel da hin tişt zelal dibin. Ümran Altınkılıç derheqê van navan da dîbêje ku "Ev navên anagramîk li aliyekî din jî xwîneran sewq dikin şifreyan bişikînin."[50] Di romanê da gelek rexne li dewletê û li sîyasetê tên kirin. Şertên ku berê mirovan didin dîyasporayê, rewşa penaberên li dîyasporayê, şoka

[50] Ümran Altınkılıç, *Rengvedanên Postmodernîst di Romana Kurdî de*, Zanîngeha Dîcle, Enstîtuya Zanistên Civakî, Teza Doktorayê ya Neweşandî, 2022. r. 96.

çandî, pirsgirêkên derûnîya penaberan li ber çavan tên raxistin. Herweha meseleya êşkenceyê jî di çîroksazîya trajîk a vê romanê da faktora herî bingehîn e.

1.2.4. Hesenê Metê û Romanên Wî

Hesenê Metê ku wek çîroknûs û novelîst tê naskirin, di sala 1957an da li navçeya Erxenî ya girêdayî Dîyarbekirê hatîye dinyayê. 35 sal e ku li derveyî welêt jîyana xwe didomîne. Niha li Swêdê dîjî. Gelek kitêbên wî li zimanên din hatine wergerandin. Hesenê Metê jî ji gelek nivîskaran wergêr kirine: Berhemên Alexandre Puşkin, Anton Çexov, Fidor Mihayloviç Dostoyevskî, Göran Tunstrêm wergerandîye zimanê kurdî. Hesenê Metê bi hin kurteçîrok û novelê xwe di antolojîyên swêdî, almanî û tirkî da jî cih girtîye.[51]

Hesenê Metê ji bo formên romanên xwe bêjeya romanê bi kar nayîne. Ew, van metinên ku dinivîse bi têgeha novelê binav dike. Metê, di novelên xwe da atmosferên surrealîst ava dike. Ev yek jî dibe sedem ku novelên wî bigihêjin şêwaza rastîya efsûnî ya Gabriel Garcia Marquez. Hesenê Metê ku bi êş û azarên dîyasporayê dizane, di novelên xwe da berê pênûsa xwe dide bûyerên fantastîk û karakterên xwe li gor atmosfera efsûnî ya rêzebûyerên xwe diafîrîne.

Hesenê Metê, mesafeya nevbera nivîskar-vebêj û karakter an tîpên novelên xwe bi hostatî eyar dike. Heta ku ji pênûsa wî tê dixwaze karekterên wî ne di bin tesîra wî da bin. Ev yek jî ji alîyê teknîka romanê ve novelên Hesenê Metê tekûztir dike. Hesenê Metê, şêwaza îronîk ango qerfî di piranîya novelên xwe da bi kar tîne. Di nava pêlên şêwaza îronîk da Hesenê Metê rexneyên tûj li civak, dîrok û sîyasetê dike.

1.2.4.1. Labîrenta Cinan (1994)

Novela Hesenê Metê ya *Labîrenta Cinan*, xwedî atmosfereke efsûnî ye. Novel, bi îdealîzma mamosteyekî gundan dest pê dike. Mamoste Kevanot, bi mebesta guhertina gund û civaka gund diçe gundekî. Ev gund, gundekî bûyerên ecêb lê diqewimin. Piştî sê salan Mamoste Kevanot diguhere û ew, dişibe gundîyên ku demekê dixwest wan biguherîne. Mamoste Kevanot dîn dibe.

---

[51] Hesenê Metê, *Labîrenta Cinan*, Peywend, Stenbol, 2019, r. 4.

1.2.4.2. Tofan (2000)

Naveroka vê romanê, jîyana kurdan a bi êş û azar e. Vebêj gelek in ango novelek e pirvebêj e. Her vebêj li gor ruhîyet, perwerde, wext, temen û perspektîfa jîyana xwe çîrokê ji me ra vedibêjin. Ev yek jî şêwaza novelê kirîye vegêraneke karnaval ango pirvebêj. Mekan, bajarê Agirî, Cizîra Botan, Qesra Îsheq Paşa, Mizgefta Morbelek, Gora Ehmedê Xanî û dîwana alimên îlahî ye. Bekoyê Ewan piştî mirina xwe bi sê sed salî bi awayekî efsûnî ji gora xwe radibe û tevî jîyana Cizîra Botan dibe. Vebêj -ku di nava çîrokê da hertim diguhere- bi zaneyî xwendevan diewgirîne (distraction). Di vê çîrokê da hemû vebêj, vebêjên hundirîn in. (homodiegetic narrator) Yanî bi gotineke din vebêj-leheng in. Nivîskar di vebêja xwe da carinan devok (dialekt) jî bi kar anîye.[52] Tofan bi teknîka xwe ya edebî di romana kurdî da ji bo postmodernîzmê nimûneyeke balkêş e.

1.2.4.3. Gotînên Gunehkar (2007)

Ev novela Hesenê Metê di nava xeyal û rastîyê da diçe û tê, çavkanîya xwe ji rastîyekê digire û xwîneran ber bi xeyalên çîrokî ve disûrikîne. Wek lehengên sereke ango protagonîst Behram û Nagîna derdikevin pêş. Jixwe çîroka wan di çîroksazîya novelê da zayîna xewn û rastîyên di nava hev da ye. Behramê Kewaşî, xwendekarê medreseya îlmê Îlahî, li malbateke xeyrûmuslîm dibe mêvan û di vê mêvêndarîyê da şahîdîya gelek bûyerên balkêş dike.

1.2.4.4. Li Dêrê (2011)

Di vê novela Hesenê Metê da mekan dêrek e. Navê dêrê, Dêra Santa Ragnhildê ye. Serlehengê romanê nivîskarek e. Ew nivîskar ji bo romana xwe ya dawî diçe dêrê û dixwaze bi keşîş ra li ser hin îkonên Hz. Îsa biaxive. Li dêrê rastî mêrekî tê, navê wî merî Bilindê Zaxoyî ye. Bilindê Zaxoyî ji nivîskar ra behsa evîna xwe ya ewil dike. Navê wê nabêje, tevî ku bi rastî ne dotmama wî ye ji ber hezkirina wê ya bi şêranî ji wê ra dibeje dotmam. Bilindê Zaxoyî ji nivîskar ra behsa bîranînên xwe dike.

---

[52] Roger Acun, *Tehlîla Novela Hesenê Metê "Tofan" Li Gorî Qaîdeyên Vegêrannasîyê*, Kadîm Hîkmet, 6 (2022), r. 95-104.

1.2.4.5. Hefsar (2018)

Novela *Hefsar* a Hesenê Metê çîroksazîya xwe ji rastîyeke jîyanê digire. Rojekê derîyê Behram lê dikeve û nameyek ji nexweşxaneya Huddîngeyê ji beşa Rehabîlîtasyona Nexweşîyên Ruhî tê destê wî. Psîkolog Monîka Bogrenê ji Behram dawxaz dike ku ji bo Germîyan arîkarîyê bide wan. Germîyan, dostekî Behram e. Behram, dostê xwe Germîyan gelek caran zîyaret dike û bi wî ra eleqedar dibe. Şevekê bi heval û hogiran ra li cihekî dicivin û li dengbêjekî guhdarî dikin. Dema dengbêj behsa zozanan dike Germîyan jî bi nostaljîyeke kûr behsa zozanan û jîyana koçerîyê dike û serwext dibe. Germîyan di fînala novelê da xwe bi wî hefsarê hespa xwe yê Kumêt dadiliqîne. Hefsar di vê novelê da wek leît motîfekî gelek caran hatîye bikaranîn. Hefsarê ku hezar hêvî dikişandin, dibe werîsê mirinê û dikeve stûyê Germîyan.

1.2.5. Helîm Yûsiv û Romanên Wî

Helîm Yûsiv di sala 1967an da li bajarê Amûdê ya Sûrîyê hatîye dinyayê. Li zanîngeha Helebê Fakulteya Hiqûqê qedandîye. Di sala 2000î da berê xwe daye Almanyayê û ji wê salê bigire heta niha li dîyasporayê dijî. Gotarên wî di kovar û rojnameyên kurdî û erebî da weşîyane. Berhemên wî li gelek zimanan hatine wergerandin.[53]

Helîm Yûsiv, di exlebê romanên xwe da zehmetîyên jîyana dîyasporayê vedibêje. Penaberî, psîkolojîya peneberan, zehmetkêşîya zimanê bîyanî, û di dema transfera çandî da pirsgirêkên nasnameyî, di derketina dîyasporayê da bandora mercên sîyasî û asîmîlasyon; mijarên sereke yên Helîm Yûsiv in ku di roman û çîrokên xwe da li ser hûr dibe.

1.2.5.1. Sobarto (1999)

Roman li Sobarto derbas dibe, nivîskar navê erdnîgarîya ku bûyer lê diqewimin wek Sobarto binav dike û derîyê alegorîyekê li xwînerên xwe vedike. Rêzebûyerên romanê di atmosfera rastî û alegorîyê da bi bûyera agirê sînemaya Amûdê dest pê dike. Roman ji serî heta dawî ji alîyê dîrokî, civakî û sîyasî ve gelek rexneyan dihewîne. Ji jîyana civakê ya serobino bigire heta daxwazên cinsî yên

[53] Abidin Parıltı, Özlem Galip, *Kürt Romanı Okuma Kılavuzu*, Sel Yayıncılık, İst., 2010, r. 121.

tepisandî, têkilîyên di nava zarok û mezinan, însan û heywanan da gelek mijar bûne armanca tîrê rexneyan.

1.2.5.2. Tirsa bê Diran (2006)

Mûsayê Qamîşlokî, mamosteyê dîrokê ye. Pizikek sor di qaçika wî da dertê û tirsa terîyê dikeve dilê Mûsa. Tirsa ku terîyek di dawîya wî da serî bide. Mûsa li ser rewşa dîrokê û li ser rewşa sîyasî û civakî şîroveyan dike û pişt ra vedigere zarokatîya xwe. Zimanê bîyanî û asîmîlasyon wek arîşeyên bingehîn di vê romana Helîm Yûsiv da jî derdikevin pêşberî me. Mûsa, bi çavê dîroknasekî rexneyên tûj li dîroka kurdan dike û li ser peymanên wek Sykes Pîcot û Lozanê felsefeya dîrokê dike. Dixwaze Sykes Pîcot bibîne û hesabê parçekirina welatê kurdan jê bipirse. Leîtmotîfa "kulî"yan gelek caran di romanê da dubare dibe. Kulî wek metafora sîxuran hatîye bikaranîn. Lewra mekanên romanê yên ewil dewleta Sûrîye ye û gelek dilqên rêvebirîya dîktatorîyê tên şeyesandin. Roman bi tirsê dest pê dike û bi tirsê diqede.

1.2.5.3. Gava ku Masî Tî dibin (2008)

Masî ku wek serlehengê romanê hatîye bijartin, li gundekî bi kûçikê xwe Bozo ra dijî. Têkilîya wî bi kesekî ra tune ye. Li gor hinekan Masî, zilamê dewletê ye, li gor dewletê jî mirovekî serêxwexwarî ye. Masî piştî demekê biryara derketina çîyê dide û tevî şervanan dibe. Masî di nava komeke çekdar da berê xwe dide Çîyayê Cûdîyê. Masî di teqînekê da birîndar dibe û her du lingên wî jî tên jêkirin. Bi arîkarîya hevalên xwe bi qaçaxî dere bajêr û demeke bi şûn da vedigere gundê xwe, dibîne ku êdî tiştek ne wek berê ye û talî wek penaber derbasî Ewropayê dibe.

1.2.5.4. 99 Morîkên Belavbûyî (2015)

Roman, li herêma Nedersaksen a girêdayî Almanyayê da bi kuştina mêrekî por spî ku navê wî Azad e dest pê dike. Nivîskar li nexweşxaneyekê di beşa nexweşîyên derûnîyê da karê wergêrê dike û rojekê jinek, deftereke rojnivîska mêrekî dide nivîskar. Romana *99 Morîkên Belavbûyî* çîroka vê defterê ango rojnivîska Azad e. Her morîkek, parçeyek ji jîyana Azad û penaberîyê ye. Hin morîkên di romanên da behsa van çîrokên dîyasporayê ne. Ev romana Helîm Yûsiv ji

serî heta fînalê li ser temaya dîyaspora û penaberîyê û sedemên penaberîyê, reva ji welêt û rexneyên sîyasî û civakî disekine.

1.2.5.5. Wehşê di Hundirê Min de (2018)

Dîmena destpêka romanê bi xirecira jina Hecî Mehmûd a ku serlehengê romanê Salar diwelidîne dest pê dike. Hecî Mehmûd, nikare trimpêlekê peyda bike û bi ereboka hespan hewl dide jina xwe bigihijîne nexweşxaneyê. Jina wî li meydana bajêr di bin sîya peykerê serok da lawê xwe Salar tîne dinyayê Salar datîne. Salar, vebêjê romanê ye. Salar, li ser cenazeyê dayika xwe dibîne ku her kes ketîye dirûvê wehşan. Li odeya xwe di nava tenêtîyeke tîr da wisa hîs dike ku ew jî bûye wehşekî. Jixwe di tevna romanê ya giştî da leîtmotîfa wehşan gelek caran derdikeve pêşberî xwîneran.

1.2.5.6. Firîna bi Baskên Şikestî (2019)

Roman, li Kobanê derbas dibe. Derhêner Hadî Kinê, devê gora xwe vedike, cîranê gora wî û dostê wî yê qedîm Bûrhan Emînê senaryonivîs, devê gora xwe vedike û her du li ser bûyera xwekuştina dengbêjekî, dixwazin bi hev ra fîlmekî çêkin. Fokûsa romannûs, li ser malbateke xwedî yanzdeh zarok e. Rodî û Cîhan zarokên vê malbatê ne ku qismekî romanê ji devê wan tê vegotin. Di beşa duyem a romanê da mirî ji kamerayan ra behsa xwe û zindîyên xwe dikin. Di beşa sisêyan da xwedîyên kamerayan behsa xwe û mirî û zindîyan dikin.

1.2.6. Jan Dost û Romanên Wî

Jan Dost, 12ê adara 1965an da li bajarê Kobanîyê hatîye dinyayê. Li Zanîngeha Helebê beşa Bîyolojî xwend lê ev beş bi dawî nake. Di temenê zarokatîya xwe da dest bi nivîsa helbestên bi zimanê erebî dike. Di ciwantîya xwe ya ewil da berê pênûsa xwe daye zimanê kurdî. Çîroka wî ya yekem *Xewna Şewitî* li Sûrîyeyê layiqî xelatê hate dîtin. Hin çîrokên wî li Almanyayê bûne kurtefîlm. Jan Dost, dîwaneke ji helbestên xwe çap kirîye. Jan Dost ji sala 2000î û vîr ve Li dîyasporayê -Almanya- dijî. *Mem û Zîn*a Ehmedê Xanî bi zimanê serdemî amade kirîye. Hin romanên wî li erebî, farisî û tirkî hatine wergerandin.[54]

---

[54] Abidin Parıltı, Özlem Galip, *Kürt Romanı Okuma Kılavuzu*, Sel Yayıncılık, İst., 2010, r. 112.

Jan Dost, çîroksazîya romanên xwe piranî ji bûyerên dîrokî digire. Bi lehengên dîrokî û lehengên xeyalî tevna bûyerên romanên xwe dihûne. Zimanê ku bi kar tîne zimanekî arkaîk û helbestkî ye. Şêwaza wî li ser ferhenga medreseyê û xeyalên helbesta klasîk rûdinê. Jan Dost di romanên xwe da bi gelek boneyan cih dide rexneya dîrokî, sîyasî û civakî. Rexneyên Jan Dost ji devê karakterên wî bi awayekî dîrekt carinan jî endîrekt tên vegotin. Felsefeya dîrokê, civak û sîyasetê, mora xwe li rexneyên romanên wî dixe.

1.2.6.1. Mijabad (2004)

Di tevna romanê da Badînê Amedî ji dîrokeke tijî kul û keser ra şahîdîyê dike. Roman li ser têkçûna Komara Mahabadê hatîye nivîsîn lê ji bilî komarê behsa gelek bûyerên dîrokî dike. Roman piranî bi teknîka pastîş wek bi cihkirina nameyan bûyeran neqil dike. Badînê Amedî, nameyan ji Jaleyê û ji Mujdeyê ra dinivîse. Di van nameyan da behsa gelek bûyerên dîrokî tê kirin: Tevgera Şêx Mehnmûdê Berzencî, Simko Axayê Şikakî, Serhildana Agirî, Cenga Cîhanê ya Yekem, Enver Paşa û Sarîqamîş, tevgerên partîyên kurdan, Mele Mistefa Barzanî, çalakîyên rewşenbîrên kurdan wek Îbrahîm Ehmed, Hêmîn, Hêjar û wd Serhildana Seyîd Riza û îdama wî, Cenga Cîhanê ya Duyem, durûtîya rûsan û xayîntîya wan bi gelê kurd ra, bûyerên Hîroşîma û Nagazakî û têkçûna Komara Mahabadê bi rexneyên dîrokî, civakî û sîyasî hatine pêçandin. Di fînala romanê da Komara Mahabadê di nava mij û dûxanekê da têk diçe.

1.2.6.2. 3 gav û 3darek (2007)

Roman, bi tîbûneke xezebê dest pê dike. Şêx Seîd, li ber mirinê ye û tî ye. Mekan, Derîyê Çîyê ye. Bajarê Dîyarbekir di xeweke giran da ye. Di navbera Şêx Seîd û sêdarê da tenê sê gav hene. Şêx, di kêlîka gava ewil da diçe biçûkanîya xwe.. Bi avêtina gava duyem ra Perîxana xîzmetkara mala bavê wî tê hişê wî. Evîna ku dilê wî sotîye. Bîranînên bi Perîxanê ra mîna şerîda filmekî di ber çavên Şêx ra derbas dibin. Di gava sêyem da bîranînên serhildanê di hişê wî da li bin guhê hevûdin dikevin: Ew telgrafa Xalit Begê Cîbrî kû bişîfre şandibû û şîfre xelet hatibû famkirin û agirê serhildênê bêwext gwîr û geş kiribû, bêtifaqîya hin eşîran, bêsebirbûna xizm

û bêtevdîrîya zilamên wî, xayintîya bûrayê wî Bînbaşî Qaso di ber werîsê birûn da tên hişê wî.

1.2.6.3. Mîrname (2008)

*Mirname*ya Jan Dost bi binaxkirina Ehmedê Xanî dest pê dike. Mirovekî rûnuxamtî di hundirê gorê da dixebite, baraneke di rêngê hubrê da dibare û ev baran, wek metaforeke leîtmotîf heta fînala romanê tê dubarekirin. Heman çîrok ji devê gelek kesan ve hatîye vegotin. Her vegêran, bi behsa bûyera li ser mezel dest pê dike û di ber ra têkilîya xwe û Xanî û çîroka xwe qiset dike. Di romanê da hesûdî an xêrnexwazîya di nava kurdan, teasûb û cahiltîya civakê, bêvîzyonîya sîyaseta kurdan û dek û dolabên kurd li piştî hev saz dikin, bi rexneyeke îndîrekt li ber çavên xwîneran bi perspektîfeke piralî tê şayesandin.

1.2.6.4. Pîrewerger (2018)

Kitêb bi navê *Pîrevergêr* û *Naqosên Romayê* ji du cildan pêk tê. *Pîrevergêr* navê cildê romanê yê yekem e. Roman bi dîmeneke agirê li ber tefandinê ye dest pê dike. Pîrewergêrê ku navê wî yê rast Mihemed Eşiqûddînê Entakî ye, serpêhatîyên xwe dibêje û Yûnisê ernewid ku bi temenê xwe ciwan e van serpêhatîyan tomar dike.

Pîrewergêr, destpêka serpêhatîyan ji deh salîya xwe û bi şûn da vedibêje. Ji bo ku Mihemed Eşîqê Entakî, zimanê latînî û îtalî fêr bibe û bibe wergêr, bavê Mihemedê Entakî, wî dişîne Îtalyayê bi arîkarîya rahîbekî hevalê bavê xwe dibe rêwîyê rêya Romayê. Cildê yekem bi gîhaştina xaka Romayê ve bi dawî dibe.

1.2.6.5. Naqosên Romayê (2019)

Naqosên Romayê wek cildê duyem berdewama romana *Pîrewergêr* e. Ev cild ji heft beşan pêk tê. Di destpêkê da Yûnisê Ernewid ji Pîrewergêr ra behsa jîyana xwe dike. Mirina sê birayên wî bi nexweşîya sorikan, pişt ra nexweşî û mirina bavê wî û zewaca dayika wî bi tacîrekî Bexdadî dibe sedem ku Yûnisê Ernewid ji welatê xwe bi dûr bikeve. Çîroka Pîrewergêr ji Romayê û bi şûn da didome. Ji ber muslumanîya xwe hin hevalên wî yê dibistana rahîban jê nefret dikin. Keşe Lûsyano, şîretan li wî dike da ku dev ji dibistanê û xwendina xwe bernede. Pîrewergêr vedigere gundê xwe, li xettatekî ciwan digere û Yunisê Ernawid dibîne wî ji bo

tomarkirina serpêhatîyên xwe digire. Ji ber nivîsîna bi salan pêçîyên wî nema pênûsê digirin loma mecbûrî xetatekî maye.

1.2.6.6. Kobanî

Roman, li ser trajedîya kurdên Sûrîyeyê û bûyerên Kobanî ya ji alîyê DAÎŞê ve hatîye talankirin û wêrankirin hatîye nivîsîn. Devoka romanê, devoka Kobanî ye. Romannûs, kameraya xwe dide ser jîyana malbateke Kobanî ya kurd: Malbata Hec Mislimê Hemziravê Mihacir. Nivîskar, xwe û jîyana xwe ya dîyasporayê ji tevî tevna romanê dike. Di serî da çîroka Hemziravê Mihacir tê vegotin.

Roman, bi temamî li ser dagirkirina Sûrîyeyê ji alîyê DAÎŞê ve hatîye hûnandin û hehsa şerê di navbera YPG û DAÎŞê û qetlîamên DAÎŞê ku jîyana xelkê Kobanî dike dojeh. Herweha serjêkirin û bazarên kole û carîyeyan ku bi destê DAÎŞê hatine sazkirin, bi kitekit tên qisetkirin. Ev romana Jan Dost ji romanekê bêtir dişibe teksteke dokumanter. Heyra neqilkirina şahîdîya bûyeran, gelek caran dikeve pêşîya endîşeya teknîka şêwaza romanê.

BEŞA DUYEM

REXNEYA CIVAKÎ DI ROMANA KURDÎ YA DÎYASPORAYÊ DA

Roman her çi qasî ji alîyê afirînerîyê ve berhemên takekesî bin ew qasî jî berhemên civakî ne lewra roman neynika civakê ne. Ramannûs, bi her awayî di bin bandora civaka xwe da dimîne. Exlaq û nirxên civakê, têkilîya civak û nerîtê, bandora dîn û zanistê ya li ser civakê qodên mejîyên nivîskaran tayîn dike. Romannûs di dema afirandina romanekê da civakeke rasteqîn an jî xeyalî ava dike. Ji malbatê bigire heta hemû sazîyên ku civakê pêk tînin di çîroksazîya romanê da cih digirin. Romannûsên ku ji civak û derûdora xwe nikarin bêne îzolekirin helbet dê pirsgirêkên civaka xwe jî bînin ziman û tiştên ku bi neyênî bandor li ser wan kiribin aşkere an jî nixumandî dê rexne bikin. Bi saya van rexneyan roman dibe qadeke ku xwîner li hin arîzeyên civakê haydar bibin.

Romannûs, di romanên xwe da yan civakê bi kêmasîyên wê li ber çavan radixin yan jî civakeke îdeal diafirînin. Bi saya rexneyên romannûsan, xwînerên romanê, xwe û civaka xwe rexne dikin û bi vê mekanîzmeya rexneyê faydeya edebîyatê digihêje ferd û civakê. Rita Felski di peywenda metin û faydeya civakî da weha dibêje: "Qîmeta metin ji faydeya wî pêk tê."[55] Rexneya civakî, dema derûdorê dinirxîne teklîf dike ku berhem di peywenda cih û wextekî da bê vekolîn. [56] Li gor Alice Templeton rexneya civakî, wek tezahura xebateke edebî ye ku berhemê di peywenda wê ya civakî da dibîne. [57] Gustave Lanson (1857-1934) diyar dike ku "Her berhema edebî bûyereke civakî ye. Berhema ferd e lê berhemeke civakî ye. Taybetmendîya berhema edebî ya esas ew e ku di navbera ferd û civakê da navgîneke ragihandinê ye." [58]

Dîsîplîna sosyolojîya edebîyatê li ser têkilîyên ferd, civak û edebîyatê disekine. Li Ewropayê dîroka xebatên sosyolojîya edebîyatê bi kitêba Mme de Stael

---

[55] Rita Felski, *Edebiyat Ne İşe Yarar* (Wer.) Emine Ayhan, Metis, İst., 2010, r.16.
[56] Hece, *Eleştiri Özel Sayısı*, Yıl : 7 Sayı : 77/78/79 Mayıs / Haziran / Temmuz 2003, r. 239.
[57] Alice Templeton, *Sociology and Literature*: Theories For Cultural Critisizm, College Literature, Volume 19, Issue 2, 1992.
[58] Gustave Lanson, *Edebiyat Tarihi ve Sosyoloji*, (Wer.) Cemil Meriç, Hisar, Sayı 154,1976, s. 9.

ya bi navê *Bandora Avahîyên Civakî û Dînî li Ser Edebîyatê* dest pê dike.[59] Haşim Ahmedzade di hevpeyvînekê da weha dibêje: "Xelkekî te heye di civakê de dijîn, çunkî roman civaka wan jî heye û gerek pêwendiya asta axaftina wan bi civaka wan re hebe."[60] Berhema edebî bi rastîya civaka xwe ra rasterast di nava têkilîyeke dîyalektîk da ye. Rexneya marksist ku di dema vekolîna berhemeke edebî da, estetîkê dide alîyekî û pey têkilîyên berhem û civakê dikeve, di salên 1970yî da di derketina holê ya sosyolojîya edebîyatê da sedemeke bingehîn e. [61]

Remezan Alan dibêje ku: "Madem em li ser kurdan û hunereke mîna romanê diaxivin, divê em teslîm bikin ku qedera qewmî û cografî ya kurdan wisan fersendeka seranser hunerî û şexsî jî bexşnake ku pêsîra romannûsên kurd ji mijar û kêşeyên kolektîf xelas bibe."[62] Di romana kurdî ya dîyasporayê da ji ber giranîya romanên civakî rexneya mijarên civakî jî berfireh e: Gundîtî, axatî, şerê eşîrî, xizanî, hesûdî û fesadîya mirovan, rexneya însan, rexneya orf û edetan û rexneya dînî hin rexneyên sereke yên civakî ne.

2.1. Gundîtî

Gund bi populasyon, erdnîgarî, aborî û taybetmendîyên xwe yên civakî herêmên bejahî ne ku ji bajaran vediqetin. Gund di sîstema eşîrî û axatîyê da bi sedan salan ji her alîyî ve hatine guhertin û hîn jî ev rewş berdewam e. Gund li gor sosyolog İsmail Beşikçi (1939-) bi vî awayî dikarin bên senifandin: "Gundê axayan, aîdê şexsekî ango axayekî ne. Gundê azbetan, ew gund in ku ji çend malbatên ji bavekî pêk tên. Gundên şênî, ew gund in ku cîyawaziya milkîyeta taybet kêm e û gundî kêm zêde ji alîyê amrazên hilberîyê wekhev in. Erka sîyasî di destê mixtaran da ye. Gundên têkel jî ew gund in ku hem axayên xwedî milkên berfireh lê hene hem jî kesên ku milkên wan kêm in an jî qet tune ne bi hev ra niştecih in."[63] Gundî, kesên ku jîyana xwe dûrî bajaran li gundan derbas dikin, bi çandinî û ajalvanîyê debara xwe dikin û ji alîyê civaknasîyê ve bi malbatê û nirxên civakê ve girêdayî ne. Gundîtî, şêwaza jîyan, raman û gîyanê niştecihên gundîya ye. Di romana kurdî ya dîyasporayê

---

[59] Robert Escarpit, *Edebiyat Sosyolojisi*, (Wer.) Ali Türkay Yazıcı, Remzi Kitabevi, İst, 1968, s. 8.
[60] Dawid Yeşilmen, *Li Ser Wêje, Civak û Romana Kurdî Bi Haşim Ahmedzade re Hevpeyvîn*, Wêje û Rexne, Hejmar: 1, Sal: 2014, r. 97.
[61] Hece, *Eleştiri Özel Sayısı*, Yıl : 7 Sayı : 77/78/79 Mayıs / Haziran / Temmuz 2003, r. 254.
[62] Remezan Alan, *Fantazmaya Romana Kurdî*, Zareme, Sal:7/ Hejmar: 14/2021, r. 156.
[63] İsmail Beşikçi, *Doğu Anadolu'nın Düzeni,* Yurt Yayınları, Ankara, 1992, r. 93.

da romannûsên me xebata xwe bi wan û romanên wan berteng kirîye, di romanên xwe da gelek caran li ser temaya gundîtîyê sekinîne û ji devên tîp an karakterên xwe ve rexne li gundîyan kirine.

Mahmut Baksi di romanên xwe da bi awayekî qerfî mijara gundîtîyê dinirxîne û bi tîpên gilover rexneya gundîyan dike. Romana *Gundikê Dono* galerîya rexneya gundîyan e. Gundîyên Baksi di gundekî bi axa da dijîn. Hecî Zorav, nîşaneya tirs û xofê ye heta ku gundî, ne ew qasî dîndar in jî ji ber tirsa axa tên mizgeftê. Vebêjê Baksi, derheqê vê meseleyê da dibêje ku gundîyên Gundikê Dono ne zêde dîndar bûn heta hatina wan a mizgeftê jî ne ji xof û hezkirina Xwedê lê ji ber tirsa Hecî Zorav bû. Li gor wan vebêj-lehengê Baksi mizgeft cihê şêwrê bû. [64]

Baksi, gundîyan bêaqil dişayesîne lê li gor vebêjê Baksi axa, beg û şêx, temsîla biaqilîyê ne. Cîyawazîya di navbera gundî û axa, beg û şêxan a dewlemendîyê jî çavkanîya xwe ji vê meseleya xwedî aqilbûnê digire. Hin gundî bi qasî ku ji bêaqilîya xwe haydar bin biaqil bin jî ev rewş, serdestîya axa û bindestîya gundîyan naguherîne. Lehengê Baksi, Filît vê rewşê weha dinirxîne: *"Ma ku em gundî bi aqil bûna ev çi halê me bû wisa? Xweda mal û aqil daye axayan, daye beg û şêxan."* [65] Li gor vebêjê Baksi gundî, tevî bêaqilîya xwe ew qasî jî mizawir in. Tiştê neyê hesabê wan an jî ji berjewendîya wan ra xizmetê neke, xwe li kawikî datînin û gunehê qebhetên xwe dixin sikura şeytên. Baksi vê yekê weha tîne ziman: *"Gunehê kerên Gundikê Dono jî mabû di stûyê şeytanê pepûk da."* [66] Bi vi awayî şeytan jî li hemberî kiryarên gundîyan safik tê nîşandan. Mizawirîya bêaqilî, nakokîyeke li gîyanê gundîtîyê tê û dibe hedefa tîrên rexneya civakî.

Gundî ji erka îqtîdarê ditirsin. Di îrsîyeta mejîyê wan da stûxwarkirina li hember axa û began heye. Baksi ji devê lehengê xwe Hesen dibêje ku hin ji wan ji bo ku bikaribin hebûna xwe biparêzin xwe didin kêleka axa û began an jî kesên desthilatdar.[67] Bi vê boneyê hem xwe ji belayên desthilatdaran distirînin hem jî li

---

[64] Mahmut Baksi, *Gundikê Dono, Lîs,* Çapa Duyem, Dîyarbakir, 2018, r. 9.
[65] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 68.
[66] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 46.
[67] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 73.

hember gundîyên din, dibin şirîkê hêz û qewetê û xwe li hember ên wek xwe qure dikin.

Gundîyê nezan, dijberî rûdanên modern in. Guherîn di ferhenga wan a qedîm da tenê gotineke qaşil e û kakilê wê hertim bûye sedema gengeşîyan. Ew qasî derheqê modernîzasyon an jî bajarvanîyê da kevneperest in ku kesên an jî komên ne wek wan dijîn bi bênamûsîyê jî dikarin tewanbar bikin. Ji ber vê çendê gundî, ji jîyana xwe ya klasîk razî ne û li hember rûdanên civaka modern di nava tundîyekê da ne.

Sosyologê fransî Alain Touraine (1925-2023) dibêje ku "Modernîte wek avakirina civateke rasyonel dikare bê şeyesandin."[68] Civakeke li hember modernîzasyonê ew qasî eks be û dûrî aqil tevbigere dê çawa bê guhertin? Baksi vê dijberîya gundîyan a li hember modernîzmê ji devê lehengê xwe Faro, weha rexne dike: *"Piranîya gundîyên me ê çûne bajêr ji birçînan keç û bûkên xwe difiroşin. Îcar piştî vî emrî tu dixwazî qetika bênamûsîyê têxî stûyê bavê xwe?"* [69] Helbet, rexneyên Baksi ne tenê yek alî ne. Baksi, carinan ji devê axayan jî rexneya gundîyan dike. Li gor axayan jî îdarekirina gundîyan di dinyayê da tiştê herî zehmet e. Gundî, eks in bi hêsanî nayên ser rê. Baksi, vê yekê bi metafora traktorê şênber dike û ji devê Hecî Zorav dibêje ku di dinyayê da tiştê herî zehmet birêvebirina gundîyan e lewra ne wek traktorê ne, dîreksîyonê wan tune ye[70]

Baksi, piranî jîyana gundîyan û tevgerên wan ên di civaka eşîrîyê da dike armanaca rexneyên xwe. Gundî di sîstema axatîyê da cahil mane û ji ber tunebûna ax, mal û milkan, bêçare mane ku ji axayan ra xulamtîyê bikin û di vê pergalê da jîyana xwe bidomînin. Baksi, kirasê vegotina qerfî li rexneyên xwe dike û bi awayekî romantîk civakê ji alîyê reş û spî ve li ber çavên xwîneran radixe.

Mehmed Uzun, romanên xwe li ser tevna folklorê ava dike û qîmeteke mezin dide jîyana gundîyan, mijara gundî û gundîtîyê bi şêwazeke erênî dinirxîne. Gund û gundîtî, nîşaneya xwerûtî, safîtî û dilovanîyê ne di romanên Uzun da. Uzun, di romana *Mirina Kalekî Rind* da gundîyan di nava valahîyekê da dişayesîne û ji devê

---

[68] Alain Touraine, *Modernliğin Eleştirisi*, YKY, 2004, r. 24.
[69] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 35.
[70] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 24.

lehengê xwe Kalo, destnîşan dike ku gundî di nava herikîna demê da bêwext dijîn[71] Uzun, bi van gotinan dûrbûna mejîyê gundîyan a ji rûdanên rojane û bêxemîya wan a jîyanê rexne dike.

Fırat Cewerî di *Payiza Dereng* da gundîyan ji ber helwesta wan a di cemaetê da li hev guhdarî nakin û dora gotinê nadin hev rexne dike. *"Her kesî tiştek digot, kesî li kesî guhdarî nedikir, kê dengê xwe bi ser ê kê bixista wî mafê peyvê bidest dixist."*[72] Ev hevok ragihandina çewt a di navbera gundîyan da baş îzeh dike. Li gor karakterekî Cewerî yê ku bi salan li Ewropayê mabû (Ferda) û pişt ra vegerîyabû welêt, gundî ji alîyê paqijîyê ve pir di halekî xirab da ne û ew, nizanin di civatan da bi usûl û edeb tevbigerin. Cewerî ,vê rewşê ji devê Ferda, weha rexne dike: *"Yekî din ku di emrê min de bû, sîrkûtkîbû û şewqakî ku qilêrê xwe ji jêr ve ber bi jor ve dabû der li serî bû, di nav wê civatê de behlîfek xistibû nav çîpê xwe"*[73] Cewerî jî wek Mahmut Baksi, gundîyan di warê guherîn û modernîzasyonê da kevneparêz dibîne û ji devê pîrika Ferda, li hember koçkirin û bicihbûna bajêr gotinên ji bo bajarîyan tijî sixêf dipengize. *"Hûn ê barkin bajêr, ew bajarê ku serê sûkên wê tije qehpik in."*[74] Wek tê dîtin dîsa gundîyên kevneparêz, bajarîyan bi bênamûsîyê tewanbar dikin. Cewerî, bi vî awayî rexneyeke endîrekt li civakê dike.

Hesenê Metê, romanên xwe piranî li ser jîyana gundîyan ava dike. Tîp an karakterên romanên wî di nava atmosfereke xumam a sofîstîke da tevdigerin, tirs û xof û endîşeyên surralîst di dîyalogên romanên wî da xwedî cihekî giring in. Hesenê Metê jî mîna romannûsên din ên dîyasporayê bi rêya şêwaza endîrekt, rexneyên tund li gundîyan dike, hin gundîyan dinya nedîtî û çikûs nîşan dide. Metê, ji devê lehengê xwe Behramê Kewaşî weha dibêje: *"Pirsa dîjwar û bizmarên xanî ji min nake, nabêje bizmaran bi dîwaran ve nekute. Ji wan xisûsîyetên gundîyên çikûs û karmendên dinya nedî dûr…"* [75] Hesenê Metê bi xwe tiştekî nabêje û kesayeta xwe tevî romanê nake lê ji devê Behramê Kewaşî, gotinên giran wek rexne ji bo gundîyan tîne zîman.

---

[71] Mehmed Uzun, *Mirina Kalekî Rind,* İthaki, Çapa Çarem, İstanbul, 2015, r. 99.
[72] Firat Cewerî, *Payiza Dereng*, Avesta, Çapa Duyem, Stembol, 2014, r. 149.
[73] Cewerî, *Payiza Dereng,* r. 183.
[74] Cewerî, *Payiza Dereng,* r. 159.
[75] Hesenê Metê, *Gotinên Gunehkar*, Avesta, Çapa Yekem, 2007, Stenbol, r. 12.

"Ez dinêrim ku zarokên wan ne wek gundîyên kuvî ne."[76] Hesenê Metê, meseleya "kuvî"tîyê ji bo gundîyên kurd wek rexneyeke civakî daxilî romana kurdî kirîye.

Helim Yûsiv di romanên xwe da wek cih û war piranî bajaran bi kar tîne. Rêzebûyerên ecêb û carinan derasayî, tevna romanên wî bi celeba şêwaza romanên realîzma efsûnî dihûne. Mijar çi dibe bila bibe Helîm Yûsiv, tîrên rexneyê xwe hertim dide civakê û ji gelek alîyan ve vegotineke qerfî lidardixe. Di romana *Sobarto* di dîyalogekê da cih dide vê gotina lehengê xwe Firyalê: "Ez dixwazim te ji gundîtîya te bişom."[77] Yûsiv, bi bêjeya 'şuştinê' fikira ku gundîtî tiştekî qirêj e dermale dike.

Jan Dost bi gotinên metaforîk di peywenda mijarê da rexneyên xwe yên civakî, sîyasî û dîrokî bi rêya şexsên romanê radigihîne xwîneran. Di romana *Mijabadê* da gundîtîyê wek belaya serî dinirxîne û bi rêya nûnerekî Hîwayê Elî Hemdî, sîyasetê dişibîne setrencê ku divê bingeha wê bêyî zanîn û lê zêde dike ku sîyaset ne gayê cot e ku her gundî dikaribe vî gayî bi hêsênî biajo. [78]

Gundî, piranî li berjewendîyên xwe difikirin û sîstem û sazîyên civakî û sîyasî ne li ser bala wan e. Dema avakirina Komara Mahabadê gundîyekî ji êla Dîbokrî, gilî û gazinên xwe dike. Nerazîbûna xwe li hember bac û daxwazên rayedarên komarê dike û weha dibêje: *"Ma komar bi serê me ketîye ha! Mehabadîyan ew qas tûtin firotin, şekir firotin, pere bi ku de çûn ha?"*[79] Ev cure axaftin ji ber tunebûna hişmendîya civaki û sîyasî ye. Li gor vebêjê Jan Dost, heger fikira azadî û neteweperwerîyê li cem wî gundîyî hebûya, gazinên bi vî rengî nedikir. Kesên ku gîyanê wan para xwe ji fikira neteweyê negirtibe fedakarî û cefakêşîya di ber gel da wek barekî giran dibînin û naxwazin vî barî hilgirin.

Di romana Jan Dost, *Mîrnameyê* da nalbendek ji bo dahatûya xwe li hêvîya artêşa Osmanîyan e da ku artêş bê û ordîgeha xwe li Bazîdê deyne. Selîmê nalbend, dizane ku artêşa bê, dê qizilbaşan bipelîxîne û malên wan talan bike dîsa jî ji bo çend nalên hespan, ketîye pey mixabinîya nehatina artêşa Osmanîyan û dibêje: *"Çi heyf e*

---

[76] Metê, *Gotinên Gunehkar*, r. 44.
[77] Helîm Yûsiv, *Sobarto*, Peywend, Çapa Duyem, Stenbol, 2014, r. 85.
[78] Jan Dost, *Mijabad*, Avesta, Çapa Sêyem, Stenbol, 2015, r. 145.
[79] Dost, *Mijabad*, r. 157.

ku êdî nema leşker tên ji zû de ye siltanan û eskerên wan riya xwe bi welatê me naxînin û naçin şerê qizilbaşan.Çi bextekî reş e lo![80] Jan Dost, rexneyên xwe yên li ser gundîtîyê di romana *Kobanî*yê da jî didomîne. Karakterekî romanê yê sereke Hec Mislim, li gor tîpolojîya "bavê kurd" a klasîk bi şexsîyeteke dîndar û kevneparêz hatîye resimkirin ku têkilî her tevgera kufletên xwe dibe. Dixwaze ku her hareketa wan li gor usûl û esasê dîn û civakê be. Mîsal lêdana tembûrê li gor îslamê heram dibîne û nerazîbûna xwe ya li hember vê meseleyê bi nêzîkatîya malê û camîyê weha karîkaturîze dike: *"Yawrim, ma ti fedî nakî? Ne ti cîranê camî yî! Bavê te hecî ye ti jî vê tingetingê naterikîni. Hele ti nimê nakî lê va çi tembûr e?"*[81] Hin tişt hene ku di civakê da ji alîyê bawerîyê ve bûne sembolên neyênî. Tembûr û gelek amûrên muzîkê yên din jî li gor mihafezekaran remzên neyênî ne.

Gundi di romana kurdî ya dîyasporayê da bi dîndarîyeke ne dilovanî, bi cahiltî û bêmirêzî, bi serhişkî û kevneparêzî, bi mizawirî û oportunîzmê hatine tawanbarkirin. Romannûsan, rexneyên xwe yên civakî ji gelek alîyan ve li ser jîyana gundî û gundîtîyê saz kirine. Jan Dost û Mahmut Baksi, bêtir li ser gundîyan sekinîne û jîyan û ramanên wan kirine mijara rexneyên xwe yên civakî.

2.2. Axa û Beg

Rêvebirîya kesek an jî malbateke bihêz li ser heremekê wek axatîyê tê bi navkirin. Ji alîyê mantalîteya hilberînê ve dişibe pergala feodalîyê lê ji alîyê binyadî ve helbet ne wek feodalîteya Ewropî ye. Alâeddin Şenel destnîşan dike ku feodalîte di encama tunebûna hegemonyaya navendî da bi daxwaza kesên bihêz ku îqtîdara xwe tesîs bikin û bi meyla kesên zeîf ku di heyra ewlehîya can û malê xwe da ne, derketîye holê. [82] Di civaka kurdan da ev têgeh wek eşîr an jî axatîyê jî tê binavkirin. "Reîsê eşîre, piranî wek axa tê bi navkirin. Ev unwan ji sala 1637an ku Siltan Murad (1612-1640), Bexdad bi dest xistîye tê bikaranîn."[83] Kurdên ku ji rêvebirîya dewletan dûr dijîn, bi sedan salan di bin sîwana axa yan jî eşîretan da jîyane. Eşîr ji wan ra

---

[80] Jan Dost, *Mîrname,* Avesta, Çapa Sêyem, r. 173.
[81] Jan Dost, *Kobanî*, Weşanên Dara, Çapa Yekem, Diyarbakır, 2017, r. 12.
[82] Alâeddin Şenel, *Siyasal Düşünceler Tarihi*, Bilim ve Sanat Yay., Ankara, 1995, r. 214.
[83] Vladimir Minorsky, Thomas Bois, *Kürt Milliyetçiliği*, (Wer.) E. Karahan, H. Akkuş, N. Uğurlu, Örgün Yay., İst., 2008, r. 150.

bûye wek pişt û pal û wan jî xwe bi vê sazîya civakî bihêz û biewle hîs kirine. "Eşîret ji kesên ku ji komên koçer an jî niştecih bin, bi rêya xwîn an jî zewacê di navbeyna wan da xisimtî hebin û di warê dînî, çandî, aborî da hevpişk bin, pêk tê."[84] Bo nimûne "Eşîreta heverkan, konfederasyoneke ji bîst û çar eşîran pêk dihat. Hin ji wan musluman hin ji wan êzidî bûn. Ji vê dîtir hin xirîstîyanên têkilîyên wanî mayinde bi konfederasyonê jî ra hebûn."[85] Eşîr di bin serokatîya axa yan jî begekî da tên bi rêvebirin. Qanûnên wan ên nivîskî tune ne. Hêza qayîdeyên çandî yên devkî û orfî di îdarekirina eşîran da hêmanên bingehîn in. "Aşîreta kurdan xwe dispêre bavekî rasteqîn an jî wisa tê zenkirin û li ser hîmê xisimtîyê înşa bûye, piranî yekîneyeke sosyo-polîtîk e ku yekîtîyeke axê jî dihewîne."[86]

Gelek eşîrên kurdan koçer in, havînan li zozanan dimînin û karê ajalvanîyê dikin, dema zivîstanê jî vedigerin germîyanan. jîyana wan jîyaneke îptîdayî ye. Ji amûrên modernîzmê mehrûm in. Lê nayê maneya ku hemû eşîrên kurdan koçer in, eşîrên niştecih ku hem karê ajalvanîyê û hem karê çandinî û bazirganîyê jî dikin hene. "Nêrîna romantîk a ku kurdan wek şivanên koçer destnîşan dikin, xelet e. Di wextên berê da hejmara koçeran zêde bû. Dîsa jî bi îhtîmaleke mezin tu carî nîvê nifûsa kurdan teşkîl nekirine. Di salên 1920an da ji ber ku Komara Tirkîyeyê, rêyên koçê yê bi cîranên başûr ra birîn, gelek eşîrên koçer ji naçarî niştecih bûn."[87] Ji ber hin sedemên sîyasî li seranserê Kurdistanê dewletên desthilatdar ji bo ku karibin herêmên dûrî ji navenda dewletê îdare bikin, serokeşîr an jî axa û beg bertîl kirine. Bi dayîna erd û erazîyên berfireh, bi tevdîkirina meqam û mewqîyên îdarî û leşkerî, dewletan xwestine ku eşîrên ji hezaran kesan pêktên, di bin desthilatdarîya xwe da bihêlin. Ji ber ku lihevkirina kesekî hertim ji lihevkirina bi hezaran kesan hêsantir û pratîktir e.

Jîyana eşîrî bi xwe ra sitû tewandina li hember qayîdeyên axatîyê jî tîne. Di nava vê sîstema civakî da hemû hêz di destên axa an jî began da ye. Gotina wan, emir û ferman e. Di şer û pevçûnên navxweyî û micadeleya lîdertîya konfederasyona eşîran da gelek kesên ji eşîrê yên jirêzê, bi can û malê xwe zerarê dibînin. Qûweta kê

---

[84] İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler*, Nûbîhar, İstanbul, 2017, r. 63.
[85] Martin Van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, (Wer.) Banu Yalkut, İletişim Yay., İst., 2010, r. 163.
[86] Bruinessen, h., b., r. 82.
[87] Martin Van Bruinessen, *Kurdistan Üzerine Yazılar*, (Wer.) Kolektîf, İletişim Yayınları, İstanbul, 2010, r. 159.

ji ya kê zêdetir be berê şûrê xwe dide wê hêlê. Lêdan, kuştin, revandina keçan, talan, şewitandina dehl, rez û erdan dibin çalakîyên zilma rojane. Bi ser da çav berdidin rizqê gundîyên fiqare jî. Bo nimûne Martin Van Bruinessen ji bo zilma axayên Şirnexê weha dîbêje: "Deh yekê pîvazê jî digirin hetta para mela ya parçeyekî zikatê jî distînin."[88] Oryantalîstê rûs Vladimir Minorsky (1877-1966) û Kurdologê fransî Thomas Bois (1900-1975) îdîa dikin ku: "Di bûyerên dizîyê, revandinê û qetil û qitûlê da dema gundî ji bo hakimtîyê serî li axa didin, reîsê eşîrê; xwedî mafê birîna cezayê pera ye. Ev jî ji bo wî çavkanîyeke mihim a dahatûyê ye."[89] Ji gelek alîyan ve axa yan jî beg, xwe tenê xwedîyê erd û erezîyan, mal û milkan nabînin ew di heman demê da xwe wek xwedîyê ajalên gundên eşîrê û ya sosret, xwe wek xwedîyê însanên eşîrê dibînin. Çerxa tesîra wan a li ser gel, bi her awayî fireh dizîvire.

Mela Mehmûdê Bayezîdî (1797-1863) di kitêba xwe ya navdar *Adat û Rûsûmatnamê Ekradîye* da derheqê kurdan û girêdana wan a bi axayan ra tespîteke balkêş dike. "Ehlê Ekrad, xwecihî û rewend qewî zêde hakimperest û axaperest in. Zêde îta'eta (ferman pejirandina milxwarîya ji bo) hakiman û mîr û axan dikin. Bilanî hakimên wan fileyek jî bibitin, êdî zêde îta'et dikin."[90] Ji ber van sedemên borî gelek kes ji vê sîstema pederşahî ya zilm û zordarî zagona wê ye, revîyane û xwe li wargehên dîyasporayê girtine. Jîyana xurbetê çi qasî zehmet be jî ji zilm û zordarîyê, ji neheqîyê, ji kuştin û talanê û ji tunebûna mafên însanî yên bingehîn çêtîr tê dîtin.

Pergala axatîyê ya civaka kurdan ji sedî sed ne wek feodalîzma Ewropayê ye, lê belê ji ber serdestîya axayan a li hember gundîyan, berfirehîya milkên axa û began, civaka ku debara wê girêdayî çandinîyê ye û hin gelek sedemên din dişibe feodalîzmê. İsmaîl Beşikçi derheqê mijara feodalîzmê da weha dibêje: "Pergala civaka feodal di navbera sedsalên 10 û 13an da ango dawîya Serdema Navîn dirûvekî li Ewropayê dixûye, lê têkilîyên hilberîn û milkîyetê yên vê pergalê karîkaturîze

---

[88] h., b., r. 140.
[89] Vladimir Minorsky, Thomas Bois, *Kürt Milliyetçiliği*, (Wer.) Kolektîf, Örgün Yay., İst., 2008, r. 150.
[90] Mela Mehmûdê Bayezîdî, *Adat û Rûsûmatnameê Ekradîye*, Lêkolîn: Jan Dost, Nûbîhar, Çapa 2., Îstanbûl, 2012, r. 62.

dikin, ne tenê mexsûsê Ewropaye ne. Di serdemên curbecur li hin deverên din ên dinyayê û di vê navberê da li Împaratorîya Osmanîyan da jî tê dîtin." [91]

Axa an beg wek hêzên herêmî yên desthilatdar piranî ked û kesba gundîyan xesp dikin û bi nanozikatî wan di kar û barên giran da dixebitînin. Ev hêzên herêmî, gelek caran bi dewletê ra destbirak in û dewlet jî ji bo hêza xwe ya navendî bikaribe li van deverên dûrdest biparêze ji qewet û tesîra axa û began sûdê werdigire. Heta di gelek serhildan û alozîyên herêmî da axa û began bi dewletê ra mişterek hereket kirine û hewl dane serhildanan têk bibin. Li hember van kiryarên xwe jî ji dewletê pere, erazîyên fireh an jî meqam û mewqî girtine. Sosyolog Dr İsmaîl Beşikçi, destnîşan dike ku "Bi hevrastîya kêmbûna hêza desthilatîya rêveberîya navîn ra em dibînin ku feodalîte û derebegîtî hêzê winda dike." [92]

Di romana kurdî ya dîyasporayê di peywenda rexneya civakî da li ser axa û began gelek rexne derdikevin pêşberî me. Mahmut Baksi di *Hêlîn*ê da gazinên gundîyan ji axa û melayan bi awayekî îronîk tîne ziman û ji devê bavê lehenga xwe Hêlînê, dibêje ku axa û mele bi arîkarîya hikûmetê gundîyan dixapînin û wan dişelînin lê heger zarokên gundîyan perwerde bibin dê axa û mele nema karibin vî hikmê xwe bidomînin.[93] Baksi, axayan wek tîpên şehwetperest nîşan dide û nefstenikîya wan afîşe dike. Lehenga Baksi ya jin Aso; Axayê Gundikê Dono Hecî Zorav, tevî ku mêrê sê jina ye û dixwaze bi Perîxana di temenê keça xwe da ye bizewice, bi tundî rexne dike.[94] Di dawîya romanê da bi bûyerên sosret, Hecî Zorav û yên temsîla wî ruswa dike. Dixwaze bibêje ku ev pergala polîjînî ango pirjinî ne dirust e. Baksi, di cihekî din ê *Gundikê Dono* da jî li ser meseleya pirjinîyê sekinîye û ji devê gundîyekî rexneyeke sosyolojîk a balkêş li romanê zêde kirîye. Baksi, bi rêya karakterekî xwe dibêje ku xortên me ji derdê zewacê dîn û har bûne lê Hecî Zorav mêrê çar jina ye. *"Lê ku Hecî Zorav çaran bistîne dê kî vê valayîe tije bike? Ma dê Xwedê nebêje deyûzno, we çima para xwe da Hecî Zorav?"*[95] Axa, çawa bi darê zorê dest datînin ser rizqê xelkê, bi vî awayî mafê xortên berzewac jî ji destê wan digirin.

---

[91] İsmail Beşikçi, *Kürt Toplumu Üzerine*, Yurt Yayınları, İstanbul, 1993, r. 83.
[92] Beşikçi, *Kürt Toplumu Üzerine*, r. 98.
[93] Baksi, *Hêlîn*, Lîs, Çapa Duyem, Dîyarbakir, 2018, r. 35.
[94] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 12.
[95] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 45.

Axa û beg, elîtên gundan in. Xwarin û vexwarina wan ji yên gundîyan cuda ne. Tiştên herî xweş para wan in. Gundî, xwedî dikin, hildiberînin, diparêzin û çêdikin ew jî li ser rûdinên û duxwin, mirîşkên gundan jî li gor Baksi ji bo axayan hêkan dikin.[96] Hêk, metaforeke hilberînê ye. Baksi, bi vê nîşaneyê, nakokîya feqîrî û belengazîya gundîyên kedkar û dewlemendîya axayan ji alîyê hişmendîya çînî ve rexne dike. Axa ji ber kedxwarîya gundîyan û hevşirîkatîya dewletê bi pere û zêran têne taltîfkirin. Ew ji pere û zêran gelekî hez dikin, jixwe pere û zêr jî li ser wan dibarin.

Hikim û qudreta axayan li cem gundîyan ew qasî bilind e ku gundî, axayan wek hevalê Xwedê dibînin. Baksi di *Gundikê Dono* da vê rewşê bi şêwazeke îronîk rexne dike û bi navgînîya Filîto dibêje ku *"Pere bavê Hecî Zorav e, hikûmet kalikê wî ye. (...) Ma ne wisa bûya çima xilîlok, çima teyrok li genimê axayê din da û çima ne li ê Hecî Zorav? Ji ber ku Xwedê jî hevalê wî ye."* [97] Axa û began, karên xwe yên qirêj bi destê dewletê jî dikirin. Jixwe hêza dewletê ya ku piştevanîya wan dikir, destê gundîyan girêdida. Di romana *Gundikê Dono da "Hecî Zorav, bi destê cendermeyan û bi darê zorê mala Filîto ji gund derdixe."*[98] Gundîyên ku bixwestana arîkarîya hev bikin an jî li pişta hev rabin ji tirsa cendirmeyan nikarîbûn xwe tev bidin û mecbûr diman li hember neheqîya axayan bêdeng bimînin an na heman rewşa xetere, li pêşîya wan jî bû. Baksi vê rewşê ji devê gundîyekî bi navê Hesen, rexne dike û dibêje axayên Xerzan û cendirme hevkarê hev in. Gundî ji vê rewşê bêzar in lê tu hêza wan tune ye ku li hember axayan derkevin.[99]

Axayan, li gundên xwe tu carî mixtarî nedikirin. Ji ber ku nedixwestin ew û dewlet di kar û barên rêvebirîyê da bên hember hev. Heger dewletê û leşkeran di meseleyekê da tiştekî neyê hesabê axayan bi darê zorê bikira û gundî jî bi vê meseleyê bihisîyana dê qedir û prestîja axa ji binî ve bihejîya. İsmail Beşikçi derheqê axa û xwe dûrhiştina wan a ji mohra mixtarîyê weha îzeh dike: "Li gundên axayan tu carî axa, wezîfeya mixtarîyê hilnegirtîye. Sedema herî mezin a vê, nexwestina axa a di her meseleyê da hatina hember dewletê ye lewra dema axa, peywireke wek mixtarîyê bipejêre bivênevê dê têkeve bin hikmê midûrên nahîyê û qeymeqamên

---

[96] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 15.
[97] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 39.
[98] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 18.
[99] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 73.

navçeyê. Lê belê bi awayekî kiryarî bandora axayan a li ser xelkê û sîyasetmedaran ji van her duyan jî bilindtir e." [100] Vebejê Baksi, serdestîya axayan a mohra mixtarîyê weha rexne dike: *"Hesen hem xulamê tifingê hem jî muxtarê gund bû. Mohra gund di destê Hecî Zorav de bû. Bidaya kê, muxtar ew bû."* [101] Baksi, bal dikêşê zilma axayan ku li gundîyan dikin û ji ber vê zilmê destnîşan dike ku kûçik bi kûçikatîya xwe jî zilma axayan nikare qebûl bike. Di romana *Gundikê Dono* da kûçika bi navê Doxê diceheme. Baksi ji devê gundîyekî bi navê Zibêr, dibêje ku kûçik bi kûçikanîya xwe li hember zilm û neheqîya Hecî Zorav neqedandîye.[102]

Axa, bi berfirehîya erezî û pirbûna mal û milkên xwe li herêmên xwe bûne desthilatdar. Di dema Osmanîyan da bi saya pergala timarê, şexsan; erdê dewletê diçandin û li hember wê ji dewletê ra siwarî xwedî dikirin. Bi domana demê ra li ser van erezîyên berfireh rûdiniştin û heq îdîa dikirin. Hin axa, nevîyên şêxan bûn û çavkanîya desthilatdarîya xwe ji du kanîyan digirtin: Yek şêxitî û ya din jî axatî. Vebêjê Baksi, dibêje: *"Şêxên bi nav û deng, axayên mezin milkên Kurdistanê bihost bi bihost di nava xwe de par kiribûn."*[103] Exlebê van axayên mezin serokatîya eşîr an jî konfederasyona eşîran dikirin û di heman demê da ritbeyên leşkerî wek mîralaytîyê ji dewleta Osmanî werdigirtin û li herêma xwe mîna paşayan dihatin pejirandin. Nûnerên dewletê, bi boneyên curbecur dihatin ber derîyên van axayan û ji wan arîkarî dixwestin. Baksi vê rewşê ji devê Eyşanê, rexne dike û dibêje Hecî Zorav xwedîyê herêmê Xerzan e. Nûnerên hikûmetê yên herêmî wek hakim û qeymeqam li ber derîyê wî mîna parsekan in[104]

Baksi di romana *Serhildana Mala Eliyê Ûnis* da cihekî taybet ji axayên xayin ra vediqetîne û axayên ji bo berjewendîyên xwe û ji bo ritbeyan xwe firotine dewletê û di xizmeta dewletê da xebitîne rexne dike.[105] Baksi, nêrîna li sîlehan a Mala Eliyê Ûnis, namûs û xîreta wan bi tevgera axayên menfaetperest miqayese dike, Baksi, mînaka Cemîlê Çeto dide. Gotina wî ya li ser axatî û birakujîyê kurteya trajedîya civaka kurdan a qedîm e. Menfaet, dîsa taca zêrîn e û li ser serê birakujan e, talîya

---

[100] İsmail Beşikçi, *Doğu Anadolu'nın Düzeni,* Yurt Yayınları, Ankara, 1992, r. 154.
[101] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 21.
[102] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 26.
[103] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 26.
[104] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 33.
[105] Baksi, *Serhildana Mala Elîyê Ûnis*, r. 27.

birakujîyê jî kuştina bi destên neyaran e. Herweha qedera reş a Cemîlê Çeto jî bi vî rengî qewimîye. "Serokê eşîra Pencînaran Cemîlê Çeto (1877-1926) di şerê kurd û tirkan da (Serhildana Şêx Seîd, 1925) yek ji serokên eşîran bû ku bêalî mabû. Tê gotin ku Mustafa Kemal, soz daye dê bi keça Cemîlê Çeto ra bizewice. Ji ber vê yekê di şerê kurd û tirkan da bêalî ma ye. Piştî ku dewletê, li herêma Reman û Reşkotan nîzam tesîs kir vegerîye ser eşîra Cemîlê Çeto û sîlehên wan ji wan stand. Ew û lawê wî derdest kir û teslîmî Mehkemeya Îstîklalê kir. Li hêwana girtîgehê, Cemîlê Çeto, weha diqîrîya: 'Werin, werin û tifî rûyê min bikin. Bibêjin xayinê miletê xwe Cemîlê Çeto, ji kerê keto.' (Cemîlê Çeto) Ji alîyê Hikûmeta Tirkîyeyê ve hate îdam kirin ."[106] Mahmut Baksi bûyerê bi navgînîya Zibêr, weha rexne dike: *"Axatî birakuj e. Ên ku nikaribin ji bo menfîeta xwe birayê xwe bikujin, heqê wan û axatîyê di nava Pencînaran de tune ye."*[107] Bi van gotinan zilma axayan ku ne tenê li ser gundîyan di heman demê da li ser ehil û eqrebayên xwe jî dikirin, bi aweyekî endîrekt tê rexnekirin.

Jan Dost jî di romana *3 gav û 3darek*ê da axa û serokeşîrên ku piştevanîya Serhildana Şêx Seîd nekirin û bi ser da jî piştgirî dane artêşa Tirkîyeyê ku ji bo serhildan têk biçe, bi rêya vebêjê xwe rexne dike û dibêje ku Şêx Seîd (1865-1925) *"Weke ku zanibû dewletan û xwedayan û serokeşîran ew bi tenê li ber vê qedera werîsî hiştine."*[108] li ber sêdarê sekinî bû. Axayên li îdama Şêx Seîd temaşe kirin, piştî demeke kurt, bûne mêvanê wan sêdarên kendîrên bizeyt.

Mahmut Baksi, xwefirotin, kuştin û talana axayan wek leîtmotîfekê di romanên xwe da gelek caran dubare dike. Baksi ji devê gundîyekî bi navê Zibêr, dibêje *"Ez namûsa xwe ji bo qetek nan nafiroşim. Firotin, kuştin, talan, derew para axayan e."* [109] Bi van gotinan tîrên rexneyên tund li axayên xwînmij dide. Di nezera Zibêr da axa, gundîyan mîna keran dibînin. Li wan siwar dibin û berê wan bidin kîjan deverê gundî diçin wir.[110] Baksi, bi saya van dîyalogên di navbera gundîyan da derbas dibin bi awayekî endîrekt rexneyên xwe li pergala axatîyê dike.

---

[106] Nezîrê Cibo, *Havêrkan Sultanları I*, Komal, İstanbul, 2010, r. 119.
[107] Baksi, *Gundikê Dono,* r. 74.
[108] Jan Dost, *3 gav û 3darek*, Avesta, Çapa Yekem, Stenbol, 2007, r. 32.
[109] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 59.
[110] Baksi, *Gundikê Dono*, r, 68.

Mehmed Uzun di romana *Bîra Qederê* da li ser îxaneta axa, beg û şêxên kurdan disekine û rexneyên giran ji devê karakterê romanê Mîr Celadet Bedirxan (1893-1951) li milet dike û dibêje *"Ma îxaneta axa, beg û şêxên kurdan ne meşhûr e, vê îxanetê li hemû dinê nav nedaye?"* [111] Lehengê Uzun, di wê bawerîyê da ye ku milet, dahfikên axa, beg û şêxan nedîtîye û rûyên wan î qirêj ferq nekirîye.

Mehmed Uzun di *Hawara Dîcleyê* da ji devê şêwirmendê Mîr Bedirxan Mam Sefo, rexneyeke kesayetî li begên kurdan dike û wan di karê rêvebirîyê û bilêvkirina qene'et û fermanên xwe da zêde sert û hêrsokî dibîne û van celebê kiryar gotinan wek ehmeqîyê dinirxîne.[112] Belê sîyaset hunera rêvebirinê ye û divê rêvebir xwe û miletê xwe baş binase lewra karê sîyasetê karekî pirrûyê ye. Jixwe gotina polîtîkayê ji vir tê. Balkêş e gotina sîyasetê jî di zimanê erebî da ji koka seyîsê tê. Seyîs, hespan timar dikin. Sîyasetmedar jî mejîyê mirovan timar dikin. Li gor vebêjê Uzun, Biroyê Dengbêj; tevgera axa û begên kurdan naşibe dirûvê sîyasetmedaran. Axa, dilkevir in û ji bo çengek ax an jî kîsekî genim ku ev nîşaneyên berjewendîyên madî ne, dikarin bibin dijminê dost û cîranên xwe.[113] Di vê dijminahîyê da perîşanî an mirina eşîr û kesên derûdora wan ne xema wan e. Mesele berdewamîya dewrana wan a serdest e.

Firat Ceweri di *Payiza Dereng* da bi çavên Ferda ji alîyê şoreşa proleter ve li meseleyê dinêre û li ser pêwîstîya jiholêrakirina pergala axatîyê, rexneyê li pêwendîyên malbatî dike kû li gor wî paşdemayîna civakê bi van têkilîyên malbatî ve girêdayî ne û heta ev têkilî ji holê ranebin pêşketin ne pêkan e.[114] Ev rexne rasterast li ser pergala axatî û encamên wê yên sosyolojîk ku malbatê eleqeder dikin hatîye kirin. Nivîskarê sosyalîst ê amerîkî Leo Huberman (1903-1968) îdîa dike ku "Heta ku pergala feodal, statîk bimîne û têkilîyên di navbera efendî û serfan da li gor kevneşopîyê di halê xwe yê qeşayî da bimîne, ne pêkan e ku gundî rewşa xwe serrast bikin." [115] Gundî, çi qasî ji halê xwe razî bin û ji bo guhertina mercên jîyana xwe tevnegerin, dê axa û beg jî pergala xwe biparêzin û hêza xwe ya hegemonîk bidomînin.

---

[111] Mehmed Uzun, *Bîra Qederê*, Kürt - Kav / Avesta, Çapa Sêyem, Stenbol, 1999, r. 203.
[112] Mehmed Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, Avesta, Çapa Yekem, Stenbol, 2003, r. 67.
[113] Uzun, *Hawara Dîcleyê II* , r. 95.
[114] Firat Cewerî, *Payiza Dereng*, Avesta, Çapa duyem, Stenbol, 2014, r. 278.
[115] Leo Huberman, *Feodal Toplumdan 20. Yüzyıla*, (Çev.) Murat Belge, İetişim, 2009, r. 54.

Di romana *Ez ê Yeki bikujim* da Firat Cewerî, rexneyekê li hişmendîya civakî ya derheqê mêran û mêranîyê da dike û cih dide pîvanên mêranîya civaka kevneşop ku bi wêrekîya kuştinê dîyar dibe. Bavê lehengê romanê Temo dibêje: *"Zilam te got, divê mêrxas be. Tu hê nikarî dîkekî serjê bikî, ma tu ê çawa zilaman bikujî?"* [116] Di civaka eşîrîyê da bi gelemperî zarokên law ji biçûkanî da ji bo mirin û kuştinê tên amadekirin ango li gor tradîsyona mêranîya eşîrîyê, berxê nêr ji kêrê ra ye.

Jan Dost di *Mijabadê* da rexneyeke korferasetê li axayên kurdan dike wan wek êsîrê berjewendîyên şexsî dinirxîne. Dost ji devê pêşmergeyekî bi navê Nûrî Emîn, derheqê axayên kurdan weha dibêje: *"Ji sîya konên êla xwe dûrtir nabînin."* [117] Li gor Nûrî Emîn, haya axayên kurdan ji der û deverên dûr û siberojê tune ye. Axa bin jî axatîya wan heta ber derîyê serokeşîran e. Dema rewşeke aloz derdikeve holê ji serokeşîran arîkarîyê hêvî dikin.

Romannûsên dîyasporayê wek sedemeke bingehîn a derketina kurdan ji welatên bav û kalan û reva dîyasporayê, pergala eşîrîyê û tevgerên axa, beg û serokeşîran dibînin. Ji ber vê yekê di romanên xwe da di gelek cihan da bi rexneyên tûj yên civakî li ser vê meseleyê disekinin. Li gor wan, axa û beg nezan in, korferaset in. Xayînên gelên xwe ne. Serdestîyê li êl û gundîyên xwe dikin. Ji berjewendîyên xwe pêvetir li tu tiştekî nafikirin û ji bo domandina dewrana axatî an begîtîya xwe, dikarin her cure dek û dolaban li serê herkesî ra bifitilînin.

Axayên di romana dîyasporayê da bi giştî şehwetperest in û mêrê sê çar jinan in û dikarin ji bo dilbijokîya xwe ya cinsî, gelek keçên xama bikin qurbana xwe. Di nava dewlemendîyeke mezin da dijîn û bi erka xwe ya axatîyê bi dewletê ra hevşirîkatîyê dikin û zilm û zoreke mezin li ser gundîyan dimeşînin. Romannûs, wan wek sedemeke paşdemayîna gelê kurd dinirxînin û gelek çavkanîyên arîşeyên civakê bi pergala axatîyê ra girê didin.

---

[116] Firat Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim*, Avesta, Çapa Yekem, Stenbol, 2008, r. 59.
[117] Jan Dost, *Mijabad*, r. 179.

2.3. Şerê Eşîrî / Berberî

Eşîr, pergaleke civakî ye ku li nava kurdan berbelav e. Rastîyeke civakî ya Rojhilata Navîn e. "Eşîret wek têgeheke civaknasîyê kesên ku di navbera wan da girêdana îrsî ango têkilîya xwînê heye ji heman bavikî tên an jî ji bavikên pisê pismaman tên di bin sîwana eşîretê da dibin yek. Rêxistina eşîrê, rêxistineke civakî û aborî ye. "Weha tê bawerkirin ku cara yekem di serdema neolîtîk da derketîye holê."[118] Walker Connor (1926-2017) weha dibêje: "Ligel ku têgeha eşîrê ne pir zelal e û li nav antropologan jî mijareke nîqaşê ye, ji bo teswîrkirina yekeyeke sosyo-polîtîk a ji alîyê etnîk ve homojen lê tenê parçeyek ji komeke mezin, hatiye bikaranîn."[119] Komeke civakî ye ku ji gelek alîyan ve bi hev ra girêdayî ye û di nava xwe da derheqê ûsûl û esasê jîyanê da xwedî pergalekê ye.

Jîyana eşîrtîyê piranî koçerî ye. "Eşîrên koçer ne nişteciheê erdeke sabît in û milkîyeta wan a axê tune ye. Bi xwedîkirina pez ra mijûl in. Ji bo ku ji pezên xwe ra mêrgên şên bibînin li gor rewşa demsal û gîhayan ji zozanan ber bi germîyanan û ji germîyanan ber bi zozanan ve koç dikin û hertim di konan da dijîn."[120] Helbet gelek eşîr di demên borî da ji ber sîyaseta dewletê ya îskana mecbûrî nişteciheê jî bûne.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da romannûsan, fokûsa rexneyên xwe yên civakî gelek caran dane ser meseleya eşîrtî û şer û pevçûnên di navbeyna eşîran ango bi gotineke kevnar şerê berberîyê. Ev pevçûn, nîşaneya paşdemayîna civaka kurdan e û sedemeke derengmayîna gîyanê netewetîyê jî dihewîne.

Mahmut Baksi di romana *Hêlîn*ê da ji devê apê Hêlînê destnîşan dike ku çar dewlet dixwazin kurdan ji cîhanê paqij bikin bi ser da jî kurd, mîna mar û dûpişkan dijminê pismamên xwe ne. Kîn û xezeba di dilê kurdan da bi kesereke kûr rexne dike. [121] Baksi di *Gundikê Dono* da behsa şerê di navbera eşîra şemdînan û eşîra reşkotan dike û bi bîr tîne ku ji ber van şerên berberîyê hin mirov bi salan li serê çîyayan mehkûm diman û ji cendirmeyên dewletê direvîyan. Ev meseleya

---

[118] Nezîrê Cibo, *Havêrkan Sultanları I*, Komal, İstanbul, 2010, r. 13.
[119] Walker Connor, *Kaosa Termînolojîk a Derbarê Têgehên Dewlet, Netewe û Neteweperweriyê de*, (Wer.) Fexriye Adsay, Zarema, Sal:8/Hejmar:16/2022, r. 24-25.
[120] İsmail Beşikçi, *Doğu Anadolu'nın Düzeni,* Yurt Yayınları, Ankara, 1992, r. 61.
[121] Baksi, *Hêlîn*, r. 66.

mehkûmtîyê rê li ber eşqîyatîyê jî vekirîye. Gelek mehkûmên li çîyayan bi salan mane gîhaştine hev, bûne çete û di şikeftan da jîyane, ji bo debara xwe ya rojane, rêya karwanan birîne û xelk şelandine. Carinan jî bi axayên xwînmij ra bûne destbirak û tirsa axayan a di dilê gundîyan bi tivingên xwe yên xedar mezin kirine. Baksi vê yekê ji devê vebêjê xwe weha rexne dike: *"Hesen ji eşîra Şemdînan bû. Çend sal berê eşîra wan û Reşkotan ji hev nêzîkî deh mêran kuştibûn. Hesenê Meysê bi salan li serê çiyê mehkûm mabû."* [122] Mehkûmên ku ji ber cendirmeyên dewletê direvin, hem xwe derveyî qanûnên dewletê dibînin hem ji bandora kevneşopîya eşîrê li ser wan kêm dibe û jîyaneke defacto ava dikin.

Gundî bi mensûbîyeta eşîran, xwe bihêztir hîs dikin. Eşîran ji bo ewlehîya xwe û malbata xwe, ji bo şeref û namûsa xwe mîna mertalekî pola dibînin. Ev ruhê mensûbîyetê di rewşeke awarte da dibe hincet ku bi sedan, dibe ku bi hezaran mêrên ji eşîrekê, bên arîkarîya hev. Ev yek jî sîwana eşîrê dike cihekî biewle û kesên eşîrparêz ên tena serê xwe feqîr û belengaz, li hember kesên biqewet diparêze. Baksi di *Gundikê Dono* da vê yekê bi rexneyeke îronîk, şênber dike. Gundîyekî bi navê Mehemed Beg ji yekî din ra dibêje: *"Eger ne ji devê tivinga min bûya dê dar têxistana bavê te ehmeq, Li şûna ku di nava qehweyên Qûrtelanê tu behsa derpîyê dîya min bikî here heyfa jinbava xwe ji Reşkotîyan bistîne deyûz…"*[123] Mixabin derpîyên dayikan jî di nakokî û şerên berberîyê da dibe benîştê devê fesad û gelacên êlperestan.

Di romana *Serhildana Mala Elîyê Ûnis* da Baksi, rexneyên xwe yên derbarê şerên eşîran da ji devê vebêjê xwe rêz dike û dibêje tu cîyawazî di navbera kerîyên guran û hin eşîrên Xerzan da tune bû, ew neyarên hev bûn û dema seydek peyda nekirina ji birçîna bi dora hev diketin û hewl didan ku hevûdin bixwin.[124] Ev rexneya Baksi, li ser eşîrên Xerzan hatîye gotin lê rewşa eşîrên din ên kurdan jî ne ew qasî ji vê rastîyê dûr e. Baksi, şerê berberîyê ji dijberîya dewletê jî xeternaktir dibîne û li gor wî ên ku mala eşîran xera dikin dîsa ew bixwe ne. Baksi ji devê Evdirehmanê Elîyê Ûnis, dibêje ku hin eşîrên di nava kurdan da bi hikûmetê ra dibin yek û diavêjin ser eşîrên din. Baksi destnîşan dike ku ev mîzansen ji dema Osmanîyan da weha ye û

---

[122] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 21.
[123] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 62.
[124] Baksi, *Serhildana Mala Elîyê Ûnis*, r. 26.

şerê Mala Mîr Bedirxan û pismamê wî Ezdîn Şêr bi bîr tîne. [125] Ev tradîsyona xayintîyê, ji bo gelek eşîrên kurdan rastîyeke civakî ye û encamên wê di gelek bûyerên dîrokî da tê dîtin. Xayinti û durûtîya eşîran û hevşirîkatîya wan a bi dewletê ra pişta eşîrên din dişikîne û wan lawaz dike.

Baksi, tevgera eşîran a li hember Komara Tirkîyeyê jî rexne dike û wan zêde îtaetkar dinirxîne. Baksi, ji devê vebêjê xwe piranîya eşîran, wek xulamê dewletê bi nav dike û dibêje ku gelek eşîrên kurdan tu carî serî hilnedane lê ji şerê birakujîyê û talanan ra mêr di ser wan ra tune ne.[126] Vebêjê Baksi, di asêbûna li hember biryar û kiryarên dewletê da gelek eşîran, bikêrnehatî dibîne û lê zêde dike ku her eşîr, dixwaze eşîrên din têxe bin hikmê xwe û bibe serdestê herêma xwe.

Mehmed Uzun di *Bîra Qederê* da ji devê Mîr Celadet Bedirxan rexneyekê li bedbînî û zikreşîya kurdan dike û dipirse *"Lê çima ev bedbînî, zikreşî û dilxerabîya kurdan a li hember hev, çima?*[127] Ev pirs, pirseke ji Şerê Çaldiranê (1514) heta Komara Mahabadê (1946) û serhildanên dema Komara Tirkîyeyê (1925, 1930, 1937) û dewletên din her gav ji bo gelê kurd pirseke derbasdar e, divê bersiva vê pirsê bê dayîn. Bersiv, tunebûna yekîtî û dûrbûna ji hişmendîya neteweyî ye. Uzun, nezanîya gelê kurd, wek belaya serê wan dinirxîne û ji devê Celadet Bedirxan, îdîa dike ku *"Nezanî û berberî. Wext û heyama nezanî û berberîyê, bi rengê xwe yê reş bûye qedera kurdan. Û vê qederê jî kurd xistine bin qeyd û zincîran."* [128] Lehengê Uzun, bindestîya kurdan û zor û zextên li ser wan hatine ceribîn jî bi vê nezanî û rikberîyê ve girê dide.

Mehmed Uzun; feqîrî, perîşanî û belengazîya kurdan jî bi vê meseleyê ra eleqedar dibine. Uzun, bi navgînîya Mîr Celadet Bedirxan, bombebarana rexneyên civakî yên derheqê meseleya şerên berberîyê û dijberîya kurdan da didomîne:*"Kurd ne yek bûn, yekîtîya wan pir dijwar bû û wan gora hevûdû dikolan. Dinya dijminê*

---

[125] Baksi, *Serhildana Mala Elîyê Ûnis*, r. 32.
[126] Baksi, *Serhildana Mala Elîyê Ûnis*, r. 36.
[127] Uzun, *Bîra Qederê*, 251.
[128] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 252.

wan bû, ew jî dijminê hev bûn." [129] Li gor Celadet, civaka kurdan li hev kom dibû. Bi heman tiştan qerfên xwe dikirin, lê dema ji hev vediqetîyan, dijminatîya wan dest pê dikir. Celadet jî gazinan ji tunebûna yekîtîya kurdan û dijminahîya di navbera wan da dike.

Mehmed Uzun di *Hawara Dîcleyê* da ji devê Biroyê Dengbêj, gelek rexneyên civakî rêz dike. Pirsa wî jî bi "Çima?" dest pê dike. *"Çima ev deverên kevnare yên miqedes evçend bi kîn û nefretê dagirtî ne?"* [130] Uzun, bal dikêşe ser erda miqedes a Mezopotamya û kîn û nefreta li ser vê axê ku navbera erd û ezman dagirtîye. Vebêjê Mehmed Uzun, Biroyê Dengbêj, ketîye nav kûrahîya dîrokê ya kevnar û pirsa serdestî û bindestîyê dike. Mirovên bindest çawa dikarin ew qasî li hember hev bikîn, gir û edawet bin? Uzun ji devê Biroyê Dengbêj kul û keserên di dilê xwe da wek rexneyên civakî anîye zimên. Dengbêj Biro, di civaka kurdan da ji guhên şimakirî digazine û ji ber dijberîya li welêt da zêde bûye welat mîna warê kor û kerran dişayesîne.[131] Welatekî ku dengê wicdan û rehmê le nedihat bihîstin û şewata dilê kesî xuya nedibû. Li gor Biroyê Dengbêj, pêdivîyeke mezin bi gotinê ra hebû. Lewra kesî li hev guhdarî nedikir. Ên ku zanibûn, nedipeyivîn, ên nezan, dora peyvê nedidan kesî.

Di cildê *Hawara Dîcleyê II*an da Uzun, rewşa welêt a tevlihev û di nav şerên berberîyê da têkçûyî bi hevokên tije gilî û gazin, rexne dike. Li ser meseleya îxaneta Ezdînşêr a li hember Mîr Bedîrxan (1803-1868) ji devê vebêjê xwe Biroyê Dengbêj, rexneyeke eqrebetîya li ser xapandinê û berjewendîyan sazbûye dike. *"Welatê me weha bû; xalan xwarzê radikirin, apan, birazî winda dikirin û çaxa dewr û dewran diqulupîn û xwarzî û birazî dibûn xwedî gotin hingê wan tola xwe ji xal û apan hildidan."*[132] Altan Tan, derheqê meseleya îxanetê da weha dibêje: "Di dema serhildana Mîr Bedirxan Paşa (1806-1869) da Ezdîn Şêr bi Osmanîyan ra li hevkir û bû Mîrê Cizîrê. Demekê bi şûn da bi rêveberîyê ra kete îxtîlafê û (…) serîhilda; tevî bajarê Mêrdîn, Midyat, Nisêbîn, Bedlîs û Sêrtê ji di nav da herêmeke berfireh xiste bin hikimê xwe, lê serhildana Ezdîn Şêr a di 1854an jî wek ên din bi arîkarîya eşîrên

---

[129] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 305.
[130] Uzun, *Hawara Dîcleyê I*, r. 18.
[131] Uzun, *Hawara Dîcleyê I*, r. 281.
[132] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 217.

kurdan ên derdorê hate bidawîkirin." [133] Mehmed Uzun, nakokî û şerên berberîyê yên di nava eşîrên kurdan da ji alîyekî sîyasî ve jî dinirxîne û rexneya eşîrcivakî derdixe asta rexneyeke neteweyî. Perçiqandina di navbera du hikumdarîyên mezin wek Osmanîyan û farisan bi şerên nakokîyên eşîrîyê ve girê dide. [134]

Firat Cewerî di *Payiza Dereng* da bi rêya lehengê xwe Ferda xeyda di navbera ehil û eqrebeyan da rexne dike. Ferdayê ku bi vegera xwe ya ji Ewropayê wek xewneke nostaljîk bijî, di nava ehlên xwe da digere û li wan dibe mêvan, lê pê dihese ku hinek pismamên wî bi hinekan ra napeyivin. Ew jî wek ku mirov qaşilê birîneke kûr rake û wê xwîn bike, bêgavîya xwe ya li hember vê xeyd û berberîyê bi pirseke dijwar rexne dike. *"Ma ez ji ku zanim kî, bi kê re napeyive, kî ji kê xeyidî ye û berberîyên wan çi ne?"* [135] Ferda, tevî her tiştî welêt xweş dibîne, lê nexweşîyên welêt jî destnîşan dike. Yek ji van nexweşîyan jî birakujî ye.[136]

Helîm Yûsiv di romana *99 Morîkên Belavbûyî* da bi navgînîya vebêj-lehengê Azad, ji rewşa welêt gazinan dike û dibêje li welatê me kesekî bîyanî nikare jîyana xwe bi hêsênî bidomîne. Wek dupata vê yekê jî kuştina navxweyî nîşan dide. Azad, dibêje ma welatekî însanên wê hevûdin bixwin, dê xerîb û xûreba çawa dikaribin lê bijîn? [137]

Jan Dost di *Mijabad*ê da bi referansên dînî rexneyeke radîkal li serokeşîrên dike û ji devê sîyasetmedar Refîq Hilmî dibêje: *"Serokê eşîran herin bihuştê jî wê genî bikin. (...) Ew li ser mêrg û çîmenên herêmê li hev nakin, wê çawa li ser sîyasetê li hev bikin?"*[138] Sîyaset, hunera rêvebirina gelan e, mijarên wê kompleks in û gelek caran encax bi feraseteke kamil mirov dikare ji nav gerînekên wê derkeve. Mêrg û çîmen li kû, kabên sîyaseta dijwar li kû? Helbet ev rexne di peywenda Komara Mahabadê û dijberîya serokeşîran da hatîye kirin. Abbas Valî, derheqê têkilîya serokeşîran û şoreşê dibêje ku "Kurd di vê heyamê da piranî ji pêvajoya şoreşê dûr sekinîn û gelek belge dupat dikin ku kurd, dijberî şoreşê sekinîn. Serokên eşîrên

---

[133] Altan Tan, *Kürt Sorunu*, Timaş Yayınları, 8. Baskı, İstanbul, 2011, r. 94.
[134] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 401.
[135] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 182.
[136] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 229.
[137] Helîm Yûsiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, Peywend, Çapa Duyem, Îstanbul, 2018, r. 114.
[138] Jan Dost, *Mijabad*, r. 70.

kurdan li Azerbeycanê tevî hêzên neserkeftî yên dijşoreşê bûn û di teşebisên jîndarî û jinûve sazîya rejîma kevin da cih girtin." [139]

Eşirî, nasnameyeke bêmohr û îmze ye. Kesên mensûbê eşîrekê bin wek terefgîrê tîmeke fitbolê bêyî wê nasnameyê xwe lawaz hîs dikin. Ji ber vê yekê fanatîzmeke dijwar di hizira gîyanê eşîrîyê da heye. Di dawîyê da kesên eşîrperest, can û mal û milkên xwe heta zarokên xwe ji bo eşîrê xwe dikarin feda bikin. Jan Dost di *Mijabad*ê da bi awayekî îronîk vê haletî rûhîyeya fanatîzma eşîrîyê dişayesîne û neserkeftina Komara Mahabadê bi vê gîyana eşîrperwerîyê ve girê dide. Jan Dost, di nameyeke ji serlehengê romana Mijabad'ê Badînê Amêdî ra hatîye nivîsîn da ji devê Kerîmê Şikakî weha dibêje: *"Ez tevî hêzên herkî û şikakan bûme bêyî ku zanibim çima? Eşîrtî, di xwîna min de ye, were ya dawî ez eşîra xwe bi komarê tevî nadim."* [140] Helbet, tunebûna ruhê netewperwerîyê jî di vê meseleyê da giring e. Jan Dost di cihekî din ê romana *Mijabadê* da navê hin eşîran dide û bi giranî li ser eşîra şikakan disekine. Dost, ji devê vebêj-lehengê xwe Badînê Amêdî, rexneyên tund li tevgera wan a li hember Komara Mahabadê dike. Badînê Amêdî, diyar dike ku *"Hemî şikakî çûne warê xwe, tu dibêjî ev der bo wan warê kozê bû. (...) Ne komar û ne Kurdistan hîç di bala wan de nebûn."* [141] Li gor vebêjê Dost, şikakî ne di heyra Komara Mahabadê da bûn. Hatin û çûn. Mîna şivanên ku ji ber baranê xwe li kozekê bigirin û piştî baranê pişta xwe bidin kozê û biçin, şikakî çûn û Komar bêpişt hiştin. Jan Dost, eşîran ne tenê li hember ruhê netewetîyê wek pirsgirêkekê dibîne di heman demê da eşîr li gor wî li hember evînê jî rewşên aloz derdixin holê û carinan dibin astengî û derdikevin pêşberî evîn û evîndaran. Bi vî awayî eşîr, bihuştên evînê jî qirêj dikin. Jan Dost ji devê jineke bi navê Xedîceya Mihacir, çîroka wê ya xemgîn vedibêje û sersebeba negihaştina wê û evîndarê wê Amed, bi qurebûna eşîrîyê ve girê dide. Xedîce weha dibêje*:"Min digot qey eşîrtîya gemarî nikare derbasî bihuşta evînê bibe."* [142] Arîstokrasîya eşîrîyê -wek di vê meseleyê da jî dîyar e- di nava malbatan da hunkufîyekê nebîne, dikare li hember evîndaran derkeve û bibe sedemê veqetandina wan.

---

[139] Abbas, Vali, *Kurdistan Cumhurîyeti*, (Çev.) Zeri İnanç, Avesta, İstanbul, 2010, r. 25-26.
[140] Jan Dost, *Mijabad*, r. 185.
[141] Jan Dost, *Mijabad*, r. 225.
[142] Jan Dost, *Kobanî*, r. 117.

Jan Dost di romana *Kobanî*yê da dema behsa Metînê ku bûye gerîlla û derketîye serê çîyê dike, wek kesekî ji qeyd û bendên malbatî, eşîrtî û gundîtîyê rizgar bûbe wî dişayesîne. Bi vî rengî dîyar dike ku têkilîyên malbatî, gundîtî û eşîrî, girêdanên mîna qeyd û bendan in û mirov kengî ji wan xelas bibe dê wê demê azad bibe, ango azadîya heqîqî, rizgarîya giyanê mirov ji qeydên nirxên civakî ye. [143]

Bi perspektîfeke giştî di romana kurdî ya dîyasporayê da romannûsan mantalîteya eşîrî û şerên berberîyê rexne kirine. Romannûsên daxilî vê xebatê ne, eşîr ji alîyê tunebûna ruhê neteweyî ve rexne kirine û şerên wan î navxweyî wek sedemeke paşdemayîna gelê kurd nîşan dane. Li gor romanên ku çarçoveya vê tezê dîyar dikin, eşîrê kurdan bi awayekî girseyî li ser meseleyeke sîyasî konsensusek ava nekirine û tevgerên xwe nekirine yek. Serok eşîran xwe wek rêvebirên herêmî dîtine û di nava xwe da ketine pêşbazîya serokatîyeke giştî. Her eşîrê di şerên li hember dewletan da ji bo berjewendîyên xwe yên herêmî û serokeşîran jî ji bo manfaetên xwe yên şexsî arîkarîya hêzên dewletê kirine û pişt ra yan çekên wan ji dest wan hatine girtin an jî cihê wan hatine guhertin; carinan jî bi eşîrî çûne nefîyê. Ev şer û pevçûnên eşîrî wek mîrateyeke genetîk a civakî derbasî kodên malbatan jî bûne û gelek malbatên biçûk ji bo hin tiştên bêqîmet bo nimûne şerê kûçik û pisîkan, dizîya hêk û mirîşkan şûrê dijminatîyê kişandine û ev forma jîyanê ji nifşên nûhatî ra jî bûye kevneşopîyeke dijberî û nakokîyên berberîyê.

2.4. Xizanî

Aborî di jîyana kes û civakan da xwedî roloke sereke ye. Ji ewil heta axîr ve debara kurdan bi berhevkarî, nêçirvanî, ajalvanî û çandinîyê, bi dan û stendinê bûye. Kurd, miletekî xizan e. Piranî di karên zor û zehmet da jîyana xwe diborin. Bi sedan salan di bin zextên mîr, axa û began da piranîya wan nebûne xwedîyê erdên li ser dijîn. Hertim ji bo kesên erkdar xebitîne û ketine heyra rizqê xwe yê rojane. Karê çandinîyê ji wan ra bûye angarya. Ji ber vê yekê gelek ji wan, xwe li çîya û zozanan girtine û debara xwe bi ajalvanîyê kirine. “Bi rastî jî Kurdistan welatê ajalvanîyê ye. Ji mîh, bizin, çêlek û gamêşan; şîr, rûnê nivîşk, penêr, çerm, post, rêvî û qiloç tê

[143] Jan Dost, *Kobanî*, r. 153.

hilberîn. Çerm û hirî, di çêkirina cil û berg, çarox û kulavan da tê bikaranîn û dahatûyeke aborî pêk tîne."[144]

Şivantî di nava kurdan da pir berbelav e. Kesên ku şivantîya pezên xwe dikin xwedî siûd hatine hesibandin. Ên bêsiûd jî şivantîya xelkê kirine. Dan û stendina kurdan jî li ser ajalvanîyê bi pêş ketîye. Dan û stendina alavên tîcarî di nav kurdan da ji berê da heye. Martin Van Bruinessen dibêje: "Li nahîyeyên Kurdistanê hertim heta radeyekê tîcaret hatîye kirin. Dîyarbekir, Bedlîs, Van, Erbîl, Mûsil, Sanandaj û gelek deverên dîtir bûne navenda dan û stendinê."[145] Meseleya danûstendinê ji demên qedîm ve qedera civakan tayîn kirîye.

Civakên debara wan li ser zîreatê ne bêtir bi nirxên civakê ve girêdayî ne û wek civakên zîreatê têne pênasekirin. Di van cure civakan da malbat û di nava pergala malbatê da mezinahî, jin û mêrtî, nirxên exlaqî heta girêdana bi dîn û bawerîyê ji civakên bajarî bêtir tê bilindkirin. Di pergala civakên bajarî an jî civakên endustrîyê da wek ferd girêdana bi malbatan di asteke nizm da ye. Jîyana takekesî tê tercîhkirin û her kesek ji xwe û siberoja xwe berpirsyar e. Nirxên exlaqî û civakî ne zêde li ser bala kesî ne. Girêdana dîn û bawerîyê li gor civakên zîreatê qels in.

Pergala axatî û eşîrîyê nehiştîye bazirganî di civaka kurdan da zêde pêş ve biçe. Lewra erd û erezî yên axayan in û gundî, bi nanozikotî li ser van erdan dixebitin. Dîsa pez, ên axayan in û gundî encax ji vî pezî ra şivantîyê dikin. Di van mercên koletîyê da îhtîmala pêşveçûna bazirganîyê li nava kurdan nepêkan e. Encax bi belavbûna pergala eşîrtî û axatîyê û bi saya reformên axê ku gundî hindik be jî bûne xwedî erd û erezî, tovên tîcaretê li nava kurdan zîl dane.

Kurdên li nav Tirkîyeyê ji ber bacên giran ên dema Osmanîyan oşur û axnam û hwd ne di halekî çê da ne. Jixwe erdên wan ne erdên berfireh in û bi ser da jî dema oşurçî dihatin û olçekên xwe li ceh, genim û nîskên gundîyan dixistin êdî tu kar ji wî zadî nedihat.

Şerên Osmanîyan û dewletên din ên sedsala 18 û 19an kurd xistine nava xizanîyeke domdar. Serhildanên dema Komara Tirkîyeya ciwan, nêrîna dewletê ya neyênî li herêmê û bi ser da jî krîza aborî ya navnetewî a sala 1929an kurd ji alîyê

---

[144] Vladimir Minorsky, Thomas Bois, *Kürt Milliyetçiliği*, Wer. Kolektîf, Örgün Yay., İst., 2008, r. 98.
[145] Martin Van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet,* Wer. Banu Yalkut, İletişim Yay., İstanbul, 2010, r.36.

xizanîyê ve bêzar kirine. "Ji sala 1912an û vir ve Anatolya di ber şerên silsileyî yên texrîbkar da mabû. Şerên Balkanan (1912-1913) û dijminatîya Cenga Cîhanê ya Yekem (1914-1918) û Şerê Îstîqlalê (1920-1922) bi xwe ra hilweşîn û mirin û encamên demografîk ên civakî û aborî ku wê demeke dirêj bi bandor bin derxistibû holê."[146]

Di romana kurdî ya dîyasporayê da -di tevna romanên civakî û dîrokî da- cihê belengazîya gundîyan bi tabloyên trajîk cih digire. Mahmut Baksi di *Gundikê Dono* da behsa xwarinên di koşka Hecî Zorav da dipijin, dike û dîmenên zarokên birçî ku li ber beroşên goşt û avdonkê ava devê wan diçe li ber çavên xwîneran mîna kamerayekê radixe. Baksi ji devê vebêjê xwe dibêje ku *"Zarokan jî weke pisîk û kûçikên gundikê Dono gepa devê hev direvand."* [147]

Mehmed Uzun di *Mirina Kalekî Rind* da xizanîyê mîna enînivîsekê dinirxîne û ji devê gundîyekî ve rexneya vê xizanîyê weha dike: *"Em feqîr hatine dinê, em ê feqîr ji herin. Ev rast e."* [148] Ev gotin di heman demê da derheqê neguherîna rewşa xizanîyê jî qene'eteke reşbînî dihewîne. Kurdên ku suxreyên axa û began dikin û ji bo dewlemendîya wan dixebitin, ne xwedîyê mal û milkan in û di hilberînê da mafên wan ê dan û sitendinê tune ye ku ji xizanîyê rizgar bibin.

Mehmed Uzun, di *Siya Evînê* da bi rêya vebêjê xwe derheqê jîyana serlehengê romanê Memduh Selîm Begê da hûrgilîyên tabloyeke feqîrîyê kite bi kite rêz dike. Mirovekî wek Memduh Selîm Begê ronakbîr, aktivîst û şoreşgerê gelê xwe û ev tabloya xizanîyê li hev nayê. Jixwe rexneya nixumandî ya vê dîmenê jî ev e. Xem û xeyalên mîna gîharan bilind û xizanîyeke di nava "çend libên zeytûn û du serî pênêr" da asê maye, qedera kurdên sîyasetmedar ên derengmayî ye.[149] Uzun, di rûpelên din ên *Siya Evînê* da dîsa behsa xizanîyê dike. Tunebûna îmkan û pereyan û feqîrî û belengazîya mirovan cardin derdixe ser dika romana xwe û vê xizanîya ku jîyana kurdan hertim dramatîze dike bi awayekî vekirî ji devê Memdûh Selîm Begê rexne dike. *"Em merivên feqîr û belengaz in. Me ne îmkan û ne jî pere hene. Û me*

---

[146] Roger Owen, Şevket Pamuk, *20. Yüzyılda Ortadoğu Ekonomileri Tarihi*, (Çev.) Ayşe Edirne, Sbancı Üniv., Birinci Basım, İstanbul, 2002, r. 19-20.
[147] Baksi, *Gundikê Dono*, 60-61.
[148] Uzun, *Mirina Kalekî Rind*, r. 88.
[149] Mehmed Uzun, *Siya Evînê*, Îthakî, Çapa Pencan, Îstanbul, 2005, r. 129.

şîn girêdaye. Welatê me di nav agir de dişewite, em tên kuştin, xelk xwîn digirî."[150] Mehmed Uzun, karakterê xwe yê romana *Siya Evînê* ku di heman demê da karakterekî rasteqîn e (Memduh Selîm Beg 1880-1976) ew qasî di nava xizanîyeke mezin da resim dike ku di herikîna bûyeran da mirov dibîne ku kitêbeke pêdivîya xwendina wî pê ra heye û ji bêperetîyê nikare vê kitêbê bistîne talîyê mecbûr dimîne û didize. Vebêjê Uzun, vê sehneyê weha vedibêje: *"Osmanlı Alemi- İctimaiyesinde Çerkes Kadınları" (...) Kitêbeke biçûk li ser jinên miletekî biçûk. Kîtabokeke balkêş. Lê Memdûh Selîm Beg, pere tune ku wê bikire. Bêgavî. Dermanê bêgavîyê; dizî. Bi hêdîka. Bihezr û dîqet."*[151] Entelektuelekî şoreşger ê ku ji bêperetîyê mecbûr bimîne kitêbekê bidize, rexneyeke sergirtî ye ji bo civakê.

Mehmed Uzun, rexneyên xizanîyê di romana *Bîra Qederê* da didomîne. Vê carê li ser tevna vegotinê neqşejîyana Mîr Celadat Bedirxanê ku ewropayî wî, wek "Prens Jeladet" binavdikin heye. Prensê ku heft heşt zimanan dizane û tena serê xwe kovara Hawarê derdixe û gelek caran ji bo cerîdeya xwe mecbûrî arîkarîya heval û dostên wek Haco Axa (?-1940) dibe, dibêje ku lawê min Cemşîd, dixwest ez ji wî ra duçerxekê bikirim lê rasterast newêribû daxwaza dilê xwe bibêje û behsa rewşa aborîya malbata xwe dikir. *"Ma mirin jê ne çêtir bû?"*[152] Rexne, carinan bi kişandin û nîşandana fotografekî bêtir bandorê li ser mirovan dike.

Firat Cewerî di *Payiza Dereng* da bal dikêşe ser xizanîya welat, belengazîya xelkê û li ber vê rewşê dikeve. Cewerî ji devê Ferda dibêje: *"Xwezî ev bajar bi tenê di xeyal û fantaziyên min de bimaya û min ew bi vê belengaziyê nedîta."* [153] Dibe ku di vê werqilandina xizanî û belengazîya welat da tecrubeya dîtina welatên Ewropayê jî hebe. Lewra heta mirov ji warê xwe dernekeve û cih û deverên din nebîne, mirov dibêje qey dinya gundê min e û ji wê û pê ve tiştek tuneye, lê dema asoya mirov fireh dibe êdî mirov çêtir têdigihêje û dikare miqayeseyên bimentiq bike.

Di romana *Ez ê Yekî Bikujim* da Cewerî, bal dikêşe ser rewşa esnafan û wan bi guvaşa psîkolojîk a dan û stendinê ku li ser mirovan ferz dikin, rexne dike.

---

[150] Uzun, *Siya Evînê*, r. 132.
[151] Uzun, *Siya Evînê*, r. 156.
[152] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 298.
[153] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 172.

Cewerî, ji devê lehengê romanê Temo dibêje ku esnaf qelebalixê dikin û tu nemaye bi darê zorê bi milên mirovan bigirin û wan bikişînin hundirê dikanên xwe.[154] Temo, vî halê esnafan napejirîne û ji bo bidestxistina pereyên zêdetir vê miameleya nebaş, layiqî mirovan nabîne.

Helîm Yûsiv di *Sobarto*yê da tunebûna îmkanên karê baş, bi axîneke kûr bilêv dike û ji devê birayê Misto ku ,welat terk kirîye û welatê Sobartoyê heta qirikê di nava pirikê da dibîne, rexneyeke tunebûna îstîhdamê û aborîya xirab bi me dide ragihandin. Birayê Misto, di nava konforeke biewlehî da weha dibêje: *"Ez ê bêm Sobartoyê çi bikim, ha? Ez ê pûş ji çola bidim hev? Ez ê kerpîçan çêkim? An hêkan bifiroşim, mast bifiroşim? An li kolanan û gundan solan bifiroşim?*[155] Ev gotin, kurte sedemên derketina kurdan a dîyasporayê baş îzeh dikin.

Helîm Yûsiv di *Sobarto*yê da behsa bavekî ku temenê xwe di rênçberî û emeletîyê da derbas kirîye dike. Bavê ku ji xelkê ra xanîyan çê dike lê ew û zarokên xwe di xanîyekî bimar û dûpişk da ne dijîn. Bi kesayeta vî bavî, Helîm Yûsiv; rexneya bûrjûwazîyê dike û fedîya zarokekî ji karê bavê wî û dibe ku ji bavê wî li ber me radixe û bi vê dîmena tijî nakokîya çînî, rexneyekê li xizanîyê dike. [156]

Yûsiv, di *Sobarto*yê da bi navgînîya jineke mamoste, derheqê zewacê û xizanîyê da rexneya xwe tîne zimên û dibêje ez qîza xwe nadim feqîrekî. Dema mirov xizan be, zewac jî dibe xeyaleke pûç. Ev rexneya Helîm Yûsiv, mixabin hîn jî ji bo civaka kurdan derbasdar e. Gelek kes, naxwazin keçên xwe bidin malbatên feqîr. Dewlemendîya mala zavayan ji bo xinamîyan hertim wek serbilindîyekê tê dîtin. [157]

Jan Dost, di meseleya feqîrî û zewacê da di *Mîrname*yê da rexneyekê li civakê dike û zewacê ji alîyê feqîran ve wek arîşeyekê destnîşan dike. Lehengekî romanê bi navê Hecî Zuhdiyê bazirgan ku li gor tevna romanê Ehmedê Xanî evîndarê keça wî Şengê ye ji bo qîmeta dewlemendîyê destnîşan bike û nirxê karê

---

[154] Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim*, r. 35.
[155] Yûsiv, *Sobarto*, r. 121.
[156] Yûsiv, *Sobarto*, r. 58.
[157] Yûsiv, *Sobarto*, r. 97.

Ehmedê Xanî yê îlîm û îrfanê daxe weha dibêje: *"Qencîya rast çingîniya florî û aqçeyan û dînar û diravan e, ne xiştexişta kaxezan û sîrkesîrka qelaman li ser wan e."*[158] Li gor vebêjê Jan Dost kes naxwaze keçên xwe bide feqîran. Dost, qîmeta nirxên civakî jî ji alîyê erozyona exlaqî ve rexne dike û dibêje pereyên te tunebe di nezera vê civakê da tu ne tiştek e, tevî ku ew kes alimekî mezin be jî tunebûna pereyan, qîmetê ji îlîm û îrfanê ra nahêle. Dost, bi mixabinîyeke nixumandî hikumdarîya pere û pûlan ku însan bi rastî jî kirine koleyên girêdayî li ber çavan radixe. Jan Dost di romana *Kobanî*yê da jî li ser meseleya xizanîyê disekine û mercên niştecihên Kobanîyê û belengazîya wan ji devê lehengê romanê Hec(î) Mislim, bi gilî û gazin tîne zimên. *"Em di van konan de genî dibin ji kûlikê nikanin çavî xwe vekin. Parî em dixûn gî gûye haşê we."* [159] Jan Dost di dema modern da jîyana di konan û zehmetîyên vê jîyanê, bi hêrsbûna bavekî di bin barê jîyanê da eciqîye, bi şayeseke realîst dide ragihandin.

Di romanên dîyasporayê da bi gelek boneyan rexneya xizanî û belengazîya gelê kurd tê bilêvkirin û romannûs, mercên giran ê gundîyan, qurebûna dewlemendan a li hember kesên xizan, dîmenên jîyana xizanîya kesên giregir û berevajîyê vê rastîya civakê aramî û rehetîya kesên dewlemend, wek nakokîyeke çînî di romanên xwe da li nava rêzebûyeran belav dikin. Ev şayes, tenê wek kişandina fotoyan têne nîşandan û carinan li ser sedemên wan tê sekinandin, lê tu reçete ji bo çarenûsa vê pirsgirêka nebaşîya aborîyê nayê nivîsîn. Jixwe reçetenûsî ne karê romannûsan e. Di romanên bitez ango civakî da teşxîsa hin meseleyên civakî hebin jî tedawî karekî cuda ye.

2.5. Hesûdî / Fesadî / Sîxurî

Di romana dîyasporayê da hesûdî, çavnebarî, fesadî, gelacî û sîxurî gelek caran hatine rexnekirin. Di hin bûyerên dîrokî û sîyasî da sîxurî bûye sedema têkçûyîna serhildanan an jî hilweşîna komaran. Jixwe wek arîşeyeke kesayetîyê di gelek romanan da hatîye rexnekirin. Hesûdî, fesadî û sîxurî wek sedemên tunebûna yekîtîya kurdan hatîye destnîşankirin.

---

[158] Dost, *Mîrname*, r. 54.
[159] Jan Dost, *Kobanî*, r. 356.

Mahmut Baksi di *Gundikê Dono* da ji devê gundîyekî bi navê Zibêr, bi awayekî aşkera etaran wek sîxurê dewletê dide nasîn û sîxurîya helawfiroşên Sêrtê ku piştî şerê Mala Elîyê Ûnis li herêmê belav bûbû rexne dike.[160] Baksi, bi navgînîya vebêjê xwe hawirdora Sasonê tijî sîxur û mixbîr dişayesîne û wan wek berjewendîperest pênase dike. Dîsa li ser etar û sefaran disekine û van kesan bi sîxurîyê tewanbar dike.[161] Li gor vebêjê Baksi, civaka kurdan van xayinên di nava xwe da baş nasdikir. Ew xayîn jî dîsa ji kurdan bûn. Ango kurmê darê dîsa ji darê bû.

Baksi, diyar dike ku carinan kesên peywirên mihim îşxal dikirin jî -wek midûr hwd- di nava vê pergala qirêjî ya sîxurîyê da cih digirtin. Li gor vebêjê Baksi ev kes, raporan ji dezgehên dewletên ra dinivîsin û bi raporên xwe dibin sedema şewitandina gundan, dijmintîya qewmê xwe dikin û qewmê xwe dixin dahfikan. Vebêjê Baksi vê rewşê weha rexne dike: *"Cemîl Beg, bi salên dirêj li gelek deverên warê Xerzan midûrê nehîyeyê bû. (...)Bertîlxwirekî bi nav û deng bû.*[162] Vebêjê Baksi, bi gotinên tije tewanbarî rexneyên xwe didomîne û bêzarîya gundîyan a ji gilî û sîxurîyê û bertîlxwarinê weha tîne zimên: *"Di her gundî de çend mixbîrên Cimhûrîyetê hebûn. Ango li warê Xerzan çi dibû hikûmet jê haydar bû."* [163] Dema bûyerek biqewimîya jî kesên sûcdar û yên bêguneh tev da diketin heman çalê.

Firat Cewerî, di *Payiza Dereng* da ji devê kesekî ku di romanê da wek mêvan dihate nasandin û li civateke gundîyan axaftineke propagandayî dikir, têkilîya bertîlên dewletê û amadebûna mirovan a ji sîxurîyê ra rexne dike û dibêje: *"A niha hûn zanibin wê dewlet çend quruşan bide we hûn ê bavê xwe bidin dest.* [164] Vebêjê Cewerî, vê rewşê wek rengvedana sîyaseta dewletê ya li van derdoran tê meşandin dişayesîne. Li gor wî, dewlet, hin kesan bi pereyan dixapîne û ew kes jî sîxurîyê civak û qewmê xwe dikin.

Helîm Yûsiv di romanên xwe da gelek caran behsa tirsa mixabiratê ku di dilê mirovan da zîldaye dike. Di romana *99 Morîkên Belavbûyî* da jî vê tirsê bi rêya vebêjê xwe tîne zimên û rexne dike. *"Endamekî hêzeke mixabiratan dikarîbû*

---

[160] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 73.
[161] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 43.
[162] Baksi, *Serhildana Mala Elîyê Ûnis*, r. 58.
[163] Baksi, *Serhildana Mala Elîyê Ûnis*, r. 70.
[164] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 280.

bajarekî bi hemû xelkên wî ve têxîne fikarê û wan rehet nehêle." [165] Mebesta fikaran, helbet tirsa ji kiryarên mixabiratê ye.

Jan Dost di *3 gav û 3darek*ê da dema Şêx Seîd mirîdekî xwe dişîne cem Seyîd Riza dîyalogekê lidardixe di wê dîyaolgê da ji devê mirîdekî, rexneya sîxuran dike. *"Çem û newal di rê de hene ji wan bêtir sîxurên hikûmeta gawiran jî hene ezbenî."*[166] Di heman romanê da rexneyeke Bînbaşi Qasim (Qasimê Silêman) û sîxurîya wî ku bûye sedema dîlgirtina Şêx Seîd û têkçûna vê serhildanê jî heye. Li gor lehengê romanê Şêx Seîd, rûyê Bînbaşi Qasim ji bo tûkirinê jî ne biqîmet e. Heyfa tûkê ye ku li ser çavê wî bikeve.[167] Ayşe Hür, îxaneta Bînbaşi Qasim bi van hevokan tîne zimên: "Şêx Seîd û rêhevalên wî ji alîyê sîxûrê rêxistina Azadî ya Enqerê Bînbaşi Qasım Begê ve di 14ê nîsanê da hatin zeftkirin û teslîmî hikûmetê bûn, serhildan bi dawî bû."[168] Şêx Seîd, ji ber sîxurîya Bînbaşi Qasım Beg, lanetê li wî dibarîne û dibêje ku *"Hezar zêrê serpereyê ku tu bistînî xerc dibin Qasim Beg (Bînbaşî Qaso) Xerc dibin. Lê lanetên neviyan kengî diqedin?"* [169] Ev rexneyeke tîr e ku ji kûrahîya dîrokê dizê û heta roja me wek mîrateyekê ji nifşekî derbasî nifşê din dibe.

Jan Dost di romana *Kobanî*yê da jî behsa sîxûran dike û rewşa gelê kurd a di nava sîxuran da maye bi navgînîya vebêjê xwe rexne dike. Komareke sînorên wê bi xwîna kurdan û werîsê sêdaran tayîn bûbe û mirov nikaribe ji ber tirsa sîxûr û ewanan li gor daxwaza dilê xwe tevbigere,[170] ev yek nakokîyeke dijwar e.

Romannûsên bakur, piranî ji alîyê civakî ve nêzî meseleya fesadî û gelacîya di nava gal da bûne lê carcaran alîyê sîyasî yê vê meseleyê ji rexneyên xwe ra kirine armanc. Exlebê romannûsên başûr û rojava ji alîyê sîyasî ve nêzî meseleyê bûne û rexneyên tund li mixabiratên Sûrîye û Îraqê kirine. Tirsa mixabiratan ku li nav xelkê deverê belavbûye, ew bêzar kirine û jîyan li ber xelkê herimandîye. Bi qasî ku tê

---

[165] Yûsiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, Peywend, Çapa Duyem, Îstanbûl, 2018, r. 121.
[166] Jan Dost, *3 gav û 3darek*, Avesta, Stenbol, 2007 r. 166.
[167] Jan Dost, *3 gav û 3darek*, r. 200.
[168] Ayşe Hür, *Öteki Tarih II*, Profil, İstanbul, 2013, r. 337.
[169] Jan Dost, *3 gav û 3darek*, r. 200.
[170] Jan Dost, *Kobanî*, r. 27.

şayesandin kiryarên mixabiratan ên nehiqûqî, bûye sedema reva gelek kurdan a Ewropayê û wek sedemeke bingehîn di geşbûna dîyasporaya kurdî da rol lîstîye.

2.6. Rexneya li Însan

2.6.1. Însan

Însan, hêmana romanê ya herî giring e. Ya rasttir însan, gîyanê jîyanê ye. Heger însan tunebûya dê tu wateya kaînatê jî tunebûya. Xweza, erd û ezman, heyv û tav û stêrk û bi hezaran heyînên din bi hebûna însan dibin xwedî maneyeke ontolojîk. "Civaka berê li ser hebûnên wek malbat, dêr, lonca, navçe an sazîyeke kolektîf bala dibû niha takekes ketîye şûna wan. Însan bi xwe bûye mijara edebîyatê."[171]

Însan bi alîyê xwe yê mixalif di edebîyatê da dibe navenda pevçûn û minaqeşeyan. Erich Fromm (1900-1980) (îdîa dike ku dîroka însan bi mixalefet û bêîteatîyê dest pê dike û dawîya însan dê bi windakirina vê bêîteatîyê bê.[172] Însan, li gor *"Qur'ana Kerîm"* eşrefî mexlûqat e (Îsra, ayet 70). Ev mexlûqê bişeref, gelek caran şerê hemcinsên xwe dike, pevçûnan derdixe, hesûdî û dilxirabîyê dike, derewan saz dike, qetil û qitûlê belav dike, li dewlemendîya mezin digere û xwe di nava gerînekên hêrs û inyatê da dibîne, carinan jî ji bo bidestxistina desthilatdarîyê, rêhevaltîya neyaran jî dikare bike. Bi qewlê Erich Fromm însan mixalif e. Çîroka însan bi qasî çîrokeke bîyolojîk e ew qasî jî çîrokeke felsefî nemaze ontolojîk û epîstemolojîk e, piçek jî estetîk e. Ev meyla estetîkê jî di şaxên hunerê da derdikeve pêşberî me.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da gelek rexne li însan hatine kirin. Ev rexne piranî li kesayeta însan û alîyê wî yên felsefî kom bûne. Mehmed Uzun di *Mirina Kalekî Rind* da bi şêwaza Dostoyevskî diaxive û gunehê xwe bi însanan tîne. Lehengê Uzun, Kalê Rind; însanan biçûk û reben dibîne û bi ser da jî mirovan derheqê nixumandina rebentîya wan û bi vî awayî xapandina mirovên din tewanbar dike.[173]

---

[171] Ian Watt, *Romanın Yükselişi*, Metis, 2007, r. 20.
[172] Erich Fromm, *Sivil İteatsizlik Üzerine*, (Çev.) Ayşe Sayın, Kariyer Yay., İstanbul, 2001, s. 8-9.
[173] Uzun, *Mirina Kalekî Rind*, r. 111.

Mehmed Uzun di *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* da ji devê Rênas ji Kevokê ra weha dibêje: *"Dijminê herî dijwar ne tebîyet e, însan e, ji bîr meke, însan dijminê herî dijwar e."* [174] Di konteksa romanê da dijminatîyeke di navbera gelan da heye û kesên hevûdin wek takekes nasnakin, li hember hevûdin disekinin û bêyî ku bizanibin fîşekên berdidin, dê li kê keve ne dîyar e û ne mihim e, bi sîlehan bera hevûdin didin. Ya giranbuha mirina yekî ye. Çima mirina kesekî ew qasî bi qîmet e, çima hebûna însan li ser mirina hinekan tê avakirin? Ev pirsên dijwar, di nava gotina dijwari û dijminatîya însan da wek bersivekê disekinin. Mehmed Uzun di *Hawara Dîcleyê* da jî însan ji alîyê xisûsîyetên takekesî ve ji devê vebêj-lehengê xwe Dengbêj Biro, rexne dike û hin alîyên din ên nebaş li ber me radixe. *"İnsan, eynî însan bû, do jî îro jî dexes, çikos, xiniz, hesûd, çavnebar, duru, fesad, pozbilind, jixwerazî, qure û dijmin."* [175] Li gor vebêjê Uzun, însan texrîbkarê însanîyetê ye.

Mehmed Uzun ji alîyê epîstemolojîk ve jî însan rexne dike. Qîmetnedayîna xwendinê û nêrîna neyênî ya mirovan li hember îlîm, îrfan û kitêban, bi xizanîya însan ve girê dide. Uzun ji devê Dengbêj Biro, dema behsa kitêbxaneya Mam Sefo û kitêbxaneya Medresa Sor dike, weha dibêje: *"Kê dîtibû ku kitaban zikê însanan têr dikir? (...)Ji bo însanê me kîloyeke goştê berxan ji deh kitabxanan çêtir bû."* [176] Lewra mirovekî zikê wî birçî, nakeve heyra têrkirina mejîyê xwe. Tê zanîn ku hîyerarşîyeke pêdivîyan heye û divê berîya her tiştî zikê mirov têr bibe da ku mirov pêdivîya kitêban hîs bike û li pey îlîm û îrfanê bibeze.

Firat Cewerî di *Payiza Dereng* da ji devê Ferda ji însanên rîyakar û sextekar gilî û gazinan dike û dibêje ku civaka xwedî arîşe, însanan ji însanîyêtê bi dûr dixe û lê zêde dike: *"Ew xanîyê ku min bi tibabek pere kirîbû yekî sextekar ew firotibû sê kesan."* [177] Li gor lehengê Cewerî civak, têra xwe di nava alozîyan da xeniqîye. Bi ser da jî sextekarîya esnafan, mirovan ji jîyanê sar dike. Lehengê Cewerî, bi vê nimûneya sextekarîyê, mafdarîyê rexneya xwe dupat dike. Firat Cewerî, dîsa di heman romana xwe da bi rêya Ferda gazinan ji civakê dike. Ferda dibêje ku di

---

[174] Uzun, *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê*, Îthakî, Çapa Çarem, Îstanbul, 2015, r. 221.
[175] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 47.
[176] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 63.
[177] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 50.

ciwantîya min da mirov henûn bûn û malbata min qîmetek mezin dida min lê niha nirov guherîne.[178] Ev hestên dîyasporayê di gelek romanên Cewerî da cih digirin. Kesên ku ji dîyasporayê vedigerin bi eşq û şewqeke mezin vedigerin lê bi guhertina gund an bajêr û guhertina însanan ra lê verdiqilên ku ew demên berê, xewnek bû, çû û nema tê lewra tu tiştek ne wek xwe ye, Cewerî, ji devê Ferda dibêje *"Binêre, dem ne dema berê, welat ne welatê berê, însan ne însanê berê, bajar ne bajarê berê ye."* [179]

Firat Cewerî, rexneyên xwe yên derbarê guhertina mirovan da di romana *Lehî*yê da jî didomîne. Lehengê Cewerî Temo, weha dibêje: *"Dilê min tije girr bûbû. Ez ê li derve nesitiriyama. Min dixwest ez ber bi girtîgehê vegerim, vegerim ba hevalên xwe ên dilsoz ku ji bo van mirovên nankor di hundir de bûn."* [180] Kesên ku ji bo gelên xwe berdêlên mezin dane û dema vedigerin nav civakê û dibînin ku tu qîmeta vê ked û kesbê li ba civakê tune ye, xwe bêçare hîs dikin, civakê û însanan jî nankor dibînin. Cewerî; van hestan ji devê Temoyê ku li hucreyeke teng li xwe digere, di nava monologeke dirêj da weha tîne ziman: *"Çima şêniyên bajêr bi guhertina bajêr re hatibûn guherin û qîmet nedidan keda min ya fedakar?"* [181]

Firat Cewerî di romana *Ez ê Yekî Bikujim* da durûtîya însan rexne dike û ji devê Temo dibêje ku xelk rîyakar in û ji bo berjewendîyên xwe paşê xwe didin rastîyê û teslîmî neheqîyê dibin. Ew kesên ku destê xwe li ber serokekî didin ser hev gava yek wî serokî bikûje dê yên mayî bibêjin em jê xilas bûn.[182] Firat Cewerî, însan ji alîyê ontolojîk ve wek heyîneke menfaetperest nîşan dide. Tevî ku di zahirî da însan xwe dilovan û rêzdar nîşan didin lê di derûnîya wan da li gor Cewerî, hizrên cihêreng kon vedane.

Hesenê Metê di *Tofanê* da rexneyeke navdemî dike û însanên îro bi însanên dema Ehmedê Xanî ra miqayese dike. Gelacî û fesadîya însanên vê demê, li gor ewantîya Beko di asteke bilind da dibîne û ji devê lehengê bi navê Delyanê Lawê Bozanê Memborî, vê rexneyê dike: "*Beko li vir bûya, hay ji rewşa îro hebûya, (...)*

---

[178] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 61.
[179] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 209.
[180] Firat Cewerî, *Lehî*, Avesta, Çapa duyem, Stembol, 2014, r. 135.
[181] Cewerî, *Lehî*, r. 162.
[182] Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim*, r. 25.

ew ê bi dilverişîn li xwe mikur bihata û bigota: Ez ji gelac û şalûsên îro re şekalan rast dikim." [183] Bi van gotinan Metê, asta fesadî û gelacîya civakê şênber dike.

Hesenê Metê, di *Gotinên Gunehkar* da di navbera Xweda û Ahrîman (Şeytan) da dîyalogekê saz dike û însan di warê nezanîya sînorên ontolojîk da rexne dike. Metê, di vê dîyalogê da ji devê Ahrîman ji Xweda ra weha dibêje: *"Dema ku mezinî têkeve nava du ruhan ew ê bibe sedema nerihetiyê, ew ê bibe sedema xerabiyê."* [184] Jixwe nakokîya di navbera Xwedê û şeytan da destpêkir jî ev bû. Şeytanê ku cewhera wî ji agir bû, secdekirina li hember Adem nepejirand ku cewhera Adem ji axê bû. Îlhama wê pevçûna qedîm, îro di nava însanan da olan dide.

Hesenê Metê di novela bi navê *Li Dêrê* da ji devê Bilind Zaxoyî ku serborîya xwe ji nivîskar ra vedibêje rexneya kuştina însan, bi destê însan dike. Metê, bi vê rexneyê serê pênûsa xwe digihîne Xwedê jî û meseleyê ji alîyê metafîzîkê ve nîqaş dike. Bilind Zaxoyî weha dibêje: *"Mirina meriv ne tenê bi destê Xwedê ye… Min mêze kir ku herkes dikane mirinê bîne ber deriyan."* [185] Însan ku wek berhemeke bi destê Xweda hatîye afirandin tê qebûlkirin, çima dîsa ji alîyê berhemeke Xweda tê kuştin û ji holê rakirin, çima eşrefî mexlûqatên Xweda, serê hev dixwin? Ev hemû pirs ji vê rexneya Hesenê Metê dipengizin.

Helîm Yûsiv di *Tirsa bê Diran* da rexneyeke bîyolojîk û heta ontolojîk li însan dike û alîyê însan ê ku wî nêzî heywanan dike derdixe pêş û ji devê pîra lehengê xwe Musayê Qamişlokî ku ditirse terîya wî çêbibe weha dibêje: *"Mirov jî gava birçî dibin tiştan dixwin, gava tişt namînin hevdû dixwin."* [186] Zincîreke xwarinê ya ji xurt û qelewan dest pê dike û ber bi qels û lawazan ve diçe. Helîm Yûsiv, rexneya însan, bi rexneyeke birçîbûnê diperçinîne û bêbextîya birçîbûnê wek sedema bingehîn a vî alîyê însan ê hov nîşan dide.

---

[183] Hesenê Metê, *Tofan,* Avesta, Stenbol, 2006, r. 52.
[184] Hesenê Metê, *Gotinên Gunehkar*, r. 118.
[185] Hesenê Metê, *Li Dêrê*, Peywend, Çapa Duyem, Îstanbul, 2015, r. 36.
[186] Helîm Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, Avesta, Çapa Yekem, Stenbol, 2006, r. 29.

Însan, di romana kurdî ya dîyasporayê da bi alîyê xwe yên wek xizanî, fesadî, durûtî, kujerî, nezanî, nankorî û ezezîyê hatîye rexnekirin. Însan, piranî jî di warê kiryarên li hember hemcinsê xwe dike, bi awayekî tundî hatîye rexnekirin lewra tu heywan jî zerarê nagihînin hemcinsê xwe.

2.6.2. Mêr

Civaka kurdan li ser hîmê eşîrîyê ava bûye û heta roja me ji vê pergala pederşahî bi giştî xelas nebûye. Mêr û mêranî di vê civakê da dîyardeyeke giring e. Mêr serokeşîr in, axa ne, beg in, mixtar in, şêx û mela ne. Di malbata kurdan da mêr sermîyan in. Gotina dawî, piranî ya wan e. Li gor mafê şerîetê ku daye wan heger bixwazin dikarin heta çar jinan bînin. Di meseleyên mihim da dikarin tena serê xwe derheqê jîyana kufletên xwe da biryarên giring bigirin û van birayaran tetbîq bikin.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da mêr bi tundî hatine rexnekirin. Mahmut Baksi di *Hêlîn*ê da nêrîna civakê ya li ser esasê mêranîyê ava bûye û qîmetnedayîna keç û jinan bi zimanekî îronîk ji devê Hêlînê weha rexne dike: *"Ez û birayê xwe di zikê dadê de mezin dibûn. Birayê min tim neheqî li min dikir û pihîn li min dixistin. Nedihişt ku ez xwarinê bixwim."* [187] Li gor Helînê, neheqîya bi destê mêran a ku li jinan dibe, hîn di zikê dayikê da dest pê dike. Bandora vê feraseta civakê ya ku li ser zarokên keç dike jî bi axaftinên tijî sosret li ber çavan radixe. Baksi, di heman romanê da bi rêya karaktera romanê ya zarok Helînê, rexneyên giran li malbatê û nêrîna malbatan a li hember keç û jinan dike. *"Bêlê navê min danîn Hêlîn. Ez ê jî wekî çivîkan li ser hêlîna xwe rûnêm. Zarokan çê bikim, li wan mêze bikim, gûyê wan paqij bikim û ez ê tu carî bi dilê xwe nikaribim zewacê bikim. Ev tişt karê bavo ye, ev tişt heqê pismaman e."* [188] Li gor civaka kurd, jin divê di malê da bin wek Hêlîn jî digazine divê li ser hêlîna xwe bin, zarokan mezin bikin, bi dilê bavê xwe bizewicin, kar û barên malê bikin ango bibin kebanî. Baksi, dipirse bav û dê yek in lê çima qedera kesên ji heman zikî derdikevin ne yek e? Bersiv dîsa ji devê Hêlînê tê: Korbûnî bi çavên felekê bê, yek keç, yek law e. Baksi, rexneyên xwe weha didomîne: Di dema sineta lawan da şahîyeke mîna dawetê li dar dikeve, nas û dost li

---

[187] Baksi, *Hêlîn*, r. 10.
[188] Baksi, *Hêlîn*, r. 14.

hev dicivin û ji zarokê law ra ku dê sinet bibe, cil û berg û pêlav û dîyarîyên xweşik tên sitendin, lewra ev rîtuel mîna gaveke mêranîyê tê qebûlkirin, lê keç ji bilî daweta wan -ku piranî ew jî bêdilê wan e- tu carî rastî qedirdayîna şahîyên weha nabin. Di romana *Hêlîn*ê da Baksi, vê nakokîya civakê bi nimûneyeke balkêş dramatîze dike. Helîna ku dibîne ji bo sineta birayê wê Azad, çi diyarî ji wî ra tên sitendin, ew jî derpîyê xwe ji xwe dike, xwe diavêje ser nivînê û dibêje ez jî dixwazim sinet bibim. Ev dramatîzasyona Baksi, rexneyeke radîkal e ji bo hişmendîya civaka pederşahî. [189]

Baksi, di *Gundikê Dono* da Ji devê Asoya ku ji alîyê bavê xwe ve ji bo qelen bi axayê gund Hecî Zorav ra hatîye erêkirin, rexneya mêran dike: *"Tu rast nabêjî bavo, Aso got. Ha te ez firotime Hecî Zorav, ha te ez firotime yekî din. Tiştê ku bû firotan eynî ye bavo."* [190] Bi van gotinên teatral Baksi, cih dide rexneya qelen ku ev mesele, di civaka kurdan da xwedî kevneşopîyeke giring e.

Firat Cewerî di *Payiza Dereng* da rexneya mêrên durû dike. Mêrên ku qaşo dibêjin mejîyê me modern e, em ronakbîr in, em ê ji civaka xwe ra bibin rolmodel û dema dizewicin daxwaza, xwe nixumandinê li jinên xwe dikin. Cewerî ji devê hevalekî Ferda weha dibêje: *"Hûn dixwazin jinên xwe di hundiran de heps bikin û bi xwe werin li memikên jinan binêrin."* [191] Ev rexneyeke durûtîya zayendî ye. Firat Cewerî, rexneyên ji devê Ferda weha didomîne: *"Ez pir kone bûm, min di tevgerên xwe de xwe modern nîşan dida, lê ez di hundirê xwe de kevneperest bûm."*[192] Ferdayê ku di ciwantîya xwe da pey xewna rizgarkirina miletekî ketibû, otokirîtîka xwe dike û dibêje ez bi xwe kevnepesret bûm. Qaşil, modern û kakil kevneperest. Ji ber ku modernîzma kurdan ne modernîteyeke tedrîcî ye ango ne li gor pêşketina civakên modern e, kesên wek Ferda, qaşo xwe hemdem nîşan didin, lê mejîyê wan bindestê civaka girtî ya eşîrîyê ye.

Firat Cewerî, mêrên ku bi qodên eşîrîyê mezin bûne û nikarin xwe ji van qodan rizgar bikin, bi gelek celeban rexne dike. Mêrên civaka kurdan bi berîgirtina jinan a di warê xwendin û pêşketinê da tewanbar dike û aşkera dibêje mêr, dixwazin

---

[189] Baksi, *Hêlîn*, r. 18.
[190] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 35.
[191] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 115.
[192] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 116

jinên wan hem ji wan ra jintîyê hem jî qerwaşîyê bikin. Xuya ye ku di vê têkilîya jin û mêrtîyê da tu mafê jîyana wekhev ji jinan ra tune ye. Ev zîhnîyet, bermehîya kevneşopîya carîyetîyê ye. [193] Firat Cewerî di *Payiza Dereng* da ji devê jina Ferda, rexneyên derbarê mêran weha didomîne: Mêrên kurdan ku li dîyasporayê demeke dirêj azeb dijîn û bi her awayî hevaltî û dostanîya jinên ewropayî dikin, xema dilê xwe ji wan digirin û dema navosere dibin ji welêt ji xwe ra keçeke xama tînin û dixwazin ev keç ji wan ra hem bibe jin têkeve himbêzê wan hem jî ji wan û mala wan ra bibe qerwaşeke belengaz.[194] Ev rexne ji alîyê mantalîteya jîyana mêrên kurd ên dîyasporayê dîyardeyeke balkêş e.

Firat Cewerî lêxistina mêran a li jinan jî wek rexneyeke civakî di nava rêzebûyeran da bi cih dike. Ji devê Ferda, lêxistina li dayikan a bi destê bavan, rexne dike. *"Gelek zilamên mehelê li jinên xwe dixistin heta bavê min jî carina li diya min dixist."* [195] Mixabin zewaca bêdil a bi darê zorê, rê li ber jîyana bi sîle û kotek vedike. Mêrên ku qelenê jinê didin, xwe wek xwedîyê wê dibînin û zilm û neheqîyê li jinên xwe dikin. Li gor van mêran, ferqa jinê ji hespekê ne bêtir e. Ferdayê ku behsa lêxistina bavê xwe ya li dêya xwe dikir û bavê xwe şermezar dikir, di dema zewaca xwe tevî xwendin û qaşo serencama Ewropayê, dîsa jî destê xwe li xanima xwe bilind dike û lê dide. Ferda dibêje *"Ez ê ku hertim li dijî lêdana jinê derdiketim, min jî êdî li jinekê xistibû. Min li jina xwe, li jina xwe ya ku min ew qasî jê hez dikir, xistibû."* [196] Lêxistina li jinê di civaka kurdan da mîrateyeke qîrêj e ku ji kalikan derbasî bavan û ji wan jî derbasî lawan bûye. Firat Cewerî bi van gotinan rexneyeke mîna romannûsên naturalîst li civakê dike ku hin qodên civakê yên genetîk hene û mixabin ew qod ji nifşekî derbasî nifşên din dibin.

Firat Cewerî di romana *Ez ê Yekî Bikujim* da li ser durûtîya civakê disekine û rexneyeke aksîyolojîk dike, civakê û nemaze mêran di çarçoveya exlaqî da di nava nakokîyekê da dişayesîne. Li gor vebêj-lehengê Cewerî, Temo; hin mêrên ku bi boneya namûsê dikarin keçên xwe bi destên xwe bikujin, fersend têkeve destê wan

---

[193] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 83.
[194] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 101.
[195] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 250.
[196] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 122.

dikarin tecawizî keçeke di temenê qîza xwe da bikin. Wê demê têgeha namûsê qet nayê ser hişê wan û nafikirin ku heger namûs hebe, keçên xelkê jî namûsa hin kesên din eleqeder dikin.[197] Temoyê ku bawer dike jîyana xwe ji bo azadîya gelê xwe feda kirîye, di heman romanê da rexneya durûtîya civakê dike ango mêran dikişîne qadeke berfirehtir û dibêje ew kesên di bin navê namûs û şerefê da keçên xwe dikujin, carinan wek qewad derdikevin pêşberî civakê û gelek keçên welêt difroşin.*"*[198] Kujerîya qaşo ji bo namûsê û qewadî du têgehên ku di tu ferhengan da nayên cem hev lê di civakê da wek nakokîyeke dijwar li ber çavan e.

Firat Cewerî, di warê çanda tecawizê ya mêran da jî bi dramatîzasyonên rasteqîn û gotinên endîrekt rexneya mêrên tecawizkar dike û wan kesan mîna qesabên karik û berxikan, bi kêrên ko ser jê dikin, dinirxîne. [199] Tecawiza laş û gîyanê jinekê, di çavên mêrên mitecawîz da xweşîya kêlîkekê ye lê di nezera jineke tûşî vê kiryara qirêjî maye, travmayeke rêhevalê temenê mayî ye. Carinan jî dibe sedema kuştinê yan xwekuştinê. Zewqa mêrekî zordar, dibe sedema dawîlêanîna jîyana jineke belengaz.

Firat Ceweri di romana *Lehî*yê da ji devê lehenga xwe Lehîyê ku laşfiroşîyê dike, qelsîya zilamên kurdan a li hember jinan bi alîyê wan ê bihêz yanî şehwî girê dide û li hember gotinên xweş ên jinan, mêrên kurdan pir qels nîşan dide û destnîşan dike ku mêrên kurdan bi hêsanî dikevin dahfika mêyîtî û şîrînîtîya jinan. [200]

Hesenê Metê ji rewşa civakê ya giştî acizîyan dike û rexneyên xwe piranî wek gilî û gazinan tîne zimên. Mixatabê wî jî piranî Xweda ye. Di *Gotinên Gunehkar* da di dîyaloga Xweda û Ahrîman da ji devê Ahrîman, azara keç û lawên Ademî ku dikişînin bi kiryarên mêran ên qirêj ve girê dide. Kuştin, tecawiz, zewacên bêdil û heta bi xwedêdana zarokên kut û kor ku bi gelemperî wek encamên têkilîyên ensest tên dîtin û rexnekirin.[201]

---

[197] Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim*, r. 33.
[198] Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim*, r. 74.
[199] Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim*, r. 147.
[200] Cewerî, *Lehî*, r. 31.
[201] Hesenê Metê, *Gotinên Gunehkar*, r. 132.

Helîm Yûsiv di *Sobarto*yê da ji devê lehengê romanê Bavê Emşa ku qewadîya xwiha xwe dike, bi wêrekî berê xwe dide mêran û wan hemûyan bi rexneyeke doxînsistîyê tewanbar dike. Bavê Emşa dibêje *"Kî ji we naxwaze bi jinên dinyayê tev re razê? Di hundirê her yekî ji me de qehpekî mezin heye."*[202] Li gor lehengê Yûsiv, cil û bergên birûmet, gemara gîyanê şehwetperestîyê dinixumîne û civak dibe qada qewadên veşartî. Helîm Yûsiv, di heman romanê da cih dide têkilîyeke ensest û bi vî awayî destnîşan dike ku cenawerê hundirê mêran ê birçîyê şehwetê, tu sînorên exlaqî û însanî jî nasnake. Karakterekî romanê bi navê Şêro dibêje: *"Erê seydayê min, bavê min xwiha min a mezin ji keçikanî xist. Şeva yekemîn mêrê wê ew vegerand. Bi zorê min zavê xwe da bawerkirin ku ez şahîdê wê roja reş bûm."*[203] Helîm Yûsiv bi çîroka bavê ku tecawizî keça xwe kirîye, rûyê mêran ê reş derxistîye holê û rexneyeke radîkal li mêrên bêexlaq kirîye. Hin sermîyanên malbatan, qaşo hefadên namûs û şerefê ne, bi bênamûsîya herî mezin jîyana keçên xwe diherimînin û dibin damezirenerê exlaqekî têkçûyî.

Zordarîya mêran gelek caran bi destbiraktîya hêzên dewletê pêk tê. Hêzên ewlehîyê ku ji jîyana hemwelatîyan berpirsyar in, di hin rewşan da ji bo termên li dû xwe hiştine mêrên kujer pîroz dikin. Vebêjê Helîm Yûsiv dibêje: *"Gava Şêro xwiha xwe kuşt, polîsê ku ew dibir girtîgehê destê xwe li pişta wî dixist, nav tê dida û digot: Mêr an wek te bin an jî tune bin."*[204] Ev rewş, nîşan dide ku civak di bandora mantaliteya eşîrîyê da maye û hin kesên neytxirab ketine pergala dewletê jî. Helîm Yûsiv, bi rêya lehenga romanê Nêrgizê, nêrîna mêran a li hember jinan jî rexne dike û dibêje: *"Jin ji mêr re benîşt e, wê bicû, bicû û biavêje kolanê."* [205] Ev bêjeya cûtinê, gelek maneyan dihewîne. Mêr, mêyîtîya jinan dimêjin, keda wan xesp dikin, wan di malan da heps dikin, bi dehan zarokan ji laşê wan sadir dikin, bi kurtasî jîyana wan kavil dikin û wan diavêjin alîyekî.

Di *Tirsa bê Diran* da Helîm Yûsiv, ji devê lehengê xwe Mûsa, îmaja mêrên berê ku ji bo her zarok û ciwanekî îdol bûn û niha ev îmaja bi erdê ve zeliqîye rexne dike. Mûsayê ku tirsa terîyê lê peyda bûye dibêje *"Min ji xwe re digot, ev çi bajar e*

---

[202] Helîm Yûsiv, *Sobarto*, r. 60-61.
[203] Helîm Yûsiv, *Sobarto*, r. 64.
[204] Yûsiv, *Sobarto*, r. 65.
[205] Yûsiv, *Sobarto*, r. 90.

ku weha dilê wî tije diz û miz in û tije mêrên ku sondên herî giran ji bo piçikeke pere dixwin."[206] Yûsiv bi van gotinan rexneya îmaja mêranîyê ya hemdem dike. Helîm Yûsiv di heman romanê da rexneya tirseke hevpar a jin û mêran a derbarê hevşabûnê da dike. Tirsa ku di temenê biçûk da ketîye dilê ciwanan di siberoja wan da jî dev ji sukura wan bernade. Helîm Yûsiv, ji devê Mûsa, weha dibêje: *"Mêr (...) Hingî ji biçûkanê de ji têkiliyên cinsî hatiye tirsandin, piştî ku mezin jî dibe êdî nikare wan têkiliyên germ bi jinê re bijî. Jixwe jin, ji mêr bêtir ditirse."* [207] Qeyd û bendên exlaqî û dînî, dijberîya malbatan a li hember têkilîya keç û lawan a derveyî zewacê, wek tirseke bêdiran dikeve dilê wan û jîyana wan a zayendî serobino dike.

Helîm Yûsiv di romana *99 Morîkên Belavbûyî* da desthilatdarîya mêran a di malbat û civakê da li ber çavan radixe û mînaka çanda mêvandarîyê û mezûbanîyê dide. Di civaka kurdan da heta demeke nêzîk hemû xwarin li ber mêvanên mêr dihate danîn ku tiştek vegerîya li ber jin û zarokan dihate raxistin. Lehengê romanê Azadê penaber, li deftera xwe weha nivîsîye: "Carinan goşt çêdibû û bêhna goşt li malê belavdibû lê ji ber ku hemû goşt li ber mêvanên mêr dihate danîn û venedigerîya alîyê jin û zarokan, jin û zarok li ser sifra sawara bêgoşt rûdiniştin." [208]

Lêxistina ku mêr li jinên xwe dikin hertim bûye mijara nîqaşê. Helîm Yûsiv ji devê zarokekî bi navê Hisên, lêxistina mêran a ku li jinên xwe dikin weha rexne dike: *"Dilê min her bi ser diya min ve bû û min dixwest ez zû mezin bibim da ku ez karibim wê ji derbên bavê xwe biparêzim."*[209] Ev zarok, dixwaze mezin bibe lê ne ji bo lixwekirina bedlên zilaman û ajotina tirimpêlan û tiştên wek din. Tenê ji bo ku karibe dêya xwe ji lêxistina bavê xwe rizgar bike. Ji bo zarokan bi destê bav lêxistina dayikê, travmayeke mezin e. Hewesa mezinbûyînê di dilê zarokan da zîl dide, ev hewes, hinekî jî bi daxwaza parastina dayikên di bin zilma bavan da ne, têkildar e.

Jan Dost di romana *Mijabad*ê da ji devê kalikê lehengê romanê Badîn, mêrên birçîyê jinan, bi şêwazeke qerfî rexne dike. Kalikê Badîn dibêje *"Min jin bi qasî*

---

[206] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 25.
[207] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 57.
[208] Yûsiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, r. 16.
[209] Yûsiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, r. 133.

*derdê dilê te dîtine, kurd, ereb, tirk, faris, cihû, rûs û ermen û her miletê ku nayêne bala te bi dehan di bin sîya g*nê kalkê te re derbas bûne."*[210] Jan Dost, mêrên ku lezeta têkilîya cinsî ne di hembêza jinên xwe lê di hembêzê jinên bîyanî da dibînin û jinê, tenê wek amûreke cinsî dinirxînin afîşe dike. Ya xirab ew e ku kalikê doxînsist, van serborîyên xwe yên sosret wek nesîhetekê li nevîyên xwe yên safik dike.

Jan Dost di romana *Naqosên Romayê* da alîyekî din ê mêran derdixe ser tevna rexneyê. Ew jî avakarîya mêran a şer û pevçûnê ye. Rahibeya Cenovayî, ji pîrewergêrê Mihemed Eşîqê Antakî ra dibêje *"Min nefret ji mêran kir dema min dît ew şer û cengan pêdixin û keştiyan di behran de diajon ji bo topbarankirina benderan û artêşên pirr mezin ber bi qadên mirinê ve diajon.."* [211] Bi van gotinan, zilamên ku jîyanê dikin qada mirinê, bi tundî tên rexnekirin.. Bêjeya nefretê tundîya rexneyê baş te'rîf dike. Lehenga Jan Dost, Rahîbeya Cenovayî bi gotina "*şer û xerabî nêr in."*[212] rexneya xwe tekûz dike.

Di civaka kurdan da mêr bi gelek boneyan du, sê heta çar jinan jî dikarin bînin. Çênebûna zarokan, kar û barên giran, mirina birayan û mahrkirina jinên wan ên bîmayî, hewldanên damezirandina dostanî bi hin malbatan ra û gelek sedemên din, dibin hinceta anîna hewîyan a ser jinê. Carinan jinên ku zarokên wan çênabin ji bêgavî ji mêrên xwe ra li jinekê digerin û bi destê xwe jineke din dixin paxila mêrên xwe. Di romana *Kobanî* da vebêjê Jan Dost dibêje *"Rastî jî wisa bû, Îslîm bi xwe ji mêrê xwe re li jinekê geriya, ji xwe re li hewîyekê geriya û dît jî: Zergê."* [213] Ev rewş ji alîyê psîkolojîya jinan ve dibe sedema travmayeke mezin û jîyanê li ber wan diherimîne.

Jan Dost, di romana *Kobanî*yê da erka avêtina telaq a ku di destê mêran da mîna şûrê Demokles li ser serê jinan ve diheje bi rêya vebêjê xwe weha rexne dike: *"Hec Muslim rojekê got ku karê xwe bike ez te vedigerînim mala bavê te. Telaqê wê û bazinekî zêr xistin destê wê û ew bi xwe re bir Tirkîyeyê."* [214] Du jîyanên ku bi hev ve kelijîne, bi avêtina sê kevir û bilêvkirina sê gotinên mêran ji nişka ve dikare ji hev veqete. Piştî wan kevir û gotinan heqê jinê di nava malê da mehra zewaca wê ye. Di romana *Kobanî*yê da lehengekî bi navê Mihemed, mêrên kurdan li hember jinan ji

---

[210] Dost, *Mijabad*, r. 97.
[211] Dost, *Naqosên Romayê*, Dara, Dîyarbakır, 2019, r. 122.
[212] Dost, *Naqosên Romayê*, 123.
[213] Dost, *Kobanî*, r. 51.
[214] Dost, *Kobanî*, r. 84.

alîyê veşartina hezkirinê ve rexne dike û weha dibêje: *"Ez hewceyî mirina dayika xwe bûm ku binasim bavê min jê hez dike."*[215] Mêr, hişkî û zalimîya xwe nîşanî jinên xwe didin. Mêr, merhemet û hezkirina ji jinên xwe di kûrahîya dilên xwe da vedişêrin. Gelek caran j bo ew hezkirin derkeve holê divê jinên wan, jîyana xwe ji dest bidin.

Romannûsên dîyaporayê, mêrên civaka kurdan ji gelek alîyan ve rexne dikin. Zalimîya wan û lêdanên wanî jinan, meyla wan a şehwetê û anîna wan a gelek jinan, desthilatdarîya wan a li ser jin û zarokên wan, erka wan a bihêz a civakê, neheqîyên ku dikin, xirabkarîya wan a ku dibe sedema şer û pevçûnên mezin hin mijarên rexneyan in.

2.6.3. Jin

Jin, hevparê jîyanê ne. Ji serdema nêçîrvanî û berhevkarîyê û heta roja me jin di avakirin û berdewamakirina malbatê da hêzeke bingehîn e. Heta di demên kevnar da serdestî li mêran kirine û civaka maderşahî, heta destpêka civaka çandinîyê di bin tesîra jinan da ye.

Basil Nikitine (1885-1960) derheqê jinan da weha dibêje: "Rewşa Jinê, şexsîyeta qewmekî pir baş resim dike. Li gor çavdêrîya V. Minorsky (1877-1966) kurd, dibe ku di nava muslumanan da yên herî lîberal bin. Bi rastî karê herî giran ji alîyê jinan ve tên kirin. Ên kar û barên pez û dewaran dikin, avê tînin, bêrîvanîya pez dikin, ardû amade dikin û bi ser da jî di dema van karan da bi çarikeke fireh ên pitikên xwe ji pişta xwe danayînin dîsa ew in. Bi vî awayî qelew û hêzdar dibin lê cazîbeya xwe ya cinsî pir zû winda dikin, diçilmisin û diçin." [216]

Di romana kurdî ya dîyasporayê da rasterast rexneyên li jinan bûne kêm in. Di rexneyan da jin wek alîyekî mixatab tên dîtin. Di rexneya jinan da berê tîrên rexneyê piranî li mêran in. Jin ji rexneyan ra wek mijar in. Firat Cewerî di *Payiza Dereng* da li ser koletîya jinê disekine û ji devê Ferda dibêje ku *"Min hertim heqê jinê parastiye. Ma mirov ê çawa ji jineke kole hez bike?"*[217] Di van gotinan da hem rexneya mêrên ku ji koletîyê û pê ve tiştek ji jinan ra nehiştîne hem jî rexneya jinên ku azadîya gîyanê xwe winda kirine û koletî pejirandine heye. Cewerî, piştî rexneya

---

[215] Dost, *Kobanî,* r. 93.
[216] Basil Nikitine, *Kürtler*, Örgün Yayınevi, (Çev.) Kolektif, Çapa 2., İstanbul, 2010, r. 198.
[217] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 79.

neazadbûna jinan, sedemên vê koletîyê aşkera vedibêje. Li gor vebêjê Cewerî, sedema herî giring a vê koletîyê ji alîyê aborî ve girêdana jinan a bi mêran ve ye. Jina ku wek takekes azadîyeke wê ya aborî tunebe, nikare li ser lingên xwe bisekine û li hember mêran derkeve. Lehengê Cewerî, Ferda dîsa bi şêwazeke nixumandî vê rewşa jinan weha rexne dike: *"Ma ji bo çi keç û jinên me ne azad in? Di keçaniya xwe de çavên wan li destên bav û birayên wan in, di jinitiya xwe de jî çavên wan li destê xezûr mêrên wan in."* [218] Di civaka çandinîyê da ked û kesba jinê ji alîyê mêran ve tê xespkirin. Jin di karên herî zehmet da dixebitin lê perêyê vî karî dikeve destê bavê wan û tu carî ew di vî pereyê giştî da ne xwedî par in. Ji ber vê yekê jî destê wan li ber bav û birayên wan vekirî dimîne. Qedera wan jî di nava du lêvên bav û birayan da dîl dimîne.

Firat Cewerî, derheqê meseleya namûsê da rexneyeke civakî ya giştî dike. Bêyî ku namûsê pênase bike an têkeve pey dîroka derketina wê ya ser dika civakê, encamên vê bêjeya ku dibe sedema malxirabî û wêranîya gelek jîyanan ji devê hevalê Ferda Ferîd, rêz dike: *"Ji bo namûsê carina du eşîr, carina du gund dikişiyan ber hev. Carina bi dehan însan dihatin kuştin û bi dehan mirov di hepsan de diriziyan."*[219] Têgeha "namûs"ê dikare eşîran bera ber hev bide, keçan, bi destê bavan bide kuştin û mêran bişîne sêdaran.

Di romana *Ez ê Yekî Bikujim* da Firat Cewerî, ji devê Temo, rexneyeke sosyo-polîtîk dike û digazine, ev kesên şoreşger ku wextekî ji bo azadîya civakê serîhildan û temenê xwe feda kirin lê îro ew civak, nemaze ew mêr ji bo têrkirina zikên xwe keçên xwe difiroşin.[220] Şoreşa ji bo azadîyê û encama laşfirotinê ji bo zikên birçî, nakokîyeke bûye armanca tîrên rexneyê. Temo dibêje *"Vî bajarê ku ji ber namûsê ji sedan keç û jinan re bûye goristan..."* [221] Nakokî bi hevokeke kurt didome, civakeke cînayetên namûsê lê ew qasî pir bin û mirovên wê dema bixwazin dikaribin keçên xwe bi destên xwe bifiroşin, pirsgirêkeke totolojîk e. Li bajarekî keç û jin bi hinceta namûsê tên kuştin, li heman bajarî keç û jin ji bo pereyan tên firotin, ev rewşa tevlihev, bala Cewerî kişandîye û bûye mijara rexneyan. Lehenga laşfiroş ku ewil bi

---

[218] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 84.
[219] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 187.
[220] Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim*, r. 33.
[221] Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim*, r. 67.

navê Dîana dikeve nava bûyerê, weha dibêje: *"Du hezar jin xwe li vî bajarî difiroşin. Min ji ku dizanîbû ez ê bibim yek ji wan jinan."* [222] Ceweri, pişti gelek rexneyan di romana *Lehî*yê da rasterast berê xwe dide jinan û ji devê Lehîyê, wan bi devsistîyê tewanbar dike. Lehenga bi navê Lehîyê ku berdewama karaktera Dîana ye dibêje ku jin nikarin razên mêran veşêrin û dema bi tiştekî bihesin, dinya alem bi wî tiştî dihesînin.[223] Ev rexneyeke takekesî ye ku lehenga Cewerî, li jinan dike û ji ber aşkerakirina razên mêran, jinan tevan dixe bin tohmetekê.

Firat Cewerî, di romana *Lehî*yê da li ser meseleya jinê bi navgînîya Lehîyê rexneyekê li stiranên kurdî jî dike. Li gor Lehîyê, di stiranên kurdî da keçên kurdan zûzûka sîngên xwe pêşkêşî hezkirên xwe dikin û destûra wan li mêyîtîya xwe didin.[224] Di vir da serê tîrên rexneyê dîsa digihêje daxwazên mêran ên cinsî û fantazîyên di binehişê wan da bi salan hatine meyandin û pêk nehatine.

Hesenê Metê di romana *Li Dêr*ê da bi rêya Bilind Zaxoyî, dilê jinê mîna qadeke şer û pevçûnê pênase dike ku tê da Xweda û şeytan ne li hev in.[225] Cihekî Xweda û şeytan li hev nekin, dê çawa xwedîyê wî dilî û mêr, di mercên jîyaneke hevpar da li hev bikin? Hesenê Metê ji devê Bilind Zaxoyî dibêje ku Xweda bi xwe ev rexne li jinê kirîye. *"Xwelî li serê wê jinê ku / min bi du lingan afirandiye / lê ew bi yekî / ew bi mêrekî sekiniye."* [226] Di van gotinan da esas rexneyeke polîjînî (pirjinî) heye. Mêr madem gelek jinan tînin, jin çima vê yekê ew qasî bi hêsanî dipejirînin. Heger mafekî wekhevîyê hebe mafê jinan a polîandirîyê ango pirmêranînê çima ew qasî ecêb tê dîtin? Hesenê Metê, hin jinên nebaş jî bi gotinên Bilind Zaxoyî bi tundî rexne dike. Bilind Zaxoyî dibêje *"Jin hene ku ava deh kahniyan diherimînin…"* [227] Di nava vê hevoka kurt da fesadî û gelacî, dilxirabî, derewkarî û rîyakarî, çavnebarî, sedemên qetl û qitulê, fisq û ficûra aşkera yan veşartî û gelek tiştên Xweda û ebdan jê heznekirîye mewcûd e.

---

[222] Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim*, r. 74.
[223] Cewerî, *Lehî*, r. 103.
[224] Cewerî, *Lehî* r. 119.
[225] Metê, *Li Dêrê*, 34.
[226] Metê, *Li Dêrê*, 34.
[227] Metê, *Li Dêrê*, 70.

Helîm Yûsiv di *Sobarto*yê da meseleya jinan dikişîne qadeke din û dikeve pey bersiva serîvekirin an mejîvekirinê? Lehengê romanê Silêman dibêje *"Keçikên ku çariyan diavêjin ser rûyên xwe bi min çêtir bûn ji wanê çarî li ser mejiyên wan bû û ji derve de cil kin bûn."* [228] Li gor Silêman, heger mejî kole be azadbûna laş, tiştekî zêde îfade nake. Helîm Yûsiv dîsa di *Sobarto*yê da ji devê jineke bi navê Firyal, otokrîtîka jinan dike û dibêje *"Di hundirê her jinekê de qehbikek heye geh baş e û geh jî nebaş e. Dilê her yekê ji me dikeve sed mêrî,"* [229] Li gor Firyalê di warê şehwetperestîyê da jin ji mêran wêdetir in. Di bin sernavê rexneya mêran da me cih da gelek rexneyên derheqê doxînsistîya mêran lê Helîm Yûsiv bi vê rexneyê jinên dilbijok jî dike xaleke rexneya şehwetperestîyê.

Helîm Yûsiv, di *Sobarto*yê da zewicandina keçan a bêdil ji devê Belqîsa ku bêyî dilê xwe hatîye zewicandin rexne dike. Dîsa ji romannûsên din cîyawazîyekê nîşan dide. Romannûsên din, di dayîna keçan a bêdil da mêr rexne dikirin; lehenga bi navê Belqîs, dayikên keçan tewanbar dike û dibêje ku tevlî ku dizanibûn zewac bêdilê keça wan e dîsa jî xemil û xêza wan li wan dikirin û dema ku keça wan digirîyê ji yên derdora xwe ra digotin ev girî ji kêfa ye.[230] Vebêjê Yûsiv, bi van gotinan hin jinan di meseleya zewaca bêdil a keçan da wek şirîkê gunehên mêran dinirxîne.

Helîm Yûsiv di *Sobarto*yê da bi şêwazeke metaforîk bi navgînîya hevalê Silêman Mistoyê Qop, jinan rexne dike û dibêje *"Bawer bike li ser rûyê erdê jineke ku hêjayî fera solekê tune ye."*[231] Jixwe sol bêqîmet e; fereke solê, tena serê xwe ji tiştekî ra nabe. Di romana dîyasporayê da ev gotin yek ji girantirîn rexneya li ser jinê hatîye destnîşankirin. Silêmanê ku Belqîsê terka wî kirîye, dibêje *"Mêrê zîrek ew e, yê ku her li jinekê rast bê. Lê siwar bibe û biçe yeka din (...)Li ser rûyê erdê tu nikarî ji dilsozîya tu jinê pişstrast bî."* [232] Di têkilîya jinan da li gor wî ji bilî qezenckirina çend lehzeyên kêfxweşîya cinsî, tu tiştek nakeve kîsê mêran.

---

[228] Yûsiv, *Sobarto*, r. 82.
[229] Yûsiv, *Sobarto*, r. 84.
[230] Yûsiv, *Sobarto*, r. 168.
[231] Yûsiv, *Sobarto*, r. 174.
[232] Yûsiv, *Sobarto*, r. 177.

Jan Dost di romana *Kobanî*yê da qirêjîya civakê ya ku li ser laşê jinan hatîye avakirin, afîşe dike û di vê rexneyê da hem mêr û jinan hem jî civakê bi gelemperî dike armanca rexneyên tûj. Vebêjê jan Dost weha dibêje: *"Ew laşfiroş, bi şev li derdora klûb û kerxane û kabareyan diciviyan û hunerên şehwetbazî û bijokiyê pêşkeşî nêraniya civaka ku di siya gunê dîktatorekî de hatibû xesandin, dikirin."* [233] Tevî ku civak di bin sîya dîktatorîyê da çûye helakê kesên ku li pey laşfiroşan digerin û wan laşfiroşên ku laşên xwe peşkêşî van mêrên şehwetbaz dikin, hatine rexnekirin.

Romannûsên dîyasporayê, jin bi razîbûna jîyana koletîyê, bi girêdana aborî ya mêran, bi stûxwarkirina li hember zewaca bêdil, bi bûyîna pêlîstokbûna cînsî ya di destê mêran da rexne dikin. Carinan jî jin wek sedemeke şer û pevçûnan tê dîtin. Gelek caran jî ji ber laşfiroşîyê, jin tevî mêran hatine rexnekirin. Lê divê neyê jibîrkirin ku di romana kurdî da mêr li gor jinan bêtir hatine rexnekirin û dawîya rexneyên li ser jinan jî digihêje tevgerên mêran û nêranîya civakê.

2.7. Rexneya li Çandê

2.7.1. Orf û Adet

Bêjeya adetê di *Ferhenga Zanistên Civakî* ya Abdullah Kiran da weha tê terîfkirin: "Adet (tradition) Kevnwer; her cure danûstandina civakî ya ku mensûbên civatekê ji bav û kalên xwe distînin û derbasî nifşên nû dikin; adet, jêmayî, şîn, cejn, bawerî, pîrozkirin, bi bîranîn û her cure çalakîyên bi vî awayî di nav adetan da cih ditînin."[234] Orf û adet, hîmên civakê ne. Ji zarokatî û heta kalbûnîyê jîyana di nava civakê da bi qayîdeyên devkî yê adet û rûsûmetan derbas dibe.

Tevgerên biçûkan li hember mezinan, rabûn û rûniştin, axaftina li civatan, tevgera mêran a li hember qîz, bûk û jinên malbatê û yê bîyanîyan, çanda xwarin, vexwarin û lixwekirinê ji sineta zarokan bigire heta bi erêkirin, nîşan, hine, dawet, welidîn, mewlûd, cejn, serê salê, nexweşî û mirinê hemû rîtuelên merasîmên civakî di çarçoveya fireh a orf û adetan da cih digire. Tu civakên bêyî orf û adet, tune ne, lê di civaka kurdan da hin adetên tund hene ku ji bilî rev û çûnê rêyeke dîtir ber bi

---

[233] Dost, *Kobanî*, r. 295.
[234] Abdullah Kiran, *Ferhenga Zanistên Civakî*, Nubîhar, Îstanbûl, 2014, r. 102.

kesan ve naxe. Yek ji van adetan, tradîsyona tolhildanê yan jî heyfhilanîn e. Kesên ku merivekî wî ji alîyên dijminan ve hatibe kuştin, teqez dîvê tola xwe hilde yan na ew kes di nava eşîrê da bêxîret tê dîtin. Heta silava şer'ê lê nayê kirin. Bi her awayî mobînga civakî li ser wî tê tetbîqkirin.

Zewaca bêdil, çanda berdêlîtîyê, keçrevandin, zevaca bi darê zorê bi jinbiran ra hin nimûneyên adetên tund in di civaka kurdan da. Kesên ku li hember van orf û adetên di bîra dîrokê ya kevnare da genî bûne derdikevin û serî li hember biryarên mezinên xwe hiltînin, wek çareya tekane, berê xwe didin xerîbîyê. Ev sînorê xerîbîyê carinan digihêjê wargehên dîyasporayê. Ev sedem jî ne pir berbelav e lê sedemek e. Meseleyên namûsê ku di civaka pederşahî ya kurdan da gelekî bi firehî cih digirin, sedemek e dîtir a veqetina ji civakê ye. Mela Mehmûdê Bayezîdî dibêje ku "Eger me'azellah jinekê xirabî kir, çare nîne warîsên wê, ewê jinê dikujin û bi vî halî ferset û derfeta mana li jîyanê ji wê jinê ra nîn e. Eger ew jina xirab û ew mêrê ku lîgel wê bûye, li cihekî bi hev ra bê dîtin mêr jî jinê jî bi hev ra dikujin."[235] Kevneşopîyên jîyana civakî, tevgerên ji bav û kalan tên û rîtuelên hin merasîmên civakî bi gotineke giştî çarçoveya orf û adetên civakan dîyar dikin. Tradîsyon, civakan ji hev cuda dike û ev xisûsîyetên cihêreng, çanda civakan ava dike. Girêdana kesan û civakan bi van orf û adetan li gor pêşketina civakan a zanistî, teknolojîk û epîstemolojîk diguhere.

Civakên di wextê xwe da derbasî modernîteyê bûne û pêwîstîyê jîyana modern bi cih anîne, xwe hêdî hêdî ji girêdana van orf û adetan ango toreyan rizgar kirine lê civakên derengmayî yê modernîteyê û civakên ji alîyê aborî ve paşdemayî hîn jî di çarçoveya van toreyan da tevdigerin. Orf û adet devkî ne, anonîm in û jêderka wan nedîyar e ji nifşekî bi rêya zimên derbasî nifşên din dibe û kesên ku ji xeleka van toreyan derdikeve û serbixwe tevdigere ji alîyê civakê ve tê şermezar kirin û tê qewitandin.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da romannûsên ku karakterên mişextî avakirine carcaran di axaftinên xwe da li ser çanda gel û li orf û adetên civakê disekinin û hin ji wan rexne dikin. Mahmut Baksi di romana *Hêlîn*ê da li ser meseleya zewacê disekine û gelek rîtuelên zewacê bi rêya lehengê xwe rexne dike.

---

[235] Mela Mehmûdê Bayezîdî, *Adat û Rûsûmatnameê Ekradîye,* Lêkolîn: Jan Dost, Nûbîhar, Çapa 2., Îstanbûl, 2012, r. 180.

Vebêj-lehengê Baksi, rastîya qelen a civakê bi bîr tîne û destnîşan dike ku ji ber qelenên zêde gelek caran gengeşî, pevçûn û heta kuştin û dijminahîyên domdar derdikevin holê. Baksi di *Gundikê Dono* da jî vê meseleyê dike mijara rexneyê. Di zewacê da bav, piranî guh nadin gotinên keçên xwe û heger zava û malbata zava ketibe serê wan ji bo qelan keçên xwe dikin qurbanî û wan wek mirov çêlekekê an hespekê bifiroşe difiroşin xelkê. Bavê Asoyê Faro, biryara xwe dide: *"Mala we ava. Eyşan keçek e bila bi qurbana we be.*" [236] Xwedîyê van gotinan Faro, keça xwe ya şanzdeh salî Asoyê ji bo qelen dide axayê gund Hecî Zoravê ku mêrê sê jina ye û bi temenê xwe ji wî jî mezintir e. Tu mafê Asoyê tuneye ku li hember vê biryara zavaca bêdilê xwe derkeve û ji mecbûrî stûyê xwe li ber vê biryarê ditewîne. Bi gotineke gelerî heger kesê ku bav, keça xwe dayê kûçikek be jî keç, mecbûr dimîne serê xwe têxe nav pirça wî.

Mahmut Baksi, qêrîna keçên ku zewacên bêdil naxwazin, bi rêya romanên xwe tîne zimên û di dîyalogan da gazinên keçên belengaz bi cih dike ku tu carî tu kes li peyva wan guhdarî nakin û qirqilandin û hewara wan fayde nake. Bav û dê, keçên xwe li gor Asoya lehenga Baksi, ji keftaran ra dikin taştîya sibehê û wan bi saxî dixin gorê. [237] Gelek caran keçên hîn zarok in ji bo qelen didin mêrên yextîyar û trajedîya toreya qelen, hîn bêtir tîr dikin. Li gor Asoya ku bi darê zorê tê zewicandin,, ferqa vê dan û stendinê ji danû stendina keran ne dûrtir e. [238]

Firat Cewerî di *Payiza Dereng* da orf û adeta bav û dayikên nikarin li ba mezinên xwe bi zarokên xwe ra şabibin, ji devê Ferda rexne dike. [239] Li gelek deverên Kurdistanê ev tore hîn jî derbasdar e. Kesên di hembêza wan da zarokên wan hebin, dema dê û bavên xwe dibînin wan ji hembêza xwe datînin. Li gor civakê ev, şerm tê dîtin.

Helîm Yûsiv di *Sobarto*yê da meseleya berdêltîyê ji devê Silêman, rexne dike û dibêje *"Divê her du mal qîzên xwe berdêlî bi hev din. Bi vî awayî zavayê me xwiha*

---

[236] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 32.
[237] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 34.
[238] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 36.
[239] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 104.

min a mezin bir." [240] Ev adet rasterast guhertina keçan e. Piranî li gor daxwaza malbatekê an jî kesekî qedera çar kesan bi hev ve tê girêdan. Ji bo kesek an jî du kes bigihêjin armanca xwe sê kes carinan jî çar kes dibin qurbanî. Di toreya bêrdelîyê da mebest, xelasbûna ji dayîna qelen e yan jî bihêzkirina têkiliyên malbatî ye. Ev cure zewac, li Kurdistanê berbelav e, encamên wê ên trajîk, texrîbkar û domdar in.

Jan Dost di romana *Kobanî*yê da alîyekî qirêj ê berdêlîyê destnîşan û rexne dike. Ew jî berdêlîya kesên ku di navbera temenê wan da ferqeke mezin heye. Bo nimûne kalikek bi keçeke di temenê nevîya xwe ra bizewice û keça xwe ji xwe ra bike berdêlî. *"Kalkê min Şêx Salih, keça xwe Fatma ji xwe re kiribû berdêlî û ew li hec Elîyê Sadî yê Ereb mehr kiribû û xweha Hec Elî jî Hedla li xwe mehr kiribû."* [241] Jan Dost bi van gotinan yextîyarekî keçê xwe dike qurbana şehwetbazîya xwe rexne dike. Bi ser da jî ev kes di civakê da qaşo wek "şêx" tê nasîn.

Jan Dost di *Mîrnamê*yê da toreya zewacê ya ji bo qelen, ji devê Şengê ku li gor tevna romanê ew hezkirîya Ehmedê Xanî bû, lê bi darê zorê bi yekî dewlemend ra hatibû zewicandin, rexne dike û dibêje "*Malbatê, min weke berxeke berşîr avêtin ber qîlên tûjkirî yên Ellehqulî."*[242] Zewaca keçên di temenê lîstikê da ji bo qelen li gor vebêj-lehenga Jan Dost, avêtina berxekê ber qîlên guran e. Ku her cara ku dikevin nav nivînê têkilîya ku diqewime rasterast, tecawiz e. Civak, tecawiza keçên nereşîd bi vê toreyê tolere dike.

Romannûsên dîyasporayê, orf û adetên bi zewacê ra têkildar in, rexne dikin. Qelen, zewaca bêdil, zewaca di temenê biçûk da, dayîna keçên temen biçûk a mêrên yextîyar û zewacên berdêlî hin mijar in ku rexne li ser wan dicivin. Ev adet jî civaka kurdan di warê mafên jinan da zêde paşdemayî nîşan didin û wek xaleke giring di jîyana keçan da xetere ne ku dikarin jîyana wan serobino bikin.

---

[240] Yûsiv, *Sobarto*, r. 46.
[241] Dost, *Kobanî*, r. 143.
[242] Dost, *Mîrname*, r. 46.

2.7.2. Cehalet

Kurd ji ber mercên sîyasî û civakî ji perwerdeyeke sîstematîk bêpar mane. Civaka kurdan piranî li gundan jîyanek saz kirîye û li gundan ji bilî perwerdeyeke dînî ya seretayî ku tenê xwendina alfabeya erebî tê da hebû nîşaneyên perwerdeyê tunebû. Kurdan bi giştî tu şensê perwerdeyeke nîzamî nedîtine. Cehalêtê heta destpêka sedsala 20an mejîyê civaka kurdan îstîla kirîye û kurd ji bo xwendin û pêşvaçûnê zêde neketine nav ger û geştekê. Jixwe perwerdeya îlmên pozîtîf li bal civaka kurdan piranî wek pêdivîyekê nehatîye dîtin. Zimanê perwerdeyê erebî, farisî yan jî tirkî ye. Ev rewş tena serê xwe ji bo perwerdeyê arîşeyeke mezin bi xwe ra tîne û dibe sedema nezanîyê.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da mijareke rexneyê jî cehalet e. Romannûsan, nezanîya civakê ji gelek alîyan ve bi tundî rexne kirine. Mehmed Uzun di romana *Tu*yê da ji cahilîyê gazinan dike û ji devê lehengê xwe cih dide van gotinan: *"Digel hêz, fîtne, dek û dolabên dijmin em jî nezan û jihevketî bûn.*[243] Jixwe însanên nezan, bi rehetî tên kontrolkirin û birêvebirin. Ev yek jî karê rêvebir û muqtedîran hêsantir dike.

Cehalet, însanan ji şaristanîyê û berhemên zanînê bêpar dihêle. Mehmed Uzun di *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* da ji devê Mîr Tahar Xan, rexneya nezanîyê dike.*"Nezanî û cahiliyê em dîl girtine."*[244] Lehengê Uzun, sersebebê nakokî û pevçûnên di nava kurdan da bi nezanîya wan ve girê dide. Xulamtî, xizanî û xezeba di nava ehil û eqrebeyan giş berhemên civakeke cahil in.

Mehmed Uzun di *Bîra Qederê* da bi minasebeta derketina Kovara Hawarê û bêeleqetîya gelê kurd a li hember kovarê destnîşan dike û ji devê Haco Axa ji Mîr Celadet Bedirxan ra weha dibêje: *"Bilûra li ber ga çi ye? Çira li ber kora çi ye? Ezbenî bilûr jî cerîde û çira ye."* [245] Li gor Haco Axa, Kovara Hawarê ji ber nezanîya civaka kurdan negihaştîye armanca xwe. Mîr Celadet Bedirxan, tevî hemû destengîya xwe bi deyn û arîkarîyên madî vê kovarê bi zor û zehmetê derdixe lê ev xebat, mixabin mîna çiraya koran ji cahilan ra bêfayde ye. Mehmed Uzun, nezanî û

---

[243] Mehmed Uzun, *Tu*, Sel, Îstanbûl, 2021, r. 134.
[244] Uzun, *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê*, r. 65.
[245] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 210.

berberîyê wek qedera kurdan dinirxîne û ji devê lehengê xwe dibêje vê qederê, kurd xistine bin qeyd û zincîran û ew bindest kirine. Uzun, mercên civakê yên neyênî bi cahiltîyê ve girê dide. Ne ji cahiltîyê bûya çima yekîtîyek di nava gel da ava nebûya?

Di *Siya Evînê* da Mehmed Uzun, cih dide rexneyên dewleta Tirkîyeyê û sîyaseta wê ya dûrxistina rewşenbîr an ronakbîran ji civakê, wek polîtîkayek bi zaneyî tê meşandin, dinirxîne. [246] Li gor lehengê romanê Qedrî Cemîl Paşa (1891-1973), civakeke ronakbîrên wê ji wê bên dûrxistin, cahil dimîne û cahiltî jî wêranîyê bi xwe ra tîne. Uzun, cih dide rexneya ronakbîran jî. Hin kesên di civaka kurdan da wek zana û bîrbir derdikevin pêş, di nava tevgerên weha da ne ku kesên cahil jî van tiştan nakin. Carinan bi zanîn, bêbextîyan li civaka xwe û gelê xwe dikin û xwe biçûk dixin. Bo nimûne "Mehmed Şükrü Sekban (1881-1960) Hekîm û sîyasetmedar (bû), li Erxenîya Dîyarbekirê hatîye dinê. Di rêveberîya Cemîyeta Kürt Teavün û Terakkiyê da wek endamê avakar cih girtîye. (…) Di 1933an da bi temamî dev ji fikirên xwe berda û li Fransayê di sala 1933an da bi navê *"La Question Kurde"* kitêbeke ku îdîa dike kurd, tirk in û tûranî ne, bi zimanê fransî çapkir." [247] Lehengê romanê Memduh Selîm Begê, rexneya vê meseleyê weha dike: *"Mehmed Şukrî Segban, (...) malmîrato! Ma ev bêbextî bi te diket? Ma qet qedr û qîmetê rojên me yên Stenbolê jî li nik te tunebû?"*[248] Di *Hawara Dîcleyê* da jî Mehmed Uzun, rexneya cehalêtê didomîne. Vebêj-lehengê Uzun dibêje *"Gundên wan ji bo wan hemû dinya, hemû welat, hemû însaniyet bû."* [249] Uzun, dûrbûna ji perwerde, xwendin û nivîsînê wek sedema tengbûyîna fikir û raman û hiş dibîne.

Kesên cahil, dibêjin qey dinya li dora wan dizîvire û jixwe dinya ji gundê wan pê ve ne tiştek e. Ev hizir bi xwe ra dûrketina civaka kurdan a ji modernîteyê tîne û civakê, paşdemayî dihêle. Mehmed Uzun, ji devê vebêjê Hawara Dîcleyê Biroyê Dengbêj diaxive û nezanîyê herî zêde di nava welatê Bohtî da dibîne. Acizîya xwe ya ji bilêvkirina derdê cehaletê tîne zimên, nezanîyê wek kambaxî binavdike û gazinan dike ku kes li qîmeta zanînê guhdarî nake.[250] Di cihekî din ê heman romanê da Mîr

---

[246] Uzun, *Siya Evînê*, r. 121-122.
[247] İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler*, Nûbîhar, İstanbul, 2017, r. 394.
[248] Uzun, *Siya Evînê*, r. 190.
[249] Uzun, *Hawara Dîcleyê*, 276.
[250] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 64.

Bedîrxan Paşa (1803-1868) weha didomîne: *"Cehaletê em dûrî dinyayê xistin."* [251] Dûrahîya ji dinyayê wek fetisandina di kûrahîya cehaletê da ye. Ji bo ku qedirê ilm û îrfanê bê zanîn divê piçek be jî tovê zanebûnê di mejîyê civakê û însanan da hebe ji bo ku tarîya cehaletê bi ronahîya zanînê ra bê miqayesekirin. An na dê cahil, çawa bizanibin ew nezan in û pêdivîya wan bi xwendin û perwerdeyê heye?

Firat Cewerî di *Payiza Dereng* da bi rêya Ferda, cahiltîya civakê wek problemeke giring bilêv dike. Cahiltîyê bi kêmasîya xwendinê ve têkildar dibîne. Ew jî wek Mehmed Uzun, eleqeya civakê ya xwendin û zanînê hema di asta tunebûnê da dibîne. Ferda ji bêtoleransîya civakê gazinan dike û herî zêde jî li welatê xwe ji rabûna tedawilê ya xwendinê şikayet dike.[252] Ferda, di civakê da tunebûna hişmendîya zimanê zikmakî jî rexne dike û dibêje *"Li vî welatî kurmancî bi tenê ji gundîyan re maye, kurmancî nîşana paşdemayîn û nezaniyê ye."*[253] Ji ber ku gel, axaftina bi kurdî wek nîşaneya paşdemayînê dinirxîne û her diçe ji zimanê dayikê bi dûr dikeve li gor wan, kesên nezan bi kurmancî diaxivin û zimanê zanayan divê zimanê tirkî be. Şermkirina ji zimanê xwe, dîyardeya encama asîmîlasyonê ye.

Firat Cewerî, nexwendina civaka kurdan bi mînaka *Qur'an*ê dide û ji devê Ferda destnîşan dike ku ji bilî *Qur'an*ê tu kitêb li malên kurdan tune ne. [254] Li gor Ferda, Qur'an jî bi bizmarekî ve ye û li dîwar daliqandî ye. Car heye bi salan devê wê Qur'anê venabe heger vebe jî jixwe kesê ku dixwîne tu tiştekî jê fêm nake. Lewra zimanê wê erebî ye. Di vê rewşê da cahiltî dê çawa di civaka kurdan da biqede?

Helîm Yûsiv di *Sobarto*yê da bangê li xwe dike û dibêje *"Ey Helîm Yûsiv! Çi îşê te pê ketiye? Tu ê çima dinivîsînî? (...) Te çi sûd jê girtiye? Ma ne çêtir e ku tu pênûsa xwe biavêje ber bizinekê û serê xwe deyne ser balîfê heta mirinê."* [255] Yusiv, gazinan dike ku sûda nivîsê tune ye. Ev gotin, şîkayeta nezanîya miletekî ye. Yûsiv ji nexwendina civakê bêzar e û mirinê çêtir dibîne ji nivîskarîya bi zimanê civakeke nexwendî û nezan. Helîm Yûsiv bi gazinan nayê ser û di romana *Sobarto*yê da hêrsa

---

[251] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 401.
[252] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 249.
[253] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 253.
[254] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 256.
[255] Yûsiv, *Sobarto*, r. 106.

xwe ya li civakeke nezan û pasîf ji devê karakterekî bi navê Biro ve bi dijûnên tûj weha rexne dike: *"Ez ê bi ser van pelan de bimîzim, kanî kîjan gel li dinyayê bi pelan û bi hibrê tenê rizgar bûye?!"*[256] Di van gotinan da rexneye nixumandî jî heye. Hibir, azadîya meji û gîyanê mirovan temsîl dike.

Jan Dost di *Mijabad*ê da ji devê kalikê Badînê Amêdî, rexneyekê li zanînê dike û weha dibêje: *"Min barê deh qantiran kitêb xwendine, çi dibêjin! Nezaniya te kûrtir dikin, te dûrî jîyanê dikin."*[257] Jan Dost bi awayekî zimnî rexneya nezanîyê dike ku nezan, zanabûnê texfîf dikin, wê bêqîmet nîşan didin. Jan Dost, di *Mijabadê* da ji devê Hêmîn ku karakterekî rasteqîn û helbestvanekî kurdan e, derengmayîna matbe'yê ji bo kurdî wek windahîyekê nîşan dide û dibêje *"Eger ev mekîne (Matbae) berî sed salî hatibûya Kurdistanê, bêguman yek ji kitêbên me winda nedibûn."*[258] Wek tê zanîn matbaa, li Ewropayê bi sedan salan berîya Kurdistanê hatîye bikaranîn û Ewropa, bûye warê zanînê lê mixabin Kurdistan ji alîyê ronakbîrîyê ve paşda maye. Li gor Gregory Jusdanis "Mîmarê neteweperwerîyê ew peyv û hevok in ku di matbaayê da hatine rêzkirin."[259] Ev gotinên Jusdanis, rexneya ji devê Hemîn hatîye kirin dupat dike.

Jan Dost, di wê bawerîyê da ye ku çar parçeyên Kurdistanê ji hev û zanîn û edebîyata hev ne agahdar in. Li ser vê meseleya çandî di *Mijabad*ê da Badînê Amêdî weha dibêje: *"Ma ne ecêb e ku dîwanên Cizîrî, Feqiyê Teyran, Mem û Zîna Xanî li vî bajarî peyda nabin? Li Silêman û Hewlêr û Kerkûkê jî weha bû û li Amediyê çavê min li berhemên Hacî Qadir û Herîq û Salim û Nalî nediketin."* [260] Jan Dost vê pisrgirêka kulturî dişibîne giravên di nava deryayekê da û ji hev qutbûyî ne. Bi awayekî mecazî pêdivîya keştî û qeyikan tîne zimên da ku di navbera van giravan da têkilîyê deynin. Jan Dost ji devê Sadiq Bahadînê Amêdî, weha didomîne: *"Ma ne guneh e ji Xwedê, yên weke Şêx Ehmedê Cezerî, Xalid Axayê Zebarî û Şêx Nûreddînê*

---

[256] Yûsiv, *Sobarto*, r. 108.
[257] Dost, *Mijabad*, r. 97.
[258] Dost, *Mijabad*, r. 97.
[259] Gregory Jusdanis, *Gecikmiş Modernite,* (Wer.) Tuncay Birkan, Metis, İst., 1998, r. 230.
[260] Dost, *Mijabad*, r. 106.

Birîfkanî neyên naskirin! Û def û zirne tenê ji Salim û Herîq û yên din re lêdikevin?" [261] Dost, bi şêwaza gilî û gazinan bêndên çandî û hûnerî jî rexne dike. [262]

Jan Dost di *Mîrname*yê da ji devê Ehmedê Xanî (1650/51-1707) rexneyeke tund li nezanîna kurmancan û tevgera wan a li hember zanînê dike. *"Li vî welatî û li nav me kurmancan qîmetê ilm û nalê kerekî piştkurmî weke hev e."* [263] Wek Remezan Alan jî dibêje "Belê, li ortê qumaşekî baş heye lê muşterîyê wî tune ye. Sifrekî saf û bêhîle heye lê ji mohra qîmetê mehrûm e"[264] Kurdên nezan qîmeta faydeyê di ser her tiştî ra dibînin. Lewra kurdên cahil, dikaribin bar li pişta kerekî piştkurmî jî bikin, ew ker ji ber ku bi kêrî wan tê ji wan ra ji ilm û îrfanê çêtir e.

Jan Dost di *Mîrnamê*yê da derheqê meseleya faydeyê da ji devê Ehmêdê Xanî cih dide vê rexneyê: "Bajarekî nalên keran ji kitêban bêtir lê bên firotin, Xweda xezeba xwe bera ser wî bajarî daye. [265] Jan Dost, di heman romanê da ji devê bavê Selîmê nalbend, qîmetnedayîna civakê ya zanînê; bi gotinên îronîk bilêv dike û aliman dike çar kategorî: *"Sê ribê aliman parsek in û ribê mayî jî feqîr in."*[266] Ji bo aliman bikaranîna parsekîyê têra serê xwe rexneyeke giran e. Rengdêra parsekîyê ji bo alimên ku li gor menfaeta mîr, axa û began tevdigerin û li ber derîyê wan bi fitre, zekat û sedeqeyan debara xwe dikin, bi kar tîne.

Jan Dost li ser qedr û qîmeta xwendinê gelekî disekine û ji ber atmosfera romana *Mîrname*yê ya mîstîk û kesayeta serlehengê wê Ehmedê Xanî, mijara zanînê û vebêyîna wê ya di civakê da bi gelek gotinên tijî rexne bilêv dike. Dost, ji devê karakterekî romanê Selahaddînê sehhaf weha dibêje: *"Bajarê ku mirovên wê nexwînin mêş tê de dibin mele."*[267] Di van gotinan da rexneyeke alimtîyê li meleyan jî tê kirin lewra meleyên ku di xitbe û we'zên xwe da hertim heman tiştî dubare dikin tu ferqa axaftinên wan ji pingînîya mêşan tune ye.

---

[261] Dost, *Mijabad*, r. 115.
[262] Dost, *Mijabad, r*. 115.
[263] Dost, *Mîrname*, r. 165.
[264] Remezan Alan, *Bendname li ser ruhê edebîyatekê*, Avesta, Stembol, 2009, r. 58.
[265] Dost, *Mîrname,* r. 166.
[266] *Dost, Mîrname, r. 172*.
[267] Dost, *Mîrname*, r. 175.

Jan Dost di romana *Pîrewerger* da ji devê Rahîbê Marûnî Bulis, pêdivîya mirovan û cîhanê ya bi zanînê destnîşan dike û bidawîbûna şer û pevçûnê daxwaz dike. Heger şer û pevçûnek hebe li gor Rahibê Marûnî Bûlis, ev cîdal divê li ser kaxezan û bi pênûs û hibrê be. Divê şûr û rimên di destê miletan da cihê xwe bidin herf û zimanan.[268] Di romana *Naqosên Roma*yê da jî Jan Dost, nezanîyê wek koka hemû karên qirêj û hizirên mîna kîn û nefretê dibîne û bi navgînîya Keşe Lûsyano ji Eşîqê Mihemedê Antakî ra dibêje *"Erê kurê min, nezan e û nezanî koka hemû bedkariyan û çavkaniya hemû kîn û nefretan e.*" [269] Bi xwendin, agahî û ilm û îrfanê mirov ji gir û edawetê rizgar dibe û digihêje asta mirovahîyê.

Di romana dîyasporayê da romannûsan, gelek rewşên ku kurd tê da ne û wek pirsgirêk nikarin jê rizgar bibin, bi sedema nezanîyê ve girê dane. Tunebûna yekîtîyeke neteweyî, bêdewletbûnî, feqîrî û belengazî, kîn û nefreta di nava gel da, şer û pevçûnên civakî û dîrokî, tunebûna hişmendîya dîrokê, qîmetnedayîna zanînê, zilm û zora axa û began, teasûba eşîrîyê hemû wek encamên cahiltîyê tên rexnekirin.

2.7.3. Perwerde

Perwerde bi rêya dibistan, zanîngeh û kûrsan hînkirineke sîstematîk e ku mirovan li gor qabîlîyetên wan amadeyî jîyanê dike. Li gor sîstema gelek dewletan wek mafekî bingehîn ê makezagonî tê pejirandin. Usûl û esasê perwerdeyê ji alîyê dewletan ve tên dîyarkirin û hemwelatî li gor rêziknameyên hatine pêkanîn ji vî mafê perwerdeyê sûdê werdigirin.

Ilmê pedagojî li ser meseleya perwerdeyê bi giştî disekine û ji bo perwerdekirineke birêkûpêk lêkoler li ser vê meseleyê bi hûrbînî dixebitin. "Perwerdehî ji hîndekarîyê cudatir bi gelek alîyên însan ve têkildar e. Ne tenê hînkirina ziman û hin zanistan e; herweha hînkirina exlaq, kiryar û nirxan e. Ji bo ku perwerdehî bê dayîn divê pêşî meriv xwedî sîstem û mifredatekê be."[270] Her dewlet li

---

[268] Dost, *Pîrewerger,* r. 64.
[269] Dost, *Naqosên Romayê*, r. 60.
[270] Zahir Ertekin, *Li Tirkîyeyê Hin Astengên Li Pêş Perwerdehiya Kurdî û Pêşniyar ên Çareseriyê*, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 2015, 1(1), 28-38.

gor pêdivîyên xwe û gerdûnî ji bo nifşên nû pergalên perwerdeyê dinirxînin û dixwazin sîstemeke baş ava bikin.

Gelê kurd ji ber mercên sîyasî, civakî û dîrokî ji perwerdeyeke neteweyî bêpar maye. Zarokên kurdan li dewletên dijîn, daxilî pergala perwerdeya neteweyî ya wê dewletê bûne û bi zimanê fermî yê desthilatdaran, perwerde dîtine. Ji ber vê yekê bandora asîmîlasyonê li ser gelê kurd zêde çêbûye. Kurdan, zimanê xwe yê zikmakî yan ji bîr kirine yan jî bûne ku nikaribin hizirên xwe bi zimanê dayikê bilêv bikin.

Edîb û alimên kurdan di nivîsên xwe da gelek caran bangî civaka kurdan kirine û ehemmîyeta perwerdeyê anîne zimên. Saîdî Kurdî (1878-1960) di Rojnameya *Kurd Teavvün û Terakki*yê da derheqê giringîya perwerdeyê da weha dibêje: "Emrê dawî perwerde, perwerde, perwerde û yekîtî, yekîtî, yekîtî ye." [271] Babanzade Îsmaîl Hakki (1876-1913) jî di heman rojnameyê da weha destnîşan dike: "Kurd, arnavut û yên din çi qasî paşdemayî, bêziman, bêedebîyat, bêsen'et û bêperwerde bên hiştin dê dewleta Osmanî ew qasî feqîr bibe. Hêz û geşedan bi perwerdeyê tên, perwerde jî bi ziman qaîm dibe."[272] Di meseleya perwerdeyê da romannûsên dîyasporayê gelek rexne li kurdan û dewletên desthilatdar kirine û paşdemayîna kurdan bi tunebûna perwerdeyeke bi zimanê kurdî ve girê dane. Jixwe li jorê me behsa rexneyên nezanîya kurdan kiribû. Di hîmê wan rexneyan da jî meseleya perwerdeyê heye.

Mahmut Baksi di *Helîn*ê da gelek rexne li perwerdeya bi zimanê desthilatdaran kirîye. Vebêj-lehenga zarok Hêlînê dibêje *"Mamosteyê zarokên mezin tirk bû. Mamoste bi kurdî nizanîbû. Me jê tiştek fem nedikir. Wî li me mêze dikir, dikeniya, me jî li wî…"*[273] Mamosteyên ku bi kurdî nizanin û hewl didin tirkî fêrî zarokan bikin, dikevin nava rewşên trajîk. Baksi, perwerdeya bi zimanê bîyanî ji bo zarokan wek astengeke ragihandinê dibîne. Bi gotinên ji devê lehengên xwe, çewtîya nêrîna mirov û civakê ya li hember perwerdeyê ji devê gundîyan weha destnîşan

---

[271] *Kürd Teavvün ve Terakki Gazetesi*, 29 Teşrin-i sani 1324 (12 Aralık 1908).
[272] *Kürd Teavvün ve Terakki Gazetesei*, 6 Kânün-i evvel 1324 (19 Aralık 1908).
[273] Baksi, *Hêlîn*, r. 28.

dike: *"Em ê çi bikin ji dibistanê? Ma bav û kalên me jîyana xwe li dibistanan derbas kirine, heta em bikin."* [274] Civaka ku bi salan perwerde nedîtîye, kêmasîya perwerdeyê jî nizane û haya vê civakê ji nezanîya wê jî tune ye lewra ji bo werqilandina nezanîyê jî piçek zanîn lazim e. Kesên nezan di wê bawerîyê da ne ku bê perwerde jî jîyan didome.

Qedexebûna zimanê kurdî û ferzkirina zimanekî fermî li ser kurdan ji temenê biçûk da ji zarokan ra dibe qadeke pirs û nakokîyên dijwar. Zarokên ku li mala xwe bi malbatên xwe ra bi kurdî diaxivin, dema li dibistanan bi zimanekî bîyanî ra rûbirû dîmînin û zimanê wan ê dayikê li wan tê qedexekirin, bêziman dibin û vê nakokîya lîngûîstîk fêm nakin û nikarin ji nav derkevin. Baksi vê rexneyê bi dîyalogeke di navbera Hêlîna biçûk û bavê wê -mamosteyê gund- da weha tîne ziman: *"Bavo çima em bi zimanê xwe dersê nabînin, ji bo çi pirtûkên kurdî tune ne? Zimanê me qedexe ye keça min. Em kurd in. Ji bîr neke."* [275] Bersiva bav ku dide keça xwe, rexneyê tîr dike.

Mahmut Baksi durûtîya civakê ya di warê perwerdeyê da jî rexne dike. Gundîyên ku dibistanê ji bo kar û barên xwe wek windahîya hêza şuxlê dibînin li hember xwendinê derdikevin, naxwazin zarokên xwe bişînin dibistanan û ji ber vê yekê xwendina dibistanan wek karê şeytên binavdikin bi hin teasûbên dînî nêzî meseleyê dibin lê ji alîyekî ve jî ji bo berjewendîyên xwe dixwazin zarokên wan (ên law) qe nebe fêrî xwendin û nivîsînê bibin da ku bikaribin dan û stendinê bikin. [276]

Helîm Yûsiv nêrîna civakê ya neyênî li hember perwerdeyê bi nimûneyeke îronîk rexne dike. Şagirdê bi navê Qasimo, dema diaxive ji bo dîya mamosteyê xwe gotinên tijî sixêf dike.[277] Bi vê nimûneyê Yûsiv, diskursa civakê ya di aleyhê mamosteyan da jî li ber çavan radixe. Helîm Yûsiv, di *99 Morîkên Belavbûyî* da bi mînakeke balkêş encama perwerdeya bi zimanê bîyanî destnîşan dike. Bavê Azad, lawê xwe weha rexne dike: *"Ev sê sal in ku ev lawê min ê ker diçe fêrî erebî dibe û*

---

[274] Baksi, *Hêlîn*, r. 28.
[275] Baksi, *Hêlîn*, r. 28.
[276] Baksi, *Hêlîn*, r. 38.
[277] Yûsiv, *Wehşê di Hundirê Min de*, r. 34.

hîna navê dew nizane."[278] Ev cure pêkutîyên psîkolojîk, xwebawerîya zarokan dişikîne û wan fêmkorî dike.

Hesenê Metê di *Gotinên Gunehkar* da cih dide rexneya perwerdeya dînî ya medreseyan. Lehengê bi navê Behram, ji Mekrûs efendî ra dibêje *"Li ba me jî ji wan kesên xeyr-î muslîm re dibêjin: gavur û fileh. (...) tenê ji ders û defterên medreseyê ev nav bi zimanê min ve maye."* [279] Ev reng gotinên cîyawaz, yekîtîya di navbera gelê musluman û xeyrîmislîman da xera dike û civakê ji hev belav dike.

Mehmed Uzun di *Hawara Dîcleyê* da ji devê Biroyê dengbêj rexneyeke mîmarîyê li perwerdeya medreseyan dike. *"Jixwe Medrese jî ji alîyê derve, bi dîwarên xwe yên bilind û bi qermîtên xwe yên sor ên çarçik, mîna zindanekê dixuya."*[280] Hucreyên medreseyan, piranî bêşibake çêdikin. Hundirê van hucreyan tarî ne û bêhna mirov tê da dernakeve. Biroyê dengbêj, rexneyên xwe yên derbarê avasazîya medreseyan weha didomîne: *"Ez ê çima donzdeh an jî panzdeh salan li wê medresê ku mîna zindanekê ye bimînim?"* [281] Dibe ku ji bo ev avahî hîn qehîmtir û domdar bin û bi îstîlayên artêşan bi hêsanî hilneweşin bi vê mîmarîya hatine çêkirin an jî ji bo konsantrasyona feqîyan belavnebe şibake nexistine hucreyan. Sedem çi dibe bila bibe, hucreyên bêşibake tarî ne. Biroyê dengbêj, rexneya perwerdeya medreseyan bi zordarîya seyda, mela û feqehan dermale dike: *"Lê hişkahiya seydayan, fortên melayan, bêbaviya feqehan û êşa şiv û çoyan her mîna xwe diman."* [282] Wek tê zanîn hin seydayan di perwerdeya medreseyan da ço jî bi kar tanîn. Ev yek jî dibû sedema çavtirsandin û fêmkorîya şagirdan û şagird ji medreseyê sar dibûn, nedixwestin salên wan ê herî xweş bi vê perwerdeya hişk derbas bibe.

Firat Cewerî di *Payiza Dereng* da dide zanîn ku meseleya di perwerdeyê da bikaranîna şiv û çoyan ne tenê eyba pergala medreseyan e. Li dibistanên fermî jî di perwerdeya modern da mamoste, serî li lêdanê didin û zimanê wan ê dayikê bi tirsa

---

[278] Yûsiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, r. 9.
[279] Metê, *Gotinên Gunehkar*, r. 80.
[280] Uzun, *Hawara Dîcleyê*, r. 88.
[281] Uzun, *Hawara Dîcleyê*, r. 92.
[282] Uzun, *Hawara Dîcleyê*, r. 95.

darên mamosteyan tê qedexekirin. Cewerî, bi van gotinan rexneya asîmîlasyona bi rêya perwerdeya mecbûrî dike. Cewerî, ji devê Ferda dibêje *"Mamosteyê wan yê tirk ku çoyek xistibû destê xwe, (...)ji wan re gotibû ku ji niha û pê ve yê ku li dibistanê ji bilî tirkî bi zimanekî din bipeyivin (...) wê werin cezakirin."*[283] Mamosteyên ku piranî zimanê zarokan ê zikmakî nizanîbûn û li gor pergala perwerdeyê dixwestin zimanê tirkî bi zarokan bidin hînkirin û wan ji zimanê wan ê dayikê bi dûr bixin, carinan serî li hin rêbazên ku tu eleqeya wan bi pedegojîyê ve tune ye didan û ji bo axaftina zimanê kurdî, cezayê pereyan didan zarokan. Ên ku perê wan tunebûya di berdêla van cezayan da mirîşk, hêk an jî qurm û êzîng ji mamosteyan ra dibirin. [284]

Di romana kurdî ya dîyasporayê da perwerde ji alîyê ziman ve û ji alîyê pergala asîmîlasyonê ve hatîye rexnekirin. Romannûsan ji devê karakterên xwe kiryarên mamosteyan anîne ziman û hewl dane nîşan bidin ku sazîyên dewletê bi rêya pergala perwerdeyê çawa bûne amûrên bişaftinê. Hin romannûsên wek Mehmed Uzun û Hesenê Metê jî li gor peywend û atmosfera romanên xwe rexneya perwerdeya medreseyan kirine. Tundî û pêkutîya seydayan û mîmarîya medreseyan a ku mirovan bîhnteng dike bûye mijara rexneya perwerdeya medreseyan.

2.8. Rexneya li Dîn

Dîn û bawerî wek her civakê di civaka kurdan da jî xwedî cihekî giring e. "Piranîya kurdan girêdayî mezheba şafî ya sunîtîyê ne. Ev yek wan tenê ji cîranê wan ê Îranê bi taybet ji azerîyan venaqetîne di heman demê da wan ji ereb û tirkên li Tirkîye, Sûrîye û Îraqê dijin jî cuda dike."[285] David McDowall îdîa dike ku exlebê tirk û erebên Mezopotamyayê terefgîrên mezheba henefî ne ku ev mezheb bawerîya fermî ya Împaratorîya Osmanîyan a sedsala şanzdehan bû."[286] Basil Nikitin dibêje ku "Bawerîyên kurdan bi tu awayî di çarçoveya îslamê da nayê sînorkirin. Berevajîyê wê digihêje rabirduyeke kevin. Li ser welatê kurdan ku di nava çaryanê bawerîyên Asyaya Pêşîn da cih digire çendîn şeklên bawermendîyê xuya dibin."[287] Mîsyonerê ji

---

[283] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 173.
[284] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 174.
[285] Martin Van Bruinessen, *Kurdistan Üzerine Yazılar*, Wer: Kolektîf, İletişim Yayınları, İstanbul, 2010, r. 223.
[286] David Mcdowall, *A Modern History of the Kurds*, Tauris, London, 2000, r. 11.
[287] Basil Nikitin, *Kürtler*, Örgün Yayınevi, İstanbul, 2010, r. 19.

terîqeta Domeniko R. P. Giuseppe Mampanile dibêje ku kurd musluman in û wisa difikirin ku derheqê Xweda da gelek agahîyên kûr dizanin hetta dibêjin qey di dinyayê da ji bilî wan kesek di derheqê Xweda da rastîyê nizanin."[288]

Kurdistan, xaka bîr û bawerîyan e. "Berîya îslamê bi giştî tê pejirandin ku bawerîya kurdan dînê zerdeştî bû. Zerdeştî, doktrîneke li ser pevçûna ronahî û tarîtîyê, çêyîtî û xirabîyê ye. Tîmsalê çêyîtî û ronahîyê Ahûra Mazda; tîmsalê xirabî û tarîtîyê jî Ehrîmen e."[289] Bawerîya êzidatîyê gelek nirxên xwe yê bingehîn ji bawerîya zerdeştîyê wergirtîye. Damezirenêrê vê bawerîyê di dawîya sedsala 11an da Şêx Adî ye. Bi navê *Mishefa Reş* û *Kîtabul Cîlve* du kitêbên li bal wan pîroz hene. "Zimanê her du kitêbên pîroz jî kurdî ye. Mifessîrên îslamê, heta sedsala 13. û 14an jî dipejirandin ku doktrînên Şêx Adî li gor îslamê ne. Piştî sedsalên din tewra alimên dînî yên îslamê li hember şêx û doktrînên wî guherîn."[290] Xwendin û nîvîsîn di vê bawerîyê da qedexe ye. "Kevneşopîyeke qedexekirina xwendin û nîvîsînê ji alîyê şêx Adî ve ji bo mirîdên wî heye. Heta qirnekî berê jî elîtên civaka êzidîyan jî cahil bûn."[291] Melekê Tawis, pîroz tê hesibandin. Li hember agir bi rêzdarî tevdigerin. Diayên wan wek "qewl" tê binavkirin û kesên ku van qewlan dixwînin ji wan ra "qewwal" tê gotin. "Ezidî, hertim tûşî zilma cîranên xwe yên musluman mane. Ji ber vê sedemê piranîya wan, xaka ku li ser ji dayik bûne terikandine gelek ji wan jî bûne musluman an xirîstîyan. Têkilîyê wan a bi mesîhîyên nîştecih ji yên muslumanan hîn çêtir in. Heger mecbûr bimînin tercîha wan xiristîyanî ye."[292]

Li Kurdistanê xisûsen li mîrektîyên Behdînan û Botanê da gelek kurdên xirîstîyan dijîn. Heger bi tevdîr îcabên bawerîya xwe bi cih bînin, dînê wan ne qedexe ye."[293] Giranîya kurdên mesîhî, nastûrî ne. Di binbeşa sedemên dîrokî da em dê bi berfirehî behsa nastûrîyan û qetlîamên hatine serê wan bikin. Alewî an qizilbaş, ji ber bawerîyên xwe di dema Osmanîyan da nemaze di dema Yavuz Siltan Selim da tûşî gelek zilm û zordarîyê mane. "Kurdên bawermend şîatîyê wek mezhebeke nelirê dibînin. Bi taybet qerfên xwe bi destmêja wan a sist û nimêjkirina pênc wextan a ser

---

[288] R. P. Giuseppe Campanile, *Kurdistan Tarihi*, Avesta, İstanbul, 2013, r. 54.
[289] Altan Tan, *Kürt Sorunu*, Timaş Yayınları, 8. Baskı, İstanbul, 2011, 39.
[290] Senar Turgut, *Mezopotamya'da Kürt Uygarlık Tarihi*, Belge Yayınları, İstanbul, 2011, r. 157.
[291] Martin Van Bruinessen, *Kurdistan Üzerine Yazılar,* Wer: Kolektîf, İletişim, İstanbul, 2010, r. 22.
[292] Martin Van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, Wer. Banu Yalkut, İletişim Yayı., İstanbul, 2010, r. 45.
[293] R. P. Giuseppe Campanile, *Kurdistan Tarihi*, Avesta, İstanbul, 2013, r. 113

hev bi lez û bez dikin."[294] Meseleya bîr û bawerîyê û pirsgirêkên dînî-mezhebî jî dikarin wek sedemên derketina şexsan a dîyasporayê bên pejirandin.

Dîn û bawerî di nava kurdan da regezeke mihim a jîyanê ye. Kurd, berîya îslamê piranî bawerîya xwe bi zerdeştîyê dianîn. "Bawerîya zerdeştîyê, doktrîneke dualîst e ku ronahî û tarî, qencî û xirabî hertim di nava pevçûnê da ne. Tîmsala qencî û ronohîyê Hurmuz, nîşaneya xirabî û tarîtîyê jî Ehrîmen e. Hurmuz û Ehrîmen di nava berberîyê da ne."[295] Qismekî kurdan, piştî zayînê di sedsala 3yan da di dema Sasanîyan da bawerî bi dînê manî jî anîne. Bawerîya manî xwarina goşt qedexe dike û aşitîyê tembîh dike. Qismekî kurdan bawerîya xwe bi êzidatîyê anîne. Li gor Roger Lescot (1914-1975) "Çavkanîya êzidatîyê demeke dirêj nepenî meye. Lêkolerên ewil di vî dînî da bawerîyên dêrîn ê rojhilatî (zerdeştî û manî) dîtine. Hin lêkolerên ji vê nazerîyeyê hêz girtine bi wêrekîyeke mezin ferîşteyên êzidî û xwedawendên pagan wekhev dîtine." [296] Lescot, îdîa dike ku êzidatî, mezhebeke jirêderketî ya îslamê ye lê di roja me da tu têkilîya wê bi îslamê ra nemaye.[297] "Ezîdî, bawerîya xwe bi Xwedayekî hetahetayê baş tînin. Vî Xwedayê wek xwedawendê epîkurîstan ji meseleyên dinyevî pir dûr e û ji dûrî ve eleqeya xwe bi van meseleyan tîne. Ji ber vê desthilatdarîya xwe dewrî ferişteyên ku ji wî ra arîkarîyê dikin, kirîye."[298]

Altan Tan destnîşan dike ku "Di nava dîrokê da miheqeq hin kurdan xirîstîyanî pejirandine lê nasnameyên wan ên qewmî di nava ermenî, aşûrî, suryanî û nastûrîyan da helîyane. Îro li hin deveran xirîstîyanên kurdîaxêv hene." [299] Îslamîyet di dema Hz. Omer da li nav herêma kurdan belavbûye. Altan Tan dibêje ku "Di sala 639an da ji alîyê muslumanan bi destxistina bakurê Sûrîye û başûrê rojhilat ê Anatolya û piştî Şerê Qadesîye ya 644an ku rêveberîya Îranê bi temamî kete destê muslumanan, îslamîyet di nava kurdan da bi hêzeke mezin belav bû. Kurdan, muslumantî berîya tirkan bi 200 salî qebûl kirine."

---

[294] Martin Van Bruinessen, *Kurdistan Üzerine Yazılar*, Wer: Kolektîf, İletişim Yayınları, İstanbul, 2010, r. 251.
[295] Altan Tan, *Kürt Sorunu*, Timaş Yayınları, 8. Baskı, İstanbul, 2011, r. 39.
[296] Roger Lescot, *Yezîdîler*, Avesta, 3. Baskı, İstanbul, 2014, r. 17.
[297] Lescot, h. b., r. 17
[298] Lescot, h. b., r. 41.
[299] Altan Tan, *Kürt Sorunu*, Timaş Yayınları, 8. Baskı, İstanbul, 2011, r. 42.

Romannûsên kurd ên dîyasporayê di romanên xwe da ji Xweda û heta pêxemberan ji dîn û bawerîyan heta mezheb û terîqetan û şêx û meleyan gelek rexne li ser mijarên dînî kirine.

2.8.1. Xweda û Pêxember

Romannûsên dîyasporayê ji ber gelek sedeman rexneya Xweda û pêxemberan kirine. Tevî zilm, zor û êş û azara ku kurd dikişînin dîsa jî kurd bi bawerîya xwe ve girêdayîne. Ev mesele bûye nîqaşa lehengên romanan. Kurdan piranî bêdengîya Xweda ya li hember neheqîyên li kurdan tên kirin, rexne kirine. Mahmut Baksi di *Hêlîn*ê da dîyalogekê di navbera mirîşkê û Xweda da saz dike û mirîşk gilî û gazinên xwe bi Xweda dike:

"_Erê çîyê te kêm e mirîşkê?

_ Baş e, ez ê bibêjim.

Mirîşkê gote Xwedê: An hêka min biçûk bike, an qûna min mezin bike! Ez çiriyam lo!"[300] Meseleya "hêka mezin û qûna teng" bûye mijara rexneyên Baksi. Di vê dîyalogê da mirîşk wek metafora kurdan hatîye bikaranîn.

Mahmut Baksi, di *Hêlîn*ê da zordarîya leşkeran a li ser gundîyan dikin, rexne dike û bêdengîya Xweda manîdar dibîne. Gelo Xwedayekî mirov wek berhemên xwe afirandine, çima li hember zerardayîna berhemên xwe bêdeng dimîne û tenê vê dîmenê temaşe dike? Hêlîn dipirse:*"Heke Xwedê heye, çima çavên leşkeran dernaxe?"* [301] Ev pirs wek gazineke mirovan ji Xwedê jî dîkare bê xwendin. Baksi di *Gundikê Dono* da dîsa hebûn û tunebûna Xweda dike mijara guftûgoyan û bêalîtîya Xweda li hember zilma zaliman a li ser mazlûman bi navgînîya vebêjê xwe rexne dike.*"Ku Xwedê hebûya çima belaya Hecî Zorav nedida? Bawerîya Xwedê bawer bike pûç bû. Ew jî weke Faro, bêziman, bêhêvî û rebenek bû."*[302] Vebêjê Baksi, rengdêrên bêzimanî, bêhêvîtî û rebenîyê ji bo Xweda bi kar tîne û bi vî awayî dixwaze mezinahîya Xweda ji ber temaşegerîya wî ya zordaran texfîf bike.

---

[300] Baksi, *Hêlîn, r. 24*.
[301] Baksi, *Hêlîn*, r. 47.
[302] Baksi, *Gundikê Dono, r. 37.*

Firat Cewerî di romana *Maria Melekek Bû* da dema rabirdûya lehengê xwe bi teknîka flashbackê radigihîne xwîneran, cih dide zilma leşkeran. Ew jî wek Baksi bêalîtîya Xweda rexne dike, bi pirsên dijwar, nehatina Xweda ya hawara mazlûman rexne dike û ji devê kesekî bi navê Nûrî Almaz ku di girtîgehê da tûşî êşkenceyê mabû, weha dibêje: *"Ka Xwedê? Çima Xwedê nedihat alîkariya me? Çima Xwedayê dilovan evdên welê zalim afirandibûn?"*[303] Firat Cewerî di *Ez ê Yekî Bikujim* da bi rêya karakterê xwe Temo ve rexneyê li Xweda dike û dibêje *"Ez bawer nakim gunehê min ê bi qurbanê min bê. Ma gunehê Xwedê bi kesî tê?"*[304] Afirandin, nivîsîna qederê û ji ber nivîsîna qedereke berê dîyar e azar û êşkenceyên mirov dikişînin çavkanîya vê rexneyê ne. Li gor Temo, heger gunehê Xweda bi evdên wî neyê çima gunehê evdan bi qurbanîyên wan bê? Lewra li gor vê rexneyê evd jî qurbanîyên Xweda ne.

Hesenê Metê, di *Gotinên Gunehkar* da xwedîlêderketina Xweda wek rexneyeke balkêş derdixe pêşberî xwîneran û ji devê serlehengê novela xwe Behramê Kewaşî -xwendekarê fakulteya ilmê îlahî- weha dibêje: *"Heta salên xwe î gihîştinê bi qasî cihûyekî ez jî li xwedê xwedî derketim."*[305] Di vê gotinê da îronîyeke teolojîk bal dikêşe. Behramê Kewaşî, Xweda dişibîne zarokekî û dibêje *"Min dizanîbû ku Xwedê mîna zarokekî ye ku tu jê hez nekî ew ê sîl bibe. Ew ê bixeyîde."*[306] Ev teşbîh, mezinahî û qudreta Xweda nizm dike. Metê, bi tîmsala zarokan haletên zarokatîyê li Xweda bar dike û wî mihtacî hezkirinê nîşan dide. Herweha xeyda mirovan dike para Xweda jî. Lê rexneya herî giran gotina ku "*Tu jî wî hez neke ew ê sîl bibe*" ye. Ev gotin, hebûna Xweda bi hezkirina mirovan girê daye. Dr. Joanna Bochenska dibêje ku "Li gor fikra Metê, nefsa meziniyê ya Xwedê sebeb û jêderka xirabîyê ye. Ew heta wek sebeba afirandina mirov jî xuya dibe, bi tenê da ku yekî li gor wî qelstir hebe. Xwedayê ku ji hêla Metê ve tê pêşkêşkirin, baweriyê nade mirovan, lê wan ditirsîne. Ew, dinyayê diterikîne û guh nade êş û azara mirovan."[307] Behramê Kewaşî, naxwaze behsa pêxemberan jî bê kirin. Li gor wî êdî kesek guh nade

---

[303] Cewerî, *Maria Melekek Bû*, r. 114.
[304] Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim*, r. 21.
[305] Metê, *Gotinên Gunehkar*, r. 9.
[306] Metê, *Gotinên Gunehkar*, r. 9.
[307] Joanna Bochenska, *Rastiya Veşartî ya Xwedayekî Kolonyal Li Ser Oryantalîzma Edward Said û Gotinên Gunehkara Hesenê Metê*, (Wer.) Umran Aran, Zarema, Sal:1/Hejmar:1/2014, r. 83.

pêxemberan û bawerîya bi wan tu tiştekî îfade nake. Metê, Piştî rexnekirina Xweda dorê tîne ser pêxemberan û wan bêhêz dinirxîne herweha bawerîya bi wan jî bêkêr dibîne. [308]

Hesenê Metê di kişandina êş û azarên mirovan ê dinyayê da para Xweda jî destnîşan dike. Meseleyê tîne ser qedera ku Xweda tayîn kirîye. Karakterê romana *Gotinên Gunehkar* Mekrûs efendî, xeyda xwe ya ji Mesîh weha bilêv dike: *"Min î dît destekî xwedê jî di vê êşa wan de heye û naxwaze alîkariyê bike."*[309] Bi destên Xweda afirandina însanên zalim, çavkanîya van rexneyan e. Hebûn û tunebûna dojehê jî bêmane ye lewra dojeh li gor mekrûs efendî, tenê rewşek e. Mekrûs efendî dibêje *"Ez ji Mesîh şikiyam, ji Xwedê sar bûm. Serwext bûm ku xêra wan tune ye, wekîdin jî cihekî bi navê dojehê tune ye."*[310] Ev hizirên teolojîk, dibin sedema dilsarbûna mirovan Ji Xweda û pêxemberan. Hesenê Metê, van rexneyan weha di nava rûpelên novela xwe da bi cih dike. Behramê Kewaşî, di talîya axaftina bi Mekrûs efendî ra weha dibêje: *"Ji vê xêra Xwedê û pêxemberan gumanek li min jî çê dibe û hîs dikim ku bi qasî nefsa wî, ez jî hêdî hêdî sar dibim."*[311] Di *Gotinên Gunehkar* da Hesenê Metê dîyalogekê di navbera Ahrîman û Xweda da saz dike. Ahrîman ji Xweda dipirse: *"Tu ê çima biafirînî û tu ê çima çavên wan derxînî?"*[312] Ev pirseke ontolojîk e. Di peywenda vê pirsê da rexneyeke di warê nivîsîna qedera mirovan jî heye. Xwedîyê berhemê Xweda, çima bi destê xwe ji berhemên xwe ra qedereke reş dinivîse?

Hesenê Metê di *Labîrenta Cinan* da rexneyekê li jîyana Hz. Mûhammed (Hîcrî 570-632) jî dike. Bavê gundîyekî bi navê Gebranê Baço ku pencî û yek salî ye û dixwaze bi keça feqî Dimso ya duwanzdeh salî ra bizewice ji bo ji xwe ra fitûyê derxe zewaca Hz. Muhammed a bi Hz Eyşeyê ra refere dike û weha dibêje: *"Gelek jinên pêxemberê me jî hebûne hemû jî hipûhelal!... û dema ku bi Hezretî Eyşe re zewiciye salên wî jî di ser pênceyî re bûne (...) hezretî Eyşe ji keça mala feqî Dimso*

---

[308] Metê, *Gotinên Gunehkar*, r. 72.
[309] Metê, *Gotinên Gunehkar*, r. 91.
[310] Metê, *Gotinên Gunehkar*, r. 93.
[311] Metê, *Gotinên Gunehkar,* r. *94.*
[312] Metê, *Gotinên Gunehkar*, r. 119.

jî piçûktir bûye wê çaxê."[313] Gelek gundî, zewacên pêxember wek sinet dibînin û nefstenikîya xwe bi vê meseleyê dinixumînin. Zewaca pêxember a bi Hz. Eyşeyê ra ji bo zewaca keçên temenbiçûk hem ji alîyê bav û birayên keçan ve hem jî ji bo kesên ku wan dixwazin wek referansekê tê dîtin. Hesenê Metê, bal dikêşe ser vê meseleyê û dibêje jinên ku li hember van zewacan derdikevin bi referansên xurt ên dînî tên situxwarkirin û jinên belengaz ji bêgavî dibin qurbanîyên civaka eşîrîyê û tradîsyona polîjînî bi vî awayî didome.

Hesenê Metê di novela xwe ya *Li Dêrê* da ji devê vebêj-nivîskar, rexneyekê li Hz Îsa û Xweda dike û dibêje *"Mesîhê ji Nasiriyê ... çi meriv û çi Xwedayekî xwe î reben..."*[314] Xwedayê ku dema Hz Îsa kişandin çarmîxê bêdeng ma û arîkarîya pêxemberê xwe nekir, bi bîr tîne û rêngdêra rebenîyê bi Xweda ve vedike. Yên ku li ber zilma zaliman deng neke, li gor vebêjê Metê, reben e; çi mirov, çi Xweda ferq nake. Metê, di heman novelê da bi navgînîya lehengê xwe Bilind Zaxoyî, rexneyeke tund li pêxemberan dike û di nava gotinê da kitêbên pîroz ne wek kelamên Xweda lê wek gotinên pêxembaran dinirxîne. Bilind Zaxoyî dibêje *"Min pir dixwset mîna pêxemberan ez jî wan gotinên xwe li keviran bikolim ku weke narihetiyeke ji Xwedê her û her bimîne."*[315] Bi vî awayî rê li guftûgoya hebûn û tunebûna Xweda vedike an jî dixwaze bala xwîneran bikişîne ser têkilîya pêxemberan û kitêbên pîroz ango teblîxa bi rêya wehîyê. Di novela *Hefsar* da jî Hesenê Metê ji devê serlehengê xwe Germîyan ku qedereke reş ji zarokatîya wî heta dema jîyana wî ya dîyasporayê dev ji sikura wî bernedaye, gazinên ji Xweda dike û dibêje *"Dizanim ku ez deng bikim, ji bilî gotinên gunehkar ti gotin ji devê min dernakeve.*[316] Di van gazinan da teslîmîyeteke nêzî serîhildanê heye. Gotinên ku Xweda di warê qederê da rexne dikin û mirovan pasîvîze nîşan didin, bingeha rexneyê ava dikin. Biryara dawî ya Xweda ye lê çima mirov ji bo kiryarên xwe wê di mehkemeya îlahî da werin darizandin?

Helîm Yûsiv di *Firîna bi Baskên Şikestî da* li ser meseleya mirin an jî kuştinê disekine û Kuştina bi destê evdan, bi neqilkirina dara gwîzê ji devê oldaran weha

---

[313] Metê, *Labîrenta Cinan*, r. 51.
[314] Metê, *Li Dêrê*, r. 8.
[315] Metê, *Li Dêrê*, r. 35.
[316] Metê, *Hefsar*, r. 81.

rexne dike: *"Çima ewên tên kuştin ne bi emrê Xwedê dimirin, qey?* [317] Madem ku Xweda, mirov afirandîye divê ji bilî Xweda tu kesî nikariba mirov bikuşta. Dayika Cîhanê, li ser meseleya qedera ku bi destê Xweda ji mirovan ra rewa tê dîtin vê rexneyê dike: *"Ev çi zilme Xweda, ev çi êş e Xweda, ev çi qeder e te kirîye para me Xweda."*[318] Heger qeder be çima weha hatîye nivîsîn û bûye para kesên bi destên xelkê tên kuştin?

Helîm Yûsiv li hember kiryarên kes an jî kom û ceme'etên ku li ser navê Xweda yan jî ji bo razîbûna wî qetl û qitûlê dikin, bi navgînîya lehenga bi navê Fatma Berkel ku serborîya jîyana xwe ya bi qehr û qotik vedibêje, cih dide vê rexneyê: *"Bi qêrîna 'Ellahûekber' re heft guleyên din berdan serê min. Wan kêliyan nizanim wî Ellahê mezin ên ku wan bi navê wî bang dikirin, bi rastî li wan guhdarî dikir?"*[319] Ew kesên ku serê mirovan bi şûran dibirin, ew celadên ku guleyan bi qêrînên "Ellah û ekber!" bera laşê mirovên destgirêdayî didin, aya çi qasî ji Xweda haydar in; an jî Xweda çima temaşegerîya zilma wan a ku li ser navê wî yê pîroz dimeşînin, dike? Vebêj-lehengekî din ê bi navê Şêx Mehran jî matmayîna xwe ya li hember qetlîamên Daîşîyan weha tîne ziman: *"Çawa Xwedê li ezmanan rewşeke wanî dipejirand? Bi dehan kujerên bi çek ketibûn nav xelkên sîvîl, bêgûneh û di xew de yeko yeko dikuştin."*[320] Kesên ku qaşo ji bo Xweda celadîya evdên Xweda yên bawermend dikin, bi kîjan qanûna îlahî vî mafê kuştinê didin xwe? Helîm Yûsiv, vê şerîeta ku DAÎŞ damezirandîye û li ser mumînan dimeşîne bî mînakên dramatîk şênber dike. Lehengekî ku nivîskar, bi navê Hecîyê heftêsalî behsa wî dike, rexneyeke nakokîya rewşê tîrtir dike li ber xwîneran radixe û dibêje *"Dema min li ser sicadeyê bi nimêjê qedandîye ji hemû salên temenê te dirêjtir e. Tu jî hatî bi navê wî Xwedayê ku min ew qasî jê re nimêj kirîye min bikujî."* [321] Bi navê îslamê û şerî'etê kuştina kesên musluman li ser secdeyê, îflasa mejî ye. Di romanên Helîm Yûsiv da gelek rexneyên bi vî rengî li ser DAÎŞê û qetlîamên wê derdikevin pêşberî me.

---

[317] Yûsiv, *Firîna bi Baskên Şikestî*, r. 38.
[318] Yûsiv, *Firîna bi Baskên Şikestî*, r. 59.
[319] Yûsiv, *Firîna bi Baskên Şikestî*, r. 101.
[320] Yûsiv, *Firîna bi Baskên Şikestî*, r.107.
[321] Yûsiv, *Firîna bi Baskên Şikestî*, r.115.

Jan Dost di *Mîrnameyê* da li ser pirsgirêka di navbera Xweda û şeytan da disekine û şeytan, wek parçeyekî çîroksazîya kaînata ji alîyê Xweda ve hatîye ava kirin, dinirxîne û dibêje ku Xweda çawa emir kiribû şeytan jî wisa emrê Xweda bi cih anîbû. Ji ber vê yekê gunehê wî tune bû.[322] Şeytanê ku mecbûrî lîstina vê lîstikê bû, li gor gotinên ku Ehmêdê Xanî ji şemsoyê Qewwal ra dibêje, ne rewayê lanetê ye ku mirov lêbibarîne. Li gor lehengê *Mîrname*yê Ehmdê Xanî, Şeytan bi serîhildana li hember Xweda û rola xwe ya di îmtîhana mirovan a li dinyayê da dîsa arîkarîya Xweda dike û toqa lanetê bîlasebeb ketîye stûyê şeytan.

Jan Dost di *Mijabad*ê da ji ber bûyera tehcîrê ku di sala 1915an da li ser ermenîyan ve hate ferzkirin, disekine û vê bûyerê, wek nîşaneya newêrekîya Xweda destnîşan dike. Jan Dost, bi gotinên ermenîyekî bi navê Nûbar Nalbendîyan, rexneyeke teolojîk li Xweda dike. *"Eger Xwedê hebe jî wê Xwedayekî newêrek be."*[323] Li gor Nûbar Nalbendîyan, bêdengîya li hember vê meseleyê encax bi newêrekîyê dikare bê îzehkirin.

Jan Dost di *3 gav û 3 darekê* da mezinahîya Xweda û mezinahîya wan sêdarên ji bo îdama Şêx Seîd û rehevalên wî hatine çikandin, bi navgînîya lehengê romanê Şex Seîdê Pîran, miqayese dike. Şêx Seîd dibêje *"Gelo ji van sêdaran jî mezintir e xwedê?"* [324] Bi vê gotarê, bêdengîya Xweda li hember vê buyerê rexne dike. Vebêjê Jan Dost destnîşan dike ku *"Ji bilî sêdaran wî çel û şeş sêdarên dî di wê meydanê de bi xwe pirseke ji werîsan bû ji xwedayekî guhşimakirî dihete kirin."*[325] Jan Dost, bêdengîya Xweda bi nebîhîstina wî ve girê dide.

Jan Dost di *Naqosên Romayê* da cih dide rexneya pêxemberan. Lehengê romanê Keşe Lusyano di axaftineke xwe ya li gel Eşiq Mihemedê Antakî ra pêxemberan tevî peywira wan a rêberîyê jî wek sedemên nakokîyên di nava civak û miletan da dibîne.[326] Li gor Keşe Lusyano, pêxemberan ji bili kîn û xerezê tiştekî baş nîşanî me nedane.

---

[322] Dost, *Mîrname,* r. 188.
[323] Dost, *Mijabad* , r. 60.
[324] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 41.
[325] Dost, *3 gav û 3darek*, r.114.
[326] Jan Dost, *Naqosên Romayê*, r. 62.

Romanên dîyasporayê, Xweda wek sersebebê gelek êş û azarên mirov dikişînin nîşan dane û romannûsan bêdengîya Xweda ya li hember zor û zilmê rexne kirine. Pêxember jî piranî bi pasîvîzebûnê tewanbar kirine. Carinan jî pêxember wek sedema nakokî û pevçûnên nava civak û miletan destnîşan kirine.

2.8.2. Rexneya Îslamê

Dînê îslamê di nava kurdan da dînê herî berbelav e. Ji dema Hz. Omer û heta roja me exlebê kurdan bawerîya xwe bi îslamê anîne û xwe teslîmî Xwedayê mihriban û dilovan kirine. Di romana kurdî ya dîyasporayê da bi giştî nêrîneke neyênî li hember îslamê heye. Romanên ku atmosfera mîstîk-îlahî bikartînin jî gotarên dînî ango referansên dînî bi qerfî bi kar tînin û di nava gotinan da rexneyên nixumandî bi cih dikin.

Mahmut Baksi di *Hêlîn*ê da ji devê Hêlîna zarok, rexneya perwerdeya dînî dike. *"Min ji xwendina Quranê tiştek fam nedikir. Quran bi erebî hatibû nivîsandin. Ew jî weke tirkî zimanekî bîyanî bû."* [327] Zimanê Qur'anê ku ji zarokan ra zimanekî bîyanî ye tenê wek alfabetîk tê fêrkirin û zarok bi herikbarî bixwînin jî tu maneyê ji vê kitêbê fêmnakin. Baksi vê perwerdeya elîfbayî ya kitêba pîroz rexne dike.

Mahmut Baksi di *Gundikê Dono* da cih dide rexneya, di îslamê da destûra ji bo anîna çar jinan ji mêran ra hatîye dayîn. Baksi ji devê axayê gund Hecî Zorav ku sê jin anîye û dixwaze jineke din bîne, gotineke Hz. Muhammed refere dike û vê îcazeta dînî bi şêwazeke qerfî li ber çavan radixe. *"Pêxemberê axirê zeman bi xwe gotiye: Ên xwedî mal û milk, ên bi qudret karin ji xwe re çar jinan bînin.*[328] Têkilîya hebûna mal û milk û anîna jinên hewî jî balkêş e. Baksi dixwaze bibêje ku di çavê civaka eşîrîyê da ferqa mal û milk û jinê ji hev tuneye.

Mehmed Uzun di *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* da cih dide rexneyeke dîrokî ya derheqê îslamê û bawermendên wê. Uzun, ji devê dengbêjê kovara Hewarê Ehmedê Fermanê Kîkî, zilma li ser êzidîyan rexne dike. *"Ew di nav behra misilmanan de giraveke biçûk a kevnare bûn. Tirk, ereb, ecem, kurdên misilman û*

---

[327] Baksi, *Hêlîn,* r. 32.
[328] Baksi, *Gundikê Dono, r. 47.*

ermen bi dujminahî li wan dinêrîn û şûrê xwe li ser serê wan hildidan." [329] Bêtoleransîya dînî di vê rexneyê da bal dikêşe. Li gor Christine Allison êzidî ne musluman in ne xirîstîyan ne jî yahûdî ne û ji ber vê çendê ne ehlî kitêb in.[330] Mehmed Uzun di *Hawara Dîcleyê* da ji devê dengbêj Biroyê êzidî, dibêje ku êzidî ji tirsa muslumanan birêkûpêk nikarîbûn duayên xwe bixwînin û peywirên xwe yên dînî bi cih bînin. Broyê êzidî dibêje ku *"Jibîrbûyî êzidî ne, ku bav û kalên min in, ku he tim li serê çiya û newalên kûr ên welatê êzidiyan, tên kuştin, hertim ferman û talana wan radibe."*[331] Ferman, kuştin û talanên ji alîyê muslumanan ve li ser êzidîyan hatine tetbîqkirin, hemû ji ber dîn û bawerîya wan e. Tunebûna toleransa dînî, fokûsa vê rexneyê ye.

Tewanbarkirina êzidîyan a bi hebandina şeytên jî ji bo gelek kesên musluman tiştekî ji rêzê ye. Kurdên musluman ku tevî naverok û remzên dînê êzidatîyê nizanin dîsa jî wan bi hebandina şeytên sûcdar dikin û wan wek zarokên şeytên binavdikin. Uzun, vê meseleyê bi gotinên Dengbêj Biro, weha dramatîze dike: *"Xelkê bajêr nemaze zarok û xortên ehlê misilman, mîna ku êzidî ji dinyayeke din û mehlûqatên neçê bin, heqaret li wan dikirin, zarok diketin pey wan û diqîriyan: Kurên şeytên hatin, kurên Şeytên…"*[332] Dengbêj Biro; şer û pevçûnên di navbera mîrekîyên kurdan û keldan û asûrîyan jî bi dijminahîya di navbeyna musluman û 'fileh'an da îzeh dike û wan wek dijminê axretê bi nav dike.[333] Li gor vebêjê Uzun, musluman û fileh li vê dinyayê bi hev ra bijîn jî li axretê rê û rêçikên wan sitûnên bawerîya wan li ser nigan dihêlin ne wek hev in. Ji ber vê yekê cîyawazîya bawerîyên xwe vegûhestine dijminahîya dînî. Uzun, destnîşan dike ku hin miftîyên muslumanan jî "fetwayên xwîn helalî"ya wan dane. *"Ew filehên pêncperan (keldan Ew ku li hember dînê îslamê rabûne? Xwîna wan helal, kuştina wan sewab e!..."*[334] Mehmed Uzun di civaka kurdan da binavkirina asûrî û keldanan wek "fileh" jî rexne dike. Dengbêj Biro dibêje*"Navê wan bi tenê file, heye ku carinan asûrî û kêm caran jî keldan bi*

---

[329] Uzun, *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê*. r. 120.
[330] Christine Allison, *Yezidi Sözlü Kültürü*, (Çev.) Fahriye Adsay, Avesta, İst, 2007, r. 59.
[331] Uzun, *Hawara Dîcleyê*, r. 16.
[332] Uzun, *Hawara Dîcleyê*, r. 172.
[333] Uzun, *Hawara Dîcleyê*, r. 279.
[334] Uzun, *Hawara Dîcleyê*, r. 289.

tenê hew qas."[335] Gotina "fileh"tîyê di maneya xwe ya ferhengî da çavsorî û çavnebarîyeke kûr dimeyîne û li gor vebêjê Uzun, dibe sedema qetl û qitûlên ji dewr û dewranên qedîm mîrate mayî. Ev gotina filehtîyê, rik û xezeba di nava gelan da gwîr û geş kirîye.

Di belavbûn û geşbûna îslamîyetê da bi navê "fetih"ê êrîşên leşkerî pêk hatin û gelek milet ji dînên xwe yên bav û kalan bi darê zorê hatin bidûrxistin û bêgav man derbasî îslamîyetê bibin. Mehmed Uzun, ji devê lehengekî xwe yê bi navê Hemê, ku hevalê Dengbêj Biro ye, belavkirina dînê îslamê ya bi vî rengî jî rexne dike, serdestî û bindestîya bawerî û bawermendan wek şaşîyekê dinirxîne û dibêje ku ew dewletên ku îslamîyet pejirandin, dînê Mihemed û Qur'an û şerîeta wê li hember bindestan wek şûrê serdestîyê bi kar anîn.[336]

Fırat Cewerî di *Payiza Dereng* da rexneyeke epîstemolojîk li îslamê dike. Qur'ana pîroz ku bi fermana "Bixwîne!" dest pê dike, hîmê dînê îslamê li ser xwendin, zanîn û rasyonalîteyê datîne, li malên muslumanan bi dîwar ve daliqandî ye û piranî ji bilê vê kîtêbê tu kitêb li malên exlebê muslumanan peyda nabe. Lehengê romanê Ferda, ve nakokîya epîstemolojîk a civaka îslamê rexne dike. *"Kitêbên ku li malên welêt hebûn Quranek bû û devê wê Quranê jî kêm caran vedibû."*[337] Cewerî di *Ez ê Yekî Bikujim da* cîyawazîya di navbera musluman û mesîhîyan ji alîyê tirs û hezkirinê miqayese dike. Temo, dibêje *"Gava di hepsê de, hevalekî min got misilman ji Xwedayê xwe ditirsin, mesîhî jî ji ê xwe hez dikin."* [338] Ji alîyê teolojîk ve girêdana evdan bi Xweda li ser esasê hezkirinê be miheqeq ji tirsê çêtir tesîreke erênî li ser derûnîya mirovan dihêle.

Muslumanên nezan, bi nêrîneke neyênî li dînê êzidatîyê dinêrin. Teasûbeke dînî, gîyanê wan zeftkirîye û li hember êzidîyan toleransa wan a dînî pir qels e. Têkilîya bi êzidîyan ra heram dibînin û di çavên wan da kesên bi wan ra rabin û rûnên jî necis dibin û ji civakê tên bi dûr xistin. Malbat wan di nava xwe da nahewîne ango ji bo pêşîya têkilîyên bi êzidîyan ra bê girtin malbat, guvaşeke civakî li ser van kesan tetbîq dike. Cewerî bi rêya gotinên ciwanekî, vê teasûba malbatên

---

[335] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 19.
[336] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 371-372.
[337] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 256.
[338] Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim*, r. 36.

musluman şênber kirîye: *"Gava bavê min bihîst ku ez li cem malbateke êzidî dimînim, wî got ji destpêkê ve xwîna min heram bûye, ez niha bûme gunehkareke mezin û divê careke din nema lingên xwe bavêjim mala wî."*[339] Li gor Hesenê Metê mesele ne meseleya îman û îbadetan e. Mesele rêya heqî û heqîqetê ye lê kesên ku dibêjin qey dîn, tenê ji remzên îlahî û rêziknameyên şeklî ve îbaret e, meseleya kakilê dînan fêm nekirine an jî şaş fêm kirine. Armanca azan û naqosan heman tişt e. Metê ji devê lehengê xwe Behramê Kewaşî weha dibêje: *"Serwext dibim ku dengê Bîlalê Hebeşî û dengê jamên dêran negêhiştîye derekê."* [340] Metê, gotinê tîne ser aliman û rexneyeke giring ji devê Ahrîman dike. Metê, alimên ku li ser navê dîn çîrok û efsaneyan lidardixin û wan wek naveroka dîn pêşkeşî bawermendan dikin, di nava novela xwe da bi cih dike. [341] Dema çîrok ji nava dînan derkevin mîna qalikên gwîzan ji nava kakilan bê avêtin dê di destê keç û lawên ademî da tenê kakilê bawerîyê ango cewhera fikira îlahî bimîne.

Hesenê Metê di *Tofanê* da ji alîyê fikira dogmatîk ve bawermendên musluman rexne dike. Vebêjê Metê weha dibêje: *"Xwedê hinek ji axê û hinek jî ji rêxê çêkirine ew qas!..."*[342] Muslumanên ku derheqê afirênerîya Xweda ve heta radeyekê difikirin û ji xalekê û pê ve dibêjin kar û mûcîzeyên Xweda ne û nema pey esrara van mûcîzeyan dikevin, bi awayekî îronîk bi lêv dike. Hesenê Metê, rexneya hin kesên wek şêx û mela ku xwe wek nûnerên dîn û bawerîyê dibînin û li ser navê îslamê şîret û hişyarîyan li ser bawermendan dibarînin, ji devê vebêj-lehengê xwe rexne dike. Rêdarên pêxemberan jî tevî nesîhetên şêx, mela û ewlîyayan dike û di nava ayîn û rîtuelên dînî da acizî, bêzarî û tevlihevîya hişê mirovan tîne zimên.[343]

Hesenê Metê bi nêrîneke reddîyeyê li meseleya bawerîyê dinêre û dogmatîzma ramanî ya dînî dide alîyekî û dîn, Xweda, pêxember û kitêbên pîroz ji devê vebêjê xwe, wek afîrînerîya mirovan nîşan dide. Vebêjê Metê, dibêje ku ez tîpên rûpelên kitêbên îlahî diavêjime devê xwe û ji wan gotinan, Xwedayekî û pêxemberan çêdikim û xwe diavêjim dilovanîya wan, li ser navên wan pêxemberan

---

[339] Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim,* r. 36.
[340] Metê, *Gotinên Gunehkar,* r. 130.
[341] Metê, *Gotinên Gunehkar,* r. 131.
[342] Metê, *Tofan,* r. 18.
[343] Metê, *Tofan,* r. 19.

selawatan direşînim.[344] Hesenê Metê bi van gotinan tofana di hişê karakterê xwe da di atmosfereke kaotîk da dişayesîne. Zülküf Ergün derheqê mijarê da weha dibêje: "Hesenê Metê jî wek endamê civakeke rojhilatî, ku gotara dînî li ser nirx û çanda wan zal e û teşe daye hizir û xeyalên wan, bi her sê romanên xwe yên *Gotinên Gunehkar*, *Li Dêrê* û *Hefsar*ê û bi çend çîrokan berê xwe dide vê mijarê û bi çendîn mekanîzmayan gotara dînî ya serdest a nav civaka kurdî hildiweşîne." [345]

Helîm Yûsiv, di *Sobarto*yê da bi rêya Silêman, bawermendên musluman ên kurd ji alîyê ziman ve jî rexne dike. Kesên ku her hefte roja înê diçin mizgeftan û li ser xalîçeyên mizgeftê çongvedidin û li mele an jî seydayan guhdarî dikin ji ber ku xitbe, dua û ayet û hedîs ne bi zimanê wan tên vegotin, tu tiştekî ji xitbeyê fêm nakin û bi ser da jî dibêjin amîn, para xwe ji rexneya Helîm Yûsiv digirin.[346] Ev rexne bi giştî rexneya îslamê ya yek zimanî nemaze hegemonyaya erebî ya îbadetê ye.

Helîm Yûsiv, nakokîyên wekhevîya jin û mêran a di îslamê da tîne zimên û serdestîya parastina mêran a di fiqiha îslamê da û neheqîyên ku ji jinan ra rewa têne dîtin, di dîyalogeke di navbera Azad û Sandrayê da diqewime, rexne dike. Azad dibêje *"Hat bîra min ku di îslamê de şehdebûna du jinan bi ya mêrekî tê hesibandin. Lê min behsa vê yekê nekir."*[347] Ev nakokî gelek caran tên piştguhkirin. Ji bilî vê rewşê di şer'a mîrasê da jî û gelek meseleyên fiqihî û şer'î da wek wan nimûneyan qapana şerîeta îslamê ji alîyê mêran ve girantir derdikeve.

Jan Dost di *Mijabad*ê da di dîyalogeke di nava Hejar û Hemîn da derbas dibe rojîya meha remezanê dike mijara rexneyê. *"Hejar pirsî: 'rast, çend roj ji Remezanê re mane?' Ez keniyam û min got: 'Mahî ku sûdnedaştê, şûmerdenî rozhaş beray çi?'"*[348] Di vê rexneyê da meha remezanê wek meheke bêfayde tê destnîşankirin û rojjimartina bawermendan a vê mehê tê rexnekirin. Jan Dost, dixwaze bibêje ku birçûbûna kesên ku faydeya wan ji feqîr û fiqareyan ra tune ye, tenê birçîbûna zik e, ew jî birçîbûneke bêwate ye.

---

[344] Metê, *Tofan*, r. 20.
[345] Zülküf Ergün, *Hilweşangerî di Berhemên Hesenê Mêtêyî da*, Anemon Muş Alparslan Üniv. Sosyal Bilimler Dergisi, (10) 1-19.
[346] Yûsiv, *Sobarto*, r. 30.
[347] Yûsiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, r. 82.
[348] Dost, *Mijabad*, r. 190.

Jan Dost di romana *Kobanî*yê da cahiltîya kurdên musluman bi nimûneyeke amûra mûzîkê destnîşan dike. Lehengê romanê Hec Mislim, ji lawê xwe Baranê panzdeh salî ra sixêfan dike û ji bo lêdana tembûrê lawê xwe tehqîr dike: *"Baxlemê tenbûr e, ziqûm e, gi gû ye, heram e. Ma ti fedî nakî ti cîranê merqedê Seydayî law?"*[349] Demeke din lawê wî Baran dixwaze çarîneyeke Omer Xeyyam (1048-1131) bike wêne. Baran dibêje *"Gava bavê min ew dît, bi ser min de rabû, hêrs bû û bi gef gote min: Eger tu vî karî dubare bikî ez ji te re zanim. Ma tu nizanî ev heram e.!"* [350] Bavê wî li hember vê daxwazê jî derdikeve lewra li gor bavê miteasib ev daxwaz di îslamê da qedexe ne. Di civaka kurdan a îslamê da gelek nimûneyên bi vî rengî hene ku bingeha wan a fiqihî ne tekûz e, lê di nava gelê kurd da wek qanûnên îslamî cihên xwe girtine û mirovan di nava manewîyata wan da bêhnteng dikin û ciwanan ji îslamê sar dikin.

Jan Dost di *Kobanî*yê da cih dide rexneya îslama nûmerîk. Dost, di dîyalogeke di navbera Hec Mislim û lawê wî Baranê ku terkîsela ye diqewime û mijara wê hejmara rekatên nimêja muxrub e, ji devê Baran weha dibêje: *"Va çi Xwedê ye ku nola tucaran e, hesabî xwe bi reqeman meriyan ra dibînê! Pênc bin çi, deh bin çi, yek be çî?"* [351] Di xwendina ayet û duayan da û di kişandina werdên tesbîhatan da jimarên ku dişibin defterên mihasebeya tucaran, li gor Baranê ciwan, bêwate ne, dubare ne û asêkirina dînê îslamê ya bi hesabên hendeseyî, şaş famkirina îslamê ye.

Jan Dost di seranserê romana *Kobanî*yê da -ji ber mijara romanê- gelek caran rexneya DAÎŞê dike. Şohreta celadîya serbaz û neferên DAÎŞî ku li dinyayê belavbûye bi sahneyên bixof ku xwîna mirovan dicemidîne li ber çavan tên raxistin. Celladekî DAÎŞî ji Çeçenistanê bi navê Ebû Şamîl El Daxistanî, dema ji celladê bi navê Zîyad ra behsa teknîkên serîbirînê dike, weha dibêje: *"Hemû serbazên Dewleta Îslamê weha ne, di destpêkê de. Tu yê fêrî serbirrînê bibî, tu yê zewqê jê bistînî."*[352] Serbazên ku zewqê ji serbirrîna mirovan digirin, dibin armanca tîrên rexneyê.

---

[349] Dost, *Kobanî*, r. 87.
[350] Dost, *Kobanî*, r. 334.
[351] Dost, *Kobanî*, r. 177.
[352] Dost, *Kobanî*, r. 290.

Jan Dost, têkilîya îman û azadîyê di romana *Pîrewergêr* da dinirxîne. Dost, ji devê lehengê xwe Rahîbê Marûnî Bûlis dibêje ku *"Îman tu carî ne koletî ye lê ew azadî bi xwe ye."*[353] Bawerîya ku mirov aciz bike, bêhnteng bike, sînorên jîyanê teng bike, li gor Rahîbê Bûlis, mirovan dike kole. Dost, derheqê bawerîya ji dê û bavan derbasî keç û lawan jî dibe, bi tevdîr tevdigere û kesên ku bêfikir û hizir bawerîya xwe ango îmana xwe ji dê û bavên xwe digirin, wek kole dibîne.[354] Li gor Jan Dost divê bawerî ji hiş û mejî dawerive. Di romana *Naqosên Romayê* da Jan Dost, bêtehemulîya miftîyên îslamê li hember dîn û bawerîyên din bi navgînîya Rahîbê Bûlis, rexne dike. *"Êdî eger her alîyek wek te û wan muftiyên Dewleta Osmanî bifikiriya, wê her miletek di sînorên berteng de îzole bibûya û wê her tayfîyek ji ya din veqetiya."*[355] Şaşitîya binavkirina welatên cihûyan a bi rengdêrên "kafir" û "gawir" bi referansa ayetekê rexne dike û sînortengkirina îslamê wek xetereyekê dibîne.

2.8.2.1 Şêx

Di civaka kurdên musluman da şêx, pêşengên dînî yên civakê ne. Xwedî karîzmayeke teolojîk in. Di sîlsîleya meratib a dînî da piştî ewlîyayan tên. Kesekî ku wek şêx bê naskirin li derdora wî mirîd dicivin. Mirîd bi maneya kesê ku îradeya xwe teslîmî şêxekî kiribe tê bikaranîn. Şêx di civakê da xwedî keramet tên zanîn. Bi saya hêza mirîdên xwe hem dewlemend dibin hem jî hêzeke wan a civakî çê dibe. Ilmê hin şêxan qels e, tevî ilmên xwe yên qels jî di civakê da payeya wan ji mideris, seyda û melayan balatir e. Dema şêx bimire lawê wî yê ku wek xelîfe hatîye tayînkirin tê şûna bavê xwe û wek şêxê postnişîn dibe rêberê mirîdên bavê xwe. Îradeya wan mirîdan jî îpotekî îradeya şêxê nû dibe.

Martin Van Bruinessen destnîşan dike ku "Di navbera salên 1820-1860an da li Kurdistanê di hejmar û faalîyetên şêxan da zêdahîyeke mezin hate qeydkirin. (…) sedemên vê yekê jiholêrabûna mîrektîyên kurdan û teşebisên Împaratorîya Osmanî ya bihêzkirina otorîteya navendî ya pergala îdarî ye." [356] Civaka kurdan, şêxan tenê

---

[353] Dost, *Pîrewergêr*, r. 76.
[354] Dost, *Pîrewergêr*, r. 77.
[355] Dost, *Naqosên Romayê*, r. 35.
[356] Martin Van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, Wer. Banu Yalkut, İletişim, İst., 2010, r. 114.

ne wek mirşid lê wek xelasker jî dibînin. Bi qewlê Biruinessen "Li Kurdistanê hîn jî gotineke meşhûr heye: Ê ku şêxê wî tune be, şêxê wî şeytan e."[357]

Şêx û axa, destbirakên hev in. Tirsa çoyên axayan bi şeqşeqa tizbîyên şêxan, xofeke kûr dixe dilê gundîyan. Axa, fitûyên karên xwe yên qirêj piranî ji destên şêxên sexte digirin û bi hikmê van fitûyên bêbingeh, zilm û zora xwe dimeşînin. "Şêx, piranî bi keçên serokên eşîran ra dizewicin. Ev zewac ji alîyê şêxan ve wek nîşaneya pejirandina şêxîtîya wan tê dîtin. Ji bo her du alîyan jî ev eqrebatî, (ne pir ewle be jî) dema ku ji bo hêzgirtinê têkevin reqabetê, misogerî ye ku dê li hember hev zêde ne bêmerhemet bin."[358] Axa bi boneyên curbicur çavkanîyên dahatûyên xwe zêde dikin. Bo nimûne Basil Nikitin dibêje ku "Axa bi navê heqê zewacê gayekî digire. Yê ku cezayan wek pere an jî mal digire dîsa axa ye. Şêx jî ji bo sinetê di navbera du an jî dehan mîh û ji bo zewacê jî di navbera penc û panzdehan da mîhan û ji bo qewirandina cinan jî yek an du mîhan digire." [359] Ango ji bo berjewendîyên xwe axa û şêx hertim şirîkên hev ên mizawir in.

Di romana kurdî ya dîyasporaya da romannûsan bi her hincetê rexneyên tund li şêxan û şêxîtîyê kirine. Şêx wek sedemeke paşdemayîna kurdan û cahiltîya wan hatine nîşandayîn. Mahmut Baksi di *Hêlîn*ê da ji devê mamosteyê gund ,bavê Hêlînê, şêxan dişibîne şeytanê mezin an jî marê deqdayî.[360] Ev gotin li hember gotina kurdan a gelerî ku "Ê ku şêxê wî tune be şeytan e" wek antîtezekê di romanê da hatîye bi cihkirin û şêx, wek şeytan hatîye îlankirin. Hevkarîya şêx û axayan di romana *Gundikê Dono* da tê rexnekirin Vebêjê Baksi, destnîşan dike ku şêx û axayê Kurdistanê, xaka Kurdistanê di nava hev da bihost bihost parvekirine. Şêx bi saya hezaran mirîdên xwe û dîyarî û weqfîyeyên wan dibûn xwedîyê erd û erazîyên berfireh û bi hezaran gundîyan ji wan ra koletî dikirin.[361] Baksi, meseleya dewlemendîya axayê Gundikê Dono bi arîkarîyên gundî û mirîdan rave dike.[362] Li gor vebêjê Baksi, xelkên ku tapoyên milkên xwe didin şêx, ên ku dewaran dibin ber derîyê wî girê didin û ên ku pereyan didin, çavkanîya vê dewlemendîyê pêk tînin.

---

[357] Bruinessen h. b., r. 318.
[358] Bruinessen, h. b., r. 346.
[359] Basil Nikitin, *Kürtler*, Örgün Yayınevi, İstanbul, 2010, r. 273.
[360] Baksi, *Hêlîn*, r. 35.
[361] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 26.
[362] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 28.

Keramet ji bo şêxan zehf giring e. Şêxên ku nikaribin kerametan nîşanî kesî bidin, şêxîtîya wan nayê pejirandin.. Divê keramet bên nîşandan da ku devê bêrîkên mirîdan vebin û zêr, pere biherikin cêrên şêxan. Baksi di *Gundikê Dono* da ji devê vebêjê romanê, rexneya şêxekî mizawir dike ku wî bi rêya dizan, xelk dişeland û pişt ra qaşo keramet nîşan dida.[363] Vebêjê Baksi, hunerên şêxê xapînok ku şeytan didexîsinin, rêz dike. Şêxê ku bi lîstika rengên mînderan çawa mirîdên xwe dixapîne û vê yekê wek keramet nîşan dide, li ber çavan radixe: *"Di odeya şêx de deh mînder raxisti bûn. Her mînderek bi rengekî û her reng bi maneya tiştekî bû.*[364] Ev hemû lîstikên kerametan ji bo îspatkirina şêxîtîyê ne. Delîl tune be dê kî bawerîya xwe bi şêxan bîne? Divê miheqeq delîl hebe ku keramet bibe benîştê nav sî û du diranan û li nav êl û eşîran olan bide. Bi neqila mirîdan bereket dikeve kerametan. Carinan jî kerametên şêxan, ji wan menqûl in. Welhasil şêx nafirin, mirîd wan difirînin.

Şêxên doxînsist jî dibin armanca tîrên rexneyên Baksi. Şêxên nefstenik ku sê çar jinan tînin û bi ser da jî çavên xwe bera keç, bûk û jinên xelkê didin, ji bo doxînsistîya xwe binixumînin serî li derewên wek 'paxila şêx derîyê cinetê ye' didin. Jinên diketin paxila şêx, li gor vebêjê Baksi, ji ber vê rewşê ne şermezar bûn û heta pesnê vê rewşê didan û razana bi şêx ra wek rûmetekê didîtin, bi paxila şêx, şanaz dibûn.[365] Baksi, di nava herikîna romanê da bi dramatîzasyoneke prolekirî bi dehan bêjîyan ji van têkilîyên şêx û jinan sadir dike û bi vê cure gotinên îronîk rexneya şêxîtîyê dike. *"Di nava çend salan de li warê Xerzan bi dehan bêjiyên Şêx Evdilhekîm çê bûbûn."*[366]

Mahmut Baksi, di *Gundikê Dono* da bi rêya gundîyekî bi navê Zibêrê Ehmê destnîşan dike ku şêxên sextekar, hertim ji bo berjewendîyên xwe bi destê îqtîdarê girtine û emir û fermanên ji devê mûqtedîran derketine, bi rêzdarî anîne cih. Zibêrê Ehmê dibêje *"Gava hinek axayê Xerzan xwestin ku li hember Kemalo rabin Şêx Mehmûd, fetwa da û got: Ên li dijî hikûmetê şer bikin ew kafir in."*[367] Şêxan di dayîna fetwayên xwe da jî referansên dînî bi kar anîne û mirovên nezan li gor

---

[363] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 28.
[364] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 29.
[365] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 29.
[366] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 29.
[367] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 69.

daxwaza dilê mûqtedîran ajotine ser rêyên curbicur. Carinan fetwa dane ji bo çûna cenga kafiran carinan jî tevîbûna serhildanên li hember otorîteya navendî wek minafiqtîyê nirxandine. Baksi, di romana xwe ya *Serhildana Mala Eliyê Ûnis* da jî destbirakîya şêxan û otorîteya navendî bi nimûneyeke dîrokî li ber çavan radixe.[368] Heval û hogirtîya şêx û serokeşîran ku bi Mustefa Kemal (1881-1938) ra danîne, bi çi awayî bûne sersebeba têkçûna serhildanan bi bîr tîne û vê hevkarîyê rexne dike.

Mehmed Uzun di *Hawara Dîcleyê* da ji devê Dengbêj Biro, gazinan ji şêx û axayên ku dîn ji bo berjewendîyên xwe bi kar tînin, dike.[369] Li gor Dengbêj Biro, şerîet her yek e, lê ji bo menfaetên van şêxan, şerîet dikare bê guhertin. Çawa bê hesabê wan weha tevdigerin û dîn û şerîetê li gor daxwaza xwe mîna lastîkê vedizelînin.

Di hevaltîya şêx û kesên din da dayîna dîyarîyan wek usûlekê rûniştîye. Mal û milk, erd û erezî, pez û dewar û hetta kole û rençber jin û carîye jî wek dîyarî dihatin ber lingê şêxan û şêxan ev dîyarî li gor daxwaza xwe bi kar tanîn. Mehmed Uzun di *Hawara Dîcleyê* da ji devê pîrejineke bi navê Amojna Reşê, ji Dengbêj Biro ra behsa keçeke ji alîyê sereskerekî ve ji şêx ra dîyarî hatîye dayîn dike û dibêje şêx vê keçê difiroşe bazirganekî koledar ku tîcareta xwe li ser kirîn û firotina mirovan ava kirîye. [370] Lehengekî Uzun, bi navê Migo; di meseleya welatperwerî û azadîyê da jî şêxan tevî axayan rexne dike.[371] Li gor Migo, hem axa û hem jî şêx ne di heyra welêt û serxwebûnê da ne. Derdê wan kar û qezenca wan û tolhildana wan a li hember hev e. Şerên berberîyê yên di nava wan da ji meseleya azadîyê biqîmettir e, wek din berdewamîya wan a rojane di ser her tiştî ra ye, xulase xema wan ne ji welat e.

Mehmed Uzun ji devê lehengekî *Hewara Dîcleyê* bi navê Hemê, tevî Mîr Bedirxan jî gelek mîr, axa, beg û şêxan bi kuştin û firotina êzidîyan tewanbar dike: Hemê dibêje *"Mîr Bedirxan jî, Yezdînşêr jî hemû beg, axa û şêxên din jî mêrkuj in, destê hemûyan bi xwîna êzidîyan bûye. Hemûyan jin û zarokên êzidiyan kirine kole û*

---

[368] Baksi, *Sehildana Mala Eliyê Ûnis*, r. 29.
[369] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 127.
[370] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 162.
[371] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 274.

cêrî û firotine xelkê." [372] Bi van gotinan rexneya qetlîama nastûrî û êzidîyan a di dewra Mîr Bedirxan da qewimîye dike. Ev bûyer di dîroka mîrekîyên Kurdistanê da wek rûpeleke reş hatîye nivîsîn. Rola şêxan di vê bûyerê da helbet dayîna fetwayên kuştina nastûrî û êzidîyan e.

Hesenê Metê di *Labîrenta Cinan* da cih dide rexneya şêx û melayan û wan ji alîyê îstîsmarkirina nezanîya xelkê ve rexne dike. Lehengê novelê Gebranê Baço dibêje ku mirovên nexweş ên mirinê ji dêleva biçin nexweşxaneyan û tedawî bibin, berê xwe didane dergahê şêxan û ji wan medet hêvî dikirin. [373] Ji ber ku şêxan, bi dek û dolaban navê belavkirina şîfayê ber bi navê xwe ve danîbûn û tevî dînên eware her cure nexweş, bi hêvîya şîfayê berê xwe didan derîyê wan. Ev karê hekîmtîya ku li ser xapandinê ava bûye, ji şêxan ra dibû derîyê qezencê.

Helîm Yûsiv di *Sobarto*yê da sahneyeke zikirê bi hostetî li ber çavan radixe û bi şêwazeke sublîmînal şêx û mirîdên ku îradeya xwe radestî wan kirine, bi gotinên Silêman, rexne dike. *"Yekî din ê rîdirêj ku bi saw serê wî dihejhijî, gotina 'meded' di nav lêvên wî yên lerizî de vedizeliya. (...) Ez jî behetî mabûm gelo bawermendî dibû sedema bêhişiyê?"* [374] Mirîdên ku aqil û hişên xwe avêtîne û mîna xeşhaşîyan ji dest xwe ve çûne, dîmeneke cahiltîyê ya sosret e. Bawerî ji hiş û aqil dizê an ji bêhişîyê? Ev pirsa Yûsiv, ne mihtacî tu bersivan e.

Di *99 Morîkên Belavbûyî* da Helîm Yûsiv, kesên ku ji bo şifayê û mirazan berê xwe didin şêxan bi navgînîya gotinên Azadê penaber, rexne dike. Şêxên ku tê behskirin ne şêxekî zindî ye, şêxekî mirî ye. Ew kesên diçin ser tirba wî û şifayê ji wî dixwazin û hetta axa ser tirba wî wek tiberik dibînin û dixwin [375] encama bawerîyeke xelet e, rasterast şîrk e ku Xweda li alîyekî dimîne û axa ser tirba evdekî mirî ku fêda wî ji wî ra nemaye, dikeve şûna Xweda. Ev, dîmeneke nezanîya bi hezar salan e.

Di romana *Kobanî*yê da Jan Dost bi gotinên vebêjê xwe, cih dide rexneya kesên ku axa ser tirba şêxan dixun û di laşê xwe didin û hêvîya wan ji vê axê heye.

---

[372] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 374.
[373] Metê, *Labîrenta Cinan*, r. 46.
[374] Yûsiv, *Sobarto*, r. 31.
[375] Yûsiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, r. 28.

"Îslîmê her êvarê înê diçû Mizgefta Seyda û axa ser tirba Şêx Salih dianî, hinek jê diavêt devê xwe û hinek jî dixist nav desmalekê û li zikê xwe digerand." [376] Ev rexne hem rexneya cahiltîya gundîyan e hem jî rexneya mantalîteya şêxîtîyê ye ku wek teasûbekê di civakê da cih girtîye û rêya tebabeta ilmî teng kirîye.

Di *Mîrname*yê da Jan Dost bi rêya vebêjekî bi navê Hekîmê Fille -di temsîla Şêx Seyfeddînê Cubbeşîn da- gelek rexneyan li şêxan dike. Hekîmê Fille dibêje ku Şêx Seyfeddîn, li gor xwe fetwayan dide û tedawîya muslumanan bi destê tebîbên xeyrîmuslîman cayîz nabîne da ku mirov bêne cem wî û ew qaşo wan tedawî bike û pereyan ji wan bigire.[377] Vebêjekî Jan Dost, bi navê Selahaddînê Sehhaf, Şêx Seyfeddîn wek kesekî ji xwendina kitêban û zanîna ilmê dûr dibîne û ji ber ku hertim ji ba nalbendekî nalên zingargirtî distîne wî bi sêrbazîyê tewanbar dike.[378] Jan Dost di romana *Mijabad*ê da jî bi gotinên Badînê Amêdî, rexneya şêxekî bi navê Şêxê Şîr dike ku ev şêx ji çêlek û sewalên gundîyan ra duayan dike da ku şîrê wan zêde bibe.[379] Ev cure gotinên îronîk helbet xisûsîyeteke romanên postmodern e lê divê neyê jibîrkirin ku di civaka kurdan da şêxên bi vî rengî ne kêm in.

Di *3 gav û 3darek*ê da bawerîyeke xurafeyî li ser şêxan weha tê bilêvkirin: *"Eger hûn nebaş li ser Şêxan biaxivin, dê devên we xwar bibin! Eger hûn çavên xwe di helqeyên zikir de vekin, devên we xwar dibin."*[380] Şêxên ku nedixwestin dek û dolabên wan derkevin holê li ser xwe û hin ayînên ku birêvedibin gotinên bêbingeh digotin û wek tevatur ew gotinên wan, di nava civakê da olan dida.

2.8.2.2. Mele

Mele, xoce, seyda her çi qasî di navbera van bêjeyan da ji alîyê teolojîk ve nuans hebin jî di civaka kurdan da ev bêje di heman wateyê da tên bikaranîn. Mele li gundan piştî şêxan wek kesên herî zana tên hesibandin. Gotina melê diwanzdeh ilm di civakê da qîmata wan nîşan dide. Berîya ku dewlet, meleyan bi me'aş girê bide

---

[376] Dost, *Kobanî*, r. 50.
[377] Dost, *Mîrname*, r. 138.
[378] Dost, *Mîrname*, r. 164.
[379] Dost, *Mijabad*, r. 127.
[380] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 37.

meleyan; bi zekat, fitre û arîkarîyên gundîyan debara xwe û malbata xwe dikirin. Piştî girêdana me'aşan jî ev rewş didome.

Mele, di romana kurdî ya dîyasporayê da piranî wek kesayetên neyênî derdikevin pêşberî me. Romannûs, meleyan bi alîyê wan ê mizawirî derdixin pêş û wan wek kesên ku îstîsmarkarên cahiltîya civaka xwe nîşan didin. Rexneya ku li ser navê dîn û dîyanetê paleyîya berjewendîyên xwe dikin, ji bo meleyan rexneyeke herî zêde tê kirin. Mele, gelek caran wek hevkarê şêx û axayan tên dîtin û rexneya dînî piranî bi rexneya şêx û meleyan dest pê dike.

Mahmut Baksi di romana Hêlînê da cih dide rexneya melayê gund û jina wî. *"Jina mele digot ên ku Quran nexwendibin, roja qiyametê wê çavên wan kor bibe û di cehenemê de wê bişewitin."*[381] Xwendina *Qur'an*ê dahatûyek e ji bo mele û malbata mele. *"Emoyê digot, zarokên ku diçin dersa Quranê mecbûr in ji jina melê re hêk, penîr û fêkiyan bibin."*[382] Mele, piranî bi keçên mela an jî şêxan ra dizewicin û xanimên wan jî xwendina *Qur'an*ê dizanin heta ew xanim jî xwendina *Qur'an*ê fêrî keçên gund dikin. Xapandin, jêdera rexneyan e. Bavê Hêlînê dibêje "*Axa û mele sextekar in û gundîyan dixapînin."*[383] Di romana *Gundikê Dono* da jî Baksi, hevkarîya şêx û melayan dike mijara rexneyan. Vebêjê Baksi dibêje *"Meleyan li dahola şêxan dida ji bo parîyek nanê xweştir. Lê şêxan, parvekirin nedizanî tev ji xwe re dibirin. Şêxên çavbel, li melayên jêhatî digeriyan."* [384] Melayên ku li dahola şêxan didin tê maneya ku şêx çi bibêje ew jî propagandaya gotinên şêx dikin. Melayên jêhatî li gor şêxan ne melayên di ilim da pêşketî ne melayên mizawir ku di xêzika şêx da tevbigerin li gor şêxan qedirgiran in.

Hesenê Metê di novela *Li Dêrê* da weha behsa xezeba mela û seydayan dike: Lehengê novelê Bilind Zaxoyî dibêje *"Tu ê jî têkevî ber xezeba mela û seydayan û bi navê qanûn asayîşekê ew ê te bavêjin pişt derîyan."*[385] Rexneya Bilind Zaxoyî, li ser

---

[381] Baksi, *Hêlîn*, r. 32.
[382] Baksi, *Hêlîn*, r. 35.
[383] Baksi, *Hêlîn*, r. 35.
[384] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 27.
[385] Metê, *Li Dêrê*, r. 40.

hêza di destê mele û seydayan da ye. Ev hêz jî hêza şerîetê ye ango qanûnên wê demê yên serdest in. Mele û seydayên ku ji bo kar û qezenca xwe dikarin hukmên şerîetê vezelînin, dibin mijara rexneyên Hesenê Metê.

Jan Dost, di *3gav û 3darek*ê da cih dide rexneya mela û seyda û xatiban ku ji bo berjewendîyên pir biçûk dikarin pesnê nebaşan bidin. Jan Dost ji devê Şêx Seîd, rexneya mela û seydayên wê demê weha dike: *"Xetibên van heyaman, ji bo mecîdîyekî dikarin pesnê şeytên bi xwe jî bidin. Eger min ev menber ji dara gwîzê çê kiribûya dê di îna pêşîn de bihata xwarê. Ji ber derewên xetîban."* [386]

Di romanên kurdî yên dîyasporayê da mela û seyda wek nûnerên dînî hatine dîtin û ji ber kiryarên xwe yên berjewendîparêz di civakê da wek rolmodelên neyênî hatine şayesandin. Fen û fûtên ku li serê mirovên nezan dirêsin û hevkarîya wan a bi axa û şêxan ra bala romannûsan kişandîye û mele di romana kurdî da wek tîpên "xapînok" hatine bîcihkirin.

[386] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 56.

BEŞA SÊYEM

REXNEYA SÎYASÎ DI ROMANA KURDÎ YA DÎYASPORAYÊ DA

Rexneya sîyasî di dinyaya modern da cureyeke rexneya berbelav e ku mixalif û miqtedîr bi tîrên vê rexneyê berê xwe didin hev û îdeolojîyên partî an kesayetan. Rexneya hikûmetan, rexneya partî û kesayêtên polîtîk û sazîyên dewletê yên din wek rexneya sîyasî dikare bê pênasekirin. Rexneya sîyasî tenê ji alîyê sîyasetmedaran ve nayê kirin. Helbestvan, nivîskar, filozof û rewşenbîr jî dikarin rexneya sîyasî li hember hêzên desthilatdar bi kar bînin.

Rexneya sîyasî ku wek şaxekî rexneya edebî derdikeve pêşberî me bi giranî di romanên sîyasî û di cureyên romanên civakî û dîrokî da bal dikêşe. Romanên sîyasî ji ber mijar û çîroksazîya xwe ji bo rexneya sîyasî qadeke guncav pêşkeş dikin. Romanên civakî û dîrokî jî li gor derfetên vegêranê, carinan rasterast carinan jî bi awayekî nixumandî cih didin rexneyên sîyasî. Romannûs, çawa ku di bin bandora derûdora xwe û civaka xwe da dimînin ew qasî jî di bin bandora sîyaseta aktuel da dimînin û şert û mercên sîyasetê, berê pênûsên wan dide îronî û vegêrana qerfî.

Romannûsên ku xwe wek berdevkê civaka xwe dibînin bi saya rexneyên îronîk, sîwaneke gotara mixalif saz dikin û têdikoşin ku hejmara kesên di bin vê sîwanê da zêdetir bikin. Romannûsên ku ji rexneyên sîyasî ra berdevkîyê dikin bi monolog û dîyalogên lehengên fîktîf ku rexneyên tund dihewînin, xwe ji berpirsyarîya hiqûqî ya van rexneyên sîyasî jî rizgar dikin. Romannûs bi navgînîya romanê dikarin bangeşîya ramanên sîyasî jî bikin. Ev rewş jî romanê dike şahîdekî subjektîv ê dîrokê.

Romana kurdî ya dîyasporayê ji ber mijarên civakî, sîyasî û dîrokî ve bî sîyasetê ra ji nêz ve têkildar e. Di romanên Mahmut Baksi da rexneyên civakî û sîyasî bênder dibin. Di gelek romanên Mehmed Uzun da rexneya sîyasî tê dîtin. Di serî da romana Mehmed Uzun a *Tu*yê wek rojnivîska girtîyekî sîyasî ye. Romana Uzun a bi navê *Siya Evînê* li derûdora serhildana Agirî û kesayeta Memduh Selîm

Beg (1880-1976) a sîyasî teşe digire. *Hawara Dîcleyê*, her çi qasî romaneke dîrokî be jî derheqê atmosfera wê demê da gelek rexneyên tund ên sîyasî dihewîne.

Romana Hesenê Metê ya *Hefsar* li hember zîhnîyeta hêzên tarî gelek rexneyên giran bi awayekî sînematografîk li ber xwîneran radixe. Firat Cewerî bi taybetî di *Payiza Dereng, Ez ê yekî Bikujim* û *Maria Melekek bû* da di peywenda jîyana kevne şoreşgeran û serpêhatî û mixabinîyên wan da gelek rexneyên sîyasî hem li dewletê dike hem jî li partîyên sîyasî dike. Romanên Jan Dost ên dîrokî *3 gav û 3darek, Mîrname* û *Mijabad* ji ber mijarên dîrokî rasterast rexneyên sîyasî dihewînin. Jixwe romana *Kobanî* ya Jan Dost romaneke sîyasî ye û ji serî heta dawî rê û resma rexneyên sîyasî ye. Hemû romanên Helîm Yûsiv ji alîyê rexneyên sîyasî ve dewlemend in. Romana wî ya bi navê *Gava ku Masî Tî Dibin*, romaneke sîyasî ye û galerîyeke rexneyên sîyasî ye.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da mîrên kurdan, partîyên kurdan, dewleta Osmanîyan û dewletên Rojhilata Navîn (Tirkîye, Îran, Îraq û Sûrîye) Dewletên Ewropayê xisûsî (Îngîltere û Fransa), dewleta Rûsaya hatine rexnekirin. Ji alîyekî sîyasî ve bi awayekî gişti nasname, ziman, bêdewletbûn, sirgûn, êşkence, asîmîlasyon, dîktatorî, îdeolojî û binpêkirinên mafên mirovan bûne mijara rexneyên sîyasî.

3.1. Mîrên Kurdan

Mîrektî wek rêvebirîyên otonom tên qebulkirin. "Di sedsala 13an da piştî êrîşên Moxolan li ser cîhana îslamê, bi taybetî jî li ser paytexta dewleta Ebbasîyan, dawî li dewleta Ebbasîyan hat û bi vî awayî di cîhana îslamê de serdemeke nû dest pê kir. Di vê navberê de hikûmetên kurdan ên ku di nîvê serdema Ebbasîyan de ava bûbûn jî temenê xwe tijî kiribûn. Ev serdema nû ji bo kurdan serdema mîrektîyan e. Mîrektîyên herî giring ên kurdan û bi taybetî ên kurmancan piştî êrîşên Moxolan hatin avakirin û heta nîvê sedsala 19an li ser pîyan man."[387] "Mîrên ku çîna herî arîstokrat a civaka kurdan pêktînin, lûtkeya hîyerarşîya civakê teşkîl dikin. (…) Mîrektîyên ku wek hikimdarên herêmê ne, gelek xisûsîyetên dewleteke serfiraz

[387] Abdurrahman Adak, *Destpêk Edebîyata Kurdî ya Klasîk,* Nûbihar, Stenbol, 2013, r. 162.

hildigirin. Di destpêka sedsala 19an da mîrektîyên herî giring ên kurdan Soran, Botan, Baban, Behdînan û Erdelan bûn. Xisûsen, Mîr Bedirxan (1806-1869) û mîrê Soran, berîya tesfîyeyê di nîvekê ewil yê sedsala 19an da hatibûn heyameke bihêz."[388] Di romana kurdî ya dîyasporayê da romannûsan, rexneya mîrektîyan û mîrekên kurdan kirine. Bi taybet di romanên dîrokî û civakî da bi gelek sedeman rexneya mîr an jî mîrektîyên kurdan tê kirin.

Mehmed Uzun di romana *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* da li ser meseleya vassalîya mîrekan disekine û destnîşan dike ku Osmanîyan, welatê kurdan wêran kirine, mîrekên kurdan jî wek berdevkê xwe tayîn kirine û ew kirine şervanên xwe. Uzun, ji devê dengbêj Ehmedê Fermanê Kîkî dibêje *"Her çi Osmanî bûn wan welatê kurdan kiribû warê lec û şeran û mîrekanên kurd kiribûn şervanên xwe û berdevkê Alî Osmanî."*[389] Mîrektî nayê maneya dewleteke serbixwe. Talîya talî ew jî di bin emrê otorîteya navendî da ne.

Mehmed Uzun di *Hawara Dîcleyê* da ji bo bidestxistina hêz û otorîteya mîrektîyê şer û pevçûnên di navbera malbatên mîran da ji devê vebêjê xwe rexne dike. Uzun, kirasê hikimdarîyê dişibîne kefenekî tîjî xwîn.[390] Tevî xetereyên desthilatdarîyê jî hene dîsa jî ew kefenê tije xwîn, di heman demê da xeftanê hêzeke sîyasî ye û cazîbeya wî heye. Ew xeftan; birayan, pismaman û xal û xwarzîyan bera pêxîra hev dide û dibe sedema kavilkirin û vêrankirina tarîxa welatekî ku ber bi felaketan ve digindire. [391]

Mehmed Uzun, mîrektîyên kurdan -ji ber ku ne nûnerên otorîteyeke mûtlaq in- wek gundekî xirabe dinirxîne. Nav heye lê navik vala ye. Dengbêj Biro dibêje *"Mîr û giregirên ku mam qal dikir û vê êvarê mêvanên Mîr bûn, di esasê xwe de, hew mîr bûn."*[392] Mîrên kurdan xwe wek hakimê mûtlaq dibînin lê girêdayê fermanên siltanên Osmanî ne, bacê didin dewleta Osmanî û di şeran da xwînê dirijînin. Uzun, vê yekê wek xwe xapandineke dîrokî û sîyasî dibîne.

---

[388] İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler*, Nûbîhar, İstanbul, 2017, r. 323-324.
[389] Uzun, *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê*, r. 64.
[390] Uzun, *Hawara Dîcleyê*, r. 227.
[391] Uzun, *Hawara Dîcleyê*, r. 228.
[392] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 67-68.

Mehmed Uzun, bi vebêjîya Dengbêj Biro, fermanên mîrektîyên kurdan jî rexne dike. Van fermanan ji wîcdan û merhemetê dûr dibîne û wan, wek pêkhateyên li gor mercên dewranê dinirxîne. Fermanên mîrektîyê li gor edaletê şaş dibîne û wan wek berdevkîya siltaneta Osmanî binavdike. *"Li gora min fermanên mîrekiyê ne rast bûn.*[393] Li gor wî divê edalet, hevîrtirşê fermanên desthilatdaran be. Heger dahol di stûyê mîrên kurdan da be û ço jî di destê siltanên Osmanî da be siltan çi meqamî lêxin, dê dahol jî wî dengî derxin û mîr jî hemalê vê daholê bin.

Jan Dost di *Mîrname*yê da bi navgînîya Xalidê Çolaq, ji Ehmedê Xanî neqil dike û sersebebê birakujîyê kurdan bi ehmeqî û cahiltîya mîrekan ve girê dide. [394] Di beşeke din a *Mîrname*yê da Ehmedê Xanî ji Mele Îsmaîlê Bazîdî ra dibêje ku ji ber tovên nefret û edaweta ku mîr li civaka kurdan belavdikin xortên kurdan hevûdu dikujin û dijminahîya hev dikin. Heger feraseta reveberîyê bi mîrên kurdan ra hebûya dê halê kurdan ne wisa xirab bûya.[395] Mîrên ku Jan Dost, bi tundî cih dide rexneya wan, tenê mirovên xwe li hev sor nakin, di heman demê da ji bo îqtîdara xwe daîm û qaîm bikin carinan jî ji bo îqtîdarê bi dest bixin bêyî ku çavên xwe bikutkutînin dikarin derba mirinê li birayên xwe bixin. Di *Mîrname*yê da vebêjekî bi navê Mele Salihê Cizîrî, vê bûyerê neqil dike: *"Mîr Êzdîn, (...) Xencera xwe ya qewdik ji diranê fîl bû kişand û bi ser birayê xwe de çû. (...) Mîr Şeref jî tîra xwe ya perkirî li kevan da û ji mûyê terîya hespan kişand û avête birayê xwe. Tîr di zengeloka wî de çikand."* [396] Ev sahneyeke Jan Dost di *Mîrnamê*yê da bi hûrgilî dişayesîne, bi awayekî endîrekt rexneya birakujîya di navbeyna mîr û birayên wan da dike.

Jan Dost, di *Mîrnamê*yê da rexneyên sîyasî yên derbarê çavkanîya rêveberîya mîran da didomîne. Vebêjekî *Mîrname*yê Mele Salihê Cizîrî, di axaftineke xwe û Ehmedê Xanî da dibêje ku Xanî derheqê Mîr Evdilfettah weha gotîye: Mîrên ku bi destê hinekî din bibin mîr û ji paşayên Romê fermanan bistînin ne mîr in, bende ne

---

[393] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 125.
[394] Dost, *Mîrname*, r. 123.
[395] Dost, *Mîrname*, r. 216.
[396] Dost, *Mîrname*, r. 149.

ango xulamê xulaman in. [397] Lewra paşayên Romê ji padîşahan fermanan digirin, mîr jî hîn bi paşayên Osmanî ve girêdayî ne. Mîrektîya xulamekî jî ne mûteber e.

Jan Dost, di *Mîrname*yê da bi neqilkirina Mele Îsmaîlê Bazîdî ji devê Ehmedê Xanî, mîran dişibîne marên ku jehra xwe bera bedena xelkê didin. Li gor Xanî, mîr, fêmkorî ne. Kul û birîna wan jî mal, milk û zêr û pere ne. Jixwe li hember ilm û îrfanê tu rêzdarîya wan tune ye. Bi ser da jî şehwetperest in. Darê zilm û zorê ji destê wan danakeve lê stuyê wan li ber dewleta Romê her xwar e. [398]

Di romana dîyasporayê da mîr bi serhişkîya xwe û bi nezanîya xwe dibin armanca tîrên rexneyê. Erka îqtîdarê ku ji destê bavan derbasî destê lawên bêlîyaqat dibe, tê rexnekirin. Romannûs di wê bawerîyê da ne ku mîrên kurdan piranî ji hişmendîya neteweyî dûr in û ji bo berjewendîyên xwe yên şexsî dikarin hevkarîyê bi nûnerên dewletê ra bikin.

3.2. Partîyên Kurdan

Partî, sazîyên sîyasî ne ku bi hewldana hin sîyasetmedar û aktîvîstên civakê pêk tên. Di dîroka kurdan da li her çar parçeyan di sedsala 20an da gelek partî û rêxistinên kurdan ava bûne û ji bo azadîya kurdan tekoşîna sîyasî û carinan jî ya leşkerî dane. Nûnerên van partîyan, zana û giregirên civaka kurdan bûn. Ji ber mercên sîyasî, dîrokî û civakî ev partî, gelek caran di nava xwe da ketine nakokîyan û ev nakokî jî bûne sedema şer û pevçûnên nûnerên wan. Di pevçûn û guftûgoyên sîyasî da qiriktalîya nûnerên van partîyan, bûye sedemeke giring a tunebûna yekîtîya kurdan.

Di warê rexneya partîyên kurdan da rexneya PKKyê derdikeve pêş. PKK, partîyeke çekdar e ku di sala 1978an da hatîye damezirandin. Ji bo micadeleya PKKyê di dewra serokkomarê Tirkîyeyê Turgut Özal da sîstema cerdewanîyê hatîye avakirin û li gundan kesên ku leşkerî kirine bi miaş hatine çekdarkirin. Ev kesên ku ji bo debara xwe ya rojane ketin bin emrê artêşê, berê bi mebesta parastina gundan hatine bikaranîn. Pişt ra artêşê, ev gundîyên çekdar di pêşîya yekîneyên leşkerî da

---

[397] Dost, *Mîrname*, r. 155.
[398] Dost, *Mîrname*, r. 220.

ajotine operasyonên dijwar li hember PKKyê. Di heman demê da malbatên cerdewan li hember malbatên cerdewantî qebûl nekirine û çek hilnegirtine bi awayekî hovane tevgerîyane û zor û zexteke mezin li ser gundîyên derdora xwe meşandine.

Martin Van Bruinessen destnîşan dike ku "Cerdewanan li herêmê wek şakîyên kesên bihêz faalîyet meşandine û zor dane gundîyan ku li hember van kesên erkdar bi îteat tevbigerin. Bi vê mebestê şîdet jî bi kar anîne."[399] Ev yek jî fersend da axa û serokên eşîran da ku hêzên wan ê çekdarî dirûveke qanûnî bigire û bandora wan a sîyasî tekûz bibe.[400] Bruinessen dibêje ku "Van yekîneyên cerdewanan li herêmê atmosfereke zor û zextê awa kir û bû ser da jî zor û zexta PKKyê hat."[401] Clamense Scalbert Yücel îdîa dike ku PKK ne tenê li hember dewleta Tirkîyeyê di heman demê da li hember burjûwaya kurdan û xwedîyê erdên fireh jî bikaranîna şideta şoreşger pêşnîyaz dikir.[402]

Berîya avabûna PKKyê ji bo kurdên Tirkîyeyê, çavkanîya esas a hêza sîyasî, tevgera Barzanî bû. Barzanî, wê demê ji bo neteweperwerên kurdan gelek zêde tişt îfade dikir lê belê piştî têkçûna tevgera Barzanî ya sala 1975an bandora Barzanî kêm bû û PKKyê vê valahîya dagirt. Piştî têkçûna Saddam Huseyîn a sala 2003yan rêvebirîya Îraqê ya kurdan qismekî erka xwe ya winda kiribû dîsa bi dest xist lê dîsa jî nikare rasterast berê xwe bide PKKyê.[403] Bi boneya micadeleya PKKyê li herêma Rojhilatê Tirkîyeyê bi salan rewşa awarte hate îlankirin. Herêm bi "Super walî"yan hate birêvebirin. Ji alîyê aborî ve xelkê herêmê darbeyeke mezin xwar. Ajalvanî û gelek kar û barên gundîyan ji ber operasyonên leşkerî zerar dît. Bi taybet ji sala 1993yan û pê ve koçeke mezin ji alîyê Rojhilatê Tirkîyeyê ber bi Rojavayê Tirkîyeyê ve pêk hat.

Kiryarên faîlên wan nedîyar, binpêkirinên mafên mirovan, mercên aloz ên sîyasî, bûne sedemeke dîyarde ji bo derketina derveyî welêt. Kesên ku tûşî zor û zextên dijwar hatine, reçeteya filitandina ji vê rewşê di miltecîtî an jî mişextîyê da dîtine. Xisûsen dîyasporaya kurdî ya Ewropayê bi van mercên sîyasî, civakî û aborî

---

[399] Martin Van Bruinessen, *Kurdistan Üzerine Yazılar*, (Çev.) Kolektîf, İletişim, İst., 2010, r. 158.
[400] Bruinessen, h., b., r. 321.
[401] Martin Van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, (Wer.) Banu Yalkut, İletişim, İst., 2010, r.78.
[402] Clêmence Scalbert Yücel, *Kürt Edebiyatının Anatomisi*, Ayrıntı Yay, İstanbul, 2018, r. 98.
[403] Abbas Vali, *Kürt Tarihi, Kimliği ve Siyaseti*, (Çev.) İbrahim Bingöl, Avesta, İst., 2013, r. 200-201.

her çûye firehtir û bihêztir bûye. Şer û pevçûnên di navbera partî û rêxistinên kurdan da di gelek romanên dîyasporayê da bûne mijara rexneyên sîyasî. Romannûsan ev gengeşîyên navxweyî wek sedema berbelavbûna kurdan dîtîne û ev rewşa aloz a sîyasî rexne kirine.

Mehmed Uzun di *Bîra Qederê* da ji alîyê rêxistinsazîyê ve cih dide rexneya kurdan û partîyên kurdan. Li gor lehengê romanê Mîr Celadet Bedîrxan, nûnerên partîyên kurdan mêvanperwer in, dostanîya wan bêpayan e lê ji kar û barên rêxistinî ve tu tiştekî fêm nakin. Mîr Celadet, kurdan di warê xebata nûjen da qels dibîne. [404] Mehmed Uzun di *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* da ji devê endamekî rexistineke sîyasî ve rexneya li jîyana partîyê dike. Ev jîyan li gor wî ne jîyaneke asayî ye, jîyaneke dûrî malbatê ye. Xwendin û nivîsîn ne li gor dilê kesan e, çûyîn û hatina dost û hevalan tune ye heta xwarin û vexwarin ne li gor daxwaza mirov in.[405] Uzun, bi van gotinan ji devê endamekî rêxistinê, jîyana di nava rêxistinê da dijwar dibîne.

Firat Cewerî ku bi giştî tevna romanên xwe li ser mijarên sîyasî datîne û di romanên xwe da ger û geşta kesayetên sîyasî bi hûrbînî dişayesîne, di *Payiza Dereng* da ji devê lehengê xwe yê kevnesîyasî Ferda, rexneya gengeşîyên sîyasî di navbera partîzanan da dike.[406] Li gor Ferda, van gengeşîyan, rêheval û hogirên dilsoz ji hev ve dûr dixist û derfeta wan a ji bo armanceke hevpar di bin banekî da bixebitin nedima.

Firat Cewerî, rexneyên xwe di derbarê dijberîya partîzanan da didomîne. Kesên ku heta demekê rêhevalên hev bûn û pişt ra ji ber sedemên cîyawaz ên îdeolojîk ji hev veqetîya ne ji ber hin kiryarên wan ên hovane, wan rexne dike. Vebêjê Cewerî, Ferda bi gotinên hevalên xwe cih dide van rexneyan: "Ew kesên ku dema rêya wan ji hevûdin veqetîya carinan hevûdin wek dijmin dibînin û êrîşî ser malên hevûdin dikin heta zerarên mezin digihînin mal û canên hev û eqrebeyên hev."[407]

---

[404] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 193.
[405] Uzun, *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê*, r. 146.
[406] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 65.
[407] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 206.

Firat Cewerî, ji alîyê pîvanên însanî û vîcdanî ve nêzî meseleya "şervanên zarok" ên di nava rêxistinê da dibe. Ferda ku ew bi xwe kevnesîyasîyekî penaber bûye, rêxistinê di warê tevîbûna kesên temenzarok da bi tundî rexne dike. Ferda dibêje *"Hema ez ê ji lawikekî deh donzdeh salî dest pê bikim. Ez nizanim lawikekî deh donzdeh salî wê çawa karibe bibe şerker?"*[408] Ferda, di nameyeke ji hevalê xwe ra şandîye tevîbûna rêxistinê ya gelek kesan ji mecbûrî dinirxîne. Li gor Ferda, gelek kes jî zarokên xwe winda kirine û hin kes jî li pey kar û qezenca xwe ketine nava rêxistinê.[409] Ev rexne li hember îdîaya ku rêxistin ji bo gel e û hêza xwe ya esasî ji gel digire, hatîye kirin. Cihê ku zarûret lê hebe û enîya ku bûbe warê kar û qezencê, dê bibe mijara rexneyan jî.

Firat Cewerî, bi navgînîya Ferda, rêbirîna endamên rêxistinê ku nasnameyên gel kontrol dikin, rexne dike û dibêje ez, kontrolkirina nasnameyan a leşkeran fêm dikim lê çima endamên rêxistina biçek, nasnameyên mirovan kontrol dikin û vê rewşê li ser wan ferz dikin? [410] Ev rexne jî jêderka xwe ji nakokîyên gotara partîyê ya ku "partî ji bo gel e" digire. Di dema kontrolkirina nasnameyan da endamên rêxistinê ku bi tirkî dipeyivin bala Ferda dikişîne. Li gor Ferda bi tirkî axaftina endamên rêxistinê jixwe tiştekî balkêş e. Qaşo kesên ku ji bo guvaşên li ser nasname û zimanê kurdî serîhildabûn li gor Ferda divê bi kurdî bizanîbin.

"_ Nerelîsîn?

_ Ez ji vir im.

Yê gerîlla hêrs bû. An wî bi rastî ji kurdî fêhm nedikir an jî fêhm kir lê ji ber ku bi tirkî ji min pirsî bû û diviyabû min ji bi tirkî bersiva wî bida." [411] Ev sahneya teatral, rexneyeke sîyasî ya hişmendîya rêxistinê ye. Ferda, hin kiryarên rêxistinê jî bi tundî rexne dike. *"Hîn berê melê sibehê bedena wî bi dîregê telefonê yê serê sûkê ve dadiliqîne, sed dolara ku di bêrîkê de girtine dixin devê."*[412] Hin kesên ku di çarçoveya fermanên wan da tevnagerin çawa ji alîyê hin endamên rêxistinê ve bi

---

[408] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 246.
[409] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 249.
[410] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 269.
[411] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 270.
[412] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 331.

wehşeteke mezin têne cezakirin û bi şêwaza kuştina van kesan, peyamdayîna gefxwarinên li ser gel, dibe mijara rexneyên lehengê Firat Cewerî.

Helîm Yûsiv, tunebûna yekîtîya di nava kurdan û mîna bizirê pirparê parçebûna hizbên kurdî hezim nake. Yûsiv, di romana *Sobarto*yê da zêdebûna partîyên kurdan û ji hev belavbûna wan rexne dike û ji devê keseki bi leqeba Dîno tê naskirin, li hember vê parçebûnê diqîre. *"Perçebûn!.. perçebûn!.. perçebûn! Ez ê laşê xwe perçe perçe bikim da ku ez vê perçebûnê nema bibînim."*[413] Li her çar parçeyên vê xakê ji her serîyekî dengek derdikeve û yek li gotina yê din guhdarî nake, her kes xwe û rêxistina xwe mafdar û bihêz dibîne.

Helîm Yûsiv ji devê Cegerxwîn (1903-1984), cih dide rexneyeke sîyasî ya derbarê mantalîteya partîzanîyê da. Li gor wî hişmendîyeke sîyasî ya rûniştî tune be partî mîna kerên li ber derî girêdayî ne. Qe nebe ker dikarin baran hilgirin, partî ne karin tu baran hilgirin û ne jî dikarin mîna keran bizirin. [414] Partîyên ku bi qasî kerekî faydeya wan li kesekî nebe, maneya hebûna wan jî tune ye û dê tune be.

Partîyên ku tenê propagandaya sîyasî dikin û dema peyv tê ser arîkarîya madî ya malbatan, deng ji wan dibilin jî ji rexneyên Helîm Yûsiv bêpar namînin. Ajîtatorên rêxistinan ku li ser cenazeyên endamên xwe gotinên qelew dikin lê nikarin xwe bidin ber çend quriş deynên endamên xwe partîzanîyê dikin û Yûsiv, tevgerên van kes û hizban û bêwefadarîya wan a rêhevaltîyê, bi boneya mirina mamoste Merwan rexne dike. [415]

Helîm Yûsiv di romana *Gava ku Masî Tî Dibin* da bi gotinên lehengê romanê Masî, rexneya rêvebirên partîyan dike ku di nezera wan rêvebiran da partî mîna makîneyekê ye. Masî, dibêje daxwaza herkesî meşandina makîneyê ye. Tenê makîne heye. Hesinên biçûçik ku mekanîzmeya makîneyê pêk tînin bênav in û nirxên wan tune ne. Hesinek bişikê an xira bibe dê yekî din bê û şûna wî hesinî dagire. Hebûn,

---

[413] Yûsiv, *Sobarto*, r. 74.
[414] Yûsiv, *Sobarto*, r. 75.
[415] Yûsiv, *Sobarto*, r. 126.

tebat û lebata makînayê di ser her tiştî ra ye. [416] Masî, vê hişmendîya mekanîk a sîyasî bi tundî rexne dike.

Helîm Yûsiv di jîyana nava rêxistinê da cih dide rexneya kiryarên zayendî. Di jîyana şoreşgerîyê da nêzîkbûyîna jin û mêran a cînsî nayê pejirandin û şervanên tevî rêxistinê dibin li gor rêziknamaya rêxistinê divê dûrî têkilîyên bi vî rengî bin. Dema bûyerên rewşa qedexekirî bên qewimîn, endamên di nava van tevgeran da bi şidet tên cezakirin.[417] Lehengê *Gava ku Masî Tî Dibin* Rênas, ku ew bi xwe jî şervanekî rêxistinê ye, rexneyeke endîrekt li vê meseleya zayendî û xwezayî dike. Şervanên ku li pey daxwaza azadîya takekesî û civakî ketine û serî hildane, xwe di nava nakokîyan û qedexeyên bi gelek celeban dibînin.[418] Li gor Rênas, evîna welat û ya jin û mêran û ya azadîyê tevî hev bûne û şervan, berdêlên van tevlihevîyan didin, talî jî yekê ji wan jî bi dest naxin. Bi vê boneyê, rexneyeke ontolojîk li rêxistinê û partîzanîyê dike.

Dema şervanek dimire ew şervan ji alîyê rêxistinê ve wek "şehît" tê bi navkirin. Tevî nêrîna marksîst, dîn û şehadetê li derveyî pergala îdeolojîyê dinirxîne jî mirin bi termînolojîyeke dînî tê berzkirin û kesên mirî wek "şehît" tên hesibandin. Jîyan dibe qurbana mirinê û mirina bi vî rengî ji kesên kuştî û malabatên kuştîyan ra dibe temsîla rûmetê. Masî, vê rewşê weha rexne dike: *"Nexwe mesele wilo rehet e? Navek e û wê weke şehîd bê binavkirin û her tişt biqede?"* [419] Navekî tevî rengdêra şehîdîyê demekê bi lehengî bê bilêvkirin û pişt ra heta hetayî bê jibîrkirin.

Helîm Yûsiv di romana *Wehşê di Hundirê Min de* cih dide rexneya sîyasetê û kesên ku bi sîyasetê ra mijûl in. Pasvanekî peykerê serok, dema dibîne kûçikek dê li derûdora peykerê serok bimîze weha dibêje: *"Wey korayî di çavê te de hatî. Hetanî kûçik jî li vî welatî siyasetê dikin yaho. Ma ev çi hal e ji bo Xwedê?"*[420] Ev rexne, jêderka xwe ji zêdebûna hejmara partîyan digire. Partîyên ku binyada wan kêm zêde li ser heman usûl û esasan ava bûne, xwîna dilê endamên wan ji bo heman armancê diherike lê di tu meseleyan da ava mejîyê wan bi cihekê da naçe, tên rexnekirin.

---

[416] Yûsiv, *Gava ku Masî Tî Dibin*, r. 59.
[417] Yûsiv, *Gava ku Masî Tî Dibin*, r. 99.
[418] Yûsiv, *Gava ku Masî Tî Dibin*, r. 99.
[419] Yûsiv, *Gava ku Masî Tî Dibin*, r. 121.
[420] Yûsiv, *Wehşê di Hundirê Min de*, r. 44.

Jan Dost di *Mijabad*ê da rexneyekê li hizbên dema Komara Mahabadê dike. Nakokî û pevçûnên îdeolojîk ên endamên partîyên Hîwa û Komeley Birayetî û qiriktalîya wan a wê demê, bûye mijara rexneyên sîyasî. Badînê Amêdî, dibêje: *"Ez bûme endamê partiyê, bûme beşdarê nakokîyên di navbera Hîwa û Komeley Birayetî de. (...) Wan ji me re digotin hûn şovenîst in. Hinekan ev navên ecêb nebihîstibûn, hêrs dibûn û digotin: Kafirên qûnbigû, ji me re dibêjin şorbenîsk, ka hela ev çi rêx e."* [421] Endamên hizbên cîyawaz ku hevûdin bi gotarên sloganîk ên îdeolojîk tewanbar dikin û heft û heştên qerfî yên di rojeva wan da, di mêzîna sîyaseta wê demê ya bi mij û dûman da tê rexnekirin. Lehengekî romanê sîyasetmedar Refîq Hilmî dîbêje ku *"Serokên eşîran herin bihuştê jî, wê genî bikin. (...) Ew li ser mêrg û çîmenên herêmê li hev nakin, wê çawa li ser siyasetê li hev bikin."*[422] Bi van gotinan, li hember hezar dek û dolabên li ser kurdan û welatê wan, tên sazkirin, sîyaseta partîyên kurdan a qalikê gwîzekê tijî nake û retorîka endamên van partîyan a rijî, bi tundî tê rexnekirin.

Di romana Mijabadê da parçebûna welat û ji bilî vê parçebûnê berbelavbûna hizir û hizbên kurdî ku têra xwe jîyana kurdan dike qadeke agirjendî tê rexnekirin. Lehengekî romana *Mijabad*ê ,Kerîmê Şikakî, derheqê parçebûna partîyên kurdî da weha dibêje: *"Kêşeya kurdî di wan salan de bi hezar girêkî bû. Hezar şeytan li girêkê biciviyana venedibû. Şêx Ehmed li Barzan, Şêx Mehmûd li Silêmaniye, Îhsan Nûrî Paşa li Agirî, Simko li Ormîye, her yek coyek bi tena xwe diherikî.*" [423] Dema miletek bê parçekirin, ev cudayîyeke fîzîkî ye lê ji van parçeyan her yekî dengekî cuda derkeve ev, tê maneya têkçûyîna yekîtîya giyanî ya miletekî.

Jan Dost, dijberîya partîzanî ya îdeolojîk ku li ser bangeşîya bizavên sîyaseta derveyî avabûye û tu faydeya wê ji rastîya polîtîk a civaka kurdan ra tuneye, ji devê lehengê xwe Badînê Amêdî, weha rexne dike: *"Komunîstên Îraqê ji partiya Hîva nefret dikirin, gelek caran ew radibûn hev. Stalîn fisek bikira digotin bîna gulan difûre."*[424] Ji fisa dîktatorekî bêhna gulan bê pozê kesekî, tê maneya ku

---

[421] Dost, *Mijabad*, r. 48.
[422] Dost, *Mijabad*, r. *70.*
[423] Dost, *Mijabad*, r. 76-77.
[424] Dost, *Mijabad*, r. 77.

sîyasetmedarîya wî kesî, girêdaneke koranî ye; ew kes ji mentiq û realîteya demê û ji xwendina rastîya dîrokî dûr e. Jan Dost, rexneyên xwe yên li ser Hîva ji devê Badînê Amêdî weha didomîne: *"Hîva mîva nas nakim, agirek vêketiye, divê ez çend êzingan biavêjim ser. Êdî ez nema karim di çirava nakokîyên Hîva xanim de avjeniyê bikim."*[425] Dost, partîyan dişibîne qaşilekî teng ku mirovan serkorî hev dike û hişmendîya wan a ramanî ji dest wan digire lewra partîzan wek mirîdên şêxan îradeya xwe teslîmî îradeya serokekî dikin. Kalikê Badînê Amêdî Entranîkê fotokêş dibêje ku *"Partîzan fotoyek e, her di halê xwe de dimîne, foto xemgîn be wê bimîne xemgîn, şad be wê bimîne şad."*[426] Jan Dost, rexnebarana li ser partîya Hîvayê bi gotinên Badînê Amêdî didomîne: *"Hêdî hêdî cilik ji bin lingê Hîwayê dihate kişandin, nema bawerîya xelkê bi qerwêlkên wê dihat. Xelk li dora agirê germ yê ku Barzanî geş kiribû civiyan,"*[427] Li gor Badîn, geşbûna agirê partîya Barzanî, milet li dora xwe dicivîne. Badîn, weha didomîne: *"Hîva weke bûka berfê li ber tava şoreşa Barzanî diheliya. Komek tev li komunîstên Îraqê bûn û belavoka Azadî derxistin, hinan jî partiya Rêgay Rast ava kirin"* [428] Badîn, Hîva dişibîne werîsekî rizîyayî ku di bin giranîya nakokîyan da qetîyayî. [429] Jan Dost, tenê Partîya Hîva rexne nake, li hember Demoqrat Firqesî jî cih dide gotinên rexneyî. Kalikê Badîn Entranîk, weha dibêje: *"Demoqrat Firqesî jî qûna hikûmetê dialêse, wê niha komara te weke şaxekî ter li ber bayekî hov bihêlin. Tê bibînî! Bi diwazdeh hezar pêşmerge nexape, qeder werîsekî zivir ji stuyê komarê re dirêse…"* [430] Li gor wî, Demoqrat Firqesî jî şalûzîya desthilatdarîyê dike û xetereya li pêşîya Komara Mahabadê nabîne.

Di romana dîyasporayê da gelek rexne li partîyan û partîzanîyê hatine kirin. Piranî Jan Dost, Helîm Yûsiv û Firat Cewerî, rexneya sîyasî ya partîyên kurdan kirine. Nakokîyên polîtîk û tunebûna fikira yekîtîya neteweyî mijara hevpar ya rexneyan e.

---

[425] Dost, *Mijabad*, r. 108-109.
[426] Dost, *Mijabad*, r. 96.
[427] Dost, *Mijabad*, r. 110.
[428] Dost, *Mijabad*, r. 110.
[429] Dost, *Mijabad*, r. 122.
[430] Dost, *Mijabad*, r. 131.

3.3. Dewleta Osmanî

Di romana kurdî ya dîasoporayê da bi taybet di romanên dîrokî da rexneya dewleta Osmanî cihekî giring digire. Giranîya rexneyên Osmanîyan di romanên Mahmut Baksi, Mehmed Uzun û Jan Dost da derdikevin pêşberî me. Sîyaseta ku Osmanî li ser kurdan dimeşînin û kurdan ji bo berjewendîyên xwe bi kar tînin wek sîyaseteke qirêj tê dîtin.

Di sala 1514an da Yavuz Siltan Selim (1470-1520) li Deşta Çaldêranê zora artêşa Îranê bir. Di vî şerî da alimê kurd Îdrîs-î Bitlîsî (1452/1457-1520) di navbera Siltan Selim û serokeşîrên kurdan da çû û hat. Serokên kurdan di nava xwe da serokatîya kurdekî nepejirandin. "Gelek mîrên kurdan ji bo girêdanmayîna bi Îranê ra bêqerar bûn. Îdrîsi Bitlîsî, ev mîr zîyaret kir û ji wan bîst û penc (beg) derbasî hêla padîşahê Osmanî kir."[431] Bi vê boneyê Siltan Selim bi awayekî fermî otonomîyek da eyaleta Kurdistanê û ji navenda Osmanîyan serokek peywirdar kir ji bo serokatîya kurdan. "Siltan Selim bi fermana qirkirina 40 hezar muslumanên şî'î, yên nava Împaratorîya Osmanîyan da dest bi hikmê xwe kir û ji baregehên xwe yên li Amasyayê gazî li şahê Îranîyan kir ku bê û ji ber gunehên xwe (yên dînî) tobe bike û welat û axa ku 'aîdê' tirkan e radest bike. Şah, bi xeberên tûj û kirêt cewaba wî da. Şerê miteakîb du salan dewam kir. (1514-16) Li Deşta Çildêranê nêzîkî bajarê Qersê, Îranî bi tevahî şikestibûn û şah, text û xezîne bo siltan hêlabûn û revîyabû. Serkeftina Osmanîyan a li Çildêranê destpêka dîroka kurdan a modern destnîşan dike."[432] Di 17ê gulana 1639an da di navbera Siltan Muradê IV. (1612-1640) û şahê Îranê Şah Abbas da hate îmzekirin. Erdnîgarîya Kurdistanê bi Peymana Qasrî Şîrîn"ê ra di nava Osmanîyan û Îranîyan da hate parvekirin. "Di nîvê ewil ê sedsala 16an da bi saya dîplomasîya Osmanîyan a aqîlane û serkeftinên wan ên leşkerî û kişandina mîrên kurdan a cem xwe, qismekî mezin ê Kurdistanê bi dest xistin. Ew xêzê sînor ê di nava du împaratorîyan da hatibû dîyarkirin, di sedsalên bi şûn da zêde nehat guhertin."[433] Ev xêzesînor heta sala 1932an ji alîyê sîyasî ve derbasdar bû.

Di sala 1891ê da ji alîyê Siltanê Osmanî Evdilhemîdê II. (1842-1918) ku leqeba wî 'Bavê kurdan' bû alayê Hemidîye hate damezirandin. "Bi pêşnîyaza

---

[431] Vladimir Minorsky, Thomas Bois, *Kürt Milliyetçiliği*, Wer. Kolektîf, Örgün Yay., İst., 2008, r. 49.
[432] Arshak Safrastian, *Kurd ü Kurdistan*, (Wer.) Ergin Opengin, Avesta, İstanbul, 2007, r. 46.
[433] Martin Van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, Wer. Banu Yalkut, İletişim Yay., İstanbul, 2010, r. 205.

bûrayê Siltan Evdilhemîdê II. Muşîr Mehmed Zekî Paşa (1846-1929) bi mînaka yekîneyên qazaxên rûsan hate avakirin. Di serî da 36 alay pêk hat. Ev jimar di sala 1895an da gîhaşt 57an. Di sala 1910an da ev jimar gîhaşt 66an. Alayên Hemîdîye ji eşîrên kurdan ên sunnî pêk hatin."[434] Ev hêzên leşkerî ji nav mêrxasên eşîrên kurdan dihatin hilbijartin. Serokatîya van yekîneyan jî piranî di destê axa an jî serokê eşîr an jî konfederasyona eşîran da bû. Dewleta Osmanî, rutbeyên leşkerî wek mîralay / mirlîva dida van axa û began. Li gor nîzamnameya Osmanî ya 1896an "Reîsê eşîra heyderan Huseyîn Paşayê Kor (?-1930) û serokê eşîra mîlan Îbrahîm Paşa (1840?-1909) bi rutbeya mîrlîva (tuggeneral) hatin taltîfkirin."[435] Dîroknas Ayşe Hür, destnîşan dike ku ji ber talan û şelandin û angaryaya hêzên Îbrahîm Paşa, gelê Dîyarbekir di pêşengîya Zîya Gokalp (1876-1924) da telgrafxane îşxal kirin û ew şîkayetî serayê kirin, lêbelê Evdilhemîd dîsa jî Îbrahîm Paşa bi rûtbe û nîşanan taltîf kir. Gel, cara duyem serî hilda û alaya Îbrahîm Paşayê Milî, di sala 1907an da ji herêmê hate dûrxistin.[436] Zîya Gökalp li ser vê meseleyê helbesteke bi navê *"Şaki İbrahim Destanı"* nivîsand û di vê helbestê da bi berfirehî behsa kiryarên Îbrahîm Paşa û alaya wî kir. Bi damezirandina Alayên Hemîdîye hegemonyaya serokên eşîran, bi erkên leşkerî dihate îkamekirin. Van yekîneyan ji bo dîsîplîna leşkerî ji alîyê serleşkerê Osmanî dihatin întîzamkirin.

Hêzên Hemîdîye ji suwarîyên biçek pêk dihatin. Eşîrên ku tevî van hêzên çekdar bûn di demeke kin da li herêmên xwe da bûn çavkanîya otorîteya herêmî û zilm û zor dan ser eşîrên neketine nav van alayan. Sîstema Alayên Hemîdîye bû sedema gwîrbûna şerên navxweyî yên eşîrên kurdan. Ayşe Hür dibêje: "Alayên Hemîdîye esas bûbûn belaya serê eşîrên sunnî yên kurdan. Navbera kurdan û ermenîyan jî xira kirin. Li her bajarên ermenî lê dijîn; jimara êrîş, talan û kuştinê zêde bûn. Di pevçûnên navcivakî yên Sason û Riha yên salên 1894-1896an da qewimîn, Alayên Hemîdîye bi însîyatîfên xwe bi hezaran ermenî kuştin."[437] Di sala 1911an da kadroyên Îttîhad û Terakkîyê bi nîzamnameyeke nû navê van hêzên leşkerî guherand û kir Alayên Suvarîyên Eşîran ên Sivik û wan bi Qolordîya 9. ya Erziromê ve girê dan.

---

[434] İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler*, Nûbîhar, İstanbul, 2017, r. 202.
[435] Ayşe Hür, *Öteki Tarih I Abdülmecid'den İttihad ve Terekki'ye,* Profil Yay., İst., 2013, r. 72.
[436] Hür, h., b., r. 73.
[437] Hür, h., b., r. 73-74.

Li Tirkîye di salên 1990î da hukumeta ANAPê ya di bin serokwezîrtîya Turgut Özal (1927-1993) da bi îlhama Alayên Hemîdîye li bajarên rojhilat û rojhilata başûr sîstema cerdewanîyê dameziran û ev sîstem ji gelek alîyan ve rola Alayên Hemîdîye lîst. Kurdên tevî vê sîstema cerdevanîyê bûne bi çekên dewletê û bi derfetên berfireh hikmê xwe nîşanî kurdên necerdewan didan. Divê neyê jibîrkirin ku mantalîteya Alayên Hemîdîye û sîstema cerdewanîyê, hilberîna heman hişmendîyê ne ku ew jî tekbirina kurdên mixalîf bi destê kurdên alîgirê dewletê pratîze dike.

Mahmut Baksi di romana *Gundikê Dono* da li ser dostanîya gelê ermen û kurdan disekine û Osmanîyan wek xirakerê dostanîya van du gelên qedîm destnîşan dike. *"Roma bêbext her du gelên dost û dilsoz berdane hev. Ew roj ew roj e Çemê Xerzan stuxwar e, sêwî ye."*[438] Vebêjê Baksi, zilma Osmanîyan û leşkerên wan ku ji ser gelê kurd, kêm nebûye jî weha rexne dike: *"Ma ên bavên me, pismam û hogirên me kuştin ne cenderme bûn?"* [439] Baksi, îdîa dike ku ji dema Osmanîyan heta roja me kuştina gelê kurd ku tilîya dewletê tê da heye, bûye wek tradîsyoneke dîrokî. Baksi li hember kuştina bav, pismam û hogiran banga tevgereke bi hişmendî li gelê kurd dike.

Mehmed Uzun di *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* da bi gotinên vebêj-lehengê xwe Ehmedê Fermanê Kîkî, ji bêpiştbûn û bêxwedîbûna welat digazine û dewleta Osmanîyan bi dizîya dewlemendîya kurdan tewanbar dike. *"Hatin û dewlemendiyên welêt vediguhezîn Stenbolê, payitexta dewleta Alî Osmanî, û diketin nav sandûqên zêr û yaqûtên ên saraya Osmanî û neçarî û belengazî dibû para kurdan.* [440] Osmanîyên ku bi qewlê Mehmed Uzun pişta kurdan mist didan, kurd bi awayekî sîstematîk cahîl dihiştin. Uzun, vê sîyaseta Osmanîyan a durû rexne dike.

Mehmed Uzun, Osmanîyan ji alîyê sîyaseta ku dimeşînin dilsoz nabîne. Li gor lehengê wî Tahar Xan, Osmanî nankor in, durû ne, fetbaz û zordar in. Ev xisûsîyet di genetîka sîyaseta dewleta Osmanîyan da ew qasî bi cih bûye ku bawerîya mirov êdî bi Osmanîyan nayê. Bi gotina Tahar Xan *"Nanê Osmaniyan li ser çoka*

---

[438] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 14.
[439] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 63.
[440] Uzun, *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê*, r. 64.

wan e. Meriv nikare ji wan bawer be." [441] Mehmed Uzun di *Hawara Dîcleyê* da xedarî û êrîşkarîya Osmanîyan bêpayan tarîf dike. Bi navgînîya Dengbêj Biro, Osmanîyan wek hosteyên kavilkirin, wêrankirin, şewat û kuştinê dinirxîne. Li gor Dengbêj Biro, ev eşîra (Osmanî) ku bapîrên wan ji Asyaya Dûr derketine û li cîhanê belavbûne û erdeke berfireh xistine bin otorîteya xwe ya navendî, ji ber tevgerên xwe yên sîyasî û leşkerî li gelek deveran cih û warên wêran, li dû xwe hiştine.[442] Dengbêj Biro, bûyerên ku Têlî jî wî ra behskiribûn neqil dike û zilma paşayên Osmanîyan ku li ser ehlê îdare dikirin û îteatkarîya wan a li hember siltanên Osmanî rexne dike. *"Paşayên Osmanî ku ne bav û kalên xwe dinasin ne jî war û welatên xwe; îtaatkarên siltan û dewletê lê zordarên ehlên din ku ehlê ku îdare dikirin, nedinasîn,"*[443] Paşayên ku li herêmên desthilatdar in, wek "walîyên super" bi erkên berfireh hatine wezîfedarkirin, zilm û zordarîyeke bêpayan li ser xelkê dimeşandin.

Osmanî bi kiryarên xwe yên tirsnak ku ji qeweta şûrê wan dizên, bûyerên nedîtî li dû xwe hiştine. Bi van bûyerên ecêb tirseke mezin bera dilê gelan dane. Çavtirsandina xelqên din bi kuştin û talan kirinê. Li gor lehengê Mehmed Uzun taybetmendîyeke tarîxa Osmanîyan e ku ji alîyê her kesî ve baş tê zanîn. Sîyaseta zordarîyê peyameke vekirî ye ji gelên qels û bêpişt ra. Yan tu yê di nava xwînê da bigevize yan jî tu yê girêdayî otorîteya navendî ya Osmanîyan be û bacê bide wan, leşkeran ji wan ra bişîne. Lehengekî Hewara Dîcleyê ,Têlî, ji Dengbêj Biro ra dibêje ku *"Em tarîxa osmaniyan dizanin, çaxa ew bi ser dikevin, bi darê zorê û bi qûweta şûr her derê kavil dikin, tirseke bêpayan tînin pê û ji bo îbretê bûyerên nedîtî ku hîç çu wextê nayên ji bîr kirin li dar dixin."* [444] Li gor Têlî, dewleta Osmanî hem desthilatdarê bihêz e hem jî hosteyê dek û dolaban e ango bi qasî ku şûrê wan tûj û xwînrij e, mejîyê wan jî ji mizawirîya sîyaseta derveyîn û ya hundirîn ra baş dixebite. [445]

Jan Dost di *3 gav û 3darekê* da hin sedemên Serhildana Şêx Seîd (1925) bi gelek kiryarên Osmanîyan ku wek mîrate ji dewleta nû ya Tirkîyeyê ra mabûn ve girê dide. Vebêjê Jan Dost weha dibêje: *"Qaçorçî û ûşurçî û karmendên civandina*

---

[441] Uzun, *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê*, r. 65.
[442] Uzun, *Hawara Dîcleyê*, r. 277.
[443] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 153.
[444] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 257-258.
[445] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 274.

bac û bêş û xerac û vergiyan li gund û qezayan bi cendirmeyan re digeriyan û bi navê qanûnê xelk talan dikirin." [446] Qaçorçî û ûşûrçîyên karmendên Osmanî ku li gor Jan Dost, kîn û nefreteke mezin xistibû dilê gelê kurd. Zordarîya Osmanîyan ew qasî li ser xelkê bandoreke nêyênî hiştîye ku di romana *3 gav û 3darek*ê da karakterekî romanê bi navê Xalisê Bedlîsî, derheqê nîşaneyeke dînê îslamê ya ku rêzdarîya gel jê ra heye weha dibêje: *"Tu zanî ev qûb çi ne, ew gunên siltanên Alî Osman in û ev minare jî..."* [447] Ev cure vegêrana îronîk di heman demê da edaweta li hember îdareya Osmanîyan di dilê gel da dikele û difûre jî bi awayekî qerfî nîşan dide.

Jan Dost di *Mijabad*ê da li ser meseleya "cîhad"ê disekine. Siltanê Osmanîyan ku di encama seferên Yavuz Siltan Selim ên Çildêran (1514), Mercîdabik (1516) û Rîdanîye (1517) yê da xîlafeta îslamê bidest xistin, di dema êrîşên xwe yên ser xeyrîmislîman da sencaqa "cîhad"ê derdixistin û bangî mêrên musluman dikirin da ku tevî sefera leşkerî bibin, bi gotinên lehengê xwe rexne dike. Heger mirin hebûya jixwe meqêmê şehadetê bû, mizgînîya derîyê cinetê û kelecana germahîya hembêzê horîyan bû. Heger veger hebûya, serbilindî û şanazîya xezayê bû. Lehengê romanê Badînê Amêdî, ji devê kalikê xwe neqil dike: *"Ew nû hatibû eniya şer, wî digot -her hal wî nizanibû ez ermen im- : Ez hatime cîhada gêwir. (...) Dev ji Amediyê berdabû û li Sariqamişê li morîkên gerdeniya diya xwe digeriya. Cîhad kuro! Lawê keran..."*[448] Jan Dost, devjêberdina komara berşîr a Mahabadê û tevîbûna muslumanên kurd ên şerê Sariqamîşê ku enîyeke Cenga Cîhanê ya Yekem (1914-1918) bû, bi rexneyeke tijî sixêf li ber xwîneran radixe. Kalikê Badînê Amêdî dibêje *"Ne ez bûma bawer bike, wî ji şer baznedida, cennet û heftê horiyên çavbelek û goştzelal û çardesalî li hêviya wî bûn. Wey xwelî li serê we be, xelkê dikuta xwehên we û hûn bi kutana horiyan timadar dikirin, wey xwelî li serê we be."*[449] Jan Dost ji devê lehengê xwe ji bo kurdan bêwatebûna vî şerî bilêv dike. Dost, ji bilî timayîya dinyayê, timayîya axretê jî wek amûreke xapandina qurbanîyên vî şerî destnîşan dike.

---

[446] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 105.
[447] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 121.
[448] Dost, *Mijabad*, r. 99.
[449] Dost, *Mijabad*, r. 99.

Rexneya Osmanîyan piranî di peywenda dîrokî û sîyasî da derdikeve pêşberî me. Şer û pevçûnên Osmanîyan ku bi dewletên din ra diqewimîn û têkilîya van rewşên aloz a kurdan bûye mijara rexneyên Osmanîyan. Li gor romannûsan, Osmanî ne dilsoz bûn û bi edaletê tevnedigerîyan. Bacên giran li ser gel ferzdikirin û cîhad ji bo berjewendîyên xwe bi kar tanîn.

3.4. Komara Tirkîyeyê

Di romana kurdî ya dîyasporayê da di romanên Mahmut Baksi, Mehmed Uzun, Firat Cewerî, Hesenê Metê û Jan Dost da Komara Tirkîyeyê ji alîyê zordarîyê ve hatîye rexnekirin. Raperînên di demên ewil ê komarê da ku bi tundîyeke mezin hatine tepisandin û pişt ra qedexekirina sîstematîk a ziman û çanda kurdî, mijara sereke ya rexneyan e. Piştî cuntayên leşkerî ku atmosfereke mîlîtarîst li hemû deverên Tirkîyeyê ava kirîye, li welatên kurdan li ser gelê kurd pêkutîyeke mezin pêk hatîye, gelê kurd ji gelek alîyan ve rastî kiryarên derveyî hiqûq û demokrasîyê hatîye.

Mahmut Baksi di *Hêlîn*ê da bi navgînîya Hêlînê -keça mamosteyê ku ji ber zordarîya dewletê hewl dide xwe û malbata xwe derbasî derveyî welêt bike- behsa zor û zextên dewletê dike û destdirêjahîya dewletê ku filitîna wê tune ye, rexne dike. *"Bavo digot: destê hukûmeta tirkan pir dirêj e. Meriv zû bi zû nikare xwe ji lepên wan xelas bike."*[450] Baksi di *Gundikê Dono* da kiryarên cendirmeyên Alaya Sêrtê dike mijara rexneyan. Vebêjê Baksi, ketina leşkeran a nav gundan, şewitandina gundan û zordarîya ku leşker li ser gundîyan pratîze dikin, destdirêjîya leşkeran a li hember keç û bûkên kurdan, tevgerên wan ê talangerî, lêdan û heta kuştina jin û zarok û yextîyaran bi tundî rexne dike.[451] Baksi di heman romanê da şerê Motkayê bi bîr tîne û cih dide zordarîya artêşa tirk a wê demê. Kuştina bi hezaran zar û zêç bi destê leşkeran û wêrankirina Motkayê, dibe mijara rexneyan.[452] Ji bilî vê, lehengê Baksi gelê kurd jî rexne dike ku gel ji bûyerên dîrokî û sîyasî tu encaman dernaxe û hîn jî bawerîya xwe bi kar û kiryarên dewletê tîne.

---

[450] Baksi, *Hêlîn*, r. 98.
[451] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 56.
[452] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 69.

Mahmut Baksi di romana *Serhildana Mala Eliyê Ûnis* da kiryarên Mustefa Kemal (1881-1938) ê tijî lîstikên sîyasî ne, bi rêya lehengê xwe rexne dike û mixabinîyekê ji bo bawerkirina serokeşîr û şêxên wê demê tîne zimên. Ew axa û şêxên ku bi destê Mustafa Kemal girtin û Şêx Seîd (1865-1925) di gurkirina agirê serhildanê (1925) da tenê hiştin, wek sersebeba têkçûyîna serhildanê nîşan dide.[453] Li gor vebêjê Baksi Enqere, bi vê lîstika jihevxistin û dûrxistinê, nehiştîye hêza kurdayetîyê bibe yek û gîhaştîye armanca xwe ya nîhaî. Baksi, bi van gotinan meseleya Cemîlê Çeto (1877-1926) ku me bi bîr anî bû qest dike. Baksi, di heman romanê da rexneyên xwe didomîne û destnîşan dike ku bawerî bi bextê tirkan ve nayê. Lehengekî romanê bi navê Evdirehmanê Elî dibêje *"Tu caran wan şer bi destê xwe qezenc nekirîye. Tim û tim hîle û fitne xistine nava gelên din, ew berdane hev û paşê ew yek bi yek di nava xwe de mihandine."* [454] Li gor Evdirehmanê Elî, tirkan bi vê cure sîyasetê bêyî ku xwe zêde biêşîne xelk bi destê xelkê dane perçiqandin. Baksi, xezeba leşkeran ku bi ser gel da dihat bi dîyalogên tijî xof radigihîne. Bo nimûne *"Gelek caran eskerên Roma Reş ji hev re digot: Divê em serê wan zarokan jê bikin ku wekî bav û kalên xwe serî li ber me ranekin."*[455] Fikira serjêkirina zarokan ku berîya mezin bibin û wek bav û kalên xwe li hember dewletê serîhildin, mînakeke balkêş li ber xwîneran radixe.

Zor û zilma li ser zarokên kurdan dihate kirin û ji alîyê leşkeran ve destavêtina keç û bûkan, gelek caran dibe mijara rexneyan û vebêjê Baksi, dibêje ku gelek keç û jinan xwe ji ber vê çendê kuştine. [456] Vebêjê Baksi, di meseleya kurdan da serokwezîrê wê demê İsmet İnönü (1884-1973) wek qesabê kurdan binav dike. Baksi, tevî kurdbûyîna İnönü wî wek dijminê kurdan dide nasîn.[457] Vebêjê Baksi, valakirina Kurdistanê û sirgûnkirina eşîran, civandina gundîyan a li meydanên gundan û êşkenceyên nedîtî yên li xelkê dibin wek encamên sîyaseta İsmet İnönü ya tund destnîşan dike.

Mehmed Uzun di romana *Tu*yê da ji devê lehengê xwe Komara Tirkîyeyê ji alîyê sîyaseta qedexekirinê ve rexne dike. Uzun, qedexekirina cejnên neteweyî wek

---

[453] Baksi, *Serhildana Mala Eliyê Ûnis*, r. 29.
[454] Baksi, *Serhildana Mala Eliyê Ûnis*, r. 35.
[455] Baksi, *Serhildana Mala Eliyê Ûnis*, r. 70.
[456] Baksi, *Serhildana Mala Eliyê Ûnis*, r. 70.
[457] Baksi, *Serhildana Mala Eliyê Ûnis*, r. 83.

armanca dewletê ya pêkanîna yekîtîya KTyê dinirxîne. [458] Ew dewleta ku ji bo yekîtîya komarê, fedakirina canên xelkê dixwest û hertim ev dûrişme ji devê hemwelatîyên wê bilind dibû: Hebûna min ji hebûna te ra dîyarî be! (Varlığım, varlığına armağan olsun!)

Mehmed Uzun, razemenîyên dewletê yên newekhev jî rexne dike. Lehengê Uzun, destnîşan dike ku ji bajarên Rojavayê Tirkîyeyê ra razemenîyên wek birqê û sazkirina rêyan layiq tê dîtin ji bajarên Rojhilatê Tirkîyeyê jî ra qereqol tên çêkirin û cendirme tên şandin. [459] Hemwelatîyeke li ser newekhevîyê ava dibe wek birayetîyê tê nîşan dayîn. Vebêjê Uzun, di dema lêgerîna leşkeran a malan da tevgera cendirmeyan û dijminatîya wan a li hember kitêban jî rexne dike. *"Polîsan jî çarşefa ser cihê te girtibûn û raxistibûn erdê. Kitêb diavêtin navê."* [460] Kitêbên ku li nava çarikên jinan ku zarokan pê li pişta xwe girê didin dihatin raxistin ji alîyê polîs an cendirmeyan ve wek nîşaneya çepgirîyê dihate dîtin.

Mehmed Uzun, înkarkirina nasnameya kurdî dike mijara rexneyan û vê yekê wek înkarkirina roj û stêrkan dihesibîne.[461] Lehengê Uzun, tunehesibandina miletekî napejirîne û weha dibêje: *"Rejîma nû, hebûna kurdan jî nenase. Zor û zulim li welêt her berdewam e."*[462] Kesên ku li ser navê dewletê kar dikin û diranekî pergala rêvebirîyê ne dema miletekî înkar bikin, ev cure tevger dibe sedema gengeşîyên nasnameyî û dijminahîyê.

Mehmed Uzun di *Bîra Qederê* da cih dide nameya Celadet Bedirxan ku ji Mustafa Kemal (1881-1938) ra şandîye. Uzun bi rêya vê nameyê, rexneyên Celadet Bedirxan (1893-1951) ên derheqê asîmîlasyonê da aşkera nîşan dide: *"Paşa hazretlerî, heke hûn dixwazin girêka kurdî çareser bikin, hingê rê heq û huqûq e. Ne kuştin, qedexekirin û înkar e."* [463] Uzun, bi vê nameya dîrokî hin rexneyên xwe ji devê Celadet Bedirxan bi awayekî zimnî tîne zimên. Uzun, di her qada jîyanê da serdestîya fikira tirkîtîyê ku mafê hebûnê jî nade gelên dîtir, rexne dike. Lehengê

---

[458] Uzun, *Tu*, r. 19.
[459] Uzun, *Tu*, r. 20.
[460] Uzun, *Tu*, r. 49.
[461] Uzun, *Tu*, r. 189.
[462] Uzun, *Tu*, r. 188.
[463] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 257.

Uzun dibêje ku: *"Rojnameyên Cumhuriyet û Vatanê dihatin. Kovarên Ülkü, Kadro, Bozkurt, Türkçü Dergi, Yurt ve Dünya pê ve, ew rojname û kovar hemû kursî û organên siyaseta 'tirkîzasyonê" bûn. Li gora wan li tirkiye bi tenê tirk hebûn.,."* [464] Bi van gotinan Uzun, bal dikêşe ser meseleya asîmîlasyonê ku wek têgeheke sîyasî û civakî bi gelek celeban di rojeva wê demê da cihekî giring girtîye, li ser metodolojîya wê hatîye xebitîn û derheqê mijarê da raporên sîyasî hatine amadekirin ku em ê di bin sernavê rexneyên asîmîlasyonê da bi hûrgilî behsa van xebatan bikin.

Mehmed Uzun di *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* da*"* erzanbûna mirinê ji devê lehenga xwe Kevokê rexne dike. Kevok dibêje *"Çima? Însan, jîyana însan li vir erzan e, zehf erzan, çima?"* [465] Li gor Kevoka şervan, mirina ku bêwext tê û mirovan di destê xwe da diherifîne, li vê erdnîgarîyê bûye pîvana jîyanê. Şerê di navbera du hêzên çekdar kû ji bilî mirinê tu encamek nedaye, tenê ne kesên çekdar dikuje, kuştinê jî normalîze dike.

Firat Cewerî di *Payiza Dereng* da welêt dişibîne dojeheke ku hemû mirovên wê dijminahîya hev dikin. Dayika Ferda di bersîva nameya lawê xwe da ji wî ra dibêje *"Neyê vir. Neyê vê axa ku tiyê xwînê ye, Neyê nav van mirovên ku gurên hev in, venegere vê dojehê."* [466] Gotina 'axa xwînê' ji bo rexnekirina atmosfera sîyasî û civakî metaforeke balkêş e. Di romanê da ev gotin ji devê ehl û eqrebayên Ferdayê derketîye dîyasporayê tên bilêvkirin. Kesên ku bav û kalên wan bi hezar salan li ser xakekê jîyana xwe bihurandibin û ji bo welatê xwe gotina dojehê bi kar bînin, tê wateya ku mercên jîyaneke asayî nemaye.

Firat Cewerî jî wek Mehmed Uzun ji erzanbûna mirinê gazinan dike. Mirina ku bi destên evdan tê û bêwext mirovan dixe bin erdê, dîyardeya şer e.[467] Şerê ku li temenê qurbanîyên xwe nanêre ku ew qurbanî yextîyar in an jî zarok in. Li deverekê temenê mirovên ku dimirin çi qasî kurt be tê wateya ku rewşeke awarte heye. Cewerî, li Tirkîyeyê rewşa mirovên di bin giranîya qanûnên awarte da dijîn û

---

[464] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 268.
[465] Uzun, *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê*, r. 229.
[466] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 40.
[467] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 282.

atmosfera sîyasî ya tehamûla desthilatdaran ji pîrozkirina cejneke qedîm (newroz) ra tuneye rexne dike. Firat Cewerî, mesnewîya *"Mem û Zîn"*a Ehmedê Xanî (1650-1707) refere dike û bi mixabînîyekê destnîşan dike ku ew şayesên ku Xanî di beşa pîrozbahîyên Newrozê da behs dike, tevî bihurandina sêsed salî hîn jî nayê jîyîn û mirov nikarin Newrozê bi kêfa dilê xwe pîroz bikin.

Firat Cewerî, bi gotinên Ferda, destnîşan dike ku xwendina kitêban li welêt qedexe ye nemaze kitêbên naveroka wan li gor dewletê, sîyasî bên hesibandin dikarin serê mirovan têxin belayê. Kesên ku li mala xwe cih ji kitêban ra veqetandibin, dê mecbûr in dema girtina leşkeran a ser malan van kitêban vêşêrin an jî bişewitînin.[468] Mehmed Uzun, meseleya qedexekirina kitêban gelek caran derdixe ser dika rexneya romanên xwe û nirxandina desthilatdaran a ku kitêban wek delîlên sûcên sîyasî dibînin, rexne dike. Ferda, dibêje *"Demeke wilo dest pê kiribû diviyabû mal bê kitêb, bajar bê kitêb bûna. Heta rebenê Dostoyevskî û mirovên wî ên reben jî qedexe bûbûn."*[469] Ferda, kesên ku ji bêgavî kitêb dişewitandin wek qatîlê kitêban bi nav dike.[470]

Di romanên dîyasporayê da dewleta Tirkîyeyê bi giştî ji alîyê zor û zexta ku li ser hemwelatîyên xwe yên kurd pêk tîne, hatîye rexnekirin. Bişaftina sîstematîk ku rê û resmên wê bi awayekî metodolojîk hatîye sazkirin û di demên cuntayan da êşkenceyên li ser girtîyan û li gundîyan hatine kirin di romanan da gelek caran dibe mijara rexneyan. Qedexeya li ser ziman û çanda kurdî û înkarkirina nasnameya kurdî, çarçoveya rexneyên romannûsan dadigire.

3.5. Sûrîye

Li parçeyê Sûrîyeyê Hafiz El-Esed (1930-2000) ê ku efserekî ji herêma Lazkîyeyê bû, piştî derbeya wî ya ewil a di sala 1970yî, El- Esad, Sûrîye di bin kontroleke pir hişk da ragirt heta mirina xwe ya sala 2000î. "Gava Hafiz Esad desthilatî bi dest xist, gelekan ew wek antîtezê wan kevne rejîmên bêxêr didît ku Sûrîye bi rê ve biri bûn. Esad, ser û nû pênase bi Partîya Be'esê, dewletê û sazîyên neteweyî kir da ku hêza xwe binecih bike û her çi tehdîdeke li dijî serokatîya xwe ji

[468] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 333.
[469] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 333.
[470] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 333-334.

holê rake. Bi vî awayî pişta xwe qehîm kir da ku Sûrîyeyê bi lepê hesinî bî rê ve bibe."[471]

Dewleta Sûrîyeyê bi rêvebirên xwe yên dîktator û bi mixaberata xwe ya ku wek cihê windakirina mirovan û bi girtîgehên xwe ku cihê êşkenceyên nedîtî ne, di romana kurdî ya dîyasporayê da cihekî giring digire. Asîmîlasyona li ser kurdan pêk tîne, qedexeyên li ser ziman û çanda kurdî û tevgerên erebîfîkasyonê di romanên kurdên Sûrîyeyê da bi taybet di romanên Helîm Yûsiv û Jan Dost da bi hûrgilî tê rexnekirin. Ya balkêş ew e ku di romanên Helîm Yûsiv û jan Dost da gelek rexneyên sîyasî li ser parçeyê bakur (Tirkîye) hene lê di romanên bakur yên Mahmut Baksi, Mehmed Uzun, Hesenê Metê û Firat Cewerî da derheqê parçeyê Sûrîyeyê da zêde rexneyên sîyasî cih nagirin. Ev yek jî bi naverok û erdnîgarîya romanan ve girêdayî ye.

Helîm Yûsiv di *Tirsa bê Diran* da metafora tirsê dike mijara rexneyan û wêneya welatekî ji tirsê ava bûye li ber çavên xwînerên xwe radixe. Lehengê romanê Mûsayê Qamişlokî, Sûrîyeyê wek dayika tirsê bi nav dike û dibêje *"Ez li welatekî weha çêbûm ku roj lê bi tirs hiltê, weha jî bi tirseke mezintir diçe ava. Sibehan xelk bi tirs taştiya xwe dixwin."*[472] Welatê ku bi qewlê Mûsa, roj bi tirsê lê hiltê û diçe ava, divê bê nirxandin û sedemên tirs û xofa ku ketîye dilê hemwelatîyên bênasname yên vî welatî çi ne û mirov çima ew qasî ji dewletê ditirsin, bê nîqaşkirin.

Helîm Yûsiv li Sûrîyeyê qedexekirina rengên kesk û sor û zer bi vegêraneke qerfî rexne dike. Li gor lehengekî romana *Tirsa bê Diran,* Tûtino; heta ku lempeyên trafîkê jî li hember kurdan têdikoşin. Hatina cem hev a sê rengên neteweyî biqîmet e, lê bihev ra vêneketina wan, li gor Tûtino, nîşaneya bêsiûdîya kurdan e. [473] Welatekî tirsa rengan di dilê desthilatdarên wê da zîl dabe êdî li gor Anêtê, bûye nexweşxaneya dînan û kesekî melekeyên wî/ê yên eqlî, saxlem nemaye. [474] Gotinên Yûsiv, welatekî bûye timarxane, dişayesîne. Di vê rexneyê da Yûsiv, berê tîrên xwe

---

[471] Kerîm Yildiz, *Kurdên Sûrîyeyê Gelekî Jibîrkirî*, (Wer.) Avesta, 2009, Stembol, r. 67-68.
[472] Yusiv, *Tirsa bê Diran*, r. 27.
[473] Yusiv, *Tirsa bê Diran*, r. 84.
[474] Yusiv, *Tirsa bê Diran*, r. 179.

dide hemwelatîyan jî. Bêdengmayîna mirovên biaqil a li hember her kiryarên dewletê ji demekê û pê ve mirovan dike dîwaneyên timarxaneya wê dewletê.

Helîm Yûsiv di romana *99 Morîkên Belavbûyî* da cih dide rexneya DAÎŞê. Bi destpêkirina alozîya sîyasî ya Sûrîyeyê, kesên ku xwe wek micahîdên tundrew ên da'wa îslamê bi nav dikirin di bin alayeke reş da qaşo ji bo damezirandina dewleteke şerîatê herikîbûn nava çol û bajarên Sûrîyeyê, mirov bi saxî serjêdikirin, dişewitandin û qadên sîvîlan bombebaran dikirin.[475] Mîlîtanên DAÎŞê ku li ser navê muslumantîyê û sunnîtîyê xwîna însanan dirijînin, welatê Sûrîye kirine qesabxaneyeke servekirî. Lehenga Yûsiv ,Huda, dibêje ku kesên ku ji bo ne bawermend in an jî tevgerên wan ne li gor pîvanên şerîatê ne, dikarin bi kuştineke hovane ra rûbirû bimînin. Ewlehîya can û malên tu kesî nemaye.[476] Huda, vî halê ku ne tu hal e, bi tundî rexne dike û dibêje kesên ji ber wehşeta "cîhadîyan" direvin; hêvîya rawestandina vî şerê malkambax jî winda kirine.

Helîm Yûsiv di *Wehşê di Hundirê Min de* rexneyeke sîyasî li sîyasetê bi xwe dike û ji devê lehenga xwe Jina Mamoste Alan, weha dibêje: *"Bi yek gotinê li vî welatî xwekuştin ji karê siyasetê baştir e."*[477] Welatekî ku demokrasî lê tune be û sîyaset têkeve bin destê serokekî mîna seyîsekî kor, dê şûxla sîyasî jî bibe xeftanekî ji agir û kesên ku vî xeftanî li xwe bikin wê bi êşkenceyên nedîtî û razana bi salan a zindanên reş û tarî ra rûbirû bimînin. Jina Mamoste Alan, derheqê ji alîyê mixaberatê ve girtina Mamoste Alan weha dibêje:*"Xwezî sed mêr kuştibûna û di siyasetê de kar nekiribûya. Bi kêmanî me yê niha bizanîba bê ew li ku ye."* [478] Hemwelatîyan di nava mercên neyênî da hêvîya xwe ew qasî winda kirine ku li gor wan *"Xwedê bi xwe ku navê wî Xwedê ye nikare rewşa vî welatî biguherîne."*[479] Helîm Yûsiv, bi vegêraneke qerfî ya ku di romanên postmodern da pir tê bikaranîn, cih dide rexneya sîxurî û taqîbata li ser kitêb, nivîskar û xwîneran. Lehengê romanê Salar, dibêje *"Dest pê kirin li Jean Paul Sartre û Salvador Dalî û Ehmedê Xanî digeriyan da ku wan bigirin*

---

[475] Yûsiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, r. 126.
[476] Yûsiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, r. 127.
[477] Yûsiv, *Wehşê di Hundirê Min de*, r. 18.
[478] Yûsiv, *Wehşê di Hundirê Min de*, r. 55.
[479] Yûsiv, *Wehşê di Hundirê Min de*, r. 55.

û bînin lêpirsînê."[480] Heger mirîyên sed, du sed sal berê ji lêgerîn û lêpirsîna mixaberatê nikaribin birevin, zindîyên vî welatî, dê çawa sikura xwe ji destê sîxur û cendirmeyên vê desthilatdarîyê rizgar bikin? Tunebûna nasnameya kurdên welatê Sûrîyeyê jî bê hesibandin, dê rewşa aloz û xeternak baştir bê famkirin.

Helîm Yûsiv di *Firîna bi Baskên Şikestî* da rexneyên DAÎŞê didomîne. Vebêj-Lehengekî romanê Rodî, dibêje ku xwedîyên alên reş li derûdora Kobanîyê bi cih bûbûn û serê mirovan jê dikirin.[481] Rodî, ji wan kesan ra nabêje mirov, lewra mirov nikarin serê mirovan jêkin. DAÎŞîyan ji bo ku tirs û xofa xwe bera dilê mirovên herêmê din, kiryarên wehşetê dikişandin vîdeoyan û li ser malperên medyaya civakî diweşandin. Jixwe înfazên xwe li meydanan pêk dianîn û ev dîmenên xwîna mirovan sar dikin, li ber çavan radixistin.

DAÎŞîyên ku qetila sîvîlan kiribûn karê rojane, li gor Yûsiv, bûbûn sedema derketina holê ya jîyaneke di bin sîya çekan û çekdaran da perçiqîye.[482] Welatekî ku veguheze malzaroka çekan û çekdaran û bibe gola xwîna hemwelatîyan dişibe kerîyek pezê ku gurên birçî têkevin nava wê.[483] Lehengê Yûsiv di bin sîya ala ku bi navê yekbûna Xweda ve hatîye neqişandin; serjêkirina xelkê belengaz bi destê leşkerên Xwedê û firotina keç û jinên bêçare, bi tundî rexne dike. [484] Helîm Yûsiv bi taybetî li ser meseleya ji alîyê DAÎŞê ve firotina jinan disekine û van kiryarên DAÎŞîyan, afîşe dike. Lehenga bi navê Cîhan, dibêje ku "*Jin wekî kole bi kar dianîn û wan di sûk û bazaran de dikirîn û difirotin."* [485] Tê zanîn ku dînê îslamê, li hember koletîyê derketîye û koletî ango firotina mirovan qedexe kirîye.

Endamên DAÎŞê ku ji xwe ra digotin "micahîdê şerîatê" çawa û bi çi boneyê jin li sûk û bazaran difirotin û ji xwe ra ew dikirin carîye û ew marûzî tecawizên sîstematîk dihiştin? Dewletên îslamê jî li wan temaşe dikir. Li gor vebêja bi navê Cîhanê, rayagiştî ya dinyayê li komkujî û wehşetên DAÎŞê dinêrî û ev bûyerên sosret

---

[480] Yûsiv, *Wehşê di Hundirê Min de,* r. 101-102.
[481] Yûsiv, *Firîna bi Baskên Şikestî,* r. 13.
[482] Yûsiv, *Firîna bi Baskên Şikestî,* r.16.
[483] Yûsiv, *Firîna bi Baskên Şikestî,* r. 48.
[484] Yûsiv, *Firîna bi Baskên Şikestî,* r. 57.
[485] Yûsiv, *Firîna bi Baskên Şikestî,* r. 73.

wek dîmenên sînemayekê di ber çavên mirovan ra derbas dibû, roja din dihate jibîrkirin. [486]

Helîm Yûsiv, di *Firîna Bi Baskên Şikestî* da bi rêya lehenga bi navê Vîyan Amara, destnîşan dike ku DAÎŞ, sazîyeke derbasdar e, mîadê wê biqede dê fîşa wê bêye kişandin. Mesele ew e ku kîjan dewletan, tevna DAÎŞê danîne, ew bi çekên konvansîyonel ên giran xurt kirine û piştevawenîya wê kirine da ku welatekî wêran bike û xelkê wî welatî di nava xwînê da bixeniqîne." [487]

Jan Dost di romana *Kobanî*yê da ji serî heta dawîyê li ser bûyera dagirkirina Kobanîyê ya ji alîyê DAÎŞê ve disekine û vê sazîya çekdar û xwînmij ji devê vebêjê xwe carinan jî devê lehengê xwe rexne dike. *"DAÎŞ li derûdora me bû. Hevalekî me bi navê Mihemed ku wî jî beşa îngilîzî dixwend, carekê ji minibûsê daxistin û li ber çavên jinan serjêkirin."* [488] Jan Dost, bi destê DAÎŞîyan, serjêkirina mirovan bi hûrgilî dişayesîne.

Jan Dost jî wek Helîm Yûsiv li ser meseleya koletî û carîyetîya jinan û serjêkirina mirovan bi destê DAÎŞîyan ve disekine û vê kulmoza çekdarên xwînxwar ji ber van kiryarên wan ên ne însanî û ne îslamî bi şêwazeke şermezarker rexne dike. Di axaftina du endamên Daîşê da endamek, ji ê din ra weha dibêje: *"Em ê cariye û kolejinan bi dehan peyda bikin. Mêr ji serbirrinê re, jin jî ji ser nivînê re…"* [489] Li gor Jan Dost, welatê Sûrîyeyê bûye welatê xwînê. Jan Dost ji devê endamekî Daîşê bi navê Zîyad cih dide monologeke hundurîn. Zîyadê ku ji warê xwe eware bûye û hatîye deverekê ku xelkê wê xwedî mizgeft in û di malê wan da Quran hene û ew û hevalên xwe (qaşo) ji bo selametê dînê îslamê serê wan dibirin, weha difikire: *"Xwîn, xwîn, xwîn. Ji roja ku ez derbasî ser erda sûriyeyê bûme min ji xwînrijandinê pê ve nedîtîye û nekirîye. Qesabxane ye ev welat…"*[490] Hemwelatî jî di vê qesabxaneyê da bûne qurbanîyên ber devê kêrên tûj ên DAÎŞîyan.

---

[486] Yûsiv, *Firîna bi Baskên Şikestî*, r. 94.
[487] Yûsiv, *Firîna bi Baskên Şikestî*, r. 123.
[488] Dost, *Kobanî*, r.121.
[489] Dost, *Kobanî*, r. 291.
[490] Dost, *Kobanî*, r. 298.

Di romanên kurdî yên dîyasporayê da rexneya sîyasî ji ber gelek sedeman ve berbelav e. Her romannûsî, piranî li gor mercên dewleta ku lê ji dayik bûye û lê mezin- bûye û pişt ra penaberî dewlateke bîyanî bûye, li meseleyên sîyasî nêrîye û ji perspektîfa ezmûnên xwe yên kesayetî, rewşên sîyasî nirxandîye. Mahmut Baksi, Mehmed Uzun, Firat Cewerî û Hesenê Metê, zêdetir rexneyên xwe yên sîyasî li ser Tirkîyeyê komkirine. Helîm Yûsiv û Jan Dost jî tîrên rexneyên xwe yên sîyasî li gor rewşa Sûrîyeyê nîşan girtine. Jan Dost di romana xwe ya *Mijabadê* da -ji ber ku mijara romanê li ser dîroka Komara Mahabadê ye- fokusa rexneyên xwe daye ser Îranê. Dîsa Jan Dost di romanê *3 gav û 3darek*ê da li ser bûyera dîrokî ya Şêx Seîd disekine û tevna rexneyên xwe piranî li ser xaka Tirkîyeyê ava dike.

3.6. Îraq

Li Îraqê di sala 1958an da di bin rêvebirîya Evdilkerîm Qasim (1914-1963) darbeyeke leşkerî pêk hat. Monarşîya Îraqê û hikûmeta serokwezîr Nûr Sa'îd ket. Evdilqasim, nakokîyên nav KDP û Barzanî ji bo berjewendîyên xwe bi kar anî. Pişt ra xelkên Misirî û erebên ji dewletên din wek hemwelatîyên temamî hatin pênasekirin. (Xala 2.) Bi gotineke din hemû Îraqî wekhev in lê ereb ji kurdan wekhevtir in. Ereb wek miletê birader hate destnîşankirin lê kurd wek bîyanîyên nayên xwestin sirgûnî derveyî welêt bûn.[491]

Di sala 1988an da dema Şerê Îran û Îraqê bi dawî bû, Saddam Huseyîn Abdulmecîd El Tîkrîtî (1937-2006) bi navê hareketa Enfalê operasyoneke leşkerî da destpêkirin. Ev bernameyeke erebîfîkasyonê û komkujîya nifûsa kurdan bû. Li gor Sazîya Şopandina Mafên Mirovan di navbera pêncî û sed hezar însan jîyana xwe ji dest dan. Piştî jenosîda Enfalê bajarê Helebçe bi bombeyên kîmyewî hate bombebarankirin. Gelek însan revîyan Îran û Tirkîyeyê. Hin çavkanî hejmara miltecîyan wek 250.000 û hin çavkanî wek 400.000î nîşan didin.[492] Tenê di bombeberana kîmyewî ya 16ê adara 1988an da ji pênc hezarî zêdetir kurd jîyana xwe ji dest dan. Bi deh hezaran kurd birîndar bûn. Li cîhanê li hember vê jenosîdê tu deng derneket. Civaka navnetewî di vê mijarê da bêdeng ma.[493] Saddam Huseyîn, çekên

---

[491] Martin Van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, Wer. Banu Yalkut, İletişim, İst., 2010, r. 49-50.
[492] Minoo Alinia, *Diaspora Mekânları*, Avesta, İstanbul, 2007, r. 56-57.
[493] İsmail Beşikçi, *Kürt Aydını Üzerine Düşünceler*, İBV Yayınları, İstanbul, 2016, r. 9.

kîmyewî xisûsî li hember kurdan bi kar anî. Fikirî ku micadeleya kurdan a demokratîk û neteweyî encax bi bikaranîna çekên kîmyewî dê raweste. [494] Saddam Huseyîn bi van qetlîamana xwest ku hebûna kurdan ji holê rake. Ji alîyê din ji çekên kîmyewî yên di destê dewleta xwe da li ser kurdan ceriband. Xwest kû fêm bike ka çiqas gaza xerdel û sarînê di herêmek çi qasî fireh da dikare çend kesan qir bike?

İsmail Beşikçi îdîa dike ku di salên 1980yî nêzî sed pisporên sowyetî dixebitîn û ji rejîma Be'esê ra şêwirmandîya çekên kîmyewî dikirin ka çekên kîmyewî çawa tên hilberîn, bi çi awayê tên bikaranîn, di kîjan mercên hewayî da bên bikaranîn dê encam çi be? Azmûnên ku li hin dewletan li laboratûwaran li ser mişkan tên ceribandin, li Îraqê li ser gundên kurdan, li ser kurdan hatin tetbîqkirin. Di salên 1980yî da di encama van ceribînan da hejmara kesên ku mirin ji hejmara kesên ku li Helebçeyê mirin zêdetir in. Hejmara kurdên di operasyonên Enfalê da hatin kuştin, winda bûn û yên aqibeta wan nedîyar digihêje 180 hezar kesî.[495] Kerîm Yildiz dibêje: "Di salên dû van êrîşan de bi hezaran qurbaniyên din ji ber komplîkasyon an jî seqetiyên zikmakî mirin. Çekên kîmyewî li dor 40 êrîşên din jî hatine bikaranîn."[496] Derheqê meseleyê da Martin Van Bruinessen destnîşan dike ku dawîya salên 1990î ji heft hezar gundê kurdan çar hezar bi temamî hate îmhakirin. Cihên wek Helebçe û Ranya jî serobino kirin û gelên mayî li bajarên hundirîn ên Saddam hatin bi cih kirin. Sî hezar kurdên Îraqê li kampên Tirkîyeyê bi cih bûn. Çend qatên vê hejmarê jî li Îranê wek mûltecî bi cih bûn.[497]

Senar Turgut destnîşan dike ku "Helebçe di warê bikaranîna çekên kîmyewî da ne ceribîna ewil a rejîma Be'asê ye. Turgut dibêje ku Mele Mistefa Barzanî (1903-1979) di sala 1963yan da şîkayetek ragihandibû Miletên Yekbûyî derheqê bikaranîna çekên kîmyewî yên rejîma Bexdadê da.[498] Enfal û Helebçe di dîroka kurdan da di warê jenosîdê da rûpelekî reş e.

Ji ber sedemên Şerê Îran û Îraqê, Şerê Kendavê (1990-1991) operasyonên Amerîqa yên li ser Îraqê, tevgera DAÎŞê û gelek bûyerên din bi sed hezaran kes ji cih

---

[494] Beşikçi, h., b., r. 32.
[495] İsmail Beşikçi, *Devlet ve Kürtler*, İBV Yayınları, İstanbul, 2015, r. 48-49.
[496] Kerîm Yildiz, *Kurdên Sûrîyeyê Gelekî Jibîrkirî*, Avesta, 2009, Stembol, r. 38.
[497] Martin Van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, (Çev.) Banu Yalkut, İletişim, İstanbul, 2010, r. 74.
[498] Senar Turgut, *Mezopotamya'da Kürt Uygarlık Tarihi*, Belge Yayınları, İstanbul, 2011, r. 106.

û warên xwe bûn û derketin rêwîtîya penaberîyê. Di encama van bûyerên navborî da gelek kesan jî berê xwe dane warên dîyasporayê. Îro di populasyona kurdan a dîyasporayê da bandoreke mezin a van bûyeran heye. Wek encameke giştî ya vê beşê em dikarin bibêjin ku di derçûna dîyasporaya kurdî da mercên aloz ên sîyasî jî cihekî mihim girtîye. Ji ber ku mijara me ya esas ne hûrgilîyên bûyerên dîrokî û sîyasî ne em tenê wek sedem li ser van rewş û bûyeran sekinîn.

Di romana Helîm Yûsiv a *99 Morîkên Belavbûyî* da lehengê Yûsiv, Ehmedê Kerkûkî, rejîma Beasê ji alîyê sîyaseta asîmîlasyona kurdan ve rexne dike. Li gor Ehmedê Kerkûkî, dewleta Îraqê di peywenda projeya erebîfîkasyona Kerkukê da cihê gelek malbatên ereb guherandîye û ev malbatan li Kerkukê bi cih kirîye. [499] Dewletê, malbatên kurdan ên van deveran jî tarûmar kir. Yên mirin çûn, ên filitîn nîvsaxî û penaber bûn.

Romannûsên ku me çarçoveya teza xwe bi wan û romanên wan berteng kirîye ya ji Tûrkîye ne yan jî li Sûrîyeyê ji dayik bûne û li wî welatî ciwantîya xwe bihurandine. Ji ber vê çendê di romanên ku em li ser sekinîne rexneya dewleta Îraqê zêde derneket pêşberî me.

3.7. Îran

Berîya destpêka serhildana Şêx Ûbeydullahê Nehrî (1826-1883) gelê kurd di bin zor û zilma dewletê da û di bin bacên giran da piştxûz bûbû. Rewşa kurdan bi tevahî xirab bû. Nangiranîyê, kurdên bêçare mecbûrî êrîş û talanan dikir. Celîlê Celîl derheqê meseleyê da weha dibêje: "Revşa Kurdên Cizirê, Mûsil, Dîyarbekir û deverên din jî ne pir cuda bû. Yakîmanskî di rapora xwe ya ji sefîrê Stenbolê ra şandibû dinivîsand ku ji ber kêmbûna ceh û genim, însan goştê keran û kokên gîhayan dixwarin."[500]

Prof Celîlê Celîl dibêje ku di nîvê sedsala 19an da serokê terîqeta neqşîbendîyan, Şêx Ûbeydûllahê Nehrî (1826-1883) bû. Li gor Celîlê Celîl, Şêx Ûbeydûllah jî yek ji feodalên herêmê bû ku dixwest danûstendina herêmê pêş keve û anarşî ji holê rabe. Ji alîyê Şah û Siltan ve bi dehan gund wek îhsan hatibû dayîn ji bo

---

[499] Yûsiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, r. 97.
[500] Celîlê Celîl, *1880 Kürt Ayaklanması Şeyh Ubeydullah Nehri*, (Wer.) Yaşar Abdülselamoğlu, Avesta, İstanbul, 2014, r. 51.

kalikê Şêx Ûbeydullah, Şêx Teha. Hejmara gundên ji kalikê wî mabûn di dewra şêxtîya wî da gîhaştibû 200î.[501] Celîlê Celîl, lê zêde dike ku "Şêx Ûbeydullah ji Îngilistanê wêdetir xwe nêzî Rûsya didît û vê yekê jî weha îzeh dikir: ji dêleva ku mirov li cem rovî be mirov li cem şêr be çêtir e."[502] Hin axa û serokeşîrên ku ji bo berjewendêyên xwe yên şexsî tevî vê tevgerê bûbûn, îxanetî Şêx Ûbeydullah kirin û dema nigê dîk di tawekê dîtin ji piş şêx revîyan."Artêşa Îranê bêyî kû bi berxwedaneke cîdî rûbîrû bîmîne gundên kurdan ên li ser rêya xwe xera dikir, dişewitand û talan dikir. Bêyî kû ferqa zarok, jin û îxtîyaran têxe nava wan hemû kurd qetil dikir.[503] Şulişevsky di rapora xwe ya mejûya 10.12.1880yî da dinivîsand ku ji bo tepisandina serhildanê çendin hezar kurd hatine qetilkirin û ji 200 gundî zêdetir hatine talankirin.[504]

Şêx Ubeydullah, bi dek û dolabên Osmanîyan wek mêvan hate Stenbolê. Padîşahê Osmanî, Şêx bi şanazî pêşwazî kir. Lê di demeke kin da hat fêm kirin ku Şêx, di destê Osmanîyan da dîl bû. Di demeke kin da lawê şêx, bavê xwe ji destê Osmanîyan rizgar kir lê axîr şêx û lawê xwe hatin zeptkirin û ewil sirgûnî Mûsilê pişt ra sirgûnî Mekkeyê bûn. Serhildana 1880yî têk çû.

Li Îranê pîştî "Şoreşa Îslamê" ya sala 1979an serokê rûhanî Rûhullah Mûsavî (Ayetûllah) Hûmeynî (1902-1989) ji surgûnê vegerîya rejîmeke şerîetê damezirand. Bi hezaran kes hatin daliqandin. Altan Tan dibêje ku "Komara Îslamê ya Îranê, piştî salên 1990î li hember sîyasetmedarên laîk-neteweperwer operasyon pêk anîn. Serokê Partîya Demoqrat a Kurdistanê Dr Evdirehman Qasimlo (1930-1989) û pişt ra alîkarê wî ku kete şûna wî Dr Mihemed Sadiq Şerefkendî (1938-1992) bi sûîqastan hatin kuştin.[505]

İsmail Beşikçi destnîşan dike ku "Molla, çawa hatin îqtîdarê karê ewil walîyekî faris tayînî Kurdistanê kirin. Kurd li hember vê helwestê derketin. Axaftinên Hûmeynî yên Parîsê û li Balafirgeha Tehranê bi bîr xistin. Bersiva Hûmeynî balkêş e: "Îslamên ku ji herêma we ji me ra telgraf û name şandin, gotine

---

[501] Celîl, h., b., r. 58.
[502] Celîl, h., b., r. 60.
[503] Celîl, h., b., r. 91.
[504] Celîl, h., b., r. 92.
[505] Altan Tan, *Kürt Sorunu*, Timaş Yayınları, 8. Baskı, İstanbul, 2011, r. 483.

kû em qewmîyetê naxwazin û em dixwazin di nava cemaeta îslamê da bihelin, me jî daxwaza van muslumanan pêk anî.” Bi awayekî zelal xuyaye ku îslamîyet ji bo berjewendîyên farisan tê bikaranîn. Ji bo astengkirina pêşveçûna nasnameya kurdî ya neteweyî her tevdîr tê girtin.[506] Rejîma mollayan a Îranê, li hember kurdên neteweperwer yekcar bêtolerans tevgerîya û xwest ku kurdan bi tevdîrên tûj ên sîyasî û îstîxbaratî hertim di bin kontrola dewletê da destgirêdayî bihêle.

Îran ji alîyê meseleya kurdî ve li gor Îraq, Sûrîye û Tirkîyeyê gwîzeke devgirtî ye ango derheqê kurdên Îranê da zanîna me ne wek kurdên parçeyên din têr û tijî ye. Îran jî derheqê tepisandin û ji alîyê sîyasî ve perçiqandina kurdan, xwedî rabirdûyeke tarî ye. Her çi qasî nasnameya kurdî bê pejirandin jî tu mafên wan ên sîyasî tune ye. Bi navê Kurdistan herêmeke wan jî heye lê tenê li ser nexşeyê navek e.

Jan Dost di *Mîrname*yê da ji devê Dengbêj Dostoyê Ormewî ji Ehmedê Xanî neqil dike û dibêje Xanî, ji qedera kurdan gazinan dike û destbiraktîya ecem û roman rexne dike: *“De li qedera me kurmancan binêre! Li vir ecem çi tîne serê me, li vir jî rom wisa dikin. Ku her du têne beraber yek û du jî dîsa me di bin simê hespên xwe de dipelixînin.”*[507] Jan Dost, di heman romanê da bi gotinên Xalidê Çolaq cih dide rexneya ku kurd, hertim bûne armanca “tîrên qezayê” yên desthilatdarên wek tirk, rom û eceman.[508] Ew tîrên qezayê li gor Xalidê Çolaq di sîng û dilên kurdan da hatine çikandin û nehiştine kurd rojekê azad bijîn. Jan Dost, bi awayekî endîrekt destnîşan dike ku kurd, her wextî bûne pêkenokê van miletan û li ser wan û welatê wan lîstik û entrîkayên desthilatdaran kêm nebûne.

*Mijabad*a Jan Dost ku li ser dîroka Komara Mahabadê (1946) disekine ji alîyê rexneya listikên Îranê mihim e. Jan Dost, derheqê hevkarîya desthilatdarîya Îran û rêvebirîya Moskowayê cih dide hin rexneyan. Lehengê romanê Kerîmê Şikakî ji serlehengê romanê Badînê Amêdî ra dibêje ku *“Êdî Tehran gunê Moskow miz dide Badîn! Wê Moskow, destê xwe yê hesini ji ser Mehabad û Tewrêzê rake.”*[509] Jan Dost

---

[506] İsmail Beşikçi, *Kürt Aydını Üzerine Düşünceler*, İBV Yayınları, İstanbul, 2016, r. 49.
[507] Dost, *Mîrname*, r. 95.
[508] Dost, *Mîrname*, r.123.
[509] Dost, *Mijabad*, r. 185.

di seranserê romanê da bal dikêşe ser şirîkatîya eceman û rûsan, kurdan jî di warê bawerkirin û piştdayîna rûsan da rexne dike. Li gor Kerîmê Şikakî, Moskowa, di vê lîstikê da roleke mizawîrî dilîze û fêda wê di kurdan da nemîne dê kurdan bi pelê tûtinê bifiroşe. Dost, şalûzîya sîyasî ya eceman jî rexne dike.

Dewleta Îranê, bi lîstikên sîyasî xwe ji Komara Mahabadê xelas kirîye û ji bo ku rojeke din bûyereke bi vî rengî neqewime bi her awayî kurd di cendereyeke sîyasî da tepisandî ye. Di romana kurdî ya dîyasporayê da Îran, kêm hatîye rexnekirin. Tenê di romanên Jan Dost *Mîraname* û *Mijabad*ê da rexneyên dewleta Îranê derdikevin pêşberî me.

3.8. Sowyet / Rûsya

Sowyet bi giştî di romana Jan Dost a *Mijabad*ê da bûye mijara rexneyên sîyasî. Wek tê zanîn Komara Mahabadê bi piştevanîya Sowyetan û Yosif Visaryonoviç Stalîn (1878-1953) hatibû avakirin. Dema rêvebirîya Sowyetan bi dewleta Îranê ra peymaneke neftê çêkir, Sowyetan hêzên xwe ji Îranê vekişand û Komara Mahabadê ji alîyê Îranê ve di kurtedemekê da hate hilweşandin û serokê komarê Qazî Mihemed (1893-1947) tevî çend rêvebirên Komara Mahabadê li Meydana Çarçirayê hate daliqandin. Lehengê *Mijabad*ê, Badînê Amêdî dibejê *"Halê vê komarê jî ew e, ew daneyek e di tizbiya dirêj a mejûya me de, ez dizanim wê ew di nav tiliyên stûr ên çerxa felekê de birize, hûr bibe û bibe bîranîn."* [510] Jan Dost ku tevna romana *Mijabad*ê li ser bûyerên dîrokî yê wê demê avakirîye di gelek cihên vê romanê da rexneya Sowyetan kirîye. Piranîya rexneyên Dost, li ser sîyaseta Sowyetan a durû ye ku ev sîyaset, hêza xwe ji dek û dolabên rûsan digire.

Jan Dost, di *Mijabad*ê da ji devê Entranîkê Wanlî (Nûbar Nalbendîyan) -ku kalikê Badînê Amêdî ye- dibêje ku Osmanîyan parsûyên bajarên kurdan şikandibûn û di ser wan ra derbas bûbûn. Tiştên mayî jî di bin lingê rûsan da pelîxî bû.[511] Dagirkerîya rûsan û zilma ku li gelên din dike, li gor Entranîk, haveynê sîyaseta rûsan a navnetewî ye. Jan Dost ji bo ku zor û zilma rûsan şênber bike serî li metefora "Kremlîna Sor" dide. Dost, ji devê Mujdeya hezkirîya Badînê Amêdî, weha dibêje:

---

[510] Dost, *Mijabad*, r. 35.
[511] Dost, *Mijabad*, r. 58.

"Ne ji xwîna hejaran bûya Kremlîn sor nedibû."[512] Jan Dost, kîn û edawetê mîna fitîla agirê nava gelan dibîne. Entranîk (Nûbar Nelbendîyan) lehengê romana Mijabadê dibêje *"Kîn mirovan kor dike, rûsan jî kîn di dilê me de kedî dikirin, da ku şerê osmaniyan bi me bikin, almanan jî şerê rûsan bi osmaniyan dikirin, osmaniyan jî kurd di axurên xwe de perwerde û dermale kiribûn ji rojeke wisa re..."*[513] Şerên di nava dewletên mezin, hertim bûye sedema bingehîn a perçiqandina gelên belengaz. Kurd di nava vî şerê ku çerxa wî fireh gerîyayî da bûne pîyonên ku tu qîmeta wan tune ne. Kurd tenê ji armancên mezin ra tên fedakirin û haya wan ji tiştekî tune ye. Kurdên nezan, di destê dewletên mezin da bûne pêlîstok. Osmanîyan, berê wan dane kîjan şerî, wan jî bi qehremanî berê xwe dane kuştin û mirinê.

Dîroka kurdan, dîroka xapandina wan a ji alîyê serdestan e. Jan Dost, di *Mijabad*ê da bi zanîna kesekî ku ji roja me da li dîrokê dinêre û bûyerên ku dê biqewimin, bi hûrgilî dizane, rojeva wê demê, bi gotinên lehengê xwe Entranîkê dûrbîn weha rexne dike: *"Ev komar kurmikek e di devê kurdan de ye, rûs li neftê digerin, bûye sî salên wan ku xwe nêzîkî ava giravê dikin, ne dûr e sibê peymanan bi Heme Riza* (Muhammed Riza Pehlewî, (1919-1980) *re deynin û hûn li ber ava gunê Heval Stalîn biçin."*[514] Di van rexneyan da korbûnîya Mahabadîyan û sîyasetmedarên komarê, dibe armanca tîrên rexneyên sîyasî. Lehengê *Mijabad*ê Kerîmê Şikakî ji Badînê Amêdî ra dibêje: *"Stalîn jina min û zarokên min kuştin, dê vê komarê jî di paçekê de bikuje. Tê bibînî."*[515] Tevgera Sowyetan a ji bo bidestxistina çavkanîyên neftê û hevdîtinên di navbera rûsan û îranîyan ên di wê demê da wek îlana bûyerên melûm tê dîtin û bi ser da jî bawerîya gel û rêvebiran a li hember Stalîn tê rexnekirin.[516] Di heman demê da kesên ku Stalîn, wek xelaskerê kurdan dibînin û wî teqlîd dikin jî bi şêwazeke qerfî û hetta sixêfî tên rexnekirin. Entranîk, ji nevîyê xwe Badîn ra dibêje *"Kurê gamêşê simbêlên te weke qeytanên cîzmeyên efseran e. Gunehê min çi ye? Ez ê simbêlên weke yên stalîn ji berzika pîrka xwe ji te re bihûnim."* [517] Entranîk, durûtîya dîplomatên rûs jî rexne dike û wan wek hirçan

---

[512] Dost, *Mijabad*, r. 90.
[513] Dost, *Mijabad*, r. 96.
[514] Dost, *Mijabad*, r. 98.
[515] Dost, *Mijabad*, r. 102.
[516] Dost, *Mijabad*, r. 115.
[517] Dost, *Mijabad*, r. 116.

binavdike. *"De binêre li vî hirçî! (Andreî Gromîkoyê) Dibêje ev meseleyeke hundirê îranê ye û mafê me nîn e em di kar û barên hundirîn yên dewletên din de xeber bidin."*[518] Dîplomatê ku rê û rêbazên lîstikên Sowyetan saz dike û nîyeta wî ya xirab nayê texmînkirin, wek xetereyekê li hember kurdan û Komara Mahabadê dinirxîne.

Jan Dost di peywenda rexnekirina Sowyetan da piranî cih dide serokê Sowyetan Stalîn û ji devê lehengê *Mijabad*ê Entranîk, weha dibêje: *"Stalîn weke liba nîskê ye, ne serî heye ne qûn. Berî çend mehan me digot êdî dîwarê ku kurdan pişta xwe spartiyê nayê heriftin. (...) lê vaye ji bo firek petrol komar hate firotin."* [519] Li gor Entranîk, Stalin durû ye. Belê, dewleta wî li ser xwîn û xwêdana karker û gundîyan ava bûye lê dîsa jî ew û rejîma wî ji bo berjewendîyên xwe dê li hember rijandina xwîna kurdan bêdeng bimînin û komara wan a ku piştgîrî dabûnê, dê ji bo tasek neft bi erzanî bifiroşin. Badînê Amêdî, dibêje ku *"Rûsan peymana petrolê bi xwîna Mehabadiyan îmze kirin."* [520] ji alêyê qîmetê ve berawirdkirina xwîna kurdan û petrolê ji bo destnîşankirina rastîya erdnîgarîya rojhilata navîn metaforeke balkêş a sîyasî û aborî ye.

Rexneyên derheqê Sowyetan, piranî li ser avakirin û hilweşîna Komara Mahabadê da kom bûne. Bi taybet Jan Dost ji ber mijara romana xwe ya *Mijabad*ê cih daye gelek rexneyên Sowyetan. Jan Dost di vê bûyera dîrokî da rola Sowyetan ya durû bi gelek dîyalogan li ber çavan radixe û gelek rexneyên dîrekt û endîrekt tîne ziman.

3.9. Îngilistan

Di romanên kurdî yên dîyasporayê da nemaze di romana Jan Dost *Mijabad*ê da rexneyên dewleta Îngilizan derdikeve pêşberî me. Jan Dost, tevî rexneya Almanyayê cih dide rexneya îngilizan û ji devê Jaleyê ji Badîn ra weha dibêje: *"Wê alman mala me li mîrata reş bigerînin eger werin vî welatî, kevir li ser kevir nahêlin. Ji dest Ingilizan çend kevir li ser hev mane?!"* [521] Jan Dost bi van gotinan, cih dide plan û projeyên li ser welatê kurdan. Vekirina qonsolosa Îngilistanê li nava Komara Mahabadê ji alîyê sîyasî ve hêzeke daye komarê. Di heman demê da bûye xaleke

---

[518] Dost, *Mijabad*, r. 130.
[519] Dost, *Mijabad*, r. 152.
[520] Dost, *Mijabad*, r. 238.
[521] Dost, *Mijabad*, r. 49.

giring a bawerîya xelkê Mahabadê. Lê dema Sowyetan, xwe ji pişta komarê vekişand hate famkirin ku qonsolosa îngilizan û ala wan a bixaç, bi kêrî tu tiştekî nayê û hebûna qonsolosa dewleteke mezin, nayê wateya ku ew dewlet, garantorê îqtîdara miletekî ye.[522] Lehengê *Mijabad*ê Badînê Amêdî dibêje ku *"Îngilizan, nedixwestin cengeke herêmî li dar bikeve, aramiya London di ser azadîya miletan re didîtin."* [523] Jan Dost, îdîa dike ku îngilizan ji ber tirsa Adolf Hîtler (1889-1945) ji bo ku kurdan bi kar bînin hin soz dane kurdan.

Hêzên kolonyalîst li gor plan û projeyên xwe yên dûvdirêj, polîtîkayên xwe yên herêmî dikarin biguherînin û desthilatdarên derdora xwe manîpule bikin. Axîr armanca wan gîhaştina daxwazên bav û kalan e. Jan Dost, ji devê Mele Mistefa Barzanî soz û peymanên îngilizan dişibîne qeşaya li ber tavikê helîyaye. [524] Dema faydeya wan tune be dê ji bêgavî şerê wan bê rojevê. Lewra armanca wan pergaleke kolonyalîst li ser xaka Kurdistanê lidarbixin û Kurdistanê bikin kolonîyeke kanîya neftê û cih û warê hêza erzanîya kar û bar. Li gor vebêjê Dost, ev sîyaseteke sîtemkarî ye û Kurdistan, dê tu carî nebe kolonîyeke îngilizan. Jan Dost di romana *Kobanî*yê da ji devê vebêj-lehengekî xwe îdîa dike ku îngilizan li Lozanê kurd, mehkûmî pêşerojeke tarî kirin. [525] Ango xewna azadîya miletekî şewitandin.

Îngiliz, aramîya xwe di ser serxebûna miletan teva ra dibînin. Ev yek ji sîyaseta îngilizan a cîhanşumul e. Divê îngiliz li hemû cîhanê serdest bin, dewleteke para wê di her parseyê da hebe, hesabê wê bê kirin û paytexta wê di ewlehî û aramîya da be. Ev sîyaseta kolonyalîst, bandoreke mezin li ser xaka Rojhilata Navîn kirîye.

3.10. Fransa

Di romana kurdî ya dîyasporayê da ji alîyê sîyasî ve rexneya li Fransayê tenê di romana Mehmed Uzun a bi navê *Sîya Evînê* da derdikeve pêşberî me. Uzun, di dîyalogeke romanê ku di navbera Memdûh Selîm Beg (1880-1976) û Monsîeûr Collet da derbas dibe ku bi vegêraneke îronîk feraseta sîyaseta fransizan rexne dike.

---

[522] Dost, *Mijabad*, r. 59.
[523] Dost, *Mijabad*, r. 110.
[524] Dost, *Mijabad*, r. 147.
[525] Dost, *Kobanî*, r. 314.

"Monsîeûr Collet,(...) Hûn behsa siyasetê dikin, Em li ku sîyaset li ku? Siyaset karê we mezinan e. Em xelkê hûr, reben û nezan ji siyasetê çi fêm dikin." [526] Li gor Memduh Selîm Begê, fransiz, sîyasetê wek karê dewletên mezin dibînin û bi çavê xwarineke mitbexa xwe lê dinêrin.

3.11. Rexneya Sîyasî ya Giştî

3.11.1. Nasname

Nasname, têgeheke giştî ye ku nîşaneyên aîdîyeta mirovan a civakî, sîyasî, îdeolojîk û însanî temsîl dike. Abbas Vali, têgeha nasnameyê weha pênase dike: "Nasname têkilîya cîyawazîya di navbera ezîtî û yê ditir da ye. Hertim hewcedarê şopa yên din e û hertim bi yên din ra ye. Tu demê sabît an jî bi îstîqrar nebûye." [527] Gelek şexis di pêkanîna nasnameyên xwe da xisûsîyetên wek dîn, nijad, çîn zayend û neteweyê ku girêdanên grûban temsîl dikin par vedikin.[528] Ji nasnameyê mebesta me alîyê sîyasî yê nasnameya kurdî ya neteweyî ye. Kurdîbûn ew nasname ye ku kesên xwe di bin vê sîwanê da dibînin ji miletên din vediqetin û xwe mensûbê ziman, dîrok û çanda miletekî dibînin, pênaseya hebûna xwe ya neteweyî bi vê "nasname"yê dîyar dikin.

Nasnameya kurdan di qada sîyasetê da hertim bûye mijara nîqaşên tund. "Tevî ku derheqê derketina holê ya neteweperwerîya kurdî da gengeşî hene jî" [529] Craig Calhoun di hevpeyvîneke xwe da weha dibêje: "Neteweperestî, bi taybetî îdeolojîyek e ku pir bi nêzîkî têkildarî netew-dewletê ye û dihêle ku meriv bersiva pirsekê bide, pirseke ku bersivekê dixwaze. Neteweperestî derbarê van tiştan de ye: 'Kî li hundur e, kî dikare raya xwe bide, kî dikare pasaportekê bistîne û kî endamek e.' Geşedana dewletê vebestî vê pirsê ye." [530] Pirsên giregire wek kurd kî ne, kurd miletek e yan na, welatê kurdan kîjan dever e, Kurdistan heye yan na, heger hebe sînorên wê heta ku ve diçin, taybetmendîyên nasnameya kurdan çi ne bi vî awayî

---

[526] Uzun, *Siya Evînê*, r. 180.
[527] Abbas Vali, *Kürt Tarihi Kimliği ve Siyaseti,* (Çev.) İbrahim Bingöl, Avesta, İst., 2013, r. 55.
[528] Jorge Larrain, *İdeoloji ve Kültürel Kimlik,* (Çev.) Neşe Nur Domaniç, Sarmal Yay., İstanbul, 1995, s. 212.
[529] Hamît Bozarslan, Cengiz Gunes end Veli Yadırgı, *The Kurdish*, Cambridge University Press, 2021, p. 311.
[530] Barzoo Eliassi, *Neteweperestî, Kozmopolîtanîzm û Bêdewletî, Hevpeyvînek ligel Craig Calhoun*, (Wer.) Umran Aran, Zareme, Sal: / Hejmar: 2 / 2014. r. 12.

didomin. Em werin ser meseleya nasnameyê û qedexekirina nasnameyê. "Nasname, xwe bi cihkirina takekes e. Nasnameyên kolektîf jî bi bersiva em kî ne xwe dîyar dikin. Pirsên wek em aîdê kîjan zimanî, kîjan çandê û kîjan neteweyê ne? Pirsên ku îşaretî nasnameya kolektîf dikin."[531]

Li gor Benedict Anderson (1936-2015) ji bo pêkanîna nasnameya neteweyî têgehên sereke serpêhatî û bermahîyên dîrokî û çandî; bermahîyên gel ên kevin, ziman û adet in ango folklor e.[532] Dîrok, welat, ziman, çand, wek regezên herî mihim ên neteweyan tên hesibandin. İsmail Beşikçi îdîa dike ku di çêbûna nasnameya kurdî da hêmana herî bingehîn sîyaseta redkirina hebûna kurdan û înkarkirina zimanê kurdî ye.[533] Beşikçi, îdîa dike ku di damezirandina komarê da neheqîyeke mezin li kurdan hatîye kirin. Kurd, tevî ku nifûseke wan a zêde jî heye bi qasî mafên kêmneteweyekê jî ne xwedî mafan in.

İsmail Beşikçi, destnîşan dike ku di sîstema polîtîk da kurd wek kirdeyeke sîyasî ne tiştek in. Encax bi redkirina nasnameya xwe ya neteweyî dikarin tevî pêvajoya polîtîk bibin.[534] Altan Tan jî derheqê meseleyê da dibêje ku li Tirkîyeyê hin kes hebûna kurdan înkar dikin, hin kes jî hebûna wan qebûl dikin lê wan wek dijmin dibînin, hin kes jî kurdan wek jêreçand dibînin û dixwazin kurdan di nava "nasnameya jorîn" a tirkan da asîmîle bikin.[535]

Pêvajoya sîyaseta kurdî li Tirkîyeyê ji înkarê ve ber bi qebûlkirina nasnameya kurdî ve guherîye. Ev guhertin jî bi xwe ra hin arîşeyên din anîne. Problema herî giring a girêdayî nasnameya kurdî ziman û perwerde ye. Dema nasnameyek bê pejirandin lê perwerdeya bi wî zimanî hîn jî tune be (dersên bijarte li alîyekî) tê wateya ku mantalîteya sîyasî di naskirina nasnameyê da ne dilsoz in. Erêkirina nasnameya kurdî ji alîyê neteweperwerîya kurdî jî gaveke giring e. Abbas Vali destnîşan dike ku "Neteweperwerîya kurdî, sîyaseta erêkirina nasnameya neteweyî ya kurdan e."[536]

---

[531] İsmail Beşikçi, *Devlet ve Kürtler*, İBV Yayınları, İstanbul, 2015, r. 31.
[532] Benedict Anderson, *Hayali Cemaatler*, (Wer.) İskender Savaşır, Metis, İst., 2017, r. 20.
[533] Beşikçi, *Devlet ve Kürtler*, İBV Yayınları, İstanbul, 2015, r. 14.
[534] Beşikçi, h., b., r. 189.
[535] Altan Tan, *Kürt Sorunu*, Timaş Yayınları, 8. Baskı, İstanbul, 2011, r. 401.
[536] Abbas Vali, *Kürt Tarihi, Kimliği ve Siyaseti*, (Wer.) İbrahim Bingöl, Avesta, İst., 2013, r. 48-49.

Ji sedsala 19an û vir ve serhildanên ku me di beşa borî da behskir armanca wan a sereke îspatkirina hebûna kurdan û bidestxistina mafên vî gelî bû. Martin Van Bruinessen dibêje ku "Ji bo kurdan piranî neteweya bêdewlet tê gotin. Dibe ku kurd miletekî herî qerebalix be ku ji bo avakirina dewletekê badilheba ked daye. Ev yek hem ji bo gelek kurdan û hem jî ji bo gelek çavdêran kakilê meseleyê kurdî ye.[537] Bruinessen, weha didomîne û dibêje ku Tirkîye ji bo tunekirina nasnameya neteweyî ya kurdan teşebisên gelekî dijwar kirine. Bêjeya "kurd" bi xwe jî bûye tabû û demeke dirêj jî weha maye. Wek neteweyekê behskirina ji kurdan heta îro xirabkarî hatîye hesibandin hetta ev mesele di nava ronakbîrên elît ên tirkan da jî bûye sedema bertekên hizrî.[538] Bruinssen, îdîa dike ku neteweperwerîya kurdî piranî li hember teşebisên asîmîlasyon û pêkutîyên çandî yên faris, ereb û tirkan wek bertek pêş ve çûye.[539] Dikara bê gotin ku "Serhildana kurdan a Îraqê ya domdar, neteweperwerîya kurdên Îran û Tirkîyeyê bêtir zelal kir."[540] Tevgera Mele Mistefa Barzanî ya pêşmergeyan ji bo hin tevgerên leşkerî, bû çirûska îlhamê. Tiştê herî balkêş şêx, melle û begên kurdan serkêşîya neteweperwerîya kurdan kirine. Şêx Ûbeydullahê Nehrî (1826-1883), Şêx Mehmûdê Berzencî (1878-1956), Şêx Seîdê Paloyî (1865-1925) û Mele Mistefa Barzanî (1903-1979). Senar Turgut dibêjê "Bi rastî ironîk bû ku ew Barzanîyên ku di nav qalibekî feodal da asê bûne, bibin serkêşên neteweperwerîya kurdî ya çepgir. Ji ber ku neteweperwerên bajarî ji jîyana eşîrî nefret dikin ji hêza eşîrî ditirsin û hewl didin sîstema feodal hilweşînin.[541] "Entelektuelên bajarî, hewl dan ku peyama neteweperwerî ya sîyasî û çandî di nava Kurdistanê da belav bikin. Ji bo vê yekê li bajarên mezin kulubên kurdan vekirin lê belê mercîyên Osmanî li 'taşra'yê li gor paytexta Stenbolê kêmtir tolerans nîşan didan û esas neteweperwerîya kurdî bi Stenbolê ra sînorkiri ma.[542]

Di meseleya kurdî ya neteweyî da li çar parçeyê Kurdistanê êşkenceyên li kurdan hatin kirin, bû sedemeke gwîr û geşbûna hizira neteweyî ya kurdî. Şewitandina gundan, zor û zextên li meydanên gundan li ser gundîyan hatin pratîzekirin û êşkenceyên girtîgehan, fitîla neteweperwerîya kurdî pêxist. Senar

---

[537] Martin Van Bruinessen, *Kurdistan Üzerine Yazılar*, İletişim, İstanbul, 2010, r.152.
[538] Bruinessen, h., b., r. 153.
[539] Bruinessen, h., b., r. 153.
[540] Joyce Blau, (…), *Kürt Edebiyatı,* Avesta, İstanbul, 2017, r. 32.
[541] William Eagleton Jr, *Komara Kurdistanê ya 1946'an,* Avesta, Stenbol, 2019, r.70.
[542] Senar Turgut, *Mezopotamya'da Kürt Uygarlık Tarihi***,** Belge Yayınları, İst., 2011, r. 119.

Turgut derheqê vê meseleyê da weha dibêje: "Girtîgeha Dîyabekirê bû zanîngeha neteweperwerîya kurdî."[543] İsmail Beşikçi destnîşan dike ku heta salên 1960î jî gotina "kurd" wek heqaretekê dihate bikaranîn. Bêjeya kurd, hevaltîya gotina bibexşînin dikir.[544] Ji ber van dîyardeyên sîyasî, kurdan dev ji welêtên xwe berdan û ji mecbûrî berê xwe dane wargehên dîyasporayê.

Abbas Vali destnîşan dike ku "Avakirina nasnameya kurdî ya neteweyî, têkilîya di navbera wê û yê din da ye ango têkilîya wê ye, bi nasnameyên tirk, fars, û ereb ên ku di destpêka ewil a deh salên vî sedsalî da derketine holê. Meseleya nasnameyê, bivênevê bi meseleya neteweyê ra eleqedar e. Înkarkirina nasnameyê, dibe sedema gengeşîyên civakî, sîyasî û dîrokî. Köksal Alver, derheqê têkilîya bûyerên civakî û vebêyîna wan a berhemên edebî da dibêje ku "Berhemên edebî mina neynikekê, nasnameyên civak û kesayetan nîşan didin û şahidîya guherîna nasnameyan dikin. "Nivîskar wek şexsekî ji nûnerê civakê ji rastîya civaknasîyê tesîrê digire û berhema xwe ava dike." [545]

Di romana kurdî ya dîyasporayê da meseleya nasnameyê bi gelek forman derdikeve pêşberî xwîneran. Nasnameya kesên ku li welatên xwe nikaribûn xwe îfade bikin û bibêjin em hene û bi ser da jî nasnameya wan a neteweyî hatîye înkarkirin û wargehên dîyasporayê ji xwe ra wek stargeh pejîrandine, di destê wan da dibe hebûna wan a herî biqîmet. Ji ber vê yekê di romanên dîyasporayê da mijar çi dibe bila bibe nasname, dîyardeyeke sereke ye. Ömer Türkeş îdîa dike ku "Romana kurdî di pey lêxwedîderketina kurdan a nasnameya xwe ya çandî dest pê dike."[546] Romannûsên kurd, gelek caran sedema bingehîn a derketina dîyasporayê wek înkarkirina nasnameyê nirxandine û boçûnên vê meseleyê rexne kirine. Mahmut Baksi, Mehmed Uzun û jan Dost bi giranî di romanên xwe da cih dane rexneyên li ser nasnameya neteweyî.

Mahmut Baksi di romana *Hêlîn*ê da li dibistanan xwendina sondê (Andimiz) a bi darê zorê ji devê lehenga xwe ya zarok Helînê rexne dike. Hêlînê dibêje *"Zarokên mezin bi dengekî bilind bersiva mamoste didan: Ez tirk im. Ez rast im. Ez jêhatî*

---

[543] Turgut, h., b., r. 135.
[544] İsmail Beşikçi, *Kürt Aydını Üzerine Düşü*nceler, İBV Yayınları, İst., 2016, r. 85.
[545] Köksal Alver, *Edebiyat ve Kimlik*, Bilgi Sosyal Bilimler Dergisi, (2), 32-43.
[546] Ömer Türkeş, *Zimanek Dîroka Wêjeya Wî Zimanî Ye*, (Wer.) Z. Yaş. *Kovara W* , Hej.13, r. 57-60, Diyarbekir, 2007.

me…"[547] Mahmut Baksi di romana *Serhildana Mala Eliyê Ûnis* da li ser îmhakirina kesên ku nasnamaye wan kurd e, disekine û ji devê vebêjê xwe weha dibêje: *"Ji bo Roma reş kuştina zarokan, kuştina dapîran, kuştina bapîr û xwişk û bira ferq nedikir. Ji bo wan kurd, kurd bû."*[548] Vebêjê Baksi, destnîşan dike ku bûyera Serhildana Mala Elîyê Ûnis û şêwaza tepisandina wê, ne jirêzê ye. Kuştina ketûber a mirovan ku zewqê bide serbaz û leşkaran, li gor Baksi çavkanîya xwe ji kîn û nefreta nasnameya kurdî digire.

Mehmed Uzun di romana *Tu*yê da Komara Tirkîyeyê ji ber înkarkirina nasnameya kurdî bi rêya lehengê xwe rexne dike. *"Dewleta tirkan rê nade ku meriv bi eşkere li ser kurdan û meselên kurdan bipeyive, binivîse, lê bikole."* [549] Li gor vebêjê Uzun, ji bo dewletê û revebirên li ser kar, înkara kurdan ji bo tepisandina mafên wan jî elzem e. Ew tune bin, jixwe mafên wan jî tune ne. Lehengê Uzun, di nava heyîrînekê da weha dipirse: *"Camêr digot Kurd tune ne. Kurd tune ne. Weke ku bibêje ro tune ye, heyv, sterk tune ne. Çawan gelek dihat înkarkirin?.."* [550] Mehmed Uzun di *Sîya Evînê* da ji nivîsareke Dr Abdullah Cevdet Beg ku di kovara Rojî Kurd da derçûye, pasajekê digire. Li gor Dr Abdullah Cevdet divê netewe, xwedî kesayeteke xurt be. Eger kesayeta miletekî lawaz be navê wî ango nasnameya wî jî nayê nava esameya miletên dîtir. Dema di qada navnetewî da nav tune be, hebûna ziman jî nabe tiştekî. [551] Uzun, bi vê şibandinê, hebûna ontolojîk û xwedîbûna ziman a mirovan, tena serê xwe watedar nabîne. Ew di wê bawerîyê da ye ku nasnameyeke xwe îspatkirî, şert e.

Mehmed Uzun, di dema têkçûyîna împaratorîyên pirneteweyî û derketina holê ya fikira neteweperwerîyê da pêwîstîya "li xwe vegerê" dibîne û kurdan di warê qelsîya fikira neteweperwerîyê da bi gotinên Memduh Selîm Begê, rexne dike. [552] Ev rexneyên Memduh Selîm Begê, di peywenda romana *Sîya Evînê* da ji bo gelê kurd, wek bangeke hişmendîya neteweyî ye.

---

[547] Baksi, *Hêlîn*, r. 34.
[548] Baksi, *Serhildana Mala Eliyê Ûnis*, r. 70.
[549] Uzun, *Tu*, r. 143.
[550] Uzun, *Tu*, r. 189.
[551] Uzun, *Siya Evînê*, r. 109.
[552] Uzun, *Siya Evînê*, r. 118.

Mehmed Uzun, di *Siya Evînê* da "li dijî evînê, pirsgirêkên nasnameya neteweyî bi cih dike ku bi vê jî bal dikêşe ser pirsgirêka dijwar a serdemê. Berberîya ku di romana Sîya Evînê da heye ji bo têgihîştina serdemê dîyardeyeke giring e, herweha ev roman, rengê rewşa trajîk a ku di romana kurdî da cih digire, nîşan dide." [553] Evîn û nasname, qayişê bi hev ra dikişînin û endîşeyên nasnameyê dikevin pêşîya evînê.

Mehmed Uzun di warê nasnameya neteweyî da cih dide rola folklorê. Li gor wî nîşaneyên nasnameya neteweyî, ziman û çand e. Heger kelepora kurdî stran û destanên kurdî û kinc û rîtuelên wan ên neteweyî tune bin, dê nasnameya wan jî tune bê hesibandin. Lewra folklor ji bo miletekî çêkerên nasnameya neteweyî dihewîne. Ramazan Pertev dibêje ku "Xebatên folklorê di temamê cîhana modern da naveroka gotarên nasname û neteweyî da xwedî cihekî giring in."[554] Mehmed Uzun vê yekê bi van rêze pirsan weha tîne ziman: *"Di welatê rojava de Kurd. Hun kî ne, çi ne? We çi ziman heye? We çi stran, destan, kinc, edet, xwarin vexwarin hene?* [555]

Murat Belge, derheqê têkilîya nasname û ziman da dibêje ku "Netewe di warê dîyarkirina nasnameyê de sereke ye. Lewra etnîsîte tê maneya ziman. Yanî ya dîyarker ne xwîn e; yekîtîya çandê ya bi rêya ziman hatîye sazkirin mihim e." [556] Mehmed Uzun, nasnameyê ji alîyê siûda kesan ve dinirxîne û ji devê vebêjê xwe dipirse: *"Siûda fransizekî, erebekî, tirkekî, îngilîzekî çavan e? Ferqa di navbera siûda kurdekî û siûda merivekî din çi ye?"* [557] Bersiva vê pirsê, kurteya gelek pirsgirêkên civakî û sîyasî ye.

Helîm Yûsiv di *Gava ku Masî Tî Dibin* da bi navgînîya lehengê xwe Serhedoyê Torî ku endamekî rêxistinê ye û hertim bi şêwazeke qerfî diaxive, li ser nasname û neteweyê vê rexneyê li Xweda dike. *"Dema Xwedê milllet û welat li hev par kirin kurd ji bîr kirin. Dawiya şeveke zivistanê, Xwedê, kurd di xewê de dîtin. Ji*

---

[553] M. N. Yavuzer, M. E. Purçak, *Berberîya Evîn û Nasnameyê û Rewşa Trajîk di Romana Sîya Evînê da*, Kurdiyat, (5), 9-29.
[554] Ramazan Pertev, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî* (1898-1946), Avesta, İst., 2018, r. 18.
[555] Uzun, *Sîya Evînê*, r. 118.
[556] Murat Belge, *Genesîs*, İletişim Yay. 2009, İst. s. 204.
[557] Uzun, *Sîya Evînê*, r. 127.

xewê veciniqî û rabû çîya çêkirin."[558] Bi bawerîya Serhedoyê Torî, xwedîbûna miletên dîtir, dana Xweda ye; nexwedîbûna kurdan a welatekî jî teqdîra îlahî ye.

Jan Dost di *3 gav û 3darek*ê da ji devê vebêjê xwe kurdan bi xisûsîyetên nasnameya wan a neteweyî rexne dike û kurmancan di şoreşan da dişibîne korên ku ketine govendê û nizanin dê gavên xwe çawa biavêjin.[559] Vebêjê Dost, nezanîya kurdan a ji alîyê rêxistinî ve wek taybetmendîyeke nasnameya kurdî destnîşan dike.

Di *Mîrnamê*yê da Jan Dost bi pey pirsyarîya ka çima *Şerefname* (1597) (ya Şerefxanê Bedlîsî), bi farisî hatîye nivîsîn ketîye. Dîroka kurdan çima bi zimanê serdestan hatîye nivîsîn? Vebêj-Lehengê bi navê Emerê Xiznedar ji Ehmedê Xanî neqil dike û kurdan ji alîyê tunebûna hişmendîya neteweyî ve rexne dike.[560] Li gor vebêjê Jan Dost kurd gelek caran ne di heyra nasnameya xwe da ne û tê dernaxin qîmeta nasnameyê çi ye û nasname ji çi ra dibe. Heger ev hişmendîya nasnameyî hebûya jixwe dê çîroka kurdan bi tevneke cuda bihata hûnandin.

Jan Dost, tîrên rexneyên xwe dide alîyê ronakbîran û wan ji ber nivîsîna bi zimanê serdestan, bi gotinên ku vebêj-lehengê bi navê Buharî ji Ehmedê Xanî neqil dike, rexne dike. Xanî, ji Buharîyê ku bi zimanê romîyan helbestan dinivîse dibêje ku *"Tu ji kê re dinivîsî keko! Sifirê xwe qilê bike ji zêrê xelkê çêtir e. Welleh billeh dengê te nagihêje Asîtane! Eger gihişt jî dê guhdarî nekin. Bi kurmancî du beytan yan jî qesîdeyekê buhûne qenctir e ji kîtêbeke weke Selîmname yan Heştbehişt yan jî Şehname ya Firdevsî!"* [561] Ev banga lixwehayêbûnê, banga vegera cewhera xwe ye ku ew cewher heger li gor zimanê serdestan di asta sifirê da be jî sîqalkirina wî sifirî, li gor vebêjê Jan Dost çêtir e ji serrafîya zêr û micewherê zimanê miletên dîtir. Di vê rexneyê da şîyandineke navdeqî ji gotina Ehmedê Xanî (1650/1651-1707) a "bazara kesat" jî heye ku bazar, kesat be jî li gor Dost, ji bo xatirê nasnameyê dê ronakbîr bibin esnafên vê bazara kesat û nebin tacirê bazarên bibereket ên malên bîyanî. [562]

---

[558] Yusiv, *Gava ku Masî Tî Dibin*, r. 70.
[559] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 25.
[560] Dost, *Mîrname*, r. 37.
[561] Dost, *Mîrname*, r. 63.
[562] Dost, *Mîrname*, r. 113.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da rexneya nasnameya neteweyî mijareke bivênevê ye û di gelek romanan da rasterast derdikeve pêşberî me. Piranî nasnameya neteweyî di çarçoveya meseleya neteweperwerîyê da tê nirxandin. Înkarkirina nasnameya kurdî û ziman û çanda kurdî, xala sereke ya rexneyên bi nasnameyê ra eleqedar in.

3.11.2. Ziman

Ziman sitûna çanda miletan e. Li ser rûyê erdê her neteweyek xwedî zimanekî ye. Ew ziman, dîyardeya nasnameya wî miletî ye. Ziman di pêkhateya neteweyê da xwedî roleke giranbuha ye. Kelepora devkî û pişt ra şaristanîya nivîskî ya neteweyan, bi saya pergala ziman ji nifşekî derbasî jîyana nifşekî din bûye. Ziman, bi qasî ku hilgirê çandê ye ew qasî jî belavkarê çandê ye.

Dewletên serdest bi qasî ku teknolojî û zanîna xwe difiroşin miletên din ew qasî zimanê xwe jî li ser wan ferz dikin. Bi vê minasebetê despotîzmeke çandî bi rêya ziman li ser dewlet û miletên kêmqewet tê pratîzekirin. Di encama vê despotîzmê da asîmîlasyon diwelide. Li gor Babanzade İsmail Hakkı (1876-1913) "Silameta milet di me'rîfetê de ye û kilîta me'rîfetê jî ziman e."[563] Ziman kanîya zanînê ye. Ew kanîya berîya hezar salan jî mejîyê mirovan zaye, bûye hilgirê herî bingehîn a çanda mirovahîyê. Mirov bi saya tecrubeyên eqil û bi amûra zimên mejîyê xwe neqilî nifşên din dike. Yek ji amûrên ji bo însan herî mihim ziman e. Lewra ziman cudayîya navbera heywan û însanan derdixe pêş. Ziman, fitîla qendîla şaristanîyê ye. Bêje dibin gotin, gotin dibin helbest, helbest dibin kilam û sitran sêrbazîya gotinê ji destan çîrok û romanan ra dibe hevîrtirşa çand û hunerê.

Civaka kurdan ji alîyê ziman ve ji ber polîtîkayên dewletên desthilatdar pir azar kişandine. Bi awayekî çalak li parçeyê Tirkîye û Sûrîyeyê zaravayê kurmancî bi taybet li Tirkîye ji bilî kurmancî li hin deveran zaravayê dimilkî, li parçeyê Îraqê zaravayê soranî û li hin deverên Îranê jî zaravayê goranî tê axaftin. "Zaravayê kurmancî ji alîyê kurdên Tirkîye û Sûrîyeyê, li Behdînan (Bakurê Kurdistan Îraqê) û li Îranê li Rojavayê Gola Ûrmîyeyê tê axaftin. Hin li başûr zaravayê soranî tê

---

[563] Babanzade İsmail Hakkı, *Kürdçeye Dair*, (Wer. Ji tîpên erebi) M. E. Bozarslan, Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi. (j. 1, r.141-143). Weş. Deng, Uppsala, 1998.

bikaranîn. Li noxteyên herî başûr Hamikîn û Kîrmanşahê hin zaravayên din ên kurdî tên axivîn."[564]

Polîtîkayên dewletên serdest ku asîmîlasyonê pêk tînin, bi awayekî aşkera ziman qedexe dikin. Qedexekirina ziman, di heman demê da tê maneya qedexekirina kilam, sitran çîrok, kitêb û hizir û ramana bi wî zimanî. Jixwe perwerdeya bi zimanekî qedexe ne mewzûbehs e.

Di dîrokê da tenê li parçeyê Îraqê zimanê kurdî tu carî qedexe nebûye. Li Tirkîye, Sûrîye û Îranê zimanê kurdî bi dehan salan di bin zor u zextan da, di bin nîrê asîmîlasyonê da têkoşîna man û nemanê da ye. Gelek ronakbîrên mîna Mîr Celadet Bedirxan tevî hemû qelsîya derfetan, bi derxistina kovar û kitêban hewl dane ku vî zimanî ji xetereya windabûnê xelas bikin. Li gor Herekol Ezîzan (Navekî mustexar ê Celadet Bedirxan e) "Miletekî dîl lê zimanê xwe winda nekirîye wek hepsîyê ku mifteya zindana wî di destê wî da ye."[565]

Mehmet Kaplan (1915-1986) ji Auguste Comte (1798-1857) neqil dike: "Ziman ew gencîneya hîkmetên heqîqî dihewîne ku bi sedan salan hatîye ceribîn."[566] Kurdan jî wek her miletî bi sedan salan vê gencîneya xwedî hîkmet bi kar anîye lê ev xezîne ji alîyê îqtîdaran va rastî zor û zextên tund hatîye. William Eagleton Jr dibêje ku "Zimanê kurdî jî kêmtirin bi qasî dîroka kurdî bûye mijara nîqaşê. Ew yek ziman e an çendîn ziman in, an tenê zaravayekî farisî ye û ji ber vê bi serê xwe ne zimanek e? Em nîqaşên fêrbûyî yên zimanzanîyê bidin alîyekî dikare bê gotin ku kurdî, zimanekî cuda ye, endamê şaxê arî ya malbata zimanên Hînd-Ewropî ye, bi hevoksazî, rêziman û bêjeyên xwe ji farisî cuda ye.[567]

Dr İsmail Beşikçi, destnîşan dike ku kurdî rastî gelek qedexeyan hatîye. İsmail Beşikçi derheqê qedexebûna zimanê kurdî da dibêje ku li sûkê kesên ku bi kurdî diaxivin, serê her bêjeyekê cezayê pereyan digirtin.[568] Beşikçi, gotina xwe weha didomîne: "Di jîyana miletekî da ziman bêşik gelekî mihim e. Ziman tune be behsa milet ne pêkan e. Yên ku ziman mayînde dike û dihêle ku ji qirnekî derbasî

---

[564] Martin Van Bruinessen, *Kurdistan Üzerine Yazılar*, Wer: Kolektîf, İletişim, İst., 2010, r. 263.
[565] Herekol Ezîzan, *Çira Zimane,* Ronahî, Hejmar 28, 1945.
[566] Mehmet Kaplan, *Kültür ve Dil*, Dergâh Yayınları, 25. Baskı, İstanbul, 2009, 130.
[567] William Eagleton Jr, *Komara Kurdistanê ya 1946'an,*, Avesta, Stenbol, 2019, r. 23.
[568] İsmail Beşikçi, *Devlet ve Kürtler*, İBV Yayınları, İstanbul, 2015, r. 61.

qirnekî din bibe dîsa ziman e."[569] İsmail Beşikçi dibêje ku "Li Tirkîyeyê kurdî zimanekî qedexe ye. Bikaranîna navê kurd û Kurdistanê qedexe ye. Kesên ku behsa kurdan û mafê wan î neteweyî û demokratîk kirine ji ber rencîdekirina hizirên mîlî yên însanên tirk hatine cezakirin. Hetta zagoneke bi 'şekilê kesên ku li Tirkîyeyê dijin zimanê wan tirkî ye' heye. Ev, xwe dispêre zagoneke 19ê cotmeha 1983an bi jimara 2932, bi navê qanûna derheqê weşanên ji bilî tirkî ve.[570] Beşikçi, derheqê înkara zimanê kurdî da jî weha dibêje: "Di sala 1971da dozgerên leşkerî, di doznameyên xwe da îdîa dikirin ku di dirokê da bi navê kurd neteweyek tune ye, her kes tirk e, bi navê kurdî zimanekî serbixwe tune ye û kurdî zaravayeke tirkî ye.[571] İsmail Beşikçi, îdîa dike ku tirkan hem zimanê kurdî qedexe kirine hem jî berhemên kurdî yên ziman û folklorê wek malên xwe nîşan dane bi vî awayî li ser çanda kurdî operasyonekê tirkîfîkasyonê pêk anîne.[572]

Her çi qasî bi Peymana Lozanê (24ê tîrmeha 1923yan) ziman û çanda gelê kurd wek çanda etnîk hatibe garantîkirin jî Mustafa Kemal di sala 1925an da derbirina her tewrên ku ne tirkî ye qedexe kirîye.[573] Di sala 1991ê da hikûmeta koalîsyonê ku serokwezîrê wê Turgut Özal bû, piştî qedexeyeke 70 salî, hebûna zimanê kurdî pejirand.[574] Ev yek jî nebûye çare loma meseleye herfên xedexe "Q, W, X" bi salan ji bo zimanê kurdî bûye sedema qedexeyeke din.

Li parçeyê Sûrîye û Îranê jî rewşa zimanê kurdî ne ji rewşa Tirkîyeyê pir cuda ye. Jixwe li Sûrîyeyê nasnameya kurdan jî tune ye ku heta zimanê wan bê pejirandin. Di derçûna dîyasporaya kurdî da rola qedexekirina zimanê kurdî pir zêde ye. Mihemed Şarman dibêje ku "Kîjan kurd di zarokatiya xwe, di salên dibistana seretayî vegere dê teqez pêrgî çîrokeke qedexebûna zimanê xwe, pêrgî êşeke dijwar were ku wextekê bi derba dar û cetwelan pêşî li canê wî pişt re li ruhê wî deq bûye."[575] Qedexekirina zimanê kurdî û tunebûna perwerdeya bi zimanê zikmakî, rê li asîmîlasyonê vekirîye. Ji bilî parçeyê Îraqê li her sê parçeyên din perwerdeya bi

---

[569] Beşikçi, h., b., r. 68.
[570] İsmail Beşikçi, *Kürt Aydını Üzerine Düşünceler*, İBV Yayınları, İstanbul, 2016, r. 17.
[571] Beşikçi, h., b., r. 28.
[572] Beşikçi, h., b., r. 55.
[573] Senar Turgut, *Mezopotamya'da Kürt Uygarlık Tarihi*, Belge Yayınları, İst., 2011, r. 121.
[574] Joyce Blau, (…), *Kürt Edebiyatı,* Avesta, İstanbul, 2017, r. 36.
[575] Mihemed Şarman, *Emê! Tu Dikarî di Tarîyê de jî bi Tirkî Biaxivî,* Zarema, Sal:1/Hejmar: 1/ 2014, r. 37.

zimanê kurdî yan qedexe ye yan jî di asta tunebûnê da ye wek mînaka dersên bijarte ya Tirkîyeyê.

Gelê kurd ji zimanê xwe yê dayikê bêpar maye. "Îro gelek kurd bi taybet kesên herî ciwan zimanê xwe ji bîr kirine û derheqê şaristanî û dîroka xwe da hema bibêjin tiştekî nezanin."[576] Derheqê vê meseleyê da Clêmence Scalbert, ji danerê alfabeya kurdî ya latînî û edîtorê Kovara Hawarê Mîr Celadet Bedîrxan neqil dike: "Lawo, çi eyb e, çi rezîltî ye. Ya fêrî zimanê xwe bibin an jî nebêjin em kurd in.[577] Celadet Bedirxan bi vê gotina xwe têkilîya navbera ziman û nasnameya neteweyî bi awayekî tund îfade dike. Ziman, koka çandê ye. Heger ew kok ji axa xwe bêyî qetandin dê çand bêpişt bimîne û têkeve bin bandora çandên bîyanî û her biçe bihele heta ku winda bibe.

Mahmut Baksi di *Helîn*ê da têkilîya ziman û perwerdeyê dike boçûna rexneya xwe û zor û zextên ku li ser mamosteyan tên kirin, li ber çavan radixe. Baksi, di dîyalogeke di navbera albay û mamoste da derbas dibe, qedexeya zimanê kurdî bi bîr tîne û zehmetîya fêmnekirina zarokan a zimanê tirkî weha bilêv dike: *"Te li gund bi Kurdî dersa zarokan û xortan daye. Ma ew jî derew e mamoste?*
_ Ew rast e Albay, mamoste got. Çimkî Kurdî zimanê wan ê zikmakî ye. Zarok ji zimanê tirkî fam nakin.
_Ma tu nizanî ku kurdî qedexe ye.
_ Meriv bi qedexeyan nikare zimanekî ji holê rake Albay."[578] Herî dawî gotineke sloganîk ji devê mamoste difilite, ew jî pêkutîyên li ser zimanan protesto dike. Baksi, di dîyalogeke din da ji alîyê serdestan ve texfîfkirina zimanê kurdî rexne dike. *"We ev zimanê pîs ji ku aniye? Hûn çima bi tirkî nizanin û napeyivin… Ji wan tirê me zimanê xwe ji dikanan bi pereyan keriye."* [579] Bi van gotinan bersiveke siruştî ya ku li rewşa derketina holê ya zimanan tê, dide van kesên kurdî tehqîr dikin û fêrbûna zimanekî serdestan li ser kurdan ferz dikin.

---

[576] Moti Zaken, (…), *Göçmenlik ve Vaadedilmiş Topraklar*, Avesta, İst., 2016, r. 67.
[577] Clêmence Scalbert Yücel, *Kürt Edebiyatının Anatomisi,* Ayrıntı Yay, İst., 2018, r. 83
[578] Baksi, *Hêlîn*, r. 52.
[579] Baksi, *Hêlîn*, r. 61.

Mehmed Uzun di hevpeyvînekê da li ser rola ziman û hişmendîya neteweyî dibêje ku "Ji bo çêbûna hişmendîyeke neteweyî roman dikare roleke giring bileyize. Dibe ku kurd neyakpare bin lê di ziman de dikarin bibin yekpare."[580] Mehmed Uzun di romana *Tu*yê da bi bîr tîne ku kurdî li Tirkîyeyê ji sala 1925an ve qedexe ye û qedexebûna vî zimanî bûye sedema qelsbûn û lawazbûna wî ya di nava gel da. *"* [581] Ziman bi xwe qels nabe, zanîn û bikaranîna kesên ku ziman diaxivin, kêm dibe; qels dibe û bi vî awayî ziman dimirin.

Mehmed Uzun di romana *Sîya Evînê* da bi navgînîya Memduh Selîm Begê hezar mixabinîyê li encamên qedexeya kurdî bilêv dike û tengî û hişkîya zimanê kurdî bi qedexeyên domdar ên li ser ziman ve girê dide. Li gor Memduh Selîm Begê, dûrketina ji welat û perwerdeya zimanekî bîyanî jî welatîyan dike lalûteyên zimanê wan.[582] Mehmed Uzun di romana *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* da rexneyên li ser qedexekirina kurdî didomîne. Gotineke din li gotina qedexeya ziman zêde dike: ceza. Uzun, dîde zanîn ku kesên bi kurdî diaxivin, bi qasî hejmara kelîmeyên ku serf kirine cezayê pereyan dixwin. Vebêj-lehengê Uzun, dengbêj Ehmedê Fermanê Kîkî, dibêje *"Îro li Tirkîye kesên ku bi kurdî dipeyivin, tên cezakirin. Ceza gotineke kurdî qurişekê ye."* [583] Uzun, bi vê rexneya dîrokî, kiryarên Tirkîyeyê ku ji bo zimanê kurdî ji holê rakin, bi tundî rexne dike.

Mehmed Uzun di romana *Bîra Qederê* da jî li ser qedera zimanê kurdî ji devê Ekrem Cemîl Paşa, gilî û gazinan dike û polîtîkaya fermî ya dewletê ku slogana wê "Vatandaş Türkçe konuş!" (Hemwelatîno, bi tirkî biaxive!) bû, ji devê lehengê xwe rexne dike.[584] Mehmed Uzun, di *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê da* di dîyalogeke di nava Jîr û Kevokê da dihûne. Di vê dîyalogê da Jîr, ziman bi çand û hebûnê ve girê dide û dibêje ku ziman di bin tehdîdekê da ye û kurd ji rehên xwe bi dûr hatine xistin. [585] Lehengê bi navê Jîr, axaftina du kesên kurd bi zimanekî bîyanî, wek

---

[580] Mehmed Uzun, *Küllerinden Doğan Dil ve Roman*, İthaki Yay., Stenbol, 2008, r. 262.
[581] Uzun, *Tu*, r. 141.
[582] Uzun, *Siya Evînê*, r.160.
[583] Uzun, *Rojek Ji Rojê Evdalê Zeynikê*, r. 10.
[584] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 200.
[585] Uzun, *Ronî Mîna Evînê*, r. 109.

serkeftina polîtîkayên dewletê dinirxîne û di wê bawerîyê da ye ku rejîmê bi van polîtîkayên ziman, kurd kirine bîyanîyê çanda bav û kalan.

Firat Cewerî di *Payiza Dereng* da rexneyên li ser qedexekirina zimanê kurdî ji alîyê perwerdeyê ve dinirxîne. Cewerî, bi navgînîya Ferda, îdîa dike ku mamosteyan ji nava xwendekaran hin zarok hildibijartin û wan wek sîxur bi kar tanîn. Peywira wan zarokan ew bû ku dema zarokên hevalên wan li dibistanê an jî li malê bi kurdî biaxivin, wan zarokan ji mamostyan ra rapor bikin. Mamosteyan, piştî agahîyên zarokên mixbîr, bi daran li wan zarokên ku bi kurdî axivîne dixistin.[586] Firat Cewerî, derheqê cazakirina zarokan a ji bo axaftina zimanê kurdî ji devê Ferda vê bûyerê neqil dike: *"Lawik devê xwe vekir û mamoste ew îsota weke êgir bera devê wî da."* [587] Firat Cewerî di meseleya zimanê kurdî da tenê dewletê û polîtîkayên dewletê yên tûnekirina zimanê kurdî rexne nake di heman demê da cih dide rexneya kurdan jî. Ferda dibêje ku *"Li vî welatî kurmancî bi tenê ji gundîyan re maye, kurmancî nîşana paşdemayîn û nezanîyê ye."* [588] Li gor Ferda, kurdên bajarî li zimanê xwe xwedî dernakevin, zimanê xwe naecibînin û wek dîyardeya gundîbûyînê dihesibînin. Ev rewş, derdixe holê ku encamên polîtîkayên ziman li gor daxwaza rejîmê teşe girtîye.

Firat Cewerî, axaftina ziman a di malan da tena serê xwe watedar nabîne û bi gotinên Ferda, bal dikişîne ser qedexeyên zimanê kurdî ku ev ziman di dibistanan da, di bînayên dewletê da û di cihên ku ji rayagiştî ra vekirîne nayê axaftin.[589] Li gor Ferda, Zimanekî ji nava çar dîwarên malan ve dernekeve, nivîsîn û axaftina wî qedexe be, çap û weşana wî tune be û wek zimanê çîyayîyan bê dîtin, dengê wî bi tu awayî nekeve qadên rayagiştî û nebe zimanê perwerde û jîyanê dê ew ziman di talîya talî da bimire.[590] Ferda, aşkere dibêje ku ziman berhema mirovahîyê ya bi hezar salan hatîye holê û gihiştîye asta kemalê û îdîa dike ku hin kes dixwazin vê berhemê tune

---

[586] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 174.
[587] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 175.
[588] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 253.
[589] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 282.
[590] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 298.

bikin û ya sosret jî vê yekê wek marîfetekê dinirxînin. [591] Zimanekî nebe cihê ragihandinê ya eslî û di her kêlîya jîyanê da neyê bikaranîn, nebe zimanê bazarê û nekeve dibistanan, di radyo û televîzyonan da neyê sehkirin û tenê bibe şîfreyên axaftina malbatî, dê ji demekê û bi şûn da cihê xwe bide zimanê fermî yê wê dewletê ku li ser hemwelatîyan tê ferzkirin. Lehengê Cewerî, Ferda weha dibêje: *"Her diçû peyvandina bi kurdî kêmtir dibû. Erê em li malên xwe bi malbatê re bi kurdî dipeyivîn, lê niha li qahwê, gava em dipeyivin, zimanê me tirkî bû."* [592] Di vê rewşê da kesên ku ji bikaranîna zimanê xwe dûr dikevin û dibin paleyên zimanê fermî hêdî hêdî hucreyên mejîyên xwe ji gotinên vî zimanî ra vedikin û nema dikarin hizirên xwe bi zimanê zikmakî bi lêv bikin. Ferda, rexneya xwe weha didomîne: *"Ji ber ku hemû xwendina me bi tirkî bû hemû sohbet û minaqeşeyên me jî bi tirkî bûn. Êdî wilo bûbû ku me nema dikarîbû bi kurdî xwe îfade bikira."*[593] Ji ber bandora perwerdeyê, çerxa asîmîlasyonê fireh digere û zimanê ku nîşaneya neteweyê ya herî şênber e, hêdî hêdî dihele. Êdî "Bi dengê dê û bavan ji nevîyan ra mîrateyek" [594] nayê transferkirin û zimanê zikmakî dibe amûrê nostaljîyeke dûr.

Firat Cewerî di *Ez ê Yekî Bikujim* da li hember rewşa zû ji bîrkirina gelê kurd a zimanê kurdî heyirî dimîne û wan kesên ji zimanê xwe yê zikmakî dûr dikevin û li şûna wî zimanî bi zimanekî dîtir dihizirin, fêm nake. Lehengê Cewerî Temo, dibêje *"Xwedêyo, çawa vî miletî evqasî zû ev ziman ji bîr kir? (...) Ê min qet nebe ez bi zimanê xwe dizanim, pê dipeyivim û gava dibêjim tirş av bi devê min dikeve."* [595] Firat Cewerî bi awayekî zimnî têkilîya gotinên zimanê zikmakî û bangewazîyên di mejîyê mirovan da jî li ber çavan radixe. Temo, rexneyeke esasî li civaka kurdan a bajarî dike. Temo dibêje *"Li vî bajarî ji xeynî gundî û feqîran kes bi kurdî napeyive û zimanê kurdî ji devê 'efendiyan' derketiye.."* [596] Dejenerasyona fêhma bajarîyê û guhertina îmaja wê ya di mejîyê mirovan da li gor Temo, di vê devjêberdana zimanê dayikê da roleke sereke dîlîze.

---

[591] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 299.
[592] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 307.
[593] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 325.
[594] Roger Acun, *Zimanê Ana*, Gazete Karınca, 27 Şubat 2021.
[595] Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim*, r. 37.
[596] Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim*, r. 52.

Firat Cewerî kesên ku bi saîkên îdeolojîk navên vî bajarî li zarokên xwe dikin û bi zarokên xwe ra bi zimanê serdestan diaxivin jî wek kesên bi qurebûneke vala tevdigerin dişayesîne. Firat Cewerî di romana *Lehî*yê *da* ji devê nivîskarê lehengê romana xwe gazinan ji miletê xwe dike. [597] Nivîskarê ku îdîa dike zimanê gelê xwe ji mirinê rizgar kirîye û ji nû ve vejandîye, tevî vî karê birûmet û zehmet, ji gelê xwe qîmeta ku hêvî dike nabîne, rexneyên Cewerî bi awayekî endîrekt radigihîne xwîneran.

Helîm Yûsiv di *Tirsa bê Diran* da rewşa zarokên ku li malê bi kurdî diaxivin û dema li dibistanê ne mecbûrî axaftina bi erebî dimînin li ber çavan radixe, vebêjê Yûsiv dibêje ku zarokên kurdan li hember mamosteyên ereb, lal diman û di nava her du zimanan da zimanê wan li hev dihebilî û nikaribûn xwe îfade bikin û tiştên ku mamoste fêrî wan dike birêkûpêk bielimin. [598] Lehengê Yûsiv, vê nakokîya di jîyana zarokên kurdan a perwerdeyê da rexne dike û tesîra qedexekirina kurdî ya li ser derûnîya zarokan weha dinirxîne: *"Peyvên her du zimanan di serê wan de dibûn şorbeyeke kelê ji zimanekî nû ku ne erebî bû û ne jî kurdî bû. Şorba ku ji ava serdestiyê û nîskên bindestiyê pêk dihat û li ser agirê zorê dikeliya."* [599] Vebêjê Yusiv, vê rewşê ji alîyê sîyasî ve bi bindestîya kurdan ve girê dide.

Di *Tirsa bê Diran* da Helîm Yûsiv, rexneyên xwe li ser perwerdeya bi zimanekî bîyanî tîr dike. Lehengên zarok ê romanê ku terîyên keran jêdikirin û ji terîyên jêkirî pêşangehek ava dikirin di heman demê da diçûn dibistanê û bi zimanê erebî perwerde dibûn.[600] Vebêjê Yûsiv, êşa tenegihiştina van zarokan a zimanê erebî ji êşa jêkirina terîyên keran dijwartir dibîne û di temenê ewil ê zarokekî da perwerdeya zimanekî ku bi darê zorê tê fêrkirin, rexne dike. Li ser meseleya şîdetê û bandora wê ya li ser binehişê mirovan, Umran Aran di gotareke xwe da dibêje: "Ji ber ku li civakên bindest şidet di hêr kêliyê û cihî de berê xwe ji yekî/e dide yekî/ê din: zilam û dezgehên rejima dagirker li mêran dixin, mêr tên mala li jinan dixin, jin û mêr û mamosteyên dibistanê li zarokan dixin. Di vê helezona şidetê de xeleka ku

[597] Cewerî, *Lehî*, r. 92.
[598] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 9.
[599] Yusiv, *Tirsa bê Diran*, r. 9.
[600] Yusiv, *Tirsa bê Diran*, r. 13.

herî pir tehde lê tê kirin zarok in. Di encama vê yekê da jî zarok jî berê vê şideta di wan de civiyayî didin heywanan, pisîk û kûçikan dikujin, terîyên keran jê dikin."[601] Helîm Yûsiv, derheqê qedexebûna zimanê zikmakî da bal dikêşe ser rewşeke derûnî jî. Lehengeke *Tirsa bê Diran* a jin bi navê Leyla, destnîşan dike ku kesên ji zimanê zikmakî dûr dikevin û bi zimanekî din perwerde dibin ji demekê û pê ve tên bişaftin û ew kes di xewnên xwe da jî bi zimanê fermî dihizirin û diaxivin.[602] Ev rewş di gîyanê mirovan da nîşaneya mirina zimanê dayikê ye. Lewra axaftina zimanekî dîtir bi zaneyî pêk bê ev tercîhek e lê dema xewê, hizira mejî bîyanî be, ev asîmîlasyon e.

Di *Sobarto*yê da Helîm Yûsiv, tesîra perwerdeya bi zimanê bîyanî li ser zarokan dişayesîne û bi navgînîya lehengê bi navê Silêman, vê rexneyê dike: *"Gava me li lêvên mamosteyên xwe zîq dinêrî tiqtiq bi me diket. Ev lêvên ku dengên seyr derdixistin…"*[603] Bêwatebûna axaftina mamosteyan, dibe valahîyeke bêwate ku şagird jê dibehetin. Bi van rexneyan ji alîyê mercên pedagojîyê ve giranîya meseleyê li ber çavan tê raxistin. Helîm Yûsiv, destnîşan dike ku li dibistanan mamoste ji ber axaftina zarokan a bi zimanê zikmakî, bi daran li wan dixin, êş û azarake mezin didin laş û gîyanê wan. [604] Helîm Yûsiv, rexneyên xwe yên derheqê ziman da bi rexneyên zimanê weşana televîzyonê dermale dike. Silêman ji bo hatina televîzyonê weha dibêje: *"Ev sindoqa qidoş bi xwe jî ne bi zimanê me yê malê, belê bi zimanê dibistanan dipeyivî."* [605] Televîzyona ku bi zimanê serdestan diaxive û mirovên navsere yên xwendin û axaftina wan bi vî zimanê tuneye, tiştekî ji vî zimanê weşanê fêm nakin û ji zarokên xwe yên dişînin dibistanan arîkarîya wergêrê dixwazin. Dema zarok jî tênêgihêjin ev yek dibe qelsî an jî lawazîya wan û dibe belaya serê wan. Dê û bav, qelsîya zarokên xwe ya di zimanê bîyanî da wek fêmkorîyê dinirxînin. Lehengê Yusiv, Azadê Penaber, vê rewşê weha rexne dike: *"Ev sê sal in ku ev lawê min ê ker diçe fêrî erebî dibe û hîna navê dew nizane. Ma ev jî ne şens e ya Rebî!"* [606] Vebêj-lehengê Yûsiv, Silêman, ne tenê di qada perwerdeyê da di qada dînî da jî serdestîya

---

[601] Umran Aran, *Kolonyalîzm, Nasname û Parçebûn Tirsa bê Diran a Helîm Yûsiv*, Zarema, Sal: 1 / Hejmar: 3 / 2015, r. 107.
[602] Yusiv, *Tirsa bê Diran*, r. 41.
[603] Yusiv, *Sobarto*, r. 16.
[604] Yusiv, *Sobarto*, r. 26.
[605] Yusiv, *Sobarto*, r. 27.
[606] Yusiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, r. 9.

zimanê erebî û qedexekirina kurdî rexne dike. Mînaka law û bavên ku bi hev ra diçin mizgeftê û law, dinêre ku bavê wî tu tiştekî ji axaftinên mele fêm nake, trajedîya jîyana kurdan bi sahneyeke sihêm li ber çavan radixe. [607] Helîm Yûsiv bi vê şayesê dixwaze bibêje ku zarok li dibistanê tiştekî ji mamosteyan fêm nakin û mezin li mizgeftê ji meleyan tiştekî fêm nakin.

Di *Gava ku Masî Tî Dibin* da Helîm Yûsiv, qedexeyên li ser kurdî yên di warê weşanên kitêban da bi awayekî endîrekt rexne dike. Lewra kurdî ne tenê di axaftina rojane da qedexe ye. Di heman demê da kitêb û kovarên bi kurdî hatine weşandin jî qedexe ne. Ji bo ku kitêb ji pêlên xezeba mixabiratê bên sitirandin, bi rêyên curbecur dihatin veşartin û zerar didîtin. [608] Vebêjê Yûsiv, veşartina kitêbên kurdî di dîwaran da, seyandina ser wan bi herîyê û zerardîtina van kitêban rexne dike û dibêje ku kitêbên bi kurdî, li gor endamên mixabaratê wek wesîqeyên delîlê sûc dihate dîtin û ev delîl, dibûn sedema lêdan û êşkenceyan û avêtina zîndanan. [609]

Jan Dost di *Mîrname*yê da bi şêwazeke ironîk ji devê lehengê xwe Buharî ku ew bi xwe bi zimanê romîyan helbestan dinivîse, nêrîna li zimanê kurdî ya wê demê li ber çavan radixe û rexneyeke parodîk dike. *"Xanî, bi kurmancî eş'aran dihûne. (...) Kî wê di vê tasika wî ya sifir de ava şêlû vexwe?"* [610] Wek tê dîtin hin kes zimanê kurdî bêqîmet dibînin. Jan Dost, qîmetnedayîna kurdî ya ji alîyê kurdên nezan ve bi gotinên qerfî rexne dike. Dost, di paragrafeke dîtir da qîmetnedayîna kurdan a zimanê kurdî ji devê Ehmedê Xanî, weha rexne dike: *"Ji Xwedê guneh e, em li vî zimanî wisa bi çavekî kêm binêrin! Sêwîtiya wî bes e!"* [611] Gotinên Xanî, derheqê xwedîlêderketina zimanê kurdî da wek bangeke giştî ye.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da nivîskaran wek kanîya arîşeyên sîyasî, civakî û dîrokî cih dane meseleya ziman û li ser qedexekirina ziman sekinîne. Li gor wan, qedexeya zimanê neteweyekê ne li gor edaleta îlahî ye û ne li gor hiqûqê ye.

---

[607] Yusiv, *Sobarto*, r. 30.
[608] Yusiv, *Gava ku Masî Ti Dibin*, r. 60.
[609] Yusiv, *Gava ku Masî Ti Dibin*, r. 61.
[610] Dost, *Mîrname*, r. 62.
[611] Dost, *Mîrname*, r. 63.

Romannûsan, piranî polîtîkayên ziman ên dewletên serdest rexne kirine û destnîşan kirine ku qedexekirina ziman, armanca asîmîlasyonê dihewîne û ev yek jî nayê pejirandin.

3.11.3. Bêdewletbûn

Kurd, neteweyeke bêdewlet e. Herêma Kurdistanê bi Peymana Qasr-i Şirinê (1639) ku di navbera Safewî û Osmanîyan da hatîye îmzekirin, bûye du parçe û pişt ra bi Peymana Lozanê (1923) ku di navbera Tirkîye û dewletên Îtîlafê (Brîtanya, Fransa, Îtalya, Japonya, Yûnanîstan, Yugoslavya) da hatîye îmzekirin, bûye çar parçe û di nava sînorên îdarî yên çar dewletan da par ve bûye. (Tirkîye, Îraq, Îran û Sûrîye) Arîşe û gengeşîyên di roja me da kurd dijîn, encamên van peymanên sîyasî ne.

Mehmed Uzun di *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* da bi gotinên Ehmedê Fermanê Kîkî, peregendebûna welatê kurdan û bêdewletbûna wan destnîşan dike. Ehmedê Fermanê Kîkî, dibêje ecem û osmanîyan welatê kurdan ji hev xistine û dane destê mîrekan, pişt ra ev mîrektî jî bi xwe ve girêdane û qaşo otonomîyek dane kurdan.[612] Ev rewş li gor vebêjê Uzun bûye sedema bêdewletbûna kurdan.

Mehmed Uzun, rewşa welat -ku gelekî xirab e û ev xirabî encama bêdewletbûnê ye- bi teşbîheke realîst dişayesîne. Lehengê romanê dengbêj Evdalê Zeynikê, bi axîneke kûr dibêje ku *"Welatê me mîna berfê spî ye paqij û delal e, warê adet û usûlan e. Lê îro kere û kûçik li serê dizirine û diewitine."*[613] Evdalê Zeynikê, bi van gotinan, bindestîya kurdan a li welatê wan, rexne dike û heyfa xwe bi vê rewşê tîne.

Mehmed Uzun di *Bîra Qederê* da bi navgînîya lehengê romanê Celadet Bedîrxan destnîşan dike ku eşîrên tirkan berîya hezar salî hatine û bûne cîranên kurdan, welatê wan girtine û bûne xwedî dewlet. Ew, bûne serdest lê kurd mane bindest. Du neteweyên Cîran lê ne cîrantîyeke wekhev. [614] Li gor Celadet Bedîrxan, tirkan zimanê xwe û qanûnên xwe li ser kurdan ferz kirine û kurd bi zimanê tirkî perwerde bûne.

---

[612] Uzun, *Rojek Ji Rojên Evdal*, r. 64.
[613] Uzun, *Rojek Ji Rojên Evdal*, r. 137.
[614] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 58.

Mehmed Uzun, di *Hawara Dîcleyê* da wek gazinên vebêjê xwe, rexneyên li ser bêdewletbûna kurdan rêz dike. Vebêjê romanê Dengbêj Biro, bi axîn dibêje ku *"Ne welat welatê te ye, ne ax axa te ye; ji lewre bi tenê heqekî te û we heye, ku ew jî mirin e."* [615] Axa ku kurd li ser dijîn ne ya wan be nemaze kurd bêweten û bêdewlet bin, çi mafên wan heye? Dengbêj Biro, bersiveke kurt dide: mirin.

Helîm Yûsiv di *Tirsa bê Diran* da bi navgînîya Mûsayê Qamişlokî, wek sersebeba trajedîya kurdan, parçekirin û parvekirina xaka Kurdistanê destnîşan dike û behsa hizira bêdewletbûnê ya li nava dewletên bîyanî dike. [616] Bi van gotinan sêwîbûna kurdekî dîyasporayê çi qasî trajîk e, li ber çavan radixe. Mûsayê Qamîşlokî, mînakekê dide: Mînaka ku kurdek li dewletekê têkeve tengasîyekê û balyozxaneyek tunebe ew kurd berê xwe bidê. Ev mînak, rewşa kurdan a penberîyê şênber dike. [617] Helîm Yûsiv, di Sobartoyê da bêçaretîya kurdan dişayesîne. Lehengê Yûsiv, Mihemedê Sitî, dibêje ez tênagihêjim bi tevahî cîhan, çima li hember kurdan e. Pirsa ji du sed dewletî çima dewletek mafê me naparêze, wek qêrîneke neteweyî ji nava pelê romana *Sobarto*yê ve bilind dibe û tevî karwanê rexneyên sîyasî yên Helîm Yûsiv dibe. [618] Cihdayîna hejmara 200 dewletan û tunebûna dewleta kurdan jî rexneyê dermale kirîye.

Helîm Yûsiv di *99 Morîkên Belavbûyî* da êş û azara bêdewletbûna ku penaber dijîn û hertim li her deverê dibin bîyanîyê wê dewletê tîne ziman û vê tevlihevîya ku ji pirsgirêka bêdewletbûyînê dizê bi rêya lehengê xwe Hemzeyê penaber, weha rexne dike: *"Li Tirkîye ji ber ku 'ez kurdekî bi qirêj im' çend tirkan êrîşî min kirin û ez ji welatê xwe derxistim. Li Almanyayê jî ji ber ku ez 'tirkekî bi qirêj im' dixwazin min ji welatê xwe derxînin."* [619] Vebêjê Yûsiv, bêdewletbûyînê wek derdekî dinirxîne û destnîşan dike ku kesên xwedî dewlet bin ji alîyê nijadî ve kesek nikare wan bêrûmet û şerpeze bike.

---

[615] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 27.
[616] Yusiv, *Tirsa bê Diran*, r. 77.
[617] Yusiv, *Tirsa bê Diran*, r. 160.
[618] Yusiv, *Sobarto*, r. 77.
[619] Yusiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, r. 93.

Jan Dost di *3 gav û 3darêk*ê da dewletê dişibîne serîyek penêr û ji devê alimekî ku li Mûşê seydatîya Feqe Seîdê ciwan kiribû dibêje *"Ew penêrê ku temamê dinyayê para xwe jê dibe, kurd tenê jê bapar in,"* [620] Ev gotin jî rexneyeke li hember pergala sîyasî ya cîhanê ye ku kurd di vê pergalê da ji mafê xwedîdewletbûnê bêpar mane. Teşbîha penêr di jîyana koçeran da beranberê tiştê biqîmet e lewra dewlet di çavên karakterê romanê da sazîyeke gelekî mihim e.

Di *Mîrname*yê da Jan Dost, rexneya tunebûna siltanekî kurdan dîsa li kurdan dike. Dost, bi navgînîya lehengê xwe Xanî, dibêje *"Ma qey kesek di nav kurmancan de nebû ku mîna siltanekî romiyan, yan jî şahekî eceman wan eşîr û êlan bide ser hev û dewleteke mezin ava bike?"* [621] Armanca Dost, rexneya bêtifaqîya kurdan e. Vebêjê Jan Dost, heyfa xwe li qedera kurdan a sîyasî tîne û dîsa gazinan ji pêkutîyên ecem û tirkan dike. Jan Dost, cih dide van gotinên Xanî: *"Dibêjin em û seltenet çiyê hev in. Kurmancan layiqê dewletekê nabînin mamê Dosto. Ker in ker. Kerên ji keran haşa ji hûzûrê te."* [622] Lehengê *Mîrname*yê Ehmadê Xanî, ji fêmkorîya xelkê ya sîyasî bêzar bûye û xelkên ku maneya îqtîdarê fêmnekin, rexne dike.

Romannûsên kurd ên dîyasporayê di romanên xwe da gelek caran behsa rewşa kurdan a belavbûyî dikin û cih didin encamên bêdewletbûna wan. Bi parçebûna împaratorîyên pirneteweyî, gelek netewedewlet ava bûne lê kurd li ser xaka xwe ya qedîm ji netewedewletekê bêpar mane û di bin serdestîya çar dewletan da her çûye ji çanda xwe ya neteweyî û ji zimanê xwe dûr ketine.

3.11.4. Sirgûn

Pêkutîya rayedar an jî hikûmetekê bibe sedema kesek an jî komek ji welatên xwe bi dûr bikeve û naçar bimîne ku li cih û warekî dîtir niştecih bibe, ev rewş wek mişextî an jî sirgûnîyê tê binavkirin. Di dema Osmanîyan da biryara nefîyê ji alîyê siltanên Osmanî an jî paşayên dewletê ve dihate dayîn û rayedarên herêmî, hewceya vê biryarê pêk tanîn. Di dema K.T.yê da di rewşên awarte da biryarên sirgunê hem ji bo şexsan hem jî ji bo kom an jî malbatan hatîye dayîn. Carinan jî mirovên ku ji ber zextên dewletê nikarin li welatê xwe bi aramî bijin, berê xwe didin wargehên

[620] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 86.
[621] Dost, *Mîrname*, r. 36.
[622] Dost, *Mîrname*, r. 95.

dîyasporayê û li wan deveran wek penaber jîyana xwe didomînin. Ev rewş jî wek sirgûnîyê dikare bê pênasekirin. Lewra xetereya jîyanê dibe sedem ku mirov, cih û warê xwe biterikîne.

Haşim Ahmedzade derheqê sirgûnîyê da weha dibêje: "Sirgûn pir mezin e, bandora wê pir mezin e. Sirgûna modern; pir modern an paşmodern li Swêd û Almanya ye û kartêkeriya wê bi taybetî li ser bakur ew qas mezin e ku heger nebaya ez bawer im zimanê kurdî niha ew hal û mercê wî baş -baş relatîf rêjeyî nisbî dibajim- nedibû."[623]

Mahmut Baksi di *Gundikê Dono* da dema karaktereke xwe dide nasîn, dibêje ku: *"Perîxan (...) Malbata wê di şerê Şêx Seîd de ji alîyê hikûmeta Tirkîyeyê ve hatibû nefîkirin û dabûn nêzî Konyayê."*[624] K.T. ji bo ku yekîtîya kurdan bişikîne û wan di nava xwe da bimehîne di Serhildana Şêx Seîd (1925) da cihê gelek malbat û eşîran diguherîne û wan sirgûnî welatên Anadola Navîn dike. Baksi, bi hizirên dîyasporayê zor û zehmetîyên jîyana sirgûnîyê ji devê Saloyê Şofêr ji axayê Gundikê Dono, Hecî Zorav ra weha vedibêje: *"Nefîtî zor e, zehmet e. Meriv bêqedr û qîmet e li welatên xerîb. Me derdê xurbetê kişandiye. Bila Xwedê neyne serê neyaran."* [625] Li gor Saloyê şofêr, welatên xerîb; qîmeta takekesî nizm dikin û ev yek jî dibe sedema kul û keserên xerîbîyê ku kesên ji welatên xwe dûrketine naxwazin dijminê wan jî têkevin vî halê nexweş.

Xurbeta ku mîadê qedandina wê di destê xerîb da be, çi qasî bişewat be jî ji ber ku rêyên vegerê vekirîne, mirov dikare dawî li vê cudayîyê bîne lê dema xurbet bi rengdêra sirgûnîyê tê wesifkirin, xerîb dibe hêsîrê welatekî dûrdest. Mahmut Baksi di *Serhildana Mala Elîyê Ûnis* da cezayê nefîyê wek stratejîya polîtîk a dewleta tirk dinirxîne. Vebêjê Baksi, dîyar dike ku di demên şer da axa û begên xwe dispêrin merhemeta dewletê, tên cezakirin. Talîya wan yan sêdar e yan jî nefî ye.[626] Vebêjê Baksi bi mixabinî dibêje ku ev ezmûna dewletê ya demên aloz tu carî ji kurdan ra nabe jêderka dersekê û kurd, vê rastîya dîrokî nabînin. Vebêjê Baksi, dîyar dike ku

---

[623] Dawid Yeşîlmen, *Li Ser Wêje, Civak û Romana Kurdî Bi Haşim Ahmedzade re Hevpeyvîn*, Wêje û Rexne, Hejmar: 1, Sal: 2014.
[624] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 12.
[625] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 24.
[626] Baksi, *Serhildana Mala Eliyê Ûnis*, r. 27.

hevkarîyek di navbera axa û dewletê da hebû û axayan, navê kê û eşîra kê bidana rayedarên herêmî, ew di vagonên reş û tarî da dişandin sirgûnîyê.[627] Vebêjê Baksi, mercên vê rêwîtîya ji mecbûrî jî rexne dike û bêavbûn û bêdestavxanebûna van vagonên reş dişayesîne.

Mijara sirgûnîyê bi xwe ra têgeheke nû anîye: edebîyata mişextîye. Romannûsên ku li dîyasporayê ekoleke edebîyatê avakirine wek nivîskarên mişextî jî dikarin bên hesibandin. Nazan Aksoy dibêje ku: "Mehmed Uzun wêjeya mişextî wek wêjeyeke bêgavîtiyê dibîne; Ji hêla wî, wêjeya mişext wêjeya hesabdîtinê, berxwedan û serhildaê ye."[628] Mehmed Uzun di *Bîra Qederê* da zextên li ser kurdan bi bîr tîne û bi rêya vebêjê xwe dibêje ku *"Her tiştê kurdî qedexe dibe. Herkesê bi kurdî bipeyive tê girtin û jê ceza tê birîn. Kurd, eşîrên kurdan ji welatê xwe ber bi alîyê Anatoliyê nefî dibin."* [629] Mehmed Uzun jî wek Mahmut Baksi behsa nefîkirina eşîran a li Anadolê dike û bi van gotinan cih dide tirs û bêdengîya ku esmanên Tirkîyeyê dagir kirîye: *"Hertim sêdar li dar bûn û cendekên muxalîfên dewletê li badibûn, gund dihatin şewitandin, navçe dihatin kavilikirin, eşîr û binemal hertim dihatin sirgûnkirin."*[630] Vebêjê Uzun, bi van gotinan sirgûnkirina eşîr û binemalên kurd, rexne dike. Li gor wî kurdên zana û zîrek bi sêdaran ve dadiliqîn û ewlad û eyalên wan diketin ser rêyên dawîya wan li şerpezebûnê diedilîn.

Nivîskarên romana kurdî ya dîyasporayê ji ber ezmûnên xwe yên sirgûnîyê gelek caran bi rêya karakterên xwe li ser jîyana sirgûnîyê û zehmetkêşîya sirgûnan sekinîne û hewl dane ku temaya sirgûnîyê bi hûrgilî di tevna romanên xwe da bi cih bikin. Özlem Galip derheqê gotara sirgûnîyê ya romannûsan da destnîşan dike ku "Xala ku bal dikişîne, welatê wan bi xwe ye, welatê mazûvan nîne; lewma li Kurdistanê rewşa sosyo-polîtîk û hestên ne kêfxweş bo welatê mazûvan dibe sedem ku di hilbera romanê de tenê li ser welatê xwe yê heqîqî konsantre bibin û tev li

---

[627] Baksi, *Serhildana Mala Eliyê Ûnis*, r. 58.
[628] Nazan Aksoy, *Wêjeya Mişext û Nivîskarekî Kurd: Mehmed Uzun*, (Wer.) Mîrza Baran, Wêje û Rexne, Hejmar: 1, Sal: 2014. r. 166.
[629] Uzun, *Bîra Qederê*, r.195.
[630] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 68.

derûdora xwe ya nû nebin."[631] Romannûsên ku di binehişê wan da serborîyên sirgûnîyê cih digirin dê helbet wan kul û keserên jîyana sirgûnîyê vebêjin.

3.11.5. Êşkence

Bi destê kesekî an jî hin kesan ve bi awayekî sîstematîk li ser laş û gîyanê mirovan zor û zextên fîzîkî û derûnî bên kirin ev rewş, wek êşkenceyê tê pênasekirin. Êşkence ne tenê li hember şexsan her weha li hember mirovahîyê jî wek sûc tê dîtin.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da gelek nivîskaran bi hûrgilî behsa dîmenên êşkenceyên bisaw kirine û wek sûcekî li hember mirovahîyê cih dane vê meseleyê. Mahmut Baksi di *Helînê* da sahneyeke êşkenceyê dişayesîne û tiştên ku qerdîyan tînin serê girtîyan ji devê Helîna zarok, weha tê vegotin: *"Qerdiyanan dest bi êşkenceyê kirin. Em dan ber cop û pihînan, li zikê me ê birçî dixistin. Em dibûn wekî gopalan. Piştî copan feleqeyê dest pê dikir. Em dan ber şîşên tifingan. (...) Qerdiyan ketin bin çengê me û em rakirin ser piyan. Nava hucreyê xwêkirî bû. Bi gerînê qarîn ji me diçû."*[632] Cop û feleqe hin hûrgilîyên vê dîmena êşkenceyê ne ku Baksi, bi qêrîna girtîyan rexneya wê dike. Baksi, ji devê kesekî bi navê Reşo ku bi bavê Hêlînê ra di heman girtîgehê da maye û êşkence dîtîye, behsa tesîra êşkenceya elektirîkê li ser mejî û dilê mirovan dike. Baksi bi navgînîya Reşo, êşkenceya daliqîna di nava kîsan û xistina pisîkan a paxila mirovên tazî, weha rexne dike: *"Serê qabloyê bi pêçîkên me ve girê dan û cereyan dan me. Cereyanê tesîreke pir mezin li mejî û dilê me dikir. Em diricifîn û direhilîn. (...) Piştî cereyanê em xistin nava torbeyan û daleqandin. Pisîk xistin paşila me."* [633] Di vê sahneya bixof da pisîk jî bûne navgînên êşkencekaran.

Mahmut Baksi ji devê Reşo, behsa talîma leşkerî ya li girtîxaneyan dike ku ev te'lîm ji bo girtîyan dirûvekî êşkenceyê ye. Reşo dibêje *"Me di hewşa hepisxaneyê de baz dida, xwe li erdê dirêj dikir û radibûn ser piyan. Me marşê tirkî ji ber kiribûn.*

---

[631] Özlem Galip, *Serpêhatiyên Bêcihûwarbûnê: Di Rabêja Romana Kurdî de Weke "Warê Demkî" Dîyaspora,* (Wer.) Ömer Delikaya, Wêje û Rexne, Hejmar: 1, Sal: 2014, r. 150.
[632] Baksi, *Hêlîn*, r. 50.
[633] Baksi, *Hêlîn*, r. 51.

Ên ku bi wan marşan nizanîbûn û ji ber nekiribûn, diketin êşkencexaneyê." [634] Ji bilî êş û azarên bi girtîyan dihate kişandin, hin kiryarên ku hem laşê wan hem jî gîyanê wan di binê bandoreke neyênî da bihêlin jî dihate serê girtîyan. Ew jî li gor lehengê Baksi ketina nava kanalîzasyonê ango bi darê zorê daqurtandina gû û ava bigû bû. Baksi vê dîmena derveyî mirovahîyê bi gotineke îronîk wek "soberîya gû" bi nav dike û vê rewşê ji devê vebêj-lehengê xwe weha rexne dike: *"Leşkeran bi porê me digirt û em noqî avê dikirin. Ava bi gû, bi kurm û kêzik, dev û pozên me tije dikir. Em di nav gû de mabûn. Soberiya gû nîv saetê ajot."* [635] Baksi ji devê dayika Hêlînê behsa êşkenceyê didomîne. *"Tazîkirin, birçî hiştin û dest avêtin, jîyana rojê bû. Keçên xama pîs dikirin û li ber çavên me dest diavêtin wan. Leşker nîvê şevê dihatin ba me û em dibirin odeyên xwe."* [636] Ev gotinên lehenga Baksi, nîşan didin ku êşkenceyên giran ne tenê li mêran herweha li jinan jî dihate kirin û jin, tûşî gelek kiryarên tacîz û tecawizan diman.

Mehmed Uzun di romana *Tu*yê da -ku roman wek rojnivîska êşkenceyê ye- behsa hefsarê stûyê karakterê romanê dike û matbûyîna xwe ya li hember hefsarxistina stûyê mirovan tîne zimên. [637] Lehengê Uzun ji bo derûnîya kesên ku tûşî êşkenceyan dimînin bêyî famkirin dibêje ku girtî yan bi êşa laşê xwe mijûl in yan jî bi axîn û qêrînên girtîyên hevalên xwe dil û gîyanê wan disoje. [638]

Mehmed Uzun jî wek Mahmut Baksi behsa êşkenceya gûdanxwarinê dike û vebêj-lehengê wî dibêje ku kesên ku bixwestana biçin destavê, destav bi wan didane xwarin û vexwarin. Li gor êşkencekaran çûna destavê ne ew qasî karekî hêsan e. Berdêla wê heye. [639] Jixwe sixêfên bi sîn û kaf mîna zirneya li ber daholê ji guhê girtîyan qût nabe. Lêdana bi saetan a bi cop, pihîn û kulmikan ku çavên girtîyan jî girtîne, bi hûrgilî tê şayesandin. [640] Uzun, bi taybetî li ser êşkenceya elektirîkê disekine û bi navgînîya lehengê xwe dibêje *"Her carê ceryan didan dereke te. Cara*

---

[634] Baksi, *Hêlîn*, r. 52.
[635] Baksi, *Hêlîn*, r. 54.
[636] Baksi, *Hêlîn*, r. 60.
[637] Uzun, *Tu*, r. 164 .
[638] Uzun, *Tu*, r. 175.
[639] Uzun, *Tu*, r. 178.
[640] Uzun, *Tu*, r. 191.

pêşî dan tilî û pêçiyên te. Piştre dan pêsîr, memik, guh û zimanê te. Û dema dan organa te ya mêraniyê pir kêfa wan hat, dikeniyan…" [641] Kesên ku êşkenceyê li girtîyan dikin bi sadîzmeke kûr û tund van êş û azaran li ser laşê mirovan pratîze dikin.

Firat Cewerî di *Payiza Dereng* da rastîya nezaretxeneyan li ber çavan radixe û bi rêya Ferda dibêje ku êşkencekar erza mirovan dişikînin û asaqan di mirovan dikin.[642] Cewerî ji bilî êşkenceyên nezaretxaneyan cih dide êşkenceyên ku leşker li meydanên gundan li ber çavên dost û dijminan tînin serê gundîyan jî. [643] Firat Cewerî kiryarên êşkencekaran dişibîne kiryarên nazîst û faşîstan. Hin êşkenceyên ku hatine serê girtîyan ji zilma kampên nazîyan jî xirabtir dinirxîne. Cewerî, ji devê Reşîtê endamê rêxistinê, dibêje kesên ku bibêjin em însan in, nikarin van tiştan bikin. Daliqandina gewdeyê mirovan, tazîkirin, şilkirin, feleqe, dayîna elektirîkê ya uzvên mêranîyê, xistina copan û alastina belxemê, gûdanwarinkirin hin ji van izêwatên ku li êşkencexaneyan tên serê girtîyan [644] Lehengê bi navê Reşît, bi tundî van kiryarên derveyî mirovahiyê rexne dike. Ferda, di nameyeke ji hevalê xwe ra nivîsîye, êşkenceyên li girtîgeha Dîyarbekirê jî bi kitekit dişayesîne û rexne dike. Ferda, girtîgeha Dîyarbekirê (5 No'lu) wek dojehêke li erd û ezmanan mînaka wê tune ye, bi navdike. Li gor Ferda, xwîna bi hezaran mirovan li dîwarê wê xezebxaneyê hişk bûye û xortên çeleng ji ber zilma êşkencekaran, agir bera laşê xwe dane. Ferda, bêdengîya rayagiştî ya cîhanê jî li hember van êşkenceyan rexne dike. Li gor wî haya Xweda jî ji kiryarên evdên wî yê vê zîndanê tune ye. [645] Bûbê Eser di hevpeyvînekê da derheqê vê zindanê da weha dibêje: "Bawer bike mirov çiqasî li ser wê girtîgehê binivîsîne, bêje wê kêm be. Ji ber zilm û wehşeta di wir de li ciwanên kurdan dikirin ne hatîye dîtin ne hatîye bihîstin û rûdaneke weha li ser rûyê vê cîhana ku êm lê dijîn, nebûye û nabe."[646]

---

[641] Uzun, *Tu*, r. 197.
[642] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 142.
[643] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 157.
[644] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 217-218.
[645] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 321.
[646] Hesenê Dewrêş, *Hevpeyvîn bi Bûbê Eser re "Tenê Girî Ne Qedexe bû*", Zarema, Sal:1 / Hejmar:1 / 2014, r. 146.

Firat Cewerî di *Ez ê Yekî Bikujim* da êşkenceyên bi serê karakterê wî da hatine vedibêje. Kirînên ku nayên gotin û bawerîya kesî pê nayên encax kesekî din dîtibe û tesdîq bike, dibe rastîyeke sihêm û li ber çavan tê raxistin. Cewerî di çîroksazîya romana xwe da cih dide van gotinên karakterekî xwe Dîlhem Anaz û ji bo bawerîya xwîneran bi gotinên wî bê, van kiryarên ku hatine serê karakterî wî bi şêwaza şahîdîyê tîne ziman.*" Heke ez kirinên wan di hizûra we de bilêv bikim, wê mehzê we bixele, hûn ê bibêjin ne mimkin e însan van kirinan di hemcînsê xwe de bike. Hûn ji min bawer nakin, Ji Mehdî Zana bipirsin, ew sax e, ê ji we re bibêje."* [647]

Fırat Cewerî di *Lehî*yê da cih dide serborîyên karakterên xwe yên êşkenceyê. Lehengê romanê *Lehî*, ji nivîskar ra behsa hevalekî wî yê di êşkencexaneya girtîgehê da tûşî destavêtinê maye û pişt ra xwe kuştîye, dike. [648] Li gor Lehîyê ew êşkenceyên ku tînin serê girtîyan heta mirinê şopên wan li ser gîyanê girtîyan dimîne.

Firat Cewerî, di romana *Maria Melekek Bû* da behsa êşkenceya bi destê hevalên mirov di bin zor û zextan da dike. Saqo Şelal, ji krîmînolog ra behsa serborîyeke xwe û Daniel a êşkenceyê dike û dibêje *"Celad, tiliya xwe ber bi min ve kir û bi hêrs got: 'Ka pantorê vî gawirî jê bişeqitîne da em bibînin bê zilamên nesunetkirî çawa xuya dikin!' Minê çawa pantorê hevalê xwe yê di nav destên celadan de jê bişeqitanda?"*[649] Firat Cewerî, vê bêgavîya mirovan a di bin zilmê da bi hûrgilî dişayesîne. Ne sinetbûyîna mirovan an jî bawerîyên wan ên cihê jî di kêlîkên êşkenceyan da ji êşkencekaran ra dibe amûra henekan û kesên nesinetkirî, tûşî gelek kiryarên xeyrî exlaqî û wîcdanî dimînin. Di vê mînakê da Cewerî, halê kesekî bi vî awayî hatîye bêrûmetkirin li ber çavan radixe. Lehengê bi navê Saqo Şelal dibêje *"Celad destê xwe avêt binê penîsê wî, hejand. Bi niyeta ku nîşanî girtiyan bide, bû hîke hîka wî…"* [650] Li gor şeyesên Cewerî, êşkenceyên bi vî rengî piranî bi înîsîyatîfa wezîfederên girtîgehê û di nava keyfîyeteke bêsînor da pêk hatine.

---

[647] Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim*, r. 63.
[648] Cewerî, *Lehî*, r. 172.
[649] Cewerî, *Maria Melekek Bû*, r. 97-98.
[650] Cewerî, *Maria Melekek Bû*, r. 99.

Firat Cewerî dide zanîn ku êşkence ne tenê li kesên ji rêzê tê kirin, kesên nasnameyeke û rabirdûyeke wan a sîyasî heye jî marûzî êşkenceyan dimînin. Ew kes ji ber ku naskirî ne bêtir dibin qurbanîyên sadîzma êşkencekaran. Naskirina wan, kiryar û gotinên wan ên di raya giştî da li hember wan tê bikaranîn û rûmeta wan tê binpêkirin. Firat Cewerî di mînaka kevneparlamenterekî ku di hilbijartinan da berendamtîya serokkomartîyê jî kirîye, vê sadîzma êşkencekaran şênber dike. kevnesîyasîyê ku tûşî êşkenceyan maye, weha dibêje: *"Ez naskirî bûm, lê ez ketibûm nav destên zebaniyan. Ew navdariya min hemû li dijî min dihat bikaranîn."* [651] Firat Cewerî, di heman romanê da behsa sahneyeke kanalîzasyonê dike û ji devê lehengê bi navê Nûrî Almaz weha dibêje: *"Wan bi serê min girt û xist nav vê kanalîzasyonê. (...) haşa pereçeyên gû bi ser ketibû."* [652] Sahneyên bi vî rengî di romanên kurdî yên dîyasporayê da gelek caran derdikevin pêşberî xwîneran.

Firat Cewerî, bi gotinên lehengê bi navê Dilhem Anaz, cih dide êşkenceyên Zîndana Dîyarbekirê (5 No'lu) û behsa kûçikê navdar Co dike ku ew, kûçikê Yûzbaşî Esat Oktay Yıldıran (1949-1988) e. *"Dilhem Anaz bi axîn got: (...) Co, kûçikê serbazekî bû. Gava ew ji îşkenceya me diwestiyan Co bera me dida. Co carina xwe diavêt gurçikên çîmên me, carna xwe divaêt rûyê me û perçek jê dibir."* [653] Gelek kesên dîtir jî di bîranînên xwe da behsa vî kûçikê har kirine. Co, sembola ku herî tê zanîn a êşkenceyên Zîndana Dîyarbekirê ye. Hasan Cemal di kitêba xwe ya *"Kürtler"* (Kurd) da behsa işkenceyên kûçikê Co dike.[654]

Helîm Yûsiv di romanên xwe da derheqê mixabirata Sûrîyeyê da gelek rexneyan dike. Di *99 Morîkên Belavbûyî* da behsa dîmena êşkencekarê ku bi ser girtîyekî da dimîze dike. [655] Li gor vebêjê Yûsiv, Azadê Penaber, *"Wan wisa li mirov dinihêrî ku her girtîyek ji me kêzikek e û karê wan ew e, ew wê kêzikê di bin sola xwe de biperçiqînin."* [656] Helîm Yûsiv, di *Wehşê Di Hundirê Min De* wek gelek nivîskarên ku me behskir bi navgînîya Salar, cih dide êşkenceya elektirîkê. Salar

---

[651] Cewerî, *Maria Melekek Bû*, r. 112.
[652] Cewerî, *Maria Melekek Bû*, r. 113.
[653] Cewerî, *Maria Melekek Bû*, r. 118.
[654] Hasan Cemal, *Kürtler*, Doğan Kitap, İstanbul, 2003, r. 26.
[655] Yûsiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, r. 43.
[656] Yûsiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, r. 44.

dibêje*"Ya herî giran ew bû ku gava têl davêtin her du tiliyên min ên lingan yên mezin û cêran didan min."*[657] Wek tê dîtin cih û nav biguhere jî cureyên êşkenceyê dişibin hev. Lewra armanca êşkenceyê yek e: Zerardayîna laş û gîyanê mirovan.

Di romana Kobanîyê da Jan Dost derheqê êşkenceyên El Sîcn El Merkezî da gelek agahîyan dide û dîyar dike ku cureyên êşkenceyên li wê zîndanê li girtîyan dihate kirin, dûrî aqilan bû. Vebêjê Jan Dost, weha dibêje: *"Pir kes bi îşkenceyê dimirin û hin jî eware, yan kût, yan kor yan lal yan jî dîn derdiketin."*[658] Ev şayesên êşkenceyê, kiryarên rejîmên dîktatorî li ber çavan radixin û derheqê famkirina sedemên hin alozîyên civakî û sîyasî yên dewletên Rojhilata Navîn da rênîşanderîyê dikin.

Êşkence û hûrgilîyên êşkenceyan di romana kurdî ya dîyasporayê da xwedî cihekî giring e. Romannûsan bi awayekî dîrekt carinan jî endîrekt ev êşkence rexne kirine û wek wesîqeyên demekê xwestine van bûyeran di nava rûpelên romanên xwe da bi cih bikin.

3.11.6. Asîmîlasyon

Civak an jî neteweyek di warê ziman, çand û nasnameyê da ji alîyê miletekî serdest ve bên mehandin, ev yek wek asîmîlasyonê tê binavkirin. Abdullah Kiran asîmîlasyonê weha pênase dike: "1) Ji alî civat an kultureke hêzdar û serdest ve mehandina civat an kultureke din a hê qelstir. 2) Ziman û nasnameya xwe hundakirina ferd an civakekê. 3) Beşeke civakê bê vîn û daxwaza wê mehandin, dirûvê wê bi xwe xistin. Sîyaseta asîmîlasyonê dibe ku di warên dînî, etnîkî, sîyasî û çandî bê rêvebirin."[659] Esasa asîmîlasyonê ev e ku çanda desthilatdar, çandeke din a ji alîyê rêvebirîya sîyasî ve qels e ji siberoja xwe ra wek tehdîdekê dibîne û daxwaz dike ku wê ji holê rake an jî heyînên wê yên folklorîk bike malê xwe. Di heman demê da wî gelê ku asîmîle kirîye, bike parçayekî miletê xwe û bi vî awayî xetereya mûhtemel ya siberojê ji holê rake.

---

[657] Yûsiv, *Wehşê di Hundirê Min de,* r. 123.
[658] Dost, *Kobanî,* r. 66.
[659] Abdullah Kiran, *Ferhenga Zanistên Civakî,* Nubîhar, Îstanbûl, 2014, r. 16.

Sosyolog û aktîvîstê îranî Alî Şerîatî (1933-1977) dibêje ku ewropî û peyrewên wan di wê bawerîyê da ne ku modernîte dermanê medenîkirinê ye, ev yek jî bi xwe ra du encam anîne: pişaftin û biyanîbûn (assimilation û alienation).[660] Ev jî bi xwe ra dejenerasyona qodên çandî ya civakê tine. Orf û adetên civakê, nirxên exleqî, çanda devkî û ya herî mihim ziman asîmîle dibe. Li gor Thomas Stearns Eliot (1888-1965) dema civakek wek civakeke din bihizire êdî nasnameya xwe ya berê winda dike û vediguheze tiştekî din.[661] Êdî ew dibe perçeyê civakeke din û tu xisûsîyetên ciyawaz li dora wê namîne, lewra zimanê civakê ku nasnameya civakê ya herî berbiçav e ji holê rabûye.

Ziman, sitûna herî giring a nasnameyê ye. Fexriye Adsay destnîşan dike ku "Giringtirîn hêmana xwebûniya neteweya kurd zimanê wê ye. Ligel axa Kurdistanê zimanê kurdî ye ku tenê aîdî wan e; wan ji neteweyên din cuda dike. Lê di bin siyasetên asimilasyon û tunekirinê de ziman xisareke mezin dîtiye."[662] Zimanê kurdî di dezgeyên asîmîlasyonê ra derbas bûye û nifşên nû ji ber tunebûna perwerdeyeke sîstematîk a bi kurdî nikarin zimanê xwe yê zikmakî biaxivin. Lêkerên ziman ji bîr kirine, mantalîteya sentaksa ziman winda kirine û bêjeyên kurdî ew qasî nehatine bikaranîn ku bêjeyên zimanên fermî li şûna wan bêjeyên zimanê zikmakî kon vedane. Ev rewşa xirab, bi giştî encama qedexekirina ziman e. Hêzên desthilatdar bi qedexekirina ziman, nasname û çanda kurdî xwestine hebûna kurdan di nava nasnameya ereb, faris û tirkan da bimehînin. Bi vê boneyê bi awayekî sîstematîk polîtîkayên asîmîlasyonê li ser kurdan hatine pratîzekirin.

Asîmîlasyon, polîtîkaya dewletê ya herî bingehîn e, digihêje heta rêvebirîya Îttîhat û Terakkîyê (1908-1918). Bi avabûna komarê ra hîn bi hişmedî û berfirehtir hatîye tetbîqkirin. Ji bo asîmîlasyona kurdîtîyê her rê û rêbaz mibah hatîye dîtin.[663] İsmail Beşikçi, îdîa dike ku ronakbîrên wek Ahmet Akif Ağaoğlu (1869-1939) û Yusuf Akçura (1876-1935) di tespît û tetbîqkirina polîtîkayên asîmîlasyonê da roleke giring lîstine.[664] Her weha Ziya Gökalp (1876-1924) derheqê teorîya asîmîlasyona

---

[660] Ali Şeriati, *Medeniyet ve Modernizm*, Düşünce, 1980, r. 14-15.
[661] T. S. Eliot, *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, (Çev.) S. Kantarcıoğlu, Paradigma, İst., 2007, r. 185.
[662] Fexriye Adsay, *Neteweperweriya Kurdî û Hin Argumanên li Dijî wê*, Zarema, Sal:8/Hejmar: 16/ 2022, r. 31.
[663] İsmail Beşikçi, *Devlet ve Kürtler*, İBV Yayınları, İstanbul, 2015, r. 14.
[664] Beşikçi, h., b., r. 20.

kurdan da ji dewletê ra arîkarî kirîye. Dr Rıza Nur (1879-1942) di xatirata xwe da dibêje ku "Meseleya kurdan min xemgîn dike. Tiştek tune ye lê wê rojekê dawa neteweyî bikin. Divê vana temsîl (asîmîle) bibin. Min dest bi tetqîqatê kir û derheqê usûlên temsîlê kitêb anîn. Min derheqê kurdan kitêb dan dîtin. Min ji Ziya Gökalpê ku li Dîyarbekir e pere şand da ku ahvalê kurdan ê erdnîgarî, lîsanî, qewnî û civakî lêbikole. (wî) raporek şand. Meqseda min ew e ku ew der, berîya bibe Makedonya mesele ji kokê da hal bibe."[665] Ev kitêba ku Rıza Nur behs dike kitêba Ziya Gökalp a bi navê *Kürt Aşiretleri Üzerine Sosyolojik Bir Tetkik* e. (Lêkolînek Civaknasî li Ser Eşîrên Kurdan). Di vê kitêbê da rê û rêbaza asîmîlasyona kurdan hatîye teorîze kirin.

Rêvebirên sîyasî ji bo ku sîyaseta asîmîlasyonê bigihêje armanca xwe serî li sirgûnê didin û hin eşîrên niştecih ji warên wan bû dûr dixin wan dişînin nav civaka ku dixwazin di nava wê da asîmîle bibin. "Bêcih û warkirina girseyên gel ên berfireh, şandina wan a sirgûnê, zor û zextên ku ji bo mal û milk û gundên xwe terk bikin ji bo asîmîlasyonê atmosfereke guncav ava dike. Bo nimûne sirgûnên piştî salên 1920î û 1930yî ku piştî serhildanên kurdan derketine holê, divê ji vî alîyî ve bên nirxandin.[666] Sirgûnên di nav van salan da rasterast ji ber bûyerên dîrokî qewîmîne û encamên sîyaseta asîmîlayonê ne.

Martin Van Bruinessen îdîa dike ku Komara Tirkîyeyê li hember kurdan helwesta herî pevnekir meşandîye û metoda tepisandina serhildanan a bi şidetê, bi polîtîkayên asîmîlasyonê yên radîkal pevgîhandîye. Ev serkeftina wê li gor cîranên wê hîn domdar bûye.[667] Rayedarên ku erka sîyasî di destên wan da ye di vê pêvajoyê da gelek daxwîyanîyên tund dane raya giştî û rasterast nîyeta xwe ya asîmîlasyonê îlan kirine. Robert Olson derheqê vê meseleyê da weha dibêje: "Di avrêla 1925an da piştî tepisandina Serhildana Şêx Seîd (1925) û zeftkirina wî, Serokwezîrê Tirkîyeyê İsmet İnönü; weha (1884-1973) daxwîyanî dabû: "Em bi awayekî aşkera neteweperest in… Neteweperestî, regeza yekîtîya me ya tekane ye. Di nava ekserîyeta tirkan da tu cihê hêza kêmnetevan tune ye. Wezîfeya me di nava welatê me da ên ne tirk in, behemehal tirkkirina wan e. Ew anasirên ku ji tirkan û tirkîtîyê ra

---

[665] Dr. Rıza Nur, *Hayat ve Hatıralarım*, C. III, Altındağ Yayınevi, İstanbul, 1968, r. 906.
[666] İsmail Beşikçi, *Devlet ve Kürtler*, İBV Yayınları, İstanbul, 2015, r. 68.
[667] Martin Van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, (Çev.) Banu Yalkut, İletişim, İst., 2010, r. 48.

mixalefetê bikin, em dê wan jêbikin û biavêjin."[668] Ev daxwîyanî tenê ne îlankirina nijadperestîya serokekî ye, manîfestoya hikûmeta wê demê ya derbarê asîmîlasyonê ye. Ji gelên ne tirk ra du alternatîf hatine pêşnîyazkirin: tirk bûyîn an jî mirin.

Asîmîlasyona li ser kurdan hatîye pratîzekirin xwedî plan û bernameyekê ye. İsmail Beşikçi, derheqê usûl û esasên vê asîmîlasyone da weha dibêje: "Rêbazeke asîmîlasyonê ya mihim dibistan, rêvebiri, radyo, televîzyon û rojname ne. Ev amûr di asîmîlasyona kurdan da bi awayekî sîstematîk tên bikaranîn. Tê zanîn ku sazîyên dîn û sîyasetê jî di pêvajoya asîmîlasyonê da bi awayekî çalak hatine bikaranîn.[669] Bo nimûne rojname û kovarên kurdî yên di kutupxaneyên dewletê da ne, hatine îmhakirin. Katalog hatine guhertin. Bi hinceta kontrolên ewlehîyê di sergirtina malan a rûtîn da kitêb, rojname û kovarên kurdî di cih da desteser dibin û li cihên guncav têne îmhakirin.[670] Wek tê dîtin reçeteya asîmîlasyonê berfireh e, armanca sereke ji holê rakirina zimanê kurdî ye.

Tirk, bi şêwazeke tund li hember perwerdeya bi zimanê kurdî derdikevin. "Li dijî derketina perwerdeya kurdî yanî li hember derketina perwerdeya bi zimanê kurdî, bi sîyaseta dewletê ya asîmîlasyonê ra ji nêz ve têkildar e.[671] Ji bo zarokên kurdîaxêv dibistan cihê lihevqelibîna du zimanan e: zimanê fermî tirkî û zimanê qedeqekirî yê malbatê kurdî.[672]

Gotinên kurdekî ku İsmail Beşikçi di kitêba xwe ya bi navê *"Devlet ve Kürtler"* da cih jê ra veqetandi ye, rewşa derûnîya zarokên kurdan aşkera li ber çavan radixe. "Zimanê tirkî li dibistanê bi lêdan û cazadayînê ferî me kirin. Malbatên me, kurd û zimanê kurdî her roj li dibistanê ji alîyê mamosteyan ve dihate bêrûmet kirin. Mamosteyan, şagirdekî ku bawerîya wan pê dihat, wezîfedar dikirin da ku şagirtên bi kurdî diaxivin tespît bikin. Wî hevalî di dema bînvedanan da, di çûyîn û hatina mal û dibistanê da navê kesên ku bi kurdî axivîne li kaxizekê dinivîsî û dida mamoste. Mamoste, wê kêlîkê yan jî roja din, li polê cezayên giran dida kesên bi kurdî axivîne. Mamoste, bi cetvelan li destê me dixist, guhê me dikişand û serê me li dîwar

---

[668] Robert Olson, *Kürt Meselesi ve Türkiye İran İlişkileri*, Avesta, İst., 2010, r. 4.
[669] İsmail Beşikçi, *Devlet ve Kürtler*, İBV Yayınları, İstanbul, 2015, r. 68.
[670] Beşikçi, h., b., r. 211.
[671] İsmail Beşikçi, *Kürt Aydını Üzerine Düşünceler*, İBV Yayınları, İstanbul, 2016, r. 8.
[672] Clêmence Scalbert Yücel, *Kürt Edebiyatının Anatomisi*, Ayrıntı Yay, İst., 2018, r. 57.

dixist.[673] Perwerdeya fermî ku bi zimanekî biyanî bê dayîn û zimanê zikmakî bi awayekî tund bê qedexekirin, zarokên ku zimanê dayikê bi kar tînîn bên cezakirin di binehişê nifşekî da biyanîbûnê kurtir dike.

Rayedaran, carinan ji bo ku zimanê fermî teşwîq bikin serî li hin rêbazên sloganîk jî didan. Îsmaîl Beşikçi, destnîşan dike ku kampanyayên "Hemwelatî, bi tirkî biaxivin!" Di wê demê da gelek mamosteyan, peywira xwe ya leşkerî wek mamoste cîgirserbaz kirin. Esas armanca van mamosteyan, fêrkirina zimanê tirkî ya zarokên kurdan, temamkirina pêvajoya tirkîfîkasyonê bû. Kurd, dê li gor qalibên çanda tirkî bihatina perwerdekirin.[674] Mamosteyên ku yek bêjeya kurdî nizanibûn û bi nijadperestî nêzî meseleya perwerdeyê dibûn, li cihên peywirdar bûn zarok bi zorçoxîyeke mezin asîmîle dikirin.

Di çarçoveya asîmîlasyonê da eşîrên kurdan ji cihên xwe dihatine derxistin. Bi van mercên îskana mecbûrî atmosfera asîmîlasyonê dihate avakirin. Eşîrên kurdan li Anatolyaya Navîn, li herêmên Trakya û Behra Reş da dihatin bi cihkirin ji bo asîmîlasyonê dihatin amadekirin. Li şûna van eşîrên kurdan jî mihacirên Balkanan dihatin bi cihkirin. "Mihacirên ku ji alîyê dewletê ve hatine bi cihkirin, li cihên ku îskan bûne, mecbûr bûn 10 salan îkamet bikin. Evana, bêyî destûra Wekaleta Daxîlîyeyê li cihekî din nikaribûn niştecih bîbûna."[675] Bi vî awayî civaka ku girtîye û di nava xwe da bi zimanê xwe diaxive, ji hundir ve tê xirakirin. Carinan jî ew grûba ji derve tê di nav grûba mezin da asîmîle dibe. Di civaknasîyê da ji vê pratîkê ra "asîmîlasyona beravajî" tê gotin.

Ji alîyê sîyaseta asîmîlasyonê ve li Sûrîyeyê rewşa kurdan ne ji ya Tirkîyeyê cuda ye. Li wir jî nasnameya kurdan nedihat qebûlkirin û ziman û çanda kurdan tune dihat hesibandin. Nivîskarê kurd Mustafa Nazdar ji şefê polîsan ê wê demê Muhammed Talab Hîlal weha neqil dike: "Kurd ne miletek in. Dîrok, şaristanî û zimanê kurdan tune ye hetta kokên wan yên kêmnetewetîyê jî tune ye."[676] Muhammed Talab Hîlal di mijdara 1963an da raporeke bi navê "Xebatek Li Ser Alîyên Neteweyî, Civakî û Sîyasî yên Wîlayeta Cezîreyê" (Dirasat'an Muhafizat el-

---

[673] İsmail Beşikçi, *Devlet ve Kürtler*, İBV Yayınları, İstanbul, 2015, r. 215.
[674] İsmail Beşikçi, *Kürt Aydını Üzerine Düşünceler*, İBV Yayınları, İstanbul, 2016, r. 83.
[675] Ayşe Hür, *Öteki Tarih III Kemalist Devrimler ve İsyanlar*, Profil Yay., İst., 2013, r. 178.
[676] Senar Turgut, *Mezopotamya'da Kürt Uygarlık Tarihi*, Belge Yayınları, İst., 2011, r. 148.

Cezîre mîn el-Nerewahî el Qawmîya we-l Îctîmaîya, we-l Sîyasîya) amade kirîye. Li Sûrîye bernameya erebîfîkasyonê heta sala 1976an jî domand. Navê gund û bajarên kurdan hatin guhertin. Di raporê da Hîlal, kurd şibandine tûmoreke xebîs ku bi bedenê neteweya reban ve hatibû û pêşnîyara derxistina wan ji herêmê dikir bi rêka planeke dûwanzdeh xalî: Tehcîrkira kurdan ji ser erdên wan, mehkûmkirina kurdan ji perwerdeyê, vegerandina kurdên tewanbar bo Tirkîyeyê, nedana firsendên karan bo kurdan, kampanyayeke propagandaya dijî kurd, bi cihkirina melayên ereb li şûna melayên kurd ên xelkê deverê, sîyaseteke parçe bike û bi rê ve bibe di nava cemaeta kurd de, bi cihkirina ereban li deverên kurdan, avakirina kordona ewlehîyê bi dirêjîya sînorê ligel Tirkîyeyê, avakirina çewlîgên kolektîf ji bo şênîyên ereb, mehkûmkirina kesên ne erebîaxêv ji mafê raydan û karmendîyê, nedana welatînîya Sûrîyeyê ji wan kesên ne ereb re ku dixwazin li deverê bijîn.[677]

Li Îranê jî rewşa kurdan ji alîyê asîmîlasyonê ve bi salan di xetereyê da bû. Riza Şah Pehlewî (1878-1944) bi hêzên artêşê û entrîkayan yek bi yek eşîr têk birin û yekîtîyeke nû ya neteweyî ava kirin. Dûre serokeşîrên xwedî bandor bi darê zorê li Tehranê bi cih kir an ew ji warên wan bi dûr xistin. Gelek hewldan hatin kirin ku li Kurdistanê zimanê farisî mecbûr bikin û cilûbergên kurdî yên kurd pê dihatin naskirin, bi yên îranî yên terza rojavayî biguherînin.[678] Dîsa jî rewşa zimanê kurdî li gor parçeyê Tirkîyeyê li Îranê çêtir e. Qedexeya ser ziman û perwerdeya kurdî ne wek ya Tirkîyeyê tund e. Hetta li Îranê bi navê "Kurdistan"ê eyaletek jî heye.

Li Îraqê di dema Partîya Seddam Huseyîn (1937-2006), Baasê da asîmîlasyon an ji erebîfîkasyon li ser kurdan hate tetbîqkirin. Lê bi serkeftinên tevgera Barzanîyan û bi destkeftîya herêma otonomîyê, ev asîmîlasyona li ser kurdan sist bû. "Di sala 1988an da dema şerê di nabeyna Îran û Îraqê da qedîya. Harekata Seddam Huseyîn a Enfalê ku tevgereke berfireh bû ji bo asîmîlekirin û qirkirina kurdan kete dewrê. Di pêvajoya vê tevgerê da li gor Sazîya Şopandina Mafên Mirovan di navbera pencî an sed hezar însan jîyana xwe ji dest dan. Li gundê kurdan mêr hatin kuştin û

[677] Kerîm Yildiz, *Kurdên Sûrîyeyê Gelekî Jibîrkirî*, (Wer.) Engîn Opengîn, Avesta, 2009, Stembol, r. 60-61.
[678] William Eagleton Jr, *Komara Kurdistanê ya 1946'an*, Avesta, Stenbol, 2019, r. 33.

jin û zarok ji herêmên kurdan hatin girtin û li kampên Îraqê yên deverên din hatin bi cihkirin. Piştî wê di qetlîama Helebçeyê da 5.000 însan jîyana xwe ji dest dan."[679]

Li çar parçeyên Kurdîstanê kesên ku xwestine an mecbûr mane ji ber vî mîrkutê asîmîlasyonê rizgar bibin xwe li dîyasporayê girtine û berê xwe dane xurbetê. Dewletên Ewropayê bi atmosfera demokrasîya xwe û toleransa li hember mînorîteyan û rêzdarîya li hember mafê mirovan ji kurdan ra bûye wargeh.

Kurdan, zincîra zor û zextên li ser nasname, çand û zimanê xwe, bi derfetên dîyasporayê şikandine, li wargehên dîyasporayê gelek kitêb nivîsîne û çap kirine, fîlm çêkirine, enstîtu vekirine, dibistan vekirine, kanalên radyo û televîzyonan vekirine, malperên ku naveroka wan bêtirs û xof dîzayn dibin, saz kirine. Kurdên dîyasporayê, xwestine ku bi van amûrên mihim nasname, ziman û çanda kurdî ji nava pencên dirinde yên asîmîlasyonê rizgar bikin û ziman û çanda kurdî modernîze bikin da ku ji zarok û nevîyên xwe ra mîrateyeke çandî ya nivîskî di asta bilind da bihêlin. Helbestvanê kurd Ehmed Huseynî dibêje: "Pêwîst e em zimanê xwe ji toza dîrokê daweşînin ji nav pencên dirindane yên asîmîlasyonê azad bikin.[680] Huseynî, Daxwaza rizgarbûna ji asîmîlasyonê bi du metaforên balkêş tîne ziman: Toza dîrokê bêje û qaîdeyên gramatîkal ê zimanê serdestan e, pencên dirinde jî zor û zexta li ser ziman e.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da ji ber ku asîmîlasyon sedemeke bingehîn a derketina derveyî welat e gelek romannûsan di romanên xwe da behsa asîmîlasyonê kirine û ev cure sîyaset bi tundî rexne kirine. Înkarkirina neteweya kurd û zimanê kurdî û qedexebûna perwerdeya kurdî wek temayên sereke yên derheqê mijara asîmîlasyonê da derdikevin pêşberî me.

Mahmut Baksi di *Hêlîn*ê da ji alîyê perwerdeyê ve nêzî meseleya asîmîlasyonê dibe. Baksi, bi navgînîya Helînê dibêje ku *"Li Tirkiyeyê bi elîfbaya latînî em dikirin tirk, li vir bi elîfbaya erebî zarokên kurdan dikirin ereb."* [681] Jixwe zarokên kurdan ji zimanên fermî tiştekî fêm nakin. Bi ser da jî dema ji welatê xwe

---

[679] Minoo Alinia, *Diaspora Mekânları,* Avesta, İstanbul, 2007, r. 56.
[680] Ehmedê Huseynî, *Çend Dîmenên Xemgîn ên Kurmanciya Nivîskî*, Aram, İst., 2004, r. 40.
[681] Baksi, *Hêlîn*, r. 83.

derdikevin û li welatekî din dibin penaber ji ber cîyawazîya alfabeyên latînî û erebî, hişê wan tevlihev dibe û dibin xerîbên xerîban.

Di romana *Tu*yê da Mehmed Uzun dibêje ku armanca dewletê ew e ku zimanê fermî fêrî zarokan bike û bi vî awayî zarok, zimanê xwe yê dayikê ji bîr bikin û di nava çanda tirkî da bimehin [682] Li gor vebêjê Uzun, ji bilî vê hewldanê, erîşên ser welat jî dîyardeya vê tirkîfîkasyonê ye. Lehengê Uzun vê yekê weha tîne zimên: *"Hikûmeta tirk êrîşên xwe yên hov roj bi roj zêdetir dike. Wan dil heye ku welatê kurdan bikin tirk."* [683] Mehmed Uzun di *Bîra Qederê* da polîtîkayên dewletê yên li ser kurdan dihatin ceribandin ji devê Celadet Bedîrxan, rexne dike.[684] Axavtina kurdî, mûzîka kurdî û nîşaneyên nasnameya kurdî navên kurdî û navên cih û warên kurdî qedexe bibin li gor Celadet Bedîrxan, ev tê wateya ku tirk, daxwaz dikin ku kurdan di nava xwe da bimehînin û çanda wan ji holê rakin.

Helîm Yûsiv di *Tirsa bê Diran* da destnîşan dike ku zarokên kurdan li hember mamosteyên ereban lal dibûn û fêm nedikirin ku çima bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde nabin û çima zimanekî bîyanî li ser wan tê ferzkirin. Vebêjê Yûsiv, dibêje ku zarok di dubendîya zimanê malê û zimanê dibistan û sazîyên dewletê da heyirmayî diman û zimanê wan li hev dihebilî. [685] Lewra zimanê kurdî qedexe bû û li gor lehenga bi navê Leylayê, *"Dema zimanê mirov qedexe be, xewnên wî jî qedexe ne."*[686] Mirovekî di xewnên xwe da jî bi zimanê xwe yê zikmakî nepeyive, tê wateya ku hizira zimanê xwe yê dayikê winda kirîye ango asîmîle bûye.

Helîm Yûsiv ji alîyê rejîma ereban guhertina navên herêman, bi rêya lehengê xwe rexne dike.[687] Li gor bavê Mûsayê Qamişlokî bi vî awayî dixwazin şopên nasnameya kurdî ji van deveran paqij bikin û kurdan, ereb bikin da ku tu mafên wan ên cuda nekevin rojeva rejîmê û siberojê ji bo dewletê nebin tovê nîfaqê. Lehengê Yûsiv, Mûsayê Qamişlokî, weha didomîne: *"Gund û bajarokên me rahiştine navên*

---

[682] Uzun, *Tu*, r. 190.
[683] Uzun, *Tu*, r. 190.
[684] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 256.
[685] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 9.
[686] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 41.
[687] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 58.

serokên ereban, şoreşên ereban, bav û kalikên ereban lêkirin. Mîna Qehtan ku navê xwe daye Tirbespiya û bûye Qehtaniyê. Malik jî navê xwe daye Dêrikê ku bûye Malikiye."[688] Ev cure gotin, bandora rexneya îronîk zêde dike. Li gor Mûsayê Qamişlokî, erebên ku bi sîyaseta biraderîyê nêzî kurdan bûn, ewil xwestin kurdan bikin ereb, piştî demekê polîtîkaya înkarkirinê dest pê kir û erebên "birader" ji bilî zimanê xwe guhê xwe ji dengên zimanê kurdî ra şimakirin.[689] Li gor wan her kes ereb e, zimanê ereban jî erebî ye, gotûbêjên li ser vê meseleyê jî qalikê vala ye.

Di *99 Morîkên Belavbûyî* da Helîm Yûsiv bi navgînîya Azadê Penaber, sîyaseta asîmîlasyonê a dezgehên dewleta Sûrîyeyê rexne dike û bal dikêşe ser navguherandina hemû tiştî. Azadê penaber dibêje *"Navê bajarên me guherine navê gundan, navê dar, ax, mirîşk, karik, mîh, berxik, çivîk û zarokên me."*[690] Nav gûherandin di usûla asîmîlasyonê da rêbazeke bivênevê ye. Lewra daxwaza serdestan ew e ku ji çand, ziman û nasnameya gelên ku tên bişaftin, tu şopên neteweyî nemînin û siberojê, îhtîmala ji nû ve ketina wan a rojevê tune be. Li gor Azadê penaber, bi vê sîyasetê ji bilî zimanê erebî hemû ziman bi zorçoxî ji holê dihatin rakirin. Ala çanda erebî, hemû gelên hêrêmê dixiste bin sîya xwe ya sawdar. Yekîtî di devê ereban da dibû sirûdeke neteweyî ku ji xeynî wan û çanda wan cihê tu kesî di nava risteyên vê sirûdê da tune bû. Helîm Yûsiv di çarçoveya rênûmaya asîmîlasyona kurdan da zor û zextên li ser zimanê kurdî, bi gotinên Azadê penaber rexne dike û dibêje ku *"Axaftina bi kurdî li dijî qanûn û rêbazên dibistanê bû û di riya wan kesan re, navê zarokên ku bi kurdî biaxiviya digihişt ber destê rêveberê giştî."* [691] Lewra rayedaran baş dizanibû ku gava herî mihim a bişaftinê jibîrkirina zimanê zikmakî ye.

Helîm Yûsiv, projeya erebfîkasyonê ya di warê nifûsê da bi navgînîya lehengê xwe Ehmedê Kekûkî, rexne dike û angaşt dike ku ereban di çarçoveya plansazîya erebkirina Kerkûkê da cihê bi hezaran malbatên kurd guherandîye û li şûna wan, ereb bi cih kirine da ku bajarê Kerkûkê nifûsa ereban zêde be û bajar

---

[688] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 59.
[689] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 60.
[690] Yûsiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, r. 13.
[691] Yûsiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, r. 58.

nasnameya xwe ya kurdî winda bike. [692] Trajedîya malbatên ji cih û warên xwe bûne jî alîyekî din ê vê meseleyê ye.

Jan Dost di romana *Kobanî*yê da encamên asîmîlasyonê rêz dike û bi tundî bişaftinê rexne dike. Dost, bi gotinên meleyekî destnîşan dike ku rayedaran, zimanê xelkê qedexe kirin û zimanekî din li ser wan ferz kirin. Ji bilî vê, tovê dijminahîyê avêtin nava gel û eşîr li hev sor kirin. [693] Dema ziman ji holê bê rakirin giyanê neteweyê jî belawela dibe û kesên ji heman nesebê wek dijminan berê xwe didin hev. Ev jî li gor dilê neyaran e.

Di *Payiza Dereng* da Firat Cewerî wek Jan Dost bi berfirehî cih dide encamên asîmîlasyonê. Ferda, dibêje ku *"Navên Çîya, Sîpan, Şoreş, Nûjîn, Zozan, Zîlan Berîvan, Azad… hemû navên rastî ne. Herçiqas zimanekî tirkî di devên wan navên kurdî de be jî."* [694] Li gor Ferda her çi qasî bi hewldana salan a kurdan hin tişt ji lepê asîmîlasyonê hatibin filitandin jî bişaftinê, cihê xwe di mejîyê kurdan da çêkirîye.

Di romana *Ez ê Yekî Bikujim* da Firat Cewerî ji zimanê kurdekî di toqa asîmîlasyonê ra derbas bûye çend hevokên balkêş wek mînak dide û wêneyê asîmîlasyonê şênber dike. *"Tê doxrî biçî, di işiqlaran de dönmîş bibî, piştî îkî yûz metre, belediye li sola ye."*[695] Ev cure gotin, encama herî berbiçav a asîmîlasyona li ser ziman e. Zimanê di bin xetereya windabûnê da ye ewil bi tevlîbûna bêjeyên biyanî pişt ra bi transfera sentaksa zimanên serdest, hêdî hêdî ji holê radibe.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da Helîm Yûsiv û Firat Cewerî di warê rexneyên asîmîlasyonê da romannûsên çalak in. Asîmîlasyon piranî di warê ziman, perwerde û nasnameya neteweyî da hatîye rexnekirin. Romannûsan li gor mercên welatên xwe yên sîyasî û çandî nêzî vê meseleyê bûne û encamên tirkîfîkasyon, erebîfîkasyon û persîfîkasyonê li ber çavan raxistine û ev rewşa sîyasî rexne kirine.

---

[692] Yûsiv, *99 Morîkên Belavbûyî*, r. 97.
[693] Dost, *Kobanî*, r. 37.
[694] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 288.
[695] Cewerî, *Ez ê Yekî Bikujim*, r. 82.

3.11.7. Dîktatorî

Li dewletekê da pergala hêzeke sîyasî ku hikmê wê mitlaq e, bê ser kar û dewlet ji alîyê kesekî an jî komîteyekê ve bê birêvebirin, ev rewş wek dîktatorîyê tê pênasekirin. Li Îraqê rejîma Baasê, wek rejîmeke dîktatorîyê bi salan di bin dîktatorîya Seddam Huseyîn (1937-2006) da dewlet bi bi tundî birêvebir. Jenosîda Helebçeyê di sala 1988an da di bin rêvebirîya wî da pêk hat.

Li Îranê rejîma Şah Muhammed Riza Pehlewî (1919-1980), berîya şoreşa îslamê ya Rûhûllah Mûsavî Hûmeynî (1902-1989) bi monarşîyeke dirûvê dîktatorîyê dewleta Îranê bi rêve dibir. "Li Sûrîyeyê Hafiz Esad (1930-2000) tena serê xwe 30 salî li îqtîdarê ma. Ji mejûya 20ê hezîrana (2000)î û vir ve (lawê wî) Beşar Esad dewleta Sûrîyeyê bi rê ve dibe." [696]

Li Komara Tirkîyeyê di pêkutîya 12 îlonê da Orgeneral Kenan Evren di dema derbasok a sîyasî da pergaleke awarte ava kir û Tirkîye bi hikmê xwe yê mitlaq îdare kir. Kurdên di nava van çar dewletan da dijîyan, bi salên dûvdirêj tûşî kiryarên bêqanûnî man û gelek kurdan ji bêgavî xwe avêtin derveyî sînorên van dewletan û li Ewropayê bûn penaber, demografîya dîyasporaya kurdî ya Ewropayê dermale kirin. Romannûsên ku me çarçoveya teza xwe bi wan û romanên wan dorteng kirîye kêm zêde ji ber van pergalên dîktatorîyal ji welatên xwe derketine û berê xwe dane cih û warên dîyasporayê. Ji ber van sedemên heyatî di romana kurdî ya dîyasporayê da rexneyên giran li rejîmên dîktatorîyal tên kirin.

Mehmed Uzun di *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* da bi monologekê rexneyên endîrekt li rejîmê dike.[697] Lehengê romanê Jîr, bi tundî rexneya pergala mîlîtarîst dike û di wê bawerîyê da ye ku general jîyaneke wekhev pêşkeşî hemwelatîyan nakin. Genaral, tenê xwedîyê hikmê xwe yê mitlaq in.

Di *Tirsa bê Diran* da Helîm Yûsiv bi navgînîya Mûsayê Qamişlokî, rexneya nîşaneyên dîktatorîyê dike. Serokê ku navê wî li her deverê tê nivîsandin, peykerên

---

[696] Christophe Brisard, Claude Quêtel, *Diktatörlerin Çocukları,* (Çev.) Okay Kunal, YKY, İstanbul, 2018, s. 211.
[697] Uzun, *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê*, r. 108.

wî li meydanan bilind dibin û wêneyên wî bi her avahîyan tê daliqandin, dibe jêderka tirsa bêdiran û dikeve dilê hemwelatîyên Sûrîyeyê. [698] Alîgirên ku jê hez dikin jî û kesên ku jê nefret dikin jî wêneyên wî li camên dikan û tirimpêlên xwe dixin da ku ji ber xezeba mixabirata wî bifilitin.

Helîm Yûsiv, di *Gava ku Masî Tî Dibin* da, bi rêya vebêjê romanê, behsa seraya serok dike û dibêje ku li seraya serok hin leşker hebûn ku tenê ji bo kêfa serokê xwe dixebitîn û ji generalê xwe ra jinên bijarte dianîn. [699] Hemwelatîyên dewletekê ji alîyê aborî ve di asta birçîbûnê da bin û serokên wan di serayên xwe da di nava kêf û sefahatê da bijîn û bi bac û dahatûyên hemwelatîyan, sifreyên Qarûn li ber xwe rast bikin li wê dewletê dadwerî ji bo gel dibe xewneke xumamî.

Di *99 Morîkên Belavbûyî* da Helîm Yûsiv, destnîşan dike ku li êşkencexaneyên mixabiratê da hêzên leşkerî û ewlehîyê ta'deyên giran li kesên mixalîf dikirin. Helîm Yûsiv, sixêf û gotinên çors ên êşkencekaran qeyd dike û ayînên pejirandina xwedatîya serok a bi darê zorê ji devê êşkencekarê qerdîyan Ebû Elî, weha tîne zimên: *"Ey kûçik, tu kî yî tu zimandirêjiya serokê mezin dikî. Serok Xwedayê te ye, Xweda. Rebbê te ye."*[700] Serokekî ku tirsa wî wek tirsa Xweda, bi destê alîgirên wî têkeve dilê hemwelatîyan tê wateya ku ew serok, edî bûye dîktatorekî û çi bixwaze dikare bike.

Di romana *Wehşê Di Hundirê Min De* Helîm Yûsiv ji devê karakterekî xwe yê zarok îronîyeke balkêş dike. Salarê zarok ji dayika xwe dipirse: *"Serok jî weke min mîz dike, yadê?"* [701] Piştî vê pirsê pirseke dîtir îronîyê dermale dike: *"Yadê gelo serok mezin e, yan Xwedê?"* [702] Serokê ku peykerên wî li meydanên bajêr bi sawdarî bilind dibin, wêneyên wî wek roj û heyvê li her deverê derdikeve pêşberî mirovan ango wek "Xweda li her derê ye" kesayeteke wî ya xwedayî çê dibe. Dema kesek ji dirûvê mirovatîyê bê derxistin û şemaleke xwadayî lê bê fesilandin, ew kes ji kiryarên mirovî yên fîzyolojîk jî minezzeh dibe û tê wê astê ku bi Xweda ra bêyî

---

[698] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 15-16.
[699] Yusiv, *Gava ku Masî Tî Dibin*, r. 83.
[700] Yûsiv, 99 Morîkên Belavbûyî, r. 43.
[701] Yûsiv, *Wehşê di Hundirê Min de*, r. 14.
[702] Yûsiv, *Wehşê di Hundirê Min de*, r. 14.

miqayesekirin. Pirsa zarok, vegêrana îronîk a rexneyî qelew kirîye. Peyker û wêneyên serokên dîktator, ew qasî tirseke tîr dixin dilê hemwelatîyan ku mirovên li van welatan dijîn ji demekê û pê ve kesayetekê didin van wêne û peykeran û ditirsin ku bi taybet gîyanek têkeve qalibê van peykeran û mirovan ber bi xwe ve bikişînin û tadeyê li wan bikin. Helîm Yûsiv, ji devê Salarê zarok vê tirsa kûr rexne dike. [703]

Jan Dost di *Kobanî*yê da ligel rexneya dîktatorîyê rexneya mêrên civakeke pederşahî ku bûne koleyê şehwetbazîyê jî dike. Li gor vebêjê Dost, ji alîyekî dîktator hemû hunerên xwe nîşanî civakê dida û ji alîyekî din jî laşfiroşan, bi şev ji bo mêrên dilbijok û doxînsist ku haya wan ji bayê felekê tunebû û ezîyetên dîktatorîyal ne li ser bala wan bû û nêranîya civaka wan hatibû xesandin, laşên xwe ji lîstikên erotîk ra pêşkeş dikirin.[704] Bi vê rexneya seksuel, Jan Dost dixwaze bibêje ku civak jî bi kiryarên rêvebirîya dîktatorîyê ji exlaq û toreyên xwe bi dûr ketîye û di vê pêvajoyê da şibîyaye celadê xwe.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da rexneya dîktatorîyê bi piranî di romanên Helîm Yûsiv da cihekî giring digire. Ji ber ku bandora dîktatorîyê li ser jîyana Helîm Yûsiv bi xwe jî bûye di gelek romanên wî da karakterên wî gazinan ji rejîmên dîktatorîyê dikin û Yûsiv bi rexneyên îronîk rewşa welatîyên di bin sîya dîktatoran da dijîn, dişayesîne.

3.11.8. Îdeolojî

Bîr û bawerîya mirovan a li ser pergalên aborîyê, sîyasetê, civakê, dîn û dinyayê wek îdeolojî tê binavkirin. Îde, tê wateya ramanê, lojî bi maneya zanistê tê bikaranîn. Îdeolojî, wek ilmê ramanê jî dikare bê pênasekirin. Bingeha romana kurdî ya dîyasporayê li ser sîyaseta bîr û bawerîyên mixalîf hatîye avakirin.

Romannûsên ku ji ber îdeolojîyên xwe yên li gor dewleta wan xetere bûn ji demekê û bişûn da ketin zindanan, êşkence dîtin, derketin dadgehan û talîyê mecbûr man derketin derveyî welêt; di romanên xwe da li ser temayên îdeolojîk sekinîne û hewl dane bi riwangeya dîasporîk hin rexneyan li îdeolojîyan bikin. “Bi vî şiklî

---

[703] Yûsiv, *Wehşê di Hundirê Min de*, r. 30.
[704] Dost, *Kobanî*, r. 295.

rastiyên ku di berhemên xwe da tesbît dikin bi awayekî sosyolojîk şîrove dikin û bi îdeolojîya hunera xwe diafirînin. Gelek ji wan berîya hunerê fikara pêkanîna dozekê dikin û ji xeynî nivîsandina romaneke baş armancên din datînin ber xwe. Pirsgirêkên welatê xwe û derdên gundîyan bi awayekî terefdar carinan bi hezkirinê carinan bi xezebê tînin zimanî; carinan tenê bi nêrinekê û carinan jî bi awayekî berfireh li ser disekinin." [705]

Di romana *Lehî*yê da Firat Cewerî bi teknîka flashbackê derheqê karakterên xwe da hin agahîyan dide û bi rêya mihasebeya rabirdûya wan hin rexneyan li îdeolojîyan dike. Cewerî, bi navgînîya Temo, wek poşmanîyekê behsa salên li dû îdeolojîyekê bihurîne dike û van salan wek qurbanîyên îdeolojîk dinirxîne ku ne tenê sal, ew jî kirine qurbanî, hêvîyên wî çilmisandine, xewnerojkên wî lî wî kirine kabûs û jîyana wî herimandine.[706] Temo, şikestina xeyalên ciwantîyê yên şoreşê û fikira têkçûyînê wek "kabûsên xezebê" dinirxîne.

Fırat Cewerî ji devê vebêjê xwe destnîşan dike milîsên ku mejîyên şoreşgeran dişon û wan dikin sempatîzan, partîzan an jî mîlîtanên îdeolojîyekê, wek bazirganan tevdigerin û sîyaseteke durû dimeşînîn. Ev kes li ser navê îdeolojîyekê li neferan digerin û ji bo berjewendîyên xwe van kesan dikin qurbanî. [707] Lehengê romana *Lehî*yê Temo, dibêje yên qurbanî, serên xwe li ber kêran dirêj dikin, bazirganên şoreşê jî dibin xatîbên nutqên azadîyê. Şoreşgerên ku bûne qurbanîyên îdeolojîyekê û pişt ra fêm kirine ku jîyana wan ji bo bilindbûna hin kesên din bûye pêpelûk, gelekî xemgîn dibin û dikevin nava poşmanîyeke tîr û kûr lê tiştekî vegerînin namîne. Di destên wan da ji bilî mixabinîyê ve tu tişt namîne.[708] Li gor Temo, di vê rewşê da fikira tolhildanekê jî dûrî rastîya jîyanê ye lewra qurbanîyên îdeolojîyan dê ji kê heyfa xwe bigirin û bi pey kîjan hesabên rabirdûyê bikevin?

Firat Cewerî di romana *Maria Melekek Bû* da rexneyên îdeolojîyê didomîne. Cewerî, ji devê kesê bi navê Saqo Şelal, dibêje ku *"Me xwe li ser fikrekê kir. Ez bi xwe hemû îşkence û deh salên zindanê didim aliyekî, lê min dixwest niha zarokên min*

---

[705] Betül Çoban, *Îdeolojî û Partîzanî di Romanên Kurdî yên Sowyeta Berê da*, The Journal Of Mesopotamian Studies, 6 (2) , 229-244.
[706] Cewerî, *Lehî*, r 156.
[707] Cewerî, *Lehî*, r. 162.
[708] Cewerî, *Lehî*, r. 214.

hebûna..” [709] Ev gotin tena serê xwe rexneyeke giran e. Cewerî, ji ber êşkenceyên li karakterê wî bûye çênebûna zarokên wî wek hesretekê dinirxîne.

Di romana *Gava ku Masî Tî dibin* da Helîm Yûsiv encamên mirina di ber doza îdeolojîk da dinirxîne û felsefeya şehadeta di rêya îdeolojîyan da rexne dike. Li gor lehengê Yûsiv, Masî; îdeolog bi rehetî meseleyê şîrove dikin û mirinê bi fîstanê şehadetê dişemirînin. Ji însanekî û bi şûn da tenê navek dimîne û rengdêreke şehîdîyê hevaltîya wî navî dike. [710] Tevgerên sosyalîst ku tu eleqeya wan bi dînê îslamê ra tune ne û bi ser da jî termînolojîya îslamê ya şehadetê bikartînin û şehadeta di rêya niştimanê da wek payeyeke bilind nîşan didin, di mejîyê şoreşgerên xwe da jî qendîlên nakokîyan pê dixin. Vegêrana Yûsiv a bi vî rengî, îronîya van nakokîyan e.

Jan Dost di romana *Mijabad*ê da cih dide guftugoyên di navbera komên cuda yên îdeolojîk da û fikira komunîzmê bi gotinên kalikê Badînê Amêdî, Entranîk, rexne dike. Li gor Entranîk, komunîzm wek “jehrekê” tê pênasekirin û behsa kesekî ya fikira komunîzmê jî herimandina şevbuhêrkê ye.[711] Îxaneta rûsan a li hember Komara Mahabadê bûye sedem ku kurdên wê demê ji fikira komunîzmê zivêrîyê bikin.

Di romana *Payiza Dreng* da Firat Cewerî behsa xeyaleke ciwantîyê dike ku ew xeyal di heman demê da wek peyarêka azadîyê dihate dîtin û li gor lehengê Cewerî şoreşgeran bawerîya xwe bi vê xeyalê anî bûn.[712] Ferda, têkçûyîna vê xeyalê wek têkçûyîna îdeolojîyê dinirxîne. Di jêremetnê van gotinan da encamên serpêhatîyên şoreşgerekî têkçûyî hene ku ev serborî ji nifşên nû ra wek şîretan jî tên şîrovekirin. Cewerî, di warê rexneya îdeolojîyan da bi wêrekî gaveke din diavêje û ji devê Ferda, bazdana li pey îdeolojîyê wek kedeke badilhewa dinirxîne. Li gor Ferda, ya zehmet ew e ku kesekî gihaştîye dawîya rê û baş têgihaştîye ku dawîya rê şikestina xeyalan e, ji kesên din ên bi kelecan berê xwe danê vê rêyê ra behsa valahîya vê rêyê bike. [713] Di sohbeteke Ferda û hevalên wî da kesekî bi navê Selîmê henekçî, sosyalîzmê weha pênase dike: *“Sosyalîzm xweş e, kê kir kê ye, wekhevî ye,*

---

[709] Cewerî, *Maria Melekek Bû*, r. 100.
[710] Yusiv, *Gava ku Masî Tî dibin*, r. 121.
[711] Dost, *Mijabad*, r. 100.
[712] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 26.
[713] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 248.

kî çi bike serbest e." [714] Di konteksa romanê da ev cure vegêran ji bo tundîya rexneya îdeolojîyê mînakeke giring e. Ev serbestîya di her warî da tê maneya îflasa hiqûq, ewlehî, aborî û hemû dezgehên dewletê.

Rexneya îdeolojîyê di romana dîyasporayê da piştî serencama lehengên romanan wek poşmanîyekê derdikeve ser dika romanê. Lehengên ku jîyana xwe di rêya îdeolojîyekê da serf kirine, pey fikira şoreşê ketine û talîyê li rastîya jîyanê likumîne û famkirine ku guhertina cîhanê ne karekî ew qasî hêsan e, bi şikestina xeyalên xwe li demên borî dizîvirin û otokirîtîkekê dikin. Di monolog an jî dîyalogên romanê da ev kirîtîk û otokirîtîkên nostaljîk, dibe navgînê derbirîna kul û keseran.

3.11.9. Binpêkirina Mafên Mirovan

Mafên bingehîn ku hemû mirov ji ber mirovahîya xwe xwedîyên wan in, wek mafên mirovan tên pênasekirin. Prof Jacques Mourgeon dibêje ku "Mafên mirovan di nava têkilîyên şexsan û şexs û desthilatdaran da ew îmtîyazên bi qayîdeyan tên rêvebirin ku di destê şexsan da wek malê wan in." [715] Dema bikaranîna mafekî di destê kesekî da wek "malê" wî be, tê wê maneyê ku bêyî xwestin an jî îradeya wî kesî tu kesên xwedî hêz, nikarin bi pêkutîyan teserûfeke din li ser wî mafî bikin.

Mafên mirovan di bin sîwana makezagona dewletan da tên parastin û dewletên di qada hiqûqa navnetewî da îmzeya xwe li binê peymanên enternasyonel xistibin ji parastin û pratîzekirina van mafên bingehîn berpirsyar in. "Peymana Mafên Mirovan a Avrûpayê di 4ê mijdara 1950î da li Romayê hatîye îmzekirin û di 3yê îlona 1952yan da ketîye merîyetê û di 18yê gulana 1954an da ji alîyê Tirkîyeyê ve hatîye pejirandin. Di peymanê da ev maf cih digirin: Mafê jîyanê, qedexeya êşkenceyê û kiryarên rûmeta mirovan dişkînin. Qedexeya angarya û koletîyê, azadîya takekesî û ewlehîya wî/e, qanûnîbûna sûc û cezayan, rêzdarîya li hember jîyana taybet a malbatî û azadîya ragihandinê, azadîya dîn, wujdan û ramanê, azadîya civîn û rêxistinbûyînê, mafê sazkirina malbatê, azadîya lêgerîna mafan."[716] "Dema em li romannûsên kurdî dinihêrin, em dibînin ku îro hê jî gelek nivîskarên ku bi kurdî

---

[714] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 257.
[715] Jacques Mourgeon, *İnsan Hakları*, (Çev.) Ayşen Ekmekçi - Alev Türker, İletişim, İst., 1991, r. 12.
[716] A. Şeref Özgürbüyük, A. Feyyaz Gölcüklü, *Avrupa İnsan Hakları Sözleşmesi ve Uygulaması*, 6. Baskı, Turhan Kitabevi, Ankara, 2005, r. 12.

(kurmancî) dinivîsin an di girtîgehan de ne yan demekî di girtîgehê de mane yan jî mişextî ne û sedem jî polîtîk in. Ji ber vê em dikarin bibêjin di romana kurmancî de şaxeke polîtîk a bihêz hê jî xwedî roleke giring e û mijar û temayên berheman jî li gor vê polîtîzebûnê tê xemilandin." [717] Di romana kurdî ya dîyasporayê da gelek nivîskaran behsa binpêkirina mafên mirovan kirine. Mahmut Baksi, Mehmed Uzun, Firat Cewerî û Helîm Yûsiv bêtirî Hesenê Metê û Jan Dost cih dane rexneyên binpêkirina mafên mirovan.

Baksi di *Hêlîn*ê da kiryarên artêşê bi gotinên Hêlînê rexne dike û dîde zanîn ku gundîyên ku bi zimanê tirkî nizanîbûn ji alîyê leşkeran ve dihatin tazîkirin û rûmeta wan dihate bin pê kirin. Hêlîna zarok dibêje ku *"Leşker weke gurên ku têkevin nava pez wisa ketin nava me. Bi şîşên tivingan li me didan, çermê me radibû. Qareqare me û qîjîna zarokan diçû ber perê esmên…"* [718] "Metafora gurên ku dikevin nava pez" ji bo şayesandina kiryarên endamên artêşê, dîmeneke sihêm li ber çavan radixe. Êşkenceyên li ser sergo yan jî meydanên gundan li gundîyan dihate kirin di romana dîyasporayê da berbelav e. Baksi, bi vegêrêna Hêlînê, rexneyên xwe yên derheqê binpêkirina mafên mirovan da didomîne. Hêlînê dibêje *"Leşkerekî şerît bi g*nikê mele ve girê da û şerît da destê Emo (...) Leşkerekî dest avêt çiçikê Emoyê û guvaşt."*[719] Tazîkirina gundîyan û li ber çavên herkesî destavêtina qîz û jinan dîmeneke sawdar, şênber dike. Kêfa êşkencekaran a li hember vê zilm û zorê jî dibe qehr û qotik û dikeve dilê temaşegeran. Li gor Hêlînê, ev kiryarên derveyî mirovahîyê şeref û namûsa gundîyan herimandîye û keç û jin ji lîstikên wan ên qirêj ra bûne pêlîstok. Destavêtina jinan a li hember kes û eqrebeyên wan bi qewlê Hêlînê ji mirinê jî xirabtir e. Hêlînê, vê rewşê weha rexne dike: *"Hikûmetê namûs û şeref ji me ra nehiştibû.* (…) *Vekirî li ber çavan dest diavêtin jin û keçan û bi wan dilîstin."* [720] Baksi, di Serhildana Mala Elîyê Ûnis da ji devê vebêjê xwe rexneya destavêtina jinan a ji alîyê hêzên dewletê ve dike û dibêje *"Ji bo vê yekê jî bi sedan keç û dayikên Kurdan ji ser zinaran xwe diavêt nava Çemê Xerzan."*[721] Êşkence hem di laş hem ji di gîyanê mirovan da şopên mayînde dihêle. Kesên ku tûşî kiryarên êşkenceyî

[717] M. E., Purçak, *Xebateke Bîblîyografîk Ji bona Romanên Kurmancî*, Kurdîname, (3), 1-28.
[718] Baksi, *Hêlîn*, r. 42.
[719] Baksi, *Hêlîn*, r. 43.
[720] Baksi, *Hêlîn*, r. 43.
[721] Baksi, *Serhildana Mala Eliyê Ûnis*, r. 70.

dimînin jîyana xwe ya mayî di nava kabûs û travmayan derbas dikin. Hin kes jî nikarin van travmayan li dû xwe bihêlin û dawî li jîyana xwe tînin.

Di *Sîya Evînê* da Mehmed Uzun di peywenda bûyerên dîrokî yên Serhildana Agirî da ji devê vebêjê xwe îdîa dike ku wê demê li derûdora Agirîyê sed û sih û li devera zîlanê jî nêzî du sed gund hatine şewitandin û ji deh hezarî zêdetir jî însan hatine kuştin. [722] Uzun, sê risteyên Ehmedê Xanî di romana *Sîya Evînê* da bi bîr tîne û pey şopa mehrûmî û mehkûmîya kurdan a li cîhanê dikeve. *"Kurmanc di dewleta dinê de / Aya bi çi wechî mane mehrûm/ Bîl cûmle ji bo çi bûne mehkûm?"* [723] Kurd, Ji dewletê bê par bûn, ji zimanê kurdî bêpar bûn û mehrûmîya ji hemû mafên hiqûqî, zorê dide nivîskar ku rexneyeke bi vî rengî li romana xwe zêde bike.

Di *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* da Mehmed Uzun, bi şêwazeke dilsoj li ser agirê ku ketîye nava kurdan disekine û cih dide van gotianan: *"Ard, zad, zexîrê me jî şewitandin… ew çend xaniyên xerbende yên gund jî şewitîn…"* [724] Uzun, ji devê vebêjê xwe rexneya şewitandina gundan weha didomîne: *"Agir, gulok bi gulok ji devên çekên wan ên mezin derdikeve û bi malan dikeve. Xanî, mal dişewitin."* [725] Gotinên dawî yên vebêjê Uzun, mîna hawara piştî talanê di guhên xwîneran da olan dide.

Kesên hatine kuştin divê rêz ji termê wan ra bê nîşandan. Di şerên mezin da jî ev qayîdeyeke bingehîn e. Lê vebêjê Uzun dibêje ku *"Li ser cendekan, zabit demança xwe dikişîne, tê ser cendekekê û sê berik bera laşê dirêjkirî dide."* [726] Vebêjê Uzun, endamên artêşê rexne dike ku derveyî qanûnên navneteweyî yên şer tevdigerin. *"Her der xwîn e, her der mirin, kuştin, birîn e. Her der tirs e."* [727] Vebêjê Uzun, ji vî halî tengezar dibe û welatê kurdan wek welatekî ji xwînê bi nav dike.

Mehmed Uzun di *Hewra Dîcleyê* da tespîteke balkêş dike. Li gor wî li derdora Çemê Dîcleyê mirin ku wek ecel tê binavkirin êdî nemaye. Di peywenda

---

[722] Uzun, *Siya Evînê*, r. 166.
[723] Uzun, *Siya Evînê*, r. 227.
[724] Uzun, *Ronî Mîna Evînê*, r. 243.
[725] Uzun, *Ronî Mîna Evînê*, r. 253.
[726] Uzun, *Ronî Mîna Evînê*, r. 294.
[727] Uzun, *Ronî Mîna Evînê*, r. 312.

şerê Mîr Bedirxan (1806-1869) û asûrî û keldanîyan da vebêjê Uzun ji mirinê gazinan dike ku mirina siruştî çima ketîye dirûvê kuştinê û bûye qayîdeyekê li van wargehan?[728] Dengbêj Biro, li ser meseleya şer disekine û dibêje ku şer wehşet e ku ev wehşet li ser kuştin û xirakirinê hatîye avakirin. Şerên zaliman li hember jar û belengazan wek kiryareke kirêt binavdike û têkilîya şer bi talan û koçê weha tîne ziman.[729] Esas ev bûyerên ku Mehmed Uzun bi berfirehî behs dike ne li gor pênaseya şer in. Wek tê zanîn şer di navbera du hêzan da pêk tê lê ev bûyer bi xwe dîmenên zilma hêzeke çekdar a li ser sîvîlan li ber çavan radixe. Şayesên Uzun ên dramatîk, encamên binpêkirinên mafên mirovan in.

Di *Payiza Dereng* da Firat Cewerî rewşa welat a di bin zilm û zorê da eçiqîye dinirxîne û ji devê Ferda dibêje ku Ji ber vê çendê mirovan xwe ji welatên xwe diavêtin derveyî sînoran û pey jîyaneke nû diketin. Jîyaneke ji zordarîyê, zindanê êşkenceyan û ji kuştinê dûr.[730] Cewerî, bi navgînîya Ferda bûyerekê neqil dike ku xebata hêzên tarî ya li welat, bi sahneyeke tijî xof li ber çavan radixe. Ferda, neqil dike: *"Pêşî ew ji qehwê revandine (...) dûre ew perçe perçe kirine, perçên wî xistine kîsekî reş û ew kîs avêtine ber deriyê mala bavê min."* [731] Bûyerên bi vî rengî li ser derûnîya mirovan bandoreke mezin dihêlin û dibin sedem ku mirov xwe li dîyasporayê biqewimînin.

Firat Cewerî jî wek Mahmut Baksi cih dide binpêkirina mafên mirovan ên li meydanên gundan qewimîne û van kiryarên bi destên endamên artêşê pakhatine bi gotinên Ferda rexne dike. *"Wan, zilamên gund tazî kirine, ew li hev siwar kirine û li ser sergo gindirandine."* [732] Êşkenceya bi destê heval û eqrebeyan ku li ser kesan hatîye ferzkirin û hîn gelek tevgerên rûmeta gundîyan şikandine bûne mijara rexneyan. Cewerî, dide zanîn ku di bin çavdêrîya hêzên ewlehîyê da cerdewanên ku çekên dewletê hilgirtibûn, ta'de li gundîyên xwe dikirin û herkes bi arîkarîya komên çekdar ra tewanbar dikirin.[733] Ev rexne hem wek rexneya kiryarên dewletê hem jî

---

[728] Uzun, *Hawara Dîcleyê*, r. 22.
[729] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 52.
[730] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 49.
[731] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 53.
[732] Cewerî, Payiza Dereng, r. 212.
[733] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 217.

gazina kurmên ji darê ye. Ferda, dibêje ku termên kuştîyên ku di şer da ketine destê hêzên ewlehîyê, ji helîkopteran ji jorî ve li hewşa leşkergehê dihate avêtin. Piştî rêzkirina ber hev a cendekan, bang li gelê herêmê dihate kirin da ku herkes li van cendekan binêre û kuştîyên xwe nas bike, ku tu kesî ji tirsa newêrîbû xwedî li termên mirîyên xwe derkeve.[734] Piştî banga xwedîlêderketina terman dema kesek nedihat, Ferda, destnîşan dike ku leşkeran, bi kepçeyê çalek dikolan û hemû termên kuştîyan bê rîtuelên dînî binax dikirin. [735]

Firat Cewerî li ser rêyên welêt, dema ger û geşta rêwîyan di çarçoveya lêgerînên rûtîn ên ewlehîya da hin tevgerên hêzên ewlehîyê jî bi navgînîya ferda rexne dike. Ferda di geşteke xwe da şahîdî lêgêrîneke li ser rê dibe û vê lêgerîna leşkeran weha rexne dike: *"Esker bi destan hundirê çentê wê tev da, du - sê derpîkên bi rengên cihê ketin destên esker. Wî ev derpîk, (...) di nav kefa destê xwe de miz dan."* [736] Bûyera ku Ferda behs dike rasterast, tacîza jinekê ye û dûrî nirxên exlaqî ye.

Hesenê Metê di novela *Gotinên Gunehkar* da li ser kiryarên hêzên ewlehîyê disekine û ji ber tevgerên wan ên dûrî mafên mirovan, rexneyan dike.[737] Metê, bi navgînîya kesê bi nava Mekrûs, destnîşan dike ku gelek leşkeran bi hev ra digirtin ser malan û hin leşkeran bi neyta xirabîyê keç û bûk dibirin hundirê kinişteyan.[738]

Di novela *Hefsar* da Hesenê Metê, behsa xezeba hikûmetê dike û zorçoxîya dewletê ya li ser çîyayîyan ji devê vebêj-lehengê novelê Germîyan, bi tundî rexne dike. Xezaba hikûmetê ya li ser gel, pêkutîyên cendirmeyan, agirê ku bi çîya û zozanan ketîye, mijara rexneyên Metê ne. [739] Kiryarên leşkerî ku rayedarên hikûmetê û artêşê wan, wek operasyon binavdikir, ne tenê li ser mirovên sîvîl herweha li ser xwezayê jî şopên şewatê hiştine. Hesenê Metê ji devê Germîyan, dibêje *"Ji wan erdan êdî mirin ne tenê kar û kerametekî bi destê Xwedê ye (...) merivên tarî û tolaz*

---

[734] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 243.
[735] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 243.
[736] Cewerî, *Payiza Dereng*, r. 261.
[737] Metê, *Gotinên Gunehkar*, r. 88.
[738] Metê, *Gotinên Gunehkar*, r. 90.
[739] Metê, *Hefsar*, r. 65.

jî dest havêtine karê Xwedê." [740] Mirina ku xwezayî ye û li gor bawerîya mirovan bi qederê ra têkildar e jî êdî ketîye înîsîyatîfa hin kesan.

Helîm Yûsiv di *Tirsa bê Diran* da ji bo zordarîya li ser kurdan pêk tê, şênber bike hêmayeke balkêş bi kar tîne û ji devê, Mûsayê Qamişlokî dibêje ku *"Sitûnên konên wan ji hestiyên kuştiyên me çêkirine."* [741] Ev kon, konê zilmê ye. Kesên ew kon ava kiribin jî mîmarên zilmê ne. Di van gotinan da rexneyeke tîr a zilmeke domdar xwe dide dest.

Di romana *Gava ku Masî Tî Dibin* da Helîm Yûsiv, dîmeneke şer a hilweşînê li ber çavan radixe. Vebêjê Yûsiv, Sola Masî, dibêje ku *"Piştî roketan, qazanên ku giraniya wan zêdeyî tonekê bû davêtin ser gund."* [742] Yûsiv, encamên vê bombebaranê jî bi awayekî realîst dişayesîne. *"Firoke dûr ketin û li pey xwe malên xerabbûyî, mirovên kuştî, perçeyên destan, yên lingan, seriyên bêlaş, destên zarokên hê negihîştin bi lîstikan bilîzin, hiştibûn."* [743] Helîm Yûsiv, bi gotinên çekdarekî bi navê Bawer, gazinan ji bêsiûdîya kurdan dike û dibêje jixwe kesên ku em bi wan ra şer dikin li hember jîyanê ne rêzdar in, qe ne be li hember kuştîyan û mirinê hurmet nîşan bidana.[744] Lê li gor Kevirê ku vebêjê Yûsiv e, *"Zilm û zora vê axê dîtîye kevirên li ser jî şiyar kirine."* [745] Kevirê vebêj, destnîşan dike ku *"Bi kuştina tenê razî nedibûn (...) Guhên miriyan jê dikirin, bêvilên wan, endamên wan yên cinsî…"*[746]

Di romana kurdî ya dîyasporayê da rexneyên li ser binpêkirina mafên mirovan cihekî fireh digire. Girtina ser malan a ji alîyê hêzên ewlehîyê û kiryarên wan ên derveyî hiqûqa navneteweyî gelek caran bûne mijarên rexneya romannûsan. Êşkence, kuştin, bêrûmetkirin, xirakirina malan, şewitandina gundan, bêhurmetîya li hember termên kuştîyan di rexneyên nivîskaran da hin xalên giring in ku derdikevin pêş.

---

[740] Metê, *Hefsar*, r. 74.
[741] Yusiv, *Tirsa bê Diran*, r. 45.
[742] Yusiv, *Gava ku Masî Ti Dibin*, r. 51.
[743] Yûsiv, *Gava ku Masî Ti Dibin*, r. 52.
[744] Yusiv, *Gava ku Masî Ti Dibin*, r. 113.
[745] Yusiv, *Gava ku Masî Ti Dibin*, r. 173.
[746] Yusiv, *Gava ku Masî Ti Dibin*, r. 176.

BEŞA ÇARAN

REXNEYÊN LI DÎROKÊ DI ROMANA KURDÎ YA DÎYASPORAYÊ DA

Dîrok, zanîna derheqê demên borî da ye ku di navbera bûyeran da têkilîyên sedemî û encamî nîşanî xwîneran dide. Dîrok ji bo siberojên ronî, hûrbîna xwe dide wesîqeyên wextên borî û ji wan wesîqeyan li ser gîyanê wê dema borî tecrubeyan neqlî nifşên nû dike. Ahmet Şimşek destnîşan dike ku her çi qasî dîrok bi îcada nivîsê dest pê bike jî berhema ewilîn, kitêba meşhûr a dîroknasê yûnanî Herodot (BZ 484-BZ 425) e. Bi Herodot ra dîrok ji çîrokên mîtîk ber bi sehaya rastîyên însanî ve çûye û bi endîşeyên însanî bûyer qeyd kirîne.[747] Ev qeyd û wesîqeyên dîrokî, rêya nivîsa dîrokê ji nivîskar û dîroknasên dîtir ra vekirîye û nivîsa dîrokê bûye qadeke zanistî.

Her milet bi dîroka xwe heye û ji dîroka xwe dersan derdixe. Ji ber vê yekê di pergala perwerdeyê da cihekî giring ê perwerdeya dîrokê heye. Armanc ew e ku her ferd, dîroka gelê xwe û gelên dîtir bizanibe û li gor vê zanînê tevbigere. Ev helwest, qîmeteke giran dide hişmendîya dîrokê. Lewra têkilîyeke bivênevê di navbera do û îro da heye û divê ev têkilî baş bê şîrovekirin.

Kitêba Şerefxanê Bedlîsî (1543-1603?) a bi navê *Şerefname* (1597) li alîyekî bêyî danîn dîroka gelê kurd, dîrokek e ku ji alîyê bîyanîyan ve hatîye nivîsîn. Neteweyên ku xwedî dewlet bûne û dîroka xwe nivîsîne bi hişmendîyeke neteweyî li xwe û dîroka xwe xwedî derketine, carinan derketine derveyî metodolojîya nivîsîna dîrokê û bûyer û kesayetên dîroka xwe berz û bala kirine. Di nava rûpelên dîroka wan da heger cihekî biçûk ji neteweyên bêdewlet ra hatibe veqetandin jî ew gotin rast an nerast dibe dîroka gelên bêdewlet û dibe mecbûrîyeteke ilmî ku dîroknas li ser van wesîqeyan bisekinin, wan bi hin wesîqeyên zimanên din ra berawird bikin û fêm bikin rastîya dîrokî çi ye. Lewra bi qewlê Alex Callinicos "Nivîsîna dîrokê ya nûjen tu carî wek ku îdîa dike ne masûm e." [748]

---

[747] Ahmet Şimşek, *Tarih Nasıl Yazılır*, Tarihçi Kitabevi, İstanbul, 2011, r.11.
[748] Alex Callinicos, *Toplum Kuramı Tarihsel Bir Bakış*, (Çev.) Yasemin Tezgiden, İst., 2013, s. 109.

Civakên modern ji bo ku vîzyona xwe qelew bikin û xwe di nava civakên din da bi qedr û qîmet nîşan bidin dikarin dîrokê berevajî bikin û li ser navê dîrokê gelek derewên mezin jî bikin heta dîrokeke nehatîye jîyîn bidin nivîsîn. Ji ber vê yekê rexneya dîrokî giring e. Rexneya dîrokî ew cure dîsîplîn e ku ji bo ronîkirina dîrokê bi nezereke hûrbînî li ser meseleyên demên borî xûz dibe û daxwaz dike ku nifşên nû dersên kartêker ji xeletîyên dîrokî derxin.

Pirsa bingehîn a rexneya dîrokî ev e: dîroka ku li ser sedem û encaman disekine gelo sedem biguherîyana dê çawa biqewimîya û bandora vê guherînê dê li ser îro çawa şênber biba? Di romanên dîrokî da gelek caran romannûs berê pênûsa xwe didin rexneya dîrokê û perspektîfa xwînerên xwe ya derheqê dîrokê da berfireh dikin. Xwîner bi saya van rexneyan haydar dibin ku bi nezereke din jî mirov dikare li bûyerên qewimîne binêre û wan şîrove bike. Di romana kurdî ya dîyasporayê da wek rexneyên civakî û sîyasî rexneyên dîrokî jî berbelav in: Rexneya li hişmendîya dîrokê, rexneya li bûyerên dîroka Osmanî, şer û pevçûnên di navbera mîrektîyên kurdan da diqewimin, rexneya li dîroka Komara Tirkîyeyê, rexneya li dîroka Îran û Îraqê hin mijarên rexneyên romannûsan in.

Mahmut Baksi di *Gundikê Dono* û *Serhildana Mala Eliyê Ûnis* da bi nezereke rexneyî li dîrokê dinêre û bêtifaqîya kurdan rexne dike. Mehmed Uzun di romanên xwe yên dîrokî da bûyerên dîrokî ji devê lehengên xwe ve rexne dike. Jan Dost di romanên xwe yên dîrokî (*3 gav û 3darek, Mîrname, Mijabad*) da li ser mijarên wek Serhildana Şêx Seîd, mîrekîya dema Ehmedê Xanî û Komara Mehabadê gelek rexneyên tund dike. Helîm Yûsiv jî di romanên xwe da xisûsî li ser dîroka gelê kurd ên li Sûrîyeyê dijîn bi şêwazeke îronîk gelek rexneyan dike. Romannûsên dîyasporayê daxwaz dikin ku şikestinên demên borî bi dengekî bala bi lêv bikin û nifşên nû hişyar bikin. Helbet mirov nikare xeletîyên demên borî serrast bike lê zanîna nifşên nû ya van xeletîyan ji bo roja me bivênevê ye.

4.1. Rexneyên li Hîşmendîya Dîrokê

Hişmendîya dîrokî ew hizir e ku mirovan sewqî zanîn û rexneya dîrokê dike. Civakên ku qîmeta dîrokê dizanin ji dîroka xwe û ya neteweyên din dersan derdixin

û dîrokê ji bo roja îro dikin çiraxek rênîşander. Di romana kurdî ya dîyasporayê da gelek rexne derheqê hişmendîya dîrokî da derdikevin pêşberî me. Bo nimûne Mahmut Baksi di romana *Gundikê Dono* da kurdan ji alîyê tunebûna hişmendîya dîrokî ve bi gotinên kesekî bi navê Mehemed Begê, rexne dike. *"Em ji tarîxê dersan nagirin. Roja keysa me tê, em destê xwe dixin qirika mêrikê gundî û dixeniqînin."* [749] Li gor Baksi, dîrok, kanîya dersan e lê kurd tu dersan ji dîrokê dernaxin.

Mehmed Uzun di *Sîya Evînê* da rasterast berê xwe dide dîrokê û wek metaforekê "şûr" bi kar tîne. Ew şûrê ku bûye sedema tune hesibandina dîrokeke kevnar û ew şûrê kû dîroka ji alîyê gel û kesên din ve hatîye nivîsîn, li ser kurdan ferz kirîye ku dîrokeke xapînok e, ji devê vebêjê xwe rexne dike. [750] Uzun bi van hevokan dide zanîn ku mohr di destê kê da be ew dibe Silêman û kitêbên dîrokê li gor berjewendîyên îqtîdara xwe dide nivîsîn ango dîrok bi çi awayî biqewime jî dîroknas dikarin wê dîrokê berevajî bikin.

Mehmed Uzun bi rêya kesayetekî dîrokî Dr Abdullah Cevdet (1869-1932) ve felsefeya dîrokê dike, giranbuhaya dîrokê ji bo gelan bi mînakekê şênber dike. *"Ji bo merivan fikirîn û bîrbitîn çi ye, tarîx jî ji bo neteweyan ew tişt e."*[751] Li gor Dr Abdullah Cevdet, qîmeta ramanê ji bo mirovan çi be qîmeta dîrokê jî ji bo miletan ew e. Sedsala 20an sedsala ku gel li ser kok û esasên xwe gwîr û geş dibin û li gor rabirdûya xwe di qada sîyaseta cîhanê da dibin xwedî hikum.

Mehmed Uzun bi du teşbîhan rexneya li hişmendîya dîrokê bi gotinên vebêjê xwe didomîne. Dîrokê hem dişibîne axurekî belawela hem jî dişibîne bexçeyekî tijî kulîlk û dipirse aya dîrok çi ye? [752] Uzun, li ser hişmendîya dîrokê bersiva vê pirsê, ji devê vebêjê xwe weha dide. *"Eger meriv nexwaze wekî heywanekî bêtarîx bimîne hingê meriv divê xîret bike û hewl bide ku tesîr li tarîxê bike."*[753] Ji bo ku mirov ji heywanan cuda be, li gor vebêjê Uzun, divê mirov xîretkêş be û hewl bide cihekî wî di dîrokê da çêbibe yan na dê mîna heywanekî bijî û bimire bêyî ku şopekê ji hebûna

---

[749] Baksi, *Gundikê Dono*, r. 64.
[750] Uzun, *Siya Evînê*, r. 70.
[751] Uzun, *Siya Evînê*, r. 109.
[752] Uzun, *Siya Evînê*, r. 150.
[753] Uzun, *Siya Evînê*, r. 151.

xwe li ser cîhanê bihêle. Uzun, bi metafora goştê biraştî ku ji xwarin û daqultandinê ra amade ye, dixwaze giringîya meseleyê li ber çavan raxe. *"Tarîx ne tîkeyên goştê pijirandî ye ku meriv lê rûnê û daqultîne."*[754] Li gor vebêjê Uzun, ev çi qasî karekî zehmet be jî milet ji bo kok û esasa xwe bigihînin dîrokeke kevnar ji xwe ra dîrokekê diafirînin. Bi van gotinan Uzun, têkilîya dîrok û neteweperwerîyê ku mijareke guftugoyê ye di çarçoveya hişmendîya dîrokê da minaqeşe dike û kesên ku dîrokê bi tiştekî nahesibînin, rexne dike. Nemaze heger tu doza neteweyê bikî, divê dîrokeke te hebe û ji bo dîrokeke te hebe jî divê tu xwe biêşînî. Dîrok, ne parîyekî ji xweber bipêje û têkeve devê kes an neteweyekê.

Mehmed Uzun, hişmendîya dîrokê bi ruhê neteweyê ve girê dide û rihê neteweyê jî bi ziman ra têkildar dibîne û bi gotinên vebêjê xwe, gazinan ji kesên derdora xwe dike da ku nebêjin tarîx. Li şûna bêjeya "tarîx"ê gotina "dîrok"ê pêşnîyaz dike. [755] Ji ber ku dîrok bi kurdî ye û tarîx jî bi erebî ye. Bi vê minaqeşeyê Uzun, ziman û dîrokê mîna du sitûnên qehîm ên neteweyê destnîşan dike û di warê qîmeta wan da hişyarîyeke dîrokî dike.*"Mixabin, hezar mixabin ku tarîx ev e û evçend dijwar û zehmet e."*[756] Uzun, bi kesereke kûr, zor û zehmetîyên dîrokê bi bîr tîne û ji devê vebêjê xwe dibêje ku *"Kurd tarîxa xwe bi xwîna xwe dinivîsînin."*[757]

Mehmed Uzun, di wê bawerîyê da ye ku dewletên cîran di derbarê dîroka kurdan da gelek agahîyên nerast li hev anîne û li gor feraseta xwe ya dîrokî û civakî kurd di rûpelên dîrokê da bi cih kirine. Memduh Selîm Begê, derbarê meseleyê da weha dibêje: *"Ev yeka mihim e monsieur, tarîxa dewletên cîran di derheqê kurdan de, li ser derewan ava bûye. Ew ne rast in.*[758] Dîroka ku nivîskarê, wê naxwazin navê gelê wê bilêv bikin, helbet dê dûrî rastîya rabirdîyê be. Uzun, di Hewra Dîcleyê da bi perspektîfeke berfireh li dîroka xaka Mezopotamyayê dinêre û diyar dike ku ji dewra Babîl û Nînovayê heta roja me şer û pevçûn bûne qedera vê xaka ku zilm û zordarî li

---

[754] Uzun, *Siya Evînê*, r. 151.
[755] Uzun, *Siya Evînê*, r. 151.
[756] Uzun, *Siya Evînê*, r. 152.
[757] Uzun, Siya Evînê, r. 159.
[758] Uzun, *Siya Evînê*, r. 217.

ser kêmnebû ye. Uzun, ji kîtêba pîroz a cihûyan Tewratê jî refere dike ku ev xak, meskenê tofan û xezebê ye. [759]

Mehmed Uzun di cildê duyem ê *Hawara Dîcleyê* da nêrîna kurdan a li dîrokê ji devê vebêjê xwe rexne dike û dibêje ku *"ji bo însanê me du serî pîvazê hişk ji tarîxê û ji şiûra tarîxê çêtir bûn."*[760] Gotinên vebêjê Uzun, hafizaya kolektîf a gelê kurd a derbarê hişmendîya dîrokê da bi awayekî realîst dişayesîne. Mehmed Uzun, bi navgînîya vebêjê xwe destnîşan dike ku cihê kurdan di dîrokê da heye lê ne wek roleke sereke encax bi koletî. [761] Vebêjê Uzun, bi bêjeya koletîyê rexneya însan derdixe pêş. Kurdên ku wek însan û pişt ra jî wek milet di bin bandora kes û gelên din da bijîn û ji bo azadîya xwe hewil nedin, heta ku hebin dê li ser qada dîrokê bibin xizmetkarê kes û gelên din.

Helîm Yûsiv, di *Sobarto*yê da cih dide rexneya qedera welatê kurdan a reş. Li gor vebêjê wî miletê ku ji seyareya dîrokê bikeve û hewl bide xwe bigihîne gelên din, bigihêje kîjan menzîlê dê bibîne ku hinekan konên xwe vedane û li wê herêmê xwedî derketine. [762] Heger miletek, dersan ji dîrokê dernexe tixubên erdnîgarîya wî miletî, bi serê şûrên miletên din tên nîşankirin.

Di *Tirsa bê Diran* da Helîm Yûsiv ji devê kesekî bi navê kalê turumpê, destnîşan dike ku dîrokê, kurd xapandine. Kalê turumpê dibêje *"Şahinşahê ku dîrokê ew xapandiye. Dîroka segbav! Dîroka ku tenê pişta xwe ji xurtan re dide erdê."*[763] Di van gotinan da hêrseke diyar li hember dîrokeke duru bi sixêfa "segbav" hatîye bilêvkirin. Dîroka ku şehînşehên erd û ezmanan ji xwe ra kirîye pêlîstokeke bêqîmet û pişt ra ew kirine qurbanîyên xwe. [764] Vebêj-lehengê Yûsiv, mamosteyê dîrokê Mûsayê Qamişlokî, dîrokê bi rengdêrên neyênî diwesifîne û weha dibêje: *"Dîroka seqet, diroka derew, dîroka mîna pêkenokên xemgîn. Dîroka tijî trajediyên ku kenê*

---

[759] Uzun, *Hawara Dîcleyê*, r. 276.
[760] Uzun, *Hawara Dîcleyê* II, r. 62- 63.
[761] Uzun, *Hawara Dîcleyê* II, r. 371.
[762] Yûsiv, *Sobarto*, r. 79.
[763] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 39.
[764] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 51.

mirov bi wan tê."[765] Li gor Mûsayê Qamişlokî, dîrok di nava dijberîyeke santîmental da ye. Bûyerên wê ên pêkenok, mirov xemgîn dikin û hin trajedîyên wê jî mirov dikenînin. Li cihekî rolên tragedya û komedya cih biguherînin, tê maneya ku jîyan, serobino bûye. Mûsayê Qamişlokî, ew qasî ji derewên dîrokê aciz dibe ku hemû pirtûkên dîrokê dixe kîsekî û dibêje ku wek ku derew li dinyayê nemabin ez gihaştime aramîyeke mezin.[766] Li gor wî, pirtûkên dîrokê bên veşartin dê hemû çîrokên bi hezar salan mirov xapandine ji holê rabin û mirov ji derewan rizgar bibin. Yûsiv, dîrokê ji rastîyan dûr dibîne heta wek tûrê derewan dinirxîne.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da gelek romannûsan mijarên xwe yan rasterast ji bûyerên dîrokî girtine yan jî di romanên xwe da cih dane qewimînên dîrokî. Piranîya nivîskarên dîyasporayê, gelê kurd di warê kêmasîya an jî tunebûna hişmendîya dîrokî da rexne kirine. Helbet roman bi xwe ne dîrok e lê ji dîrokê îstîfade dike. Nivîskar bi çavên îro li bûyerên do dinêrin û van bûyeran di nava ewlehî û konforekê da dinivîsin an jî bi çîroksazî bi lêv dikin.

4.2. Rexneyên li Dîroka Osmanî

4.2.1. Melîk Ehmed Paşa û Evdal Xan

Melîk Ehmed Paşa (?- 1662) di 1639an da bi rutbeya wezîrtîyê bûye walîyê eyaletê Dîyarbekirê. Di dawîya sala 1654an da bûye walîyê bajarê Wanê. Di dema walîtîya xwe da bi fermanên seraya Osmanî, berê hêzên di bin emrê xwe da ser Mîrektîya Bedlîsê û qesra Evdal Xanê Mîrekê Bedlîsê hedimandîye. Siltanên Osmanî di seferên xwe da hêzên mîrektîyên kurdan jî bi kar tanîn lê dema nêrîn ev mîrektî xwedî bihêz dibin û dê rojek bê da'wa serxebûnê bikin. Otorîteya navendî, xwest ku dawî li van mîrektîyan bîne.

Di romana Jan Dost, *Mîrname*yê da kiryarên walîyê Wanê Melîk Ehmed Paşa tê rexnekirin. Kesekî bi navê Emerê Xeznedar dibêje ku *"Melik Ehmed Paşa walîyê Wanê hawirdorê bajêr dorpêç kiribû û Qesra Evdal Xan talan dikir."*[767] Zalim û

---

[765] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 53.
[766] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 99.
[767] Dost, *Mîrname*, r. 31.

xedarên ku koşk û qesir talan dikirin bi talanê tenê nedihatin ser û kesên berpirsyar jî ya dikuştin û yan jî bi cezayên giran ji kesên dîtir ra dikirin îbretîalem.

Di *Mîrname*yê da Jan Dost bi mîlkişandina ango çavrijandina lehengê bi navê Emerê Xeznedar, hestên mezlûmekî li hember zaliman bi çi rengîne, ji xwînerên xwe ra dişayesîne. Emer ku xeznedarê Evdal Xan bû, weha dibêje: *"Her du bistên sor di bîbikên çavên min de kirin çîzînî û min nema ber xwe dît."*[768] Vebêjê Jan Dost, çanda zordarîyê ya otorîteya Osmanî bi minaka Melîk Ehmed Paşa bi awayekî tund rexne dike û wî wek hevkarê zordarîya dewleta Osmanî nîşan dide.

4.2.2. Sefera Rewanê û Siltan Mûradê IV.

Sefera Rewanê di *Mîrname*ya Jan dost hatîye rexnekirin. Berîya ku em cih bidin rexneyên Jan Dost, em derheqê meseleyê da guh bidin gotinên dîroknasê tirk Prof Halil İnalcık (1916-2016) Înalcik, derheqê kiryarên Siltan Mûradê IV. (1623-1640) da weha dibêje: "Di Sefera Rewanê da Siltan Mûrad, bi tundî tevgerîya. Her kes ji ber îdamên Siltan Mûrad di nava dehşetê da bû." [769] Li gor agahîyên ku İnalcık dide dorpêçkirina Keleha Rewanê di 8ê tebaxa 1635an da bi girtina kelehê bi dawî bû. İnalcık, destnîşan dike ku: "Piştî fetha Rewanê Siltan Mûrad, herêm heta Tebrîzê yaxme û talan kir." [770]

Di romana *Mîrname*yê da Jan Dost ji devê kesekî bi navê Recebê terzî ku tevlî Sefera Rewanê bûbû, rexneya cîhada ekber dike ku Siltanê Osmanîyan di seferên xwe da îlan dikirin û bi hezaran kurdên musluman ji bo şerbeta şehadetê vexwin an jî bibin xazî tevî xezayê dibûn. Recebê Terzî dibêje *"Min nas kir ku cîhada ez ji bo wê di van çol û kerbelan re derketime, cîhada derewîn û sexte ye."*[771] Bi gotinên cîhada derewîn Jan Dost, mirina di ber serkeftin û fethên xelkê da bi vegêraneke îronîk rexne dike.

---

[768] Dost, *Mîrname*, r. 35.
[769] Halil İnalcık, *Devlet-i Aliyye Osmanlı İmparatorluğu I*, Türkiye İş Bankası Yay., İst., 2008, r. 753.
[770] İnalcık, h. b., r. 753.
[771] Dost, *Mîrname*, r. 109.

Jan Dost, seferên Osmanî û tevgera rêvebirên êlên kurdan a di van seferan da ji devê Xalidê Çolaq rexne dike û dibêje ku kurd di şeran da mîna pez dihatin firotin û diketin bin emirê serdarên artêşa Osmanîyan. Paşayan jî berê van kurdan bidana kîjan deverê û kîjan şerî ji bêgavî kurdan, hespên xwe bi wî alîyî da dibezandin û şûrê xwe kil dikirin bêyî ku bizanibin li kîjan bazarê bi çend pûlan hatine firotin. [772]

Jan Dost bi awayekî dramatîk rastîya şer li ber çavan radixe û ji devê Xalidê Çolaq dibêje ku *"Min ew nekuştibûya min ê ji ku zanibûya ew jî kurmanc e!"*[773] Jan Dost bi van gotinan destnîşan dike ku di seferên Osmanîyan da carinan kurdên ku hevûdin nasnedikirin dihatin hember hev. Kurdan hevûdin dikuştin û dibûn qatîlên birayên xwe ango al û dewlet ên xelkê û cendekên bixwîn, para kurdan bûn. Sefera Rewanê ji alîyê nezanîya kurdan û mizawirîya siltanên Osmanî ve hatîye rexnekirin.

4.2.3. Siltan Evdilmecîd

Siltanê Împaratorîya Osmanî (1823-1861) yê 31. Siltan Evdilmecîd di dewra Tenzîmatê da li ser hikim bû. Mustafa Reşit Paşa (1800-1858) di dewra wî da li Parka Gulxaneyê ya Stenbolê bi navê *Gulhane-i Hattı Humayun,* Fermana Tenzîmatê (1839) li hember girseyeke mezin xwend û ev ferman, di dîroka Osmanîyan da bû destpêka merhaleyeke nû. Siltanê vê dewrê Evdilmecîd bi jîyana xwe ya taybet bal dikêşe. Meyla wî ya zewq û sefayê di romana Mehmed Uzun a *Hawara Dîcleyê* da bûye mijara rexneyê. Portreya ku Mehmed Uzun ji bo Siltan Evdilmecîd dişayesîne portreyeke neyênî ye. Li gor vebêjê Uzun, Siltan Evdilmecîd doxînsistekî bala wî hertim li ser carîyeya û wexwarina araqê ye. Mehmed Uzun bi rêya vebêjê xwe dibêje ku Mustefa Reşit Paşa (1800-1858) seray û karê dewletê bi rêve dibir û Siltan Evdilmecîd jî di nava kêfê da bû. Uzun van agahîyan bîlasebeb nade. Armanca wî mixabinîya xeftanmaçîkirina Mîrê Cizîra Botan Bedirxan Paşa yê ku piştî têkçûyîna Mîr, seremonîyeke bi vî rengî li seraya Osmanîyan hatibû lidarxistin û Mîrê Botan, bêgav mabû ku xeftanê Siltan Evdilmecîd, ramûse. Uzun vê bûyerê bi mixabinîyeke kûr destnîşan dike û vê bêrêzîyê, bi navgînîya vebêjê xwe rexne dike. *"Siltan Evdilmecîd (...)Mîr ku di dewsa bavê padîşah de bû çûbû xeftanê padîşahê xort ku li*

---

[772] Dost, *Mîrname*, r. 115.
[773] Dost, *Mîrname*, r. 119.

ser textê xwe rûniştî bû û xwe xwar kiribû, xeftan ramûsîbû."[774] Mehmed Uzun, pergala nû ya dewleta Osmanî ku wek Tanzîmatê binavkiribûn ji alîyê sîyasî ve rexne dike ku tu cîyawazîya hêzên rêvebirîyê bi xwe ra neanîye û vala ye. *"Siltanê Osmanî Ebdulmecîd, bi navê Fermana Tanzîmatê fermanek îlan kiribû."*[775] Fermana Tanzîmatê ji bo kurdan tiştekî nû neanîye û ev ferman li hember dewletên Ewropayê wek nîşanadayîna daxwaza nûjenbûnê dikare bê şîrovekirin.

Jan Dost di romana *3 gav û 3darekê* da behsa mecîdîyeyan dike. Jan Dost bi boneya mecîdîyeyekî, Siltan Evdilmecîd bi bîr tîne û ji devê kesekî bi navê Xidirê Botî dibêje "Nerehmetîyê Siltan Evdilmecîd" Ango rehmetê jî layiqî vî padîşahê nabîne.[776] Siltan Evdilmecid, bi serxweşîya xwe û ji alîyê rêvebirina dewletê ve bi fêmkorîya xwe hatîye rexnekirin. Sedemek cihdayîna rexneya Siltan Evdilmecîd jî amadekirina xwîneran a ji bo rexnekirina Mîr Bedirxan e.

4.2.4. Qetlîama Keldanî û Nastûrîyan

Mîrê Cizîra Botan Mîr Bedirxan (1806-1869) li herêma xwe desthilatdarekî otonom bû. Baca xwe dida dewleta Osmanî û di şeran da ji dewletê ra şervan dişandin. Di nav sînorên îqtîdara wî ya otonom da asûrî û nastîrî jî hebûn. Ev her du civak ji alîyê bawerîyê ve mesîhî bûn.

Mîr Bedirxan "Di sala 1828an da ji bo şerê rûs û tirkan şandina şervanan red kir û li hember Stenbolê xweserîya xwe îlan kir. Ji bo ku asûrî û nastûrî bacê nedin Mîr Bedirxan gelek dewletên rojavayî bi qenala mîsyoneran gelê asûrî û nastûrî li hember Mîr Bedirxan sor kirin."[777] Martin Van Bruinessen dibêje "Di sala 1848an da nastûrîyên li devera Tîyarî, cara ewil baca xwe ya salane nedan şîrîkê Mîr Bedirxan Begê Hekarîyan. Hêzên leşkerî yên eşîretê çûn ser gelên nastûrîyan û gelek nastûrî hatin qetilkirin."[778] Lêkolerê ermenî Arshak Safrastîan îdîa dike ku di komkujîya

---

[774] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 283.
[775] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 149.
[776] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 62.
[777] Senar Turgut, *Mezopotamya'da Kürt Uygarlık Tarihi*, Belge Yayınları, İstanbul, 2011, r. 61.
[778] Martin Van Bruinessen, *Kurdistan Üzerine Yazılar*, Wer: Kolektîf, İletişim Yayınları, İstanbul, 2010, r. 114.

1843an da qederê 10.000 asûrî hatine kuştin.[779] Ev bûyer bû sedema tîrên xezebê yên Osmanîyan bikişe ser Mîrektîya Botan.

Di dema mîrektîya Cizîra Botan da Mîr Bedirxan Paşa (1806-1869) bi hinceta nastûrî û keldanî hin bacên xwe nadin, bi ser keldan û nastûrîyan ve çû û gelek ji wan kuştin. Ev kiryara Mîr Bedirxan Paşa, wek qetlîama keldanî û nastûrîyan derbasî rûpelên dîrokê bû. "Xirîstîyanên nastûrî ku bi eslê xwe samî ne mensûbê dêra katolîk in, piştî xebatên mîsyonerên ku di sedsala 14an da hatibûn herêmê, bawerîya xwe ya dîofîzît nestûrî terikandin û katolîkî hebandin û bi Dêra Katolîk a Romayê ve hatin girêdan ji wan ra keldanî tê gotin. (…) Navenda keldanîyan a patrîkîyê berê Dîyarbekir bû, di sala 1830yî da bar kirin Mûsilê, di 1947an da jî bar kirin Bexdadê. Şaxê keldanîyan ê rojhilat, wek zimanê ayînê, suryanî bi kar tînin." [780]

Derheqê bûyera nastûrî û keldanîyan da Senar Turgut dibêje ku Mîr Bedirxan di sala 1828an da ji bo şerê rûs û tirkan şandina leşkeran red kir û li hember Stenbolê serxwebûna xwe îlan kir. Turgut, destnîşan dike ku bi sorkirina dewletên Ewropî ku xirîstîyanan, bacdayîna li Mîr Bedirxan red kirin, Mîr Bedirxan, li ser civaka Kurdistanê ya xirîsyanan, qetlîam pêk anîn.[781] Mehmed Uzun di *Hawara Dîcleyê* da li ser vê meseleyê disekine û vê qetlîamê ji devê vêbêj-lehengê xwe rexne dike. Li gor wî, mirovên mirî li ber derîyên malan bi derbên şûr an jî tivingan ketibûn. [782] Dîmenên ku Uzun, kite bi kite dişayesîne, kiryarên artêşa Mîr Bedirxan li ber çavan radixe. Li gor vê şayesa bixof kiryarên hêzên Bedirxan Beg, di dirûvê qetîamekê derdikeve pêşberî me ku ev qetîam bi plan û proje pêk hatîye.

Mehmed Uzun, piştî qetlîama keldanî û nastûrîyan bi navgînîya Dengbêj Biro, encamên vê bûyera ku bi şûrê kurdan pêk hatibû rexne dike. Estera ku keçeke xirîstîyan bû ji tirsa travmayeke kûr derbas dike û nema dipeyîve. Biro, ditirse bi wê ra bi kurdî biaxive û wê rojê bîne bîra wê û binehişê wê aktîve bike.[783] Dengbêj Biro, gotinên kurdî û sewta zimanê kurdî ku bi vê zilmê bûne bangewazîya kuştin û perçekirinê, bi tundî rexne dike. Çawa şerqînîya şûran û sewta zimanê kurdî ji heman

---

[779] Arshak Safrastian, *Kurd ü Kurdistan*, Wer. Ergin Opengin, Avesta, İstanbul, 2007, r. 65.
[780] İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler*, Nubihar, İst., 2017, r. 250.
[781] Senar Turgut, *Mezopotamya'da Kürt Uygarlık Tarihi*, Belge Yayınları, İst., 2011, r. 60-61.
[782] Uzun, *Hawara Dîcleyê*, r. 296 .
[783] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 20.

çavkanîyê derdiketin? Mehmed Uzun, gelekî di bin bandora qetlîama keldan û nastûrîyan da maye û di tevna *Hawara Dîcleyê* da cihekî giring daye rexneyên ve meseleyê. Vebêjê Uzun, destnîşan dike ku *"Qetla keldanan wacib bû, herçî kesê ku keldanek bidîta diviya ew bikuşta."*[784] Ferman, bi mora Mîr Bedirxan Paşayê Botî (1806-1869) hatibû derxistin û li gor vêbêjê Uzun, tu rizgarbûna keldan û nastûrîyan ji şûrê Mîrê Kurdan tune bû. Bûyera nastûrî û keldanîyan di romana kurdî da wek xeletîyeke dîrokî hatîye nirxandin û Mîr Bedirxan Paşa ji ber vê yekê hatîye rexnekirin.

4.2.5. Mîr Bedirxan Paşa û Osmanî

Mîr Bedirxan Paşa (1806-1869) di sala 1821ê da hate serê Mîrektîya Cizîra Botan. Li gor Dr Bletch Chirguh piştî Şerê Nîzîpê, Mîr Bedirxan ji bo ku ji kêmhêzîya tirkan îstîfade bike lez da amadekarîyên xwe û di demeke kurt da bandora hikmê xwe ji Wanê heta Mûsil, Saûcbûlak, Urmîye û Dîyarbekirê berfireh kir. [785] Mîr Bedirxan di sala 1847an da li hember îqtîdara Osmanîyan serî hilda û piştî şerê 8 mehan Mîrê Botan ji ber sedema îxaneta birazîyê xwe Yezdîn Şêr şikest xwar. Yezdîn Şêr ji bo berjewendîyên xwe yên sîyasî bi Osmanîyan ra bû yek û di guranîya şer da derbasî hêla Osmanîyan bû.

Dr Bletch Chirguh, destnîşan dike ku dewleta Osmanîyan ji bo ku bi hêzên Mîr Bedirxan ra şer bikin di bin qumandarîya Mareşal Osman Paşa da artêşek şand herêmê. Piştî ku birazîyê wî Yezdan Şêr tevî hêzên Osmanîyan Cizîra Botan îşxal kir Mîr Bedirxan, xwe li Keleha Eruhê girt. Hêzên Yezdîn Şêr û Osmanîyan Keleha Eruhê dorpêçkirin û berxwedana Mîr Bedirxan 8 mehan domand. Dr Bletch Chirguh diyar dike ku "Mîr Bedîrxan, malbata wî, 14 xanimên wî, 42 kur û 21 keçên wî, nefyî Girava Gîrîtê bûn. Mîr û malbata xwe deh salan li vê deverê man."[786] Mîr Bedirxan "Di sala 1868an da li Şamê wefat kir.[787] Mehmed Uzun, cildê II. yê *Hawara Dîcleyê* ji serhildana têkçûyî û nefîya Mîr Bedirxan û malbata wî ra veqetandîye. Lehengê romanê Biroyê Dengbêj, serpêhatîyên malbata Bedirxanîyan ji xwîneran ra vedibêje. Uzun, ji devê Biroyê Dengbêj bi şêwaza destanî, dema

---

[784] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 23.
[785] Bletch Chirguh, *Kürt Sorunu,* (Çev.) Nîhat Nuyan, Avesta, Îstanbul, 2009, r. 34.
[786] Senar Turgut, *Mezopotamya'da Kürt Uygarlık Tarihi*, Belge Yayınları, İstanbul, 2011, r. 61.
[787] Chirguh, h. b., r. 38-39.

serhildanê bi hûrgilî vedibêje. [788] Şerê di navbera hêzên çekdar li alîyekî kuştin û zilma li ser sîvîlan, berê pênûsa Uzun dide rexneyên tûj. Mal şewitandina tevî mirovan, nîşaneya qesd û xerezeke mezin e. Piştî têkçûyîna Mîr Bedirxan, dewleta Osmanîyan hin soz dabûn Mîrê nû Yezdîn Şêr lê li gor vebêjê Uzun, ev soz jî dê pûç derketina. Biroyê Dengbêj, van sozên Osmanîyan dişibîne pelê dara tûyê yên payizî ku ev pel bi surra bayekî sivik ji şaxên xwe diweşin û belawela dibin.[789] Vebêjê Uzun, ji ber tunebûna feraseta dîrokî, kurdan rexne dike.

Jan Dost di *3 gav û 3 darek*ê da tevna romana xwe her çi qasî li ser mijara Serhildana Şêx Seîd (1925) hûna be jî dîroka kurdan a nêz jî rexne dike û Serhildana Mîr Bedirxan bi bîr tîne. Di romanê da leîtmotîveke watedar heye ku çavkanîya xwe ji anekdoteke biçûkanîya Şêx Seîd digire: Dewrêşekî bi navê Xidirê Botî, gwîza xwe diavêje ser qûbeya camîyê. Heta dawîya romanê ev leîtmotîv gelek caran bi remzê badilhebabûna ked û rijandina xwîna di ber serhildanê da hatîye dubarekirin. *"Lê aaaaax ez çi bikim! Sûc ne sûcê gwîzê ye, sûcê qûbê ye loooo."*[790] Gwîza biçûk, hewldana serxebûnê, qûbe jî mezinahîya hêzên muqtedîr temsîl dike. Jan Dost, ji devê vebêj-lehengê xwe bi gotineke mecazî hem rexneya Osmanîyan dike hem jî li hember kiryarên Osmanîyan, kiryarê rêvebirên kurdan rexne dike.

Mîr Bedirxanê ku di alozîya şerê serxwebûnê da bû û berîya serkeftineke cîdî pereyên ku li ser wan navê wî hebûn darbkirin, dibe mijara rexneyên Jan Dost ku bi gotinên Xidirê Botî tîne ziman.[791] Ev kiryara Mîr, wek gotina "elhemdullaha berîya têrxwarina şîvê" ye. Dost, bi vê rexneyê di kar û barê sîyasetê da giringîya cihê sebir û tebatê nîşan dide.

Dîroka mala Bedirxanîyan, dîroka sirgûn û dîyasporayê ye. Zarok û nevîyên Bedirxanîyan jîyana xwe li dîyasporayê bihurandin. Zarokên wî Mîkdat Mîthat, Mîr Celadet, Mîr Kamûran bi xebatên xwe yê rojnamegerî, kovargerî û hin çalakîyên çandî hûnerî û hetta sîyasî ji nifşên nûjen ên entelîjansîyaya kurdan tên hesibandin.

---

[788] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 258.
[789] Uzun, *Hawara Dîcleyê II*, r. 366.
[790] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 61.
[791] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 63.

4.2.6. Partiya Îttîhad û Teraqqîyê

Cemîyeta ku navê wê Îtîhad û Teraqqî ye wek rêxistineke veşartî ava bûye di navbera salên 1908 û 1918an da di sîyaseta împaratorîya Osmanî da çalak e. İsmail Hami Danişmend (1889-1967) derheqê avabûna Îttîhad û Teraqqîyê da dibêje ku "Teşegirtina Îttîhad û Teraqqîyê ewil bi navê Teraqqî û Îttîhadê di sala 1890î da li Stenbolê li sazîya Tibbîyeya Leşkerîyê dest pê kir. Avakarên vê cemîyetê Dr Abdullah Cevdet (1869-1932), İshak Sükuti (1868-1902) û İbrahim Temo (1865-1945) ye. Ev cemîyeta veşarti ya ku armanca wê bidestxistina meşrûtîyetê bû di demeke kurt da ji Tibbîyeya Leşkerîyê derket û li bajêr, meheleyan û hetta sazîyên fermî belav bû, şûbeyên wê çêbûn." [792] Vê cemîyeta nixumandî di nava dewletê da dewleteke veşartî saz dikir û hewl dida ku rêvebirîya dewleta Osmanî têxe destê xwe.

M. Şükrü Hanioğlu (1955-) destnişan dike ku Jön Türk an jî rêvebirîya Îttîhad û Teraqqîyê piştî sala 1908an îqtîdar bi dest xist û di navbera 1878-1908an da bûn avakarê hemû tevgerên mixelefeta sîyasî ya wê demê.[793] Herweha qadroyên vê cemîyetê Cengê Cîhanê ya Yekem jî bi rê ve birin û bûn sedemên hilweşîneke giştî.

Mehmed Uzun di romana *Bîra Qederê* da rola Îttîhad û Teraqqîyê di sîyaseta kurdî da dinirxîne û padîşahê wê demê Siltan Mihemed Reşad (1844-1918) rexne dike. Li gor vêbêjê Uzun, Siltan Reşad di destê Îttîhadçîyan da bûbû pêlîstok û wan çawa bidirûtina Siltan, wisa li xwe dikir. Mehmed Uzun, cih dide rexneya Îttîhadçîyan jî. *"Tirk, tirkî, tirkîtî ala wan, vegirtina hemû Asyayê welatê bav û kalên tirkan armanca wan, qirkirina gelên din ên Osmanî mirazê wan bû.."* [794] Vebêjê Uzun, Îttîhadçîyan ji alîyê neteweperwerîya radîqal ve rexne dike.

Mehmed Uzun, destnîşan dike ku Îttîhadçîyan, metoda têkoşîna xwe li ser kîn û nefretê ava kirine û ji xwînrijandinê fêm dikin. Gotineke kurdan a gelêrî heye: Kurd dibêjin xwîn bi xwînê nayê şuştin. Vebêjê Uzun vê gotina gelêrî bi bîr tîne û

---

[792] İsmail Hami Danişmend, *İzahlı Osmanlı Tarihi Kronolojisi*, C., 4, Türkiye Yay., İst., 1972, r. 183.
[793] M. Şükrü Hanioğlu, *Bir Siyasal Örgüt Olarak Osmanlı İttihad ve Terakki Cemiyeti ve Jön Türklük (1889-1902)*, İletişim Yay., İstanbul, 1985, r. 75.
[794] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 100.

dîyar dike ku Îttîhadçî, dixwazin ku xwînê bi xwînê bişon.[795] Jan Dost jî di meseleyê kîn û nefretê da wek Mehmed Uzun difikire û di romana *3 gav û 3darek*ê da hem kîna Siltan Evdilhemîdê II. (1842- 1918) hem jî kîna Îttîhadçîyan rexne dike. Jan Dost, ji devê vebêjê xwe, endamên Cemîyeta İTCyê dişibîne gurên har. [796] Vebêjê Dost jî bi van gotinan kiryarên vê cemîyetê bi bîr tîne û nijadperestîya Îttîhadçîyan bi tundî rexne dike.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da ji ber peywenda mijarên dîrokî Mehmed Uzun û Jan Dost di romanên xwe da cih dane rexneya Îttîhad û Teraqqîyê. Ev rêxistin, bi nijadperestî û kiryarên xwe yên dervezagonî tê şayesandin.

4.2.7. Cenga Cîhanê ya Yekem (1914-1918)

Cenga Cîhanê ya Yekem di navbera salên 1914 -1918an da qewimîye. Bi navê Îttîfaq û Îtîlafê du blokên şer pêk hat û gelek dewletên mezin û biçûk di nava van blokan da hatin hember hev. Brîtanya, Fransa û Rûsya navenda dewletên Îtîlafê teşkîl dikir. Almanya, Avusturya-Macarîstan û Dewleta Osmanî jî navenda bloka Îttîfaqê pêk anîbû. "Di sala 1914an da li ezmanan ewrên şer digerîyan. Li Almanya Pan Germenîst, li Rûsya Slavîst, li Firansa Tolhildêr, li Îtalya Îrredendîst, li Brîtanya Împaratorîhezan Ewropa anîbûn ber derîyê şer."[797] Dewleta Osmanî, her çi qasî di destpêka şer da pozîsyona xwe ya bêalî îlan kiribû jî pişt ra xwe di nava şer da dît.

Derheqê rewşa Împaratorîya Osmanî ya Cenga Cîhanê ya Yekem da Ayşe Hür destnîşan dike ku "Mareşalê Alman Helmuth Karl Bernhard Von Moltke (1800-1891) ji mewqîdaşê xwe yê Avusturyayî Conrad Von Hötzendroff ra weha nivîsîbû: Tirkîye ji alîyê leşkerî ve sifir e. Raporên heyeta me ya leşkerî bi temamî hêvîşikên e. Arteş di rewşeke pir xirab da ye. Berê ji Tirkîyeyê ra digotin 'mêrê nexweş' divê niha em bibêjin "mêrê ber mirinê" Êdî hêza wê ya jîyanê nemaye û di ber sêkeratê da ye. Heyeta me ya leşkerî dişibe heyeta bijîşkên li ber nexweşekî di ber mirinê da ye." [798]

---

[795] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 112.
[796] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 124.
[797] Ayşe Hür, *Öteki Tarih I Abdülmecid'den İttihad ve Terakki'ye*, Profil Yay., İst., 2013, r. 195.
[798] Hûr, h., b. r. 199.

Tevî rewşa xirab a Osmanîyan, Almanya bi lîstikeke sîyasî ala Osmanîyan kişande keşîtîyên Gooben û Breslau û van keştîyan, benderên rûsan bombebaran kirin. Dewleta Osmanîyan îlan kir ku keştî sitendine û tevî şer bûne. Navê keştîyan Yavuz û Mîdîlî danîn. "Di 11ê mijdara 1914an da piştî îlankirina cengê ya li dewletên Îtîlafê mîsyonerê Almanya, banga cîhadê li nazirê herbîye Enwer Paşa 1881/1882-1922) û nazirê daxilîye Cemal Paşa (1872-1922) kir. (…) Îttîhadîyan, zor dan ser Siltan Reşad, talîya talî Şeyxulîslam Mustafa Xeyrî Efendîyê Urgubî (1867-1922) di 14ê mijdara 1914an da fetway-î şerîyeyeke ji pênc fetwayan pêk tê, derxist."[799] Ango Dewleta Osmanî, "cîhada ekber" îlan kir û kete şerê ku dê "mêrê nexweş" binax bibe û li ser mîrateya vî mêrê nexweş dê gelek gengeşî derkeve.

Mehmed Uzun di *Bîra Qederê* da pêkutîyên Îttîhadîyan ên li ser Siltan Reşad û îlankirina "cîhada ekber" ku tenê ji bo gotinên Xweda dikaribû îlanbibûya lê ji bo bi cihanîna daxwaza almanan hatibû îlankirin, bi awayekî endîrekt rexne dike.[800] Vebêjê Uzun, mercên cengê ku dewlet anîye ber îflasê û her tişt serobino kirîye jî bi hûrgilî rexne dike. Ji çapkirina sed û pêncî mîlyon lîreyê ku bêhember bû bigire heta îdareya xirab û tunebûna yekîtî, azadî û însanîyetê gelek tişt dibin mijara rexneyên vebêjê Uzun.[801] Dagirkirina Stenbolê ya ji alîyê dewletên Îtîlafê jî wek xaleke giring tê rexnekirin.

Di romana *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* da Mehmed Uzun, Cenga Cîhanê ya Yekem ji alîyê encamên ku bandor li kurdan kirîye bi navgînîya Ehmedê Fermanê Kîkî, rexne dike. *"Şerê malkambax ê cîhanê bi sed hezaran kurd birin gorê."*[802] Sed hezaran kurdên ku ji bo "cîhada ekber" berê xwe dane enîyên şer û venegerîyan da ku bigihêjin mertebeya şehîdîyê. Vebêjê Uzun, Cenga Cîhanê ya Yekem dişibîne hûtekî ku nefesa mirovan çikandîye. Li gor vebêjê Uzun, vê herba ûmûmî pişta kurdan şikandîye lewra welatê kurdan kirîye çar parçe ku her çar parçe hertim di nava alozîyê da ne. Vebêjê Uzun, herî zêde jî heyfa xwe bi wêrankirina welêt û ji holêrakirina navê kurd û Kurdistanê tîne.[803] Ji ber ku piştî Peymana Lozanê (Lozan Sulh Muahedenamesî-1923) xaka Kurdistanê ku bi Peymana Qesr-î şirînê (1639) ra

---

[799] Hür, Öteki Tarih I, Profil, İst., 2013, r. 205.
[800] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 105.
[801] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 119.ên
[802] Uzun, *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê*, r. 10 .
[803] Uzun, *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê*, r. 12.

bûbû du parçe êdî çar parçe bû û her parçeyekî wê di nava sînorên dewletekê da mabû. Di Cenga Cîhanê ya Yekem da artêşa Osmanîyan li Sarîqamîşê li Çîyayê EllahûEkberê şikestineke mezin xwaribû û ji ber seqemê bi deh hezaran leşker qefilî bûn. [804]

Jan Dost di *Mijabadê* da mirina leşkerên Osmanî ku ji gelek miletan bûn, ji devê Badînê Amêdî, dişibîne windabûna sitêrkên roj li wan hilê û ji nişka ve berze bibin. [805] Ew leşkerên ku bi rastîya şer ve rûbirû mane û şer, ji nişka ve jîyana wen ji dest wan girtîye bi berzebûna steran ve hatîye şibandin. Ji bilî metafora "stêrên berzebûyî" Jan Dost leşkerên mirî, dişibîne tûtina qelûna Enwer Paşa ku dişewîte û dibe ar û xwelî. [806] Ev metafora tûtinê jî bi zaneyî hatîye bijartin. Tûtin amûreke kêfê ye. Li gor vebêjê Jan Dost, mirina leşkeran zewqê dide Enwer Paşayê xwedî egoyeke qelew. Jan Dost bi gotina Kalikê Badînê Amêdî, bandora şer a li ser derûnîya leşkeran weha tîne ziman: *"Ji roja ku ez ji sariqamîşê reviyame hîn ez bi tirkî neaxivîme!"* [807] Ji ber nefreta kalikê Badîn, ku li hember bûyerên qewimîne hîs dike, Kalikê Badîn, nema dixwaze bi wî zimanê ku fermana mirina leşkeran hatîye qêrîn, biaxive. Lewra deng û bêjeyên vî zimanî (tirkî) tenê mirin û wehşetê tîne hişê wî.

Jan Dost, rêbaza civandina ji bo şer ya leşkeran, bi gotinên berpirsyarê Jînê Nûrî Emîn, rexne dike û destnîşan dike ku *"Cendirmeyan weke darkerên êzingan ji bo ardû bicivînin xort bi qeflan digirtin, serê singuyan dixistin newqên wan û ew diajotin eniyên bêveger.* [808] Li gor Jan Dost "cîhada ekber" jî tena serê xwe bikêr nehatîye û dewleta Osmanî ji bo arîkarîya mitefîqên xwe bike berê ciwanên xwe yên xama daye şerê mirinê.

Cenga Cîhanê ya Yekem, bi encamên xwe yên texrîbkar di romana kurdî da cih girtîye. Mehmed Uzun û Jan Dost vî şerê ku bi sed hezaran mirov tê da jîyana xwe winda kirine ji perspektîfa kurdan ve dinirxînin. Her du romannûs jî di wê bawerîyê da ne ku Osmanîyan bi gotara cîhadê kurd xapandine û kurd di vê şerê mezin da wek kerîyên pez ber bi kêrê ve hatine kişandin.

---

[804] Şevket Süreyya Aydemir, *Makedonya'dan OrtaAsyay'a Enver Paşa* III. cild, Remzi Kitabevi, İst., 1972, r. 26.
[805] Dost, *Mijabad*, r. 54-55.
[806] Dost, *Mijabad*, r. 56.
[807] Dost, *Mijabad*, r. 181.
[808] Dost, *Mijabad*, r. 65

4.2.8. Peymana Agirbesta Mondrosê (1918)

Ev peyman di 30ê çirîya pêşîn 1918an da di navbera "Serfermandarê Brîtanyayê Sir Somerset Arthur Gough Calthorpe (1864-1937) û li ser navê dewleta Osmanîyan wezîrê parastinê Raûf Orbay (1881-1964), misteşarê karên derve Reşat Hîkmet Beg (1865-1920) û ji serfermandarîya tirk Yarbay Sadullah Güney (1889-1945) da hatîye îmzekirin." [809] Hin xalên agirbesta Mondrosê kurd eleqedar dikirin. Derheqê meseleyê da Suat Zeyrek îdîa dike ku di Mitarekeya Mondrosê da hin xalên rasterast li ser kurdan ku elametên midaxaleya leşkerî dihewînin hene."[810] Kâzım Karabekir (1882-1948) ji destnişan dike ku "Xala Mondrosê ya 24an ku dibêje: "Di wîlayetî sîtî da tevlihevîyek derkeve mittefîq, mafê girtina hin wîlayetan di dest xwe da dihêlin" ji artêşa Brîtanya ku berê xwe daye herêmên rojhilat ku kurd lê dijîn wek vexwendinekê ye." [811]

Mehmed Uzun di *Bîra Qederê* da encamên Peymana Mondrosê ku gelê Osmanîyan xistîye bin barekî mezin û bûye sedema ku xelk ji bilî şehîdên xwe têkevin heyra zikên xwe yên birçî bi gotinên Mewlanazade Rifat Beg (1869-1930) ku xwedîyê rojnameya Sebestî ye û rojnamevanekî lîberal e, rexne dike. Mewlanazade Rifat Beg, gazinan dike ku piştî agirbesta Mondrosê ji ber krîza aborî ya mercên şer, xelk, di halekî xirab da bûn, Ev mexdûrên sîvîl ji bo nanekî bi sed dirhemî bikirin diketin dorê. Mewlanazade Rifat, fermana tekalîf-î mîllîye jî bi bir tîne û dibêje kesên ku xwedîyê zexîreyan bûn, rêvebirîyê dest datanî ser zexîrêya wan. [812]

Jan Dost di *3 gav û 3darekê* da encama Mondrosê ya sîyasî ku axa Osmanîyan mîna "gayekî pîr" di nava dewletên îtîlafê da parvekiribû bi hûrgilî dinirxîne û destnîşan dike ku kadro û sazîyên împaratorîyê nema karibûn bi usulên kevin li gor mercên serdema modern tevbigerin û *xewnên împaratorîyeke têkçûyî* pêk bînin.

---

[809] Seha L. Meray, Osman Olcay, *Osmanlı İmparatorluğunun Çöküş Belgeleri*, Ankara Üniv. Basımevi, Ankara, 1977, r. 1.
[810] Suat Zeyrek, *Milli Mücadele Sürecinde Türk- İngiliz Rekabeti: Kürt Sorunu*, Türkiyat Mecmuası, C.23/Bahar, 2013. r. 114.
[811] Kâzım Karabekir, *İstiklal Harbimiz*, Mert Yayıncılık, İstanbul, 1988, r. 4.
[812] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 119.

Jan Dost, ji devê vebêjê xwe dide zanîn ku Siltan Wahdettîn (1861-1926) li seraya Yildizê hîn jî li benda Mustafa Kemal e ku dewletê ji wî ra rizgar bike û hikmê wî yê bav û kalan ji nûve saz bike. [813] Lê împaratorî têk çû û hêvîyên Siltan Wahdettîn pûç derketin Jan Dost, dilsafîtîya Siltan Wahdettîn û bawerîya wî ya bi Mustafa Kemal rexne dike. Lewra tu tiştek wek berê nabe.

4.2.9. Bûyera Tehcîrê (1915)

Ermenî di nava Osmanîyan da neteweyeke xeyrîmuslîm e ku bi salan wek "miletî sadiqa" dihate binavkirin. Li gor Prof İbrahim Tellioğlu piştî Herba 93yan ango şerê rûs û Osmanîyan yê 1877-1878an Peymana Ayastefanos (1878) û piştî wê Peymana Berlînê (1878) hate îmzekirin û bi vî awayî pirsgirêka ermanîyan derbasî qada navneteweyî bû.[814]

Di pêvajoya Cenga Cîhanê ya Yekem da di 27ê gulana 1915an da Împaratorîya Osmanî bi navê "Qanûna Tehcîrê" qanûnek derxist. "Meclisi Vukela di 30ê gulana 1915an da biryara Nezareta Daxilîyê û pratîka wê misoger kir." [815] Di 1915an bi sed hezaran ermenî di nava mercên şer û seqema zivistanê da ber bi xaka Sûrîyeyê ve ajot. Enwer Paşa û hevalên wî yên Cemîyeta Îttîhadê, organîzasyona vê koça girseyî ya ermenîyan dane destê sê Îttîhadçîyan: Dr Bahaddîn Şakir (1874-192), Memdûhê Mitasarif ê Erzinganê û Walîyê Sêwasê Muammer.[816]

Li gor Taner Akçam: "Rêvebirên Îttîhad û Teraqqîyê wek plançêkerê bûyerê di mijara nehiştina belgeyên nivîskî da têra xwe hûrbijer tevgerîyane."[817] "Di dema bûyera Tehcîrê da li gor reqemên Osmanîyan nifûsa ermenîyan a li Enadolê 1.3 milyon li gor qeydên dêrê 2.1 milyon e. (…) Behsa nêzî milyoneke ermenî dê ne xelet be." [818] Murat Bardakçı di Rojnameya Hürriyetê, jimara 26ê avrêlê ya 2006an da destnîşan dike ku li gor Qanûna Tehcîrê 924 hezar û 158 ermenî neqlî deverên din

---

[813] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 127.
[814] İbrahim Tellioğlu, *Türk Ermeni İlişkileri ve 1915 Olayları*, Türk Ocakları Trabzon Şubesi Yayınları, Trabzon, 2015, r. 32.
[815] Kürşat Selim Şenol, *1915 Ermeni Tehciri Sosyo-Ekonomik Boyutlarıyla*, Berikan yayınevi, Ankara, r. 2006, r. 23.
[816] Kalusd Sürmenyan, *Harbiyeli Bir Osmanlı Ermenisi Mülazım-ı Sâni Sürmenyan'ın Savaş ve Tehcir Anıları*, (Çev.) Yaşar Tolga Cora,Tarih Vakfı Yurt Yayınları, İstanbul, 2015, r. 52.
[817] Taner Akçam, *Ermeni Meselesi Hallolunmuştur Osmanlı Belgelerine Göre Savaş Yıllarında Ermenilere Yönelik Politikalar*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2008, r. 35.
[818] Akçam, h. b., r. 65.

ê Împaratorîya Osmanî bûne.[819] "Hejmarên resmî û nîvresmî yên derbarê ermenîyên di bûyera tehcîrê da mirine yan jî hatine kuştin ji hev pir cuda ne. Bo nimûne çavkanîyên ermenîyan angaşt dikin ku di navbera 1.5 mîlyon û 2.5 mîlyon ermenî, li gor rapora komîsyona Nezareta Daxîlîye ya Osmanîyan di Cenga Cîhanê ya Yekem da 800.000, di 1928an li gor wesîqeyeke serfermandarîya Osmanîyan 800.000 ermenî û 200.000 rûm ji ber qetil û tehcîrê yan jî di tabûrên emeleyan da mirine." [820]

Mehmed Uzun di *Bîra Qederê* da ji devê vebêjê xwe ji romana ku Celadet Bedirxan dinivîse û di tevna romana Bîra Qederê da hatîye bi cihkirin, rexneyan dike. Celadet Bedîrxan, planên serdestan ên li ser qedera ermenî û kurdan lîstikên sîyasî saz dikin, rexne dike û bi awayekî aşkere dibêje: *"Belê, lo; kurd bûn, zo jî ermen… Wan zo qir kiribûn, dor hatibû loyan…"* [821] Li gor vebêj, tilîya dewletên mezin di van kuştinan da hebû.

Hesenê Metê di *Gotinên Gunehkar,* di dewreke xumam da behsa kuştina girseyî ya ermenîyan dike û kiryarên leşkerên dewletê ji devê lehengê xwe Mekrûs Efendî rexne dike. Li gor Mekrûsê ku ew bi xwe jî emenî ye, piştî ku mêr nemabûn leşker bi dora keç, jin û zarokan ketibûn û mîna sîmsarên heywanan, bi *awirên kerxaneciyan* li keç û bûkan dinêrîn da ku dest biavêjin wan. [822] Li gor van gotinan, mesele ne tenê kuştin û tehcîr bû xirabîyeke di dirûvê şakîtîyê jî li ser kar bû. Hesenê Metê vê "şakîtî"yê bi gotinên Mekrûs Efendî, weha dişayesîne: *"Çend leşkeran bi keftarî çend keç û bûkên bi pêsîr bi xwe re kaş dikirin hundirê dêrê.* [823]

Hesenê Metê li hember kiryarên ku li ser ermenîyan dihate pratîzekirin bi nêrîneke teolojîk, rexneya Xweda û Mesîh dike. Temaşekirina Xweda ya vê zilm û zorê û bêdengmayîna Xweda, bala Metê dikişîne. Vebêjê Metê, Mekrûs Efendî, dibêje ku ez ji Xweda û Mesîh xeyidî me û min fam kiriye ku dojeh jî tune ye. Piştî van gazinên tund cih dide pirseke ontolojîk. Pirsa ku Xweda çima ji însanan, zalim

---

[819] Murat Bardakçı, *"Savaş Sırasında 93 bin 88 Rum Başka Vilâyetlere Nakledildi"*, Hürriyet, 26 Nisan 2006
[820] Ayşe Hür, *Öteki Tarih Abdülmecid'den İttihat ve Terakki'ye*, Profil, İstanbul, 2013, r. 261.
[821] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 111.
[822] Metê, *Gotinên Gunehkar,* r. 89.
[823] Metê, *Gotinên Gunehkar,* r. 90.

afirandine? [824] Metê, bi vê pirsê xwînerên xwe vedixwîne nava minaqeşeyeke ku esas gengeşîya wê kanîya xirabîyê ye. Heger zilm û neheqî di dînên semawî û kitêbên wan da hatibe qedexekirin û Xweda li hember van kiryaran be, çima ew kesên zalim, bi destê Xweda tên afirandin û Xweda, zilma zaliman a li ser mazlûman temaşe dike? Heger armanc, îmtîhana însên a derheqê zalimîyê da be ew însanên ku ji vê zalimêyê ra dibin qurbanî çi sûc û gunehên wan heye? Bi van pirsan, pevçûna di navbera berhemên Xweda tê rexnekirin.

Di romana *3 gav û 3darek*ê da Jan Dost, rexneya êrîş û talanên gundên ermenîyan dike û rola Alayên Hemîdîye ku agir bi erdê xistibûn şênber dike. Vebêjê Jan Dost, dibêje ku Alayên Hemîdîye agir bi erdê xisti bûn û hew mabû qel'ana ermenîyan bînin. Li gor vebêj, zarokên serokeşîran li Stenbolê di mektebên eşîretan da fêrî qirkirina ermenîyan dibûn, şêx û melayên romî, mejîyê feqîyên kurmancan dişuştin û wan bi kîna ermenîyan perwerde dikirin.[825] Dost, bi van gotinan binesazîya sedemên bûyera tehcîrê ava dike û di vê meseleyê da rola dîn û bawerîyê derdixe pêş.

Di *Mijabad*ê da Jan Dost, bal dikêşê ser encamên dûr a tehcîrê û bi navgînîya Badînê Amêdî, behsa jineke zarokên wê çênabe dike û sedema wê bi tirsa bûyerên fermana filleyan ango qanûna tehcîrê ve girê dide û dibêje ku li hember muslumanan jî kîneke tîr di dilê ermenîyên mayî da meya bû. [826] Tevger û hêzên Taşnak û Hinçakê ku ji bo tolhildanê hatibûn avakirin jî li hember muslumanan xwe tûj kiribûn. Kalikê Badîn, Entranîk dibêje ku tevgerên Taşnak û Hinçakê ew qasî tovên kînê di dilê me ermenîyan da çandibûn ku min xwe bigihanda Mekkeyê min dê Mekke bi serê misilmaman da bihedimanda. [827]

Jan Dost, zeneetkarîya ermenîyan bi bîr tîne û ji devê kesekî balûle ku di romanê da wek Emîral Axa tê nasîn, dibêje ermenî hosteyên zîrek ê hesin bûn lê

---

[824] Metê, *Gotinên Gunehkar*, r. 93.
[825] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 122.
[826] Dost, *Mijabad*, r. 19.
[827] Dost, *Mijabad*, r. 60.

tirkan, bi *zimanê agir* berê xwe dan ermenîyan.[828] Wek tê zanîn agir, hesin dihelîne û teşeyê dide hesin. Jan Dost têkilîyeke alegorîk di navbera hesin û agir da datîne û bêjeya helandinê wek rexneyeke veşartî di nava rûpelên romana xwe da bi cih dike. Jan Dost di cihekî din ê *Mijabad*ê da ji devê kalikê Badîn, Entranîk, bi awayekî aşkere angaşt dike ku milyon û nîvek ermenî hatine kuştin û gelek jî sirgûnî welatan bûne. [829] Di van bûyeran da arîkarîya rûsan a ku ermenî di kolxozan da bi cih kirine jî dibe mijara rexneyên dîrokî.

Bûyera Tehcîrê di romanên Mehmed Uzun, Jan Dost û Hesenê Metê da tê nîqaşkirin. Rola Osmanîyan û İTCyê di vê nefîya mezin da tê şayesandin û di rêya nefîyê da mirina bi sed hezaran kesan bi rexneyên tûj tê vegotin. Rexneyên derheqê meseleya tehcîrê ji alîyê dîrokî ve mihim e lewra behskirin û hejmardayîna qurbanîyan wek naskirina vê mesleyê tê dîtin. Nivîskarên navborî, bi şayesên tehcîra ermenîyan, dixwazin ji alîyê dîrokî ve rexneyan li dewlet, civak, dîn û kiryarên rayagiştî ya wê demê bikin. Li gor nivîskaran rola gelek kes, tevger û cemîyetan di vê bûyerê da heye.

4.2.10. Peymana Sykes Picotê (1916)

Di heyama Cenga Cîhanê ya Yekem da Fransa û Îngilistan di 16ê gulana 1916an da ji bo parvekirina xaka di destê Osmanîyan a Rojhilata Navîn da peymaneke bi navê Sykes-Pîcot îmzekirin. Berîya peymanê "Ji bo rêvebirina hevdîtinan li ser navê Brîtanya, Sir Mark Sykes (1879-1919) û li ser navê Fransa, Georges Picot (1898-1981) hatibûn wezîfedarkirin. Peymana ku di navbera Sykes û Picot da hate çêkirin, temamê Sûrîye û Îraqê û qismekî mezin ê Başûrê Tirkîyeyê rasterast an jî bi awayekî nixumandî li serdestîya herêmên Fransa û Îngilistan par ve dikir." [830] Li gor Halil İnalcık, Fransa û Îngilistan bi vê peymanê hakimîyeta xwe ya li ser welatên ereban bi awayekî teqez tespît kirin.[831] Wek neteweyeke li ser xaka Rojhilata Navîn dijî, tu mafê dewletê ji kurdan ra nehat naskirin û kurd li ser xaka xwe ya qedîm ji siûda netewdewletekê bêpar man.

---

[828] Dost, *Mijabad*, r. 87.
[829] Dost, *Mijabad*, r. 118.
[830] Peter Mansfield, *Ortadoğu Tarihi*, (Çev.) Ümit Hüsrev Yolsal, Say Yayınları, İst., 2012, r. 232.
[831] Halil İnalcık, *Akademik Ders Notları* (1938-1986), Timaş, İstanbul, 2016, r. 67.

Helîm Yûsiv di *Tirsa bê Diran* da ji devê karakterekî bi navê Tûtino, kurdan dişibîne dûpişkan û dibêje ku li dora kurdan xêzê ji agir hatine çêkirin û kurd wek dûpişkan bi hev vedidin. [832] Tûtino, bi qasî ku di xêzkirina van sînoran da mihendîsîya sîyasî ya Sykes û Picot rexne dike ew qasî jî kurdan rexne dike. Li gor wî kurd, dijminên xwe ne, dibin sebebê mirina xwe.

Sykes û Picot qedera Rojhilata Navîn bi pênûsên xwe li ser kaxezan xêz kirine û miletê kurd di nava van sînorên ji agir di bin serdestîya ereb, faris û tirkan da hewl dane bijîn û nefreteke bêsînor di sînga mirovên kurd da li hember van du mêrên ewropî dikele. [833] Ev peyman, tê maneya ku dîrok tenê bi xwînê nayê nivîsîn carinan bi hubrê jî teşe digire. Helîm Yûsiv, meseleya nivîsîna dîrokê ya bi hubrê, bi zanabûnê û aqil ve girê dide. Mînaka Sykes dide û ji devê hevalê Mûsa yê zarokatîyê Qado, dibêje ku Sykes li ser êlên kurdan kitêbek nivîsîye. Bi navê *Êlên Kurdan di împaratoriya Osmanî de.* Di wê kitêbê da tê gotin ku hestên kurdan ên neteweyî tune ne. Ji bo mirov bigihêje tesbîteke wisa divê mirov kurdan heta bi êl û eşîrên wan nas bike. [834] Qado, di wê bawerîyê da ye ku ev zanîna wî ya derheqê êlên kurdan da bû sedema parçekirina xaka kurdan a di nava dewletan da. Lehengê Yûsiv, Mûsayê Qamişlokî vê yekê weha tîne ziman: *"Hetanî bi eşîr, êlên me te nas dikirin malmîrat! Çawa te ew qas sînorên asê li ser laşê welatê me yê birîndar çêkirin?"* [835] Helîm Yûsiv ji devê Mûsa, hin pirsan ji xeyala Sykes dike û xêzikên Sykes li ser xaka kurdan çêkirine rexne dike. Mûsa ji xeyala Sykes ra dibêje: *"Çi heqê te li me hebû ku tu van pêlên kînê bi ser serê me de rakê?!"*[836] Lewra ev xêzik bûne sersebeba parçekirina kurdan. Li gor Mûsayê Qamişlokî, çavkanîya *belaya mezin* parçekirina van erdan bû. *"*[837]

Di romana Jan Dost a *Kobanî*yê da jî sînorên Sykes û Pîcot xêzkirine bûye mijara rexneyan. Li gor vebêjê Dost, sînorên ku Sykes - Pîcot xêzkiribûn ne bi hibrê

---

[832] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 37.
[833] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 51.
[834] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 51.
[835] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 77.
[836] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 77.
[837] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 77.

lê bi xwînê hatibûn xêzkirin.”[838] Xaka ku plansazîya parvekirina wê ne di destê xwedîyên wê da be, li ser wê xakê tu ferqa xwînê ji hubrê tune ye.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da Mehmed Uzun, Helîm Yûsiv û Jan Dost di hin romanên xwe da li ser Peymana Sykes Picot sekinîne û ji devê karakterên xwe rexneya du dîplomatên ku peyman bi navê wan tê zanîn û di navbera dewletên wan da pêk hatîye, kirine. Li gor romannûsan sînorên ku hatine xêzkirin, dûrî rastîya civakî û dîrokî ne û encama endazyarîya sîyasî ne.

4.2.11. Peymana Lozanê

Peymana Lozanê di 23yê tîrmeha 1924a li bajarê Lozanê yê girêdayî Îsvîçre di navbera nûnerên Meclîsa mezin a Tirkîye û Brîtanya, Fransa, Îtalya, Japonya, Yunanistan, Romanya û Yugoslavya hate îmzekirin. Ji bo hevpeyvînên vê peymanê “Wezîrê Karê Dervê Îsmet Paşa (1884-1973) wek serokê delegasyonê û Dr Rıza Nur (1879-1942), Hasan Saka (1886-1960) jî wek nûnerên delegasyona Tirkîyeyê hatibûn bijartin.” [839] Ev peyman ji bo Komara Tirkîyeyê bû tapûyeke navneteweyî. Di heman demê da ev peyman bû sedema çar parçekirina Kurdistanê jî. Kurdistana ku bi Peymana Qasr-i Şîrînê ra bûbû du parçe, bi Peymana Lozanê jî bûye çar parçe. Ev çar parçe di nava tixubên Tirkîye, Îran, Îraq û Sûrîyeyê da man.

Derheqê bandora Lozanê ya li ser Kurdan da Altan Tan dibêje: “Biryarên ku li Lozanê hatin stendin ji wê mejûyê û pê ve rasrerast tesîr li rûdanên sîyasî kir û bi vê boneyê esasa statukoya mevcût hate danîn.”[840] Di dema guftugoyên peymanê da dewletên ewropayî israr kirin ku kurd ekalîyet (azinlik) in. Di serî da Lord George Curzon (1859-1925) digot ku “Kurd, miletekî ji tirkan gelekî cuda ye û li ser zêde dikir ku tu ekalîyetên li Mûsilê dijîn, naxwazin bi tirkan ra bijîn.”[841] Îsmat Paşa ku ji alîyê Mustafa Kemal (1881-1938) ve wek serokê delagasyona Tirkîyeyê hatibû wezîfedarkirin, mafê axaftinê xwest û weha axivî: “Tirk û kurd hêmanên bingehîn ên Komara Tirkîyeyê ne. Kurd ne ekalîyet in, milet in. Hikûmeta Enqereyê hem

---

[838] Dost, *Kobanî*, r. 31.
[839] Bilal N. Şimşir, *Lozan Günlüğü*, Bilgi Yayınevi, Ankara, 2012, r. 11.
[840] Altan Tan, *Kürt Sorunu*, Timaş Yayınları, 8. Baskı, İstanbul, 2011, 191.
[841] Ayşe Hür, *Öteki Tarh II Mondros'tan İzmir Suikasti Davası'na*, Profil Yay., . Baskı, İstanbul, 2013, r. 245.

hikûmeta tirkan hem ji hikûmeta kurdan e."[842] Peymana Lozanê xala 38an destnîşan dike ku: "Hikûmeta Tirkîyeyê, hemû kesên ku niştecihê Tirkîyeyê ne mafê wan î çêbûn, aîdîyeta civakê, ziman, bêyî ferqa dîn û bawerîyê parastina jîyan û azadîya wan tam û bêkêmanî hildigire."[843] Lê Komara Tirkîyeyê, barê berpirsyarîya xala 38an a peymanê bi vegera welêt ji ser stûyê xwe bilez û bez avêt. Piştî îmzekirina vê peymanê kurd wek ekalîyetê nehetin pejirandin û mafên bingehîn ên ekalîyetê jî winda kirin. Jixwe tu carî ji alîyê statukoyê ve wek milet jî nehatin dîtin.

Prof. İlber Ortaylı dibêje ku "Dema em li biryarên Lozanê dinêrin bi rastî tasfîyeye împaratorîyekê jî û meseleya navxweyî ya rejîma nû jî bi peymaneke navneteweyî bi cih hat."[844] Herweha "Sînorên Tirkîyeya nû ya îroyîn jî di Lozanê da tescîl bûn."[845] Sina Akşin, derheqê Lozanê da weha dibêje: "Hin cenah angaşt dikin ku Lozan hezîmetek e. Wek îspat jî jidestçûyîna giravên Egeyê, windakirina Rojavaya Trakya û Mûsilê mînak didin."[846]

Di dîroka kurdan da Lozan, destpêka heyameke nû ye. Kurd li Lozanê tune hatine hesibandin. Ayşe Hür destnîşan dike ku "Di celseya 12ê berfanbara 1922yan da İsmet Beg dibêje ku hikûmeta Meclîsa Milet a Mezin a Tirkîyeyê, bi qasî ku ya tirkan e, ew qasî a kurdan e. Lewra nûnerên kurdan ên durist û meşrû ketine Meclîsa Milet.[847]

Nûnerê delegasyona Tirkîye ya Lozanê Dr Rıza Nur di xatirata xwe da dibêje ku Frenk ji ekalîyetê sê tiştan fêm dikin: ekalîyeta irqî, ya ziman û ya dînî. Dr Rıza Nur destnîşan dike ku dema li Lozanê wî teqsîmeke wisa derheqê ekalîyetê da bihîstîye û famkirîye xetereyeke mezin ji wan ra heye, mûyê wî şûjin şûjinî bûne û hewl daye van tabîran rake û dibêje pir zehmet bû lê min rakir. [848]

Mehmed Uzun di *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* da ji bo dîroka kurdan maneya Peymana Lozanê bi awayekî kurt îzeh dike û bi navgînîya Ehmedê Fermanê

---

[842] Altan Tan, *Kürt Sorunu*, Timaş Yayınları, 8. Baskı, İstanbul, 2011, r. 193.
[843] Dr. Bletch Chirguh, *Kürt Sorunu Kökenleri ve Nedenleri*, (Çev.) Nihat Nuyan, Avesta, İst., 2009, r. 87.
[844] İlber Ortaylı, *Osmanlının Yaşayan Son Mirası Cumhuriyet*, Timaş, İstanbul, 2014, r. 171.
[845] Mesut Yeğen, *İngiliz Belgelerinde Kurdistan*, Dipnot Yayyınları, Ankara, 2012, r. 13.
[846] Sina Akşin, *Ana çizgileriyle Türkiye'nin Yakın Tarihi 1.Cilt,* (1789-1980) Cumhuriyet, İstanbul, 1997, r. 46.
[847] Ayşe Hür, *Öteki Tarh II Mondros'tan İzmir Suikasti Davası'na,* Profil Yay., İst., 2013, r. 336.
[848] Dr. Rıza Nur, *Lozan Hatıraları*, İlaveli Üçüncü Baskı, Boğaziçi Yayınları, İst., 1992, r. 103.

Kîkî, dibêje ku *"Ji 1900î û vir ve ji nîv milyonî bêtir kurd hatin kuştin û welatê kurdan bû çar perçe."*[849] Piştî misogerkirina meclîsa Tirkîyeyê, welatê kurdan ku berê bi peymana Qasr-i Şirinê bûbû du parçe êdî bûbû çar parçe û her parçeyekî wê di nava sînorên dewletekê da mabû.

Helîm Yûsiv di *Tirsa bê Diran* da bi gotinên mamosteyê dîrokê Mûsayê Qamişlokî, rexneya Lozanê dike û daxwaza xwe ya qêrînekê tîne ziman. Qêrîneke wisa ku dengê wê li Lozanê, li Swîsreyê olan bide û dîrok, li London û Parîsê bi hev ra bihejin da ku rewşa mamosteyekî dîrokê ku dîroka wî hatîye tunekirin bê famkirin.[850] Ev gotin, rexneya sîyaseta îngilîz û fransizan e ku kurd ji sifreya netewdewletan bêpar hiştîne. Kurd ji ber sîyaseta durû ya dewletên kolonyalîst li ser xaka xwe bûne ekalîyet.

Jan Dost di *3 gav û 3darek*ê da ji devê vebêjê xwe bi werîs ra dikeve nava mihasebeya dîrokê û gazinên tijî rexne dike. Vebêjê Dost, ji werîs ra dibêje ku bêhna şeraba li Lozanê hatîye vexwarin ji te tê û lê zêde dike ku textê masya ku qedera kurdan li ser hatîye nivîsîn ji kurdan ra sêdar hatine amadekirin. [851] Vebêjê Dost, nexşeyên ku sînorên nû li ser wan hate xêzkirin, dişibîne çermê gayekî mirar û sêdarên ku Şêx Seîd û hevalên wî ji jîyanê qetandin jî li gor wî hîn di Lozanê da hatibûn bilindkirin.

Jan Dost bi dilekî tijî keser bi epîgrafekê bangî Lozanê dike û dibêje ku *"Hêêêê Lozanê, çîya bi derdên çîya dizanin. Ma çima kevirên çîyayên te, guldanka me şikandin.!"* [852] Kula gulê, li ser zimanê vebêjê Jan Dost wek wegêraneke alegorîk a rexneya dîrokî bal dikêşe. Li gor vebêjê Dost, guldanka xewnên kurdan a azadîyê li gola Lemanê da noqî ava bûye û Îsmet Paşa herçend Mûsil windakiribû jî tiştekî ji Mûsilê giranbuhatir yanî qedara kurdan bi dest xistibû.[853] Vebêjê Jan Dost diyar dike ku Lozan, ji Amedê ra bû mêvanekî xwîngiran û ji kurdan ra werîs, sêdar û zindan bi

---

[849] Uzun, *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê*, r. 10.
[850] Yûsiv, *Tirsa bê Diran*, r. 95.
[851] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 40.
[852] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 139.
[853] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 143.

xwe ra anî. *"Di eyarê gurekî de Lozanê serî li Amedê da."*[854] Wek tê zanîn encamên Lozanê di sala 1925an ji bo Şex Seîd û rêhevalên wî li Meydana Derîyê Çiyê bû werîs û li situyê kurdan Şidîya.

Jan Dost di heyama hevdîtinên Lozanê da kurdên ku telgraf ji delegasyonê ra şandin û gotin em naxwazin ji tirkan cuda bibin jî rexne dike û wan ji devê sîyasetmadar Yûsif Zîya Beg (1882-1925) wek "bêşeref" diwesifîne. Sedema vê şayesê ew e ku hin kudan di dema Lozanê da li meclîsa Enqereyê ji delegasyona Lozanê ra telgiraf şandine û gotine ku em naxwazin ji tirkan cuda bibin û şensê xirab ku rûsan jî destê dostanîyê dirêjî tirkan kiribû. [855] Jan Dost, bi van gotinan, di sîyaseta wê demê da tevgera rûsan a rîyakar jî rexne dike. Jan Dost, di romana *Kobanî*yê da jî dide zanîn ku Îsmet İnönü ji kurdan ra qedereke reş kêşaye û li Lozanê bindestîya kurdan bi cih bûye bi qewlê vebêjê Jan Dost *mîxê dawî di darbesta xewna welatekî azad da hatîye kutandin.*[856]

Peyama Lozanê ku Kurdistan kirîye çar parçe û kurd di nava çar dewletan da belav kirîye, di romanên Mehmed Uzun, Helîm Yûsiv û Jan Dost da ji alîyê dîrokî û sîyasî ve hatîye rexnekirin. Rexneya bêsiûdîya kurdan û rola İsmat Paşa ya ku kurd tune hesibandîye bi mixabinî hatîye destnîşankirin. Li gor romannûsan rewşa kurdan a îro, di encam Peymana Lozanê da teşe girtîye.

4.2.12. Cenga Cîhanê ya Duyem

Cenga Cîhanê ya Duyem di sala 1939an da dest pê kir û heta sala 1945an domand. Ev şer di navbera du cenahan da pêk hat: mitefîq û mîhver. Dewletên mitefîq ji Brîtanya, Fransa, Yekîtîya Sowyetan, ABD û Çînê pêk dihat. Dewletên mîhverê jî ev bûn: Almanya, Îtalya, Japonya, Macaristan, Romanya, Bulxaristan, Fînlandîya, Hirvatistan, Arnavutluk, Habeşistan, Îraq. "Erîşa Hitler a Polonya di 1ê îlona 1939an da bû sedem ku Şêrê Cîhanê yê II. dest pê bike. Fransa û Brîtanya ku heta wê heyamê ji bo aktîve bibin ne jidil bûn ji ber soza arîkarîyê ku dabûn Polonya,

---

[854] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 201.
[855] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 152.
[856] Dost, *Kobanî*, r. 314.

şer îlan kirin.” [857] “Cenga Cîhanê ya Duyem. nîşan da ku dewletên neteweyî yên modern wek heywanên bihêz û birçî ne. Bi milyonan însan di şerê ji bo wan da jîyana xwe winda kirin.” [858]

Mehmed Uzun di *Sîya Evînê* da hengameya salên Cenga Cîhanê ya Duyem bi navgînîya vebêjê xwe rexne dike. Vebêjê Uzun, diyar dike ku salên piştî 1940î salên xirab bûn. Dinyaya yextîyar ketibû şerekî dijwar û bi mîlyonan kes ber bi pêlên vî şerî ketibûn. [859]

Di romana *Bîra Qederê* da Uzun, dide zanîn ku haya mirovên wê demê ji gelek agahîyan çênedibû. Uzun, ji devê hevaleke Celadet Bedîrxan a alman ku bi navê Monika tevlî tevna romanê dibe û li Stenbolê, Celadet zîyaret kirîye; weha behsa rewşa Ewropayê dike: Mirov nizanîn rewşa kampên esîran çi ne, hemamên gazê çawa ne, firinên ku xisûsî ji bo şewitandina însanan çêbûne bi çi awayî ne? Herweha haya gelek kesan ji qirkirina bi milyonan cihûyan jî tune bû.[860] Lewra şer, mezin û dezenformasyon zêde bû û dîtin û gotin nedibû yek. Hikmê gotinê li hember hikmê şer, pir kêm bû. Uzun vê rewşa tevlihev a xirabîyeke topyekûn ji devê vebêjê xwe rexne dike. Mehmed Uzun, encamên Cenga Cîhanê ya Duyem ji bo kurdan bi perspektîfeke neyênî şîrove û rexne dike. Li gor agahîyên ku lehengê Bîra Qederê Celadet Bedîrxan, di romana ku dinivîse behs dike, kurd ji nû ve ketibun ber lingan. Êdî bi qasî pîyonên setrancê jî qîmeta kurdan nemabû. Dinya dîsa dihate parvekirin lê di vê para nû da jî ji kurdan ra tiştek tune bû.[861]

Jan Dost, di *Mijabad*ê da ji devê hezkirîya Badînê Amêdî, Jaleyê dibêje ku Parîs ketîye û haya gelek kesan ji vê agahîyê tune ye. Jaleyê, tirsa almanan ku ketîye dilê kurdan jî tevî kavilkirina îngilizan ve rexne dike. Li gor Jaleyê, kurd di wê bawerîyê da ne ku alman bigihêjin herêmên kurdan dê mala kurdan xirabikin.[862] Jan

---

[857] Viliam H. Mcneill, *Dünya Tarihi*, Çev; Alâeddin Şenel, İmge Kitabevi, Ankara, 2002, r. 781.
[858] Christon I. Archer, John R. Ferris, Holger H. Herwig, Timothy H.E. Travers, *Dünya Savaş Tarihi*, (Çev.) Cem Demirkan, Tüm Zamanlar Yay., İstanbul, 2006, r. 470.
[859] Uzun, *Siya Evînê*, r. 203.
[860] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 281.
[861] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 290.
[862] Dost, *Mijabad*, r. 49 .

Dost, bûyera avêtina bombeya atomê ku mohra xwe li Cenga Cîhanê ya Duyem xistîye, bi navgînîya Badînê Amêdî rexne dike û dibêje ku du bombeyên atomî du bajaraên Japonyayê hedimandine û ji ber bandora vê çeke nû ya dijwar sedhezaran kes mirine. [863] Vê çekê, dawî li Cenga Cîhanê ya Duyem anî. Japonya teslîm bû, Almanya têk çû û dewletên mitefîq bûn xalibên şer.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da rexneya Cenga Cîhanê ya Duyem di romanên Mehmed Uzun Sîya Evînê û Bîra Qederê da bi wayekî tîr derdikeve pêşberî xwîneran. Uzun ji ber tevna van romanên dîrokî xewstîye ku serdema ku behsdike çêtir bê famkirin. Romana Jan Dost a *Mijabad*ê bûyerên ku piştî Cenga Cîhanê ya Duyem em qewimîne vedibêje ji ber vê yekê mercên şer û encamên giştî yên bandor li ser herêmê û cîhanê kirine hatîne şayesandin. Di van romanan da rola serokê almanyayê Adolf Hitler (1889-1945) a di şer da jî hatîye nîqaşkirin.

4.3. Rexneyên li Dîroka Komara Tirkîyeyê

4.3.1. Serhildana Şêx Seîd (1925)

Serhildana Şêx Seîd di sala 1925an da li hember Komara Tirkîyeyê hate li dar xistin û armanca vê serhildanê avakirina Kurdistaneke xweser a ku di bin hikmê şerîetê da tê revebirin bû. Ji alîyê serokê Komara Tirkîyeyê Mustefa Kemal ve xîlafet hatibû rakirin û ev yek bûbû sedem ku li Kurdistana Bakûr hin nerazîbûn derkevin holê.

"Şêx Seîd (1865-1925) di sala 1865an da li navçeya Xinisê ya Erziromê li gundê Qolhîsar hatîye dinê. Perwerdeya medresê dîtîbû û fêrî hemû qayîdeyên terîqetê bûbû. Di sala 1923an da tevî Cemîyeta Azadîyê bûbû."[864] Piştî îlankirina Komara Tirkîyeyê (1923) Mustafa Kemal, di sala 1924an da xîlafet ji holê rakir. Piştî laxvkirina meqamê xîlafetê di civaka kurdan da dengên nerazîbûnê bilind bûn. Şêx Seîd, "Ji bo amadekirina gel a bi berfirehî li herêmên ku bihêz bû mîna Licê, Xanî, Pîran û Palû derket ger û geştekê. Li cihên ku lê disekînî li hember hikûmetê axaftinên tûj dikir û xisûsen rexneya kiryarên dewletê yên antîîslamîst dikir."[865] Di

---

[863] Dost, *Mijabad*, r.181.
[864] Senar Turgut, *Mezopotamya'da Kürt Uygarlık Tarihi*, Belge Yayınları, İstanbul, 2011, r. 122.
[865] Martin Van Bruinessen, *Kurdistan Üzerine Yazılar*, Wer: Kolektîf, İletişim Yay., İst., 2010, r. 142.

van axaftinên xwe da Şêx Seîd ji bo avakirina rejîmeke li gor qayîdeyên şer'î tevdigere, agirê şoreşê pêxîstibû.

Martin Van Bruinessen dibêje ku serokê serhildanê Şex Seîd bû û Şêx Seîd, şêxekî naqşîbendî bû ku bandora wî li ser gelê herêmê pir bû. Brunissen, îdîa dike ku armanca serhildanê ya mûayyen avakirina Kurdistaneke xweser e ku ev Kurdistan wê li hember prensîbên îslamê rêzdar tevbigere ku ev prensîb ji alîyê Tirkîyeya modern ve hatine îhlalkirin.[866]

Serhildana Şêx Seîd, weha qewimî: Di 13ê sibata 1925an da yekîneyeke cendirmeyan li gundê Pîranê girtin ser mala Şêx Seîd û xwestin hin mêvanên wî derdest bikin. Zilamên şêx li hember vê yekê derketin û di navbera cendirmeyan û zilamên şêx da pevçûnek derket. Bi vê bûyerê fitîla Serhildana Şêx Seîd, berîya wextê plankirî pêket. Dîroknas Ayşe Hür, dibêje ku tevîbûna herî zêde ya serhildanê ji eşîran sunnî û zaza yên herêma Pîran, Çapakçûr û Xanê bû.[867] Di 4ê adara 1925an da Komara Tirkîyeyê, Qanûna Taqrîrî Sukûn derxist û demokrasî, bû bêjeyeke li ser kaxizê jî hikum nemayî. Dr Bletc Chirguh, destnîşan dike ku Mustafa Kemal biryar da ku pirsgirêka kurdan bi metoda halkirina pirsgirêka ermenîyan a Evdilhemîd ango bi tunekirinê çareser bike.[868] Mustafa Kemal ji bo serhildanê bişikîne hikumet guherand. Hikûmeta İsmet Paşa hate ser kar. Artêşeke ji 30 hezar leşkerî pêk tê û balafirên hêzên hewayî yên Tirkîyeyê jî seferber bûn."[869]

Di 14ê avrêla 1925an da bi îxaneta sîxurê Komara Tirkîye yê di nava Cemîyata Azadî da "Binbaşı Kasım" Şêx Seîd û rêhevalên wî hatin derdestkirin. "Xalit Begê Cibrî, Yûsûf Zîya Beg û sê kesên din li Bedlîs'ê wê rojê hatin gulebarankirin 81 kes jî birin Dîyarbekirê"[870] Ayşe Hür weha destnîşan dike ku tevî Şêx Seîd ji bo 49 kesan cezayê îdamê hate dayîn. Ji wan îdaman cezayê du kesan qulipandin deh sal hepsê. 47 kesên mayî, di 29ê hezîrana sala 1925an da destê sibehê li Meydana Derîyê Çiyê ya Dîyarbekirê hatin îdamkirin.[871]

---

[866] Martin Van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, Wer. Banu Yalkut, İletişim Yayınları, İst., 2010, r. 387.
[867] Ayşe Hür, *Öteki Tarh II Mondros'tan İzmir Suikasti Davası'na*, Profil Yay., İstanbul, 2013, r. 336.
[868] Dr. Bletch Chirguh, *Kürt Sorunu Kökenleri ve Nedenleri*, Avesta, İstanbul, 2009, r. 65.
[869] Chirguh, h., b., r. 337.
[870] Chirguh, h., b., r. 338.
[871] Chirguh h., b., r. 338.

Serhildana Şêx Seîd di navbera kurdan û Komara Tirkîyeyê da bû çavkanîya nerihatîyeke dûvdirêj. "Serhildana Şêx Seîd ji bo grûbên ku li hember kemalîzmê wek hêzên berxwedêr dikarin bibin tehdît, kiryarên bêmerhemet mûhtemel kir hetta meşrû kir."[872] Pişti Serhildana Şêx Seîd, KT gelek eşîrên kurdan sirgûnî Anatolyaya Navîn kir. Dr Bletch Chirguh îdîa dike ku "Di navbera salên 1925 û 1928an da ji nîv mîlyon kurdî zêdetir sirgûnî wîlayetên rojava yê Tirkîyeyê bûn. Di van salan da 8758 gund hate xerakirin 15206 jin, ciwan, keç, zarok û îxtîyarên ku destên wan çekan nagire di nava xirbeyên van gundan da hatin qetilkirin."[873] Ji ber zordarîya komarê gelek kesan xwe li dîyasporaya girtin.

"Şêx Seîd piştî ku li Pîranê serhildan da destpêkirin di roja 15ê sibata sala 1925an da ji Pîranê derket."[874] Armanca Şêx Seîd ew bû ku di 3yê adara 1925an da nîvê şevê erîşî çar derîyê Dîyarbekir bike. Şêx Seîd ji bilî vê, talîmata serhildanê dabû alîgirên xwe yên di nava bajêr da. Li gor Dadgeha Îstîqlalê hejmara mirovên ku Şêx Seîd li Dîyarbekir bi kar anîbû 5.000 bû." [875] Lê serhildan li ber derîyên Dîyarbekirê asê bû. "Di 14ê nîsana 1925an da qismekî serhildêran vegerîyan gundên xwe û qismek jî xwe li çîyayan girtin. Şêx Seîd piştî ku tevî hêzên ji heval û hogir û malbata wî pêk dihat; hate dorpêçkirin ji bêgavî teslîm bû." [876]

Di Serhildana Şêx Seîd da tilîya îngilizan heye an tune ye? Ev mesele dî dîrokê da gelek caran bûye sedema guftûgoyan "Her çi qasî di dema celseyên Dadgeha Îstîqlalê da îdîaya ku îngilizan serhildan dermale kirîye derketibe holê jî tu wesîqeyeke ku vê îdîayê îspat bike nehatîye dîtin."[877] İlber Ortaylı derheqê Serhildana Şêx Seîd da dibêje ku: "Di Serhildana Şêx Seîd da hêmaneke neteweyî heye. Wek ku tê gotin ne lîstikeke îngilizan an jî meseleya neqşîbendîtîyê ye. Helbet têkilîyeke neqşîbendîtîyê ji kesayeta Şêx Seîd tê lê çavkanîya serhildanê ji neteweperwerîya kurdî tê." [878] Ev hewldan, encama nerazîbûna Şêx Seîd û rêhevalên wî ya li hember kiryarên Komara Tirkîyeyê bû. Bi qewlê Aijaz Ahmed:

---

[872] Vladimir Minorsky, Thomas Bois, *Kürt Milliyetçiliği*, (Wer.) Kolektîf, Örgün Yay., İst., 2008, r. 332.
[873] Dr. Bletch Chirguh, *Kürt Sorunu Kökenleri ve Nedenleri*, Avesta, İst., 2009, r. 69-70
[874] İsmet Bozdağ, *Kürt İsyanları*, Truva Yayınları, İstanbul, 2009, r. 50.
[875] Bozdağ, h. b., r. 55-56.
[876] Bozdağ, h. b., r. 58.
[877] Bozdağ, h. b., r. 63.
[878] İlber Ortaylı, *İsmail Küçükkaya, Cumhuriyetin İlk Yüzyılı*, Timaş, İstanbul, 2012, r. 49.

"Neteweperwerî, li xakên dinyaya sêyemîn ji bo mêtînkariyê bersivek e."[879] Serhildana Şêx Seîd jî qêrîna li hember sirûdên tune hesibandina kurdan mîna bersivekê bû.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da bi taybet di romanên dîrokî da bûyera Serhildana Şêx Seîd, gelek caran bûye mijara romannûsan û li ser vê bûyerê nivîskaran hin rexne kirine. Mahmut Baksi, Mehmed Uzun û Jan Dost di romanên xwe da bêtir li ser sedem û şikestina serhildanê sekinîne.

Mahmut Baksi di romana *Serhildana Mala Elîyê Ûnis* da ji devê vebêjê xwe destnîşan dike ku piştî serhildana Şêx Seîd ji ber kiryarên qolçî û cendirmeyan kesek nema dikare here herêmên Hezro, Bedlîs û Sêrtê. Vebêjê Uzun, ji êşkence û xeraca cendirmeyan jî gazinan dike. [880] Baksi derheqê şikestina Serhildana Şêx Seîd da ji devê vebêjê xwe diyar dike ku hin eşîrên kurdan bêbextî kirine û peymana ku di navbera wan û hêzên Şêx Seîd da binpê kirine û bi vê boneyê serhildan têk çûye: [881] Plana ku li ser girtina Pira Malabadê hatibû sazkirin, li gor vebêjê Baksi ji ber îxaneta Mala Faro, eşîra xîyan, eşîra bekirî û şêxdodî têk çû û leşkerên Dîyarbekir, Silîva û Bedlîsê ketin nava bajêr û serhildan şikest. [882]

Mehmed Uzun di romana *Tu*yê da sêdarên ku Komara Tirkîyeyê di sala 1925an da li Derîyê Çîyê daçikandin û Şêx Seîd û rêhevalên wî daliqandin, bi bîr tîne û bi rêya lehengê xwe dibêje ku dewletê di mejûya 21ê hezîrana 1925an da 51sêdar li derîyê rojava sazkirin û Şêx seîd û 51 rêhevalên wî daliqandin [883] Vebêj-lehengê Uzun, bi van gotinan mixabinîyekê bilêv dike û mercên ku bûne sedema şikestina serhildanê rexne dike.

Di romana *Siya Evînê* da Qedrî Beg (Qedrî Cemîl Paşa), ji Memdûh Selîm Beg ra serpêhatîya xwe ya Serhildana Şêx Seîd neqil dike û bi keser dibêje ku "*Şêx*

---

[879] Aijaz Ahmed, *Teoride Sınıf, Ulus ve Edebiyat*, (Wer.) Ahmet Fethi, Alan, İst., 1995, r. 120.
[880] Baksi, *Serhildana Mala Eliyê Ûnis*, r. 28.
[881] Baksi, *Serhildana Mala Eliyê Ûnis*, r. 61.
[882] Baksi, *Serhildana Mala Eliyê Ûnis*, r. 62.
[883] Uzun, *Tu*, r. 98.

Seîd û Kemal Fewzî û hevalên din li ber çavên me hatin bi dar ve kirin…"[884] Bi van gotinan Mehmed Uzun, çavkanîya Serhildana Agirî bi encamên şikestina Serhildana Şêx Seîd ve girê dide. Di *Bîra Qederê* da Uzun jî wek Mahmut Baksi îxaneta eşîrên kurdan bi bîr tîne û bi navgînîya Celadet Bedîrxan dibêje *"Ew teres û segbav, dîsan bi karê xwe rabûn û îxanet kirin. Lê sûc, ne sûcê wan bênamûsan e, ya kesên ku bi bênamûsan bawer kirine."* [885] Dîrok, dubare bûye û kurdan tu ders ji dîrokê dernexistine. Celadet Bedîrxan, destnîşan dike ku ne tirkan lê kurdan, kurd şikandine lewra gelek eşîrên kurmancan arîkarî dane tirkan.[886] Celadet Bedîrxan dibêje serhildan qewî bû lê ji ber bêtifaqîya kurdan negihaşte armanca xwe. [887]

Helîm Yûsiv di *Gava ku Masî Tî Dibin* da Serhildana Şêx Seîd bi bîr tîne û piştî vê serhildanê bi heştê salî halê bajêr û rewşa mirovan ji devê lehengê xwe Masî rexne dike. Masî, piştî bi darvekirina Şêx Seîd û rêhevalên wî li hember tevgera şênîyên welêt matmayî dimîne. Lewra şênîyên bajêr bi dû kar û barên xwe yê rojane ketine û daliqandina Şêx Seîd û hevalên wî ji bîr kirine. [888] Ev gotinên Masî, wek rexneyên hişmendîya mirovan a dîrokî ji dikare bê şîrovekirin.

Jan Dost di *3 gav û 3darek*ê da gelek rexneyên dîrokî ji devê leheng û vebêjê xwe digihîne xwîneran. Li gor vebêjê Jan Dost, dema di navbera Şêx Seîd û sêdarê da sê gav man dîrok ji ber şoreşa xeniqî dinalîya û hêvî, mîna tûtina di qelûnekê da bişewîte bûbû xwelî. [889] Jan Dost, teşeyê daliqandina qurbanîyên Serhildana Şêx Seîd jî bi navgînîya vebêjê xwe weha rexne dike: *"Îşev ew dibin qurban di cejna komerake nûzayî de, hemû qurbanî jî li ber hev têne gurandin."* [890] Sêdarên ku li meydana bajêr ve hatibûn daçikandin û qurbanî li ber çavên hevûdin bi dar ve dihatin daliqandin bi ya vebêjê Jan Dost, dişibe gurandina pez a piştî hev ku di cejna Qurbanê da dihatin serjêkirin.

---

[884] Uzun, *Siya Evînê*, r. 120.
[885] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 202.
[886] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 203.
[887] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 252.
[888] Yûsiv, *Gava ku Masî Tî Dibin*, r. 153.
[889] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 25.
[890] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 44.

Jan Dost di dema serhildanê da dezenformasyona komarê jî ji devê vebêjê xwe weha rexne dike: *"Dibêjin şêxekî êzidî rabûye dînê îslamê xira dike. Jixwe tew di vê de! Wey wey wey! Dibêjin gawirên rûs piştê didinê! Wax wax."* [891] Li gor vebêjê Jan Dost xofa derewên dijmin ketîye dilê serhildêran. Jan Dost di romana *Kobanî*yê da dîsa Serhildana Şêx Seîd bi bîr tîne û bi gotinên hemziravê Mihacir, dibêje ku kurdan, ders ji vê bûyerê dernexistine û daliqandina Şêx Seîd û rêhevalên wî, pir zû jî bîr kirine[892] Vebêjê Dost, kurdên ku di bin sîya ala komarê da bi bextewarî dijîn, ji alîyê hişmendîya dîrokî ve rexne dike.

Serhildana Şêx Seîd di romana kurdî ya dîyasporayê da wek şikestina xeyalên neteweyekê hatîye nîşan dayîn. Sedemên serhildanê, pêvajoya wê û encamên wê yên giran, bala romannûsan kişandîye û ev bûyer hem ji alîyê dîrokî û sîyasî hem ji alîyê dînî ve hatîye şîrovekirin û rexnekirin. Di rexneyan da "otokrîtîk" dibe navenda mijarê. Neyartîya kurdan a li hember hev û tunebûna hişmendîya neteweyî kurteya rexneyên ve Serhildanê ne.

4.3.2. Serhildana Agirî (1927-1930)

Plansazîya serhildanê ji alîyê Cemîyeta Xoybûnê ve hatîye kirin. Cemîyeta Xoybûnê di sala 1927an da ji alîyê hin neteweperwerên kurdan ve li Lubnanê hate damezirandin. Serokê wê yê ewil Celadet Bedirxan (1893-1951) e.[893] Mîmarê fikira avakirina Cemîyeta Xoybûnê Memdûh Selîm Beg (1880-1976) e. Memduh Selîm Beg ku di nava Cemîyeta Xoybûnê da bi navê Îskender dihate zanîn, li Stenbolê beşa sîyasetê û felsefeyê xwendibû.

Rohat Alakom destnîşan dike ku di rêziknameya Xoybûnê di binbeşa meqsedan di xala 2yan da weha dinivîse: "Meqseda cemîyetê, xelaskirina hidudên di bin desthilatdarîya Tirkîyeyê da ne û avakirina Kurdistaneke mistaqîl e."[894] "Xoybûn

---

[891] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 185.
[892] Dost, *Kobanî*, r. 34.
[893] Rohat Alakom, *Hoybun Örgütü ve Ağrı Ayaklanması*, Avesta, İstanbul, 2020, r. 28.
[894] Alakom, h. b., r. 32.

ne tenê li Kurdistanê di heman demê da li nava dewletên bîyanî, di nava kolonîyên kurdan jî tesîreke mezin afirandibû û milên wê digîhaşte heya bi Amerîkayê."[895]

Îhsan Nûrî Paşa (1893-1976) ku di artêşa Komara Tirkîyeyê da zabitekî kevn bû, bi biryara komîteya rêveber a Xoybûnê di sala 1927an da ji bo Serhildana Agirî bi rê ve bibe hate wezîfedarkirin. Nîvîskarê ermen Arshak Safrastian dibêje ku Komîteya Xoybûnê, Îhsan Nûrî Paşayê kevnefermandarê artêşa Tirkîyeyê ku di serî da fermandarekî pîleya yekem da bû û bi qehremanî û romantîkîya xwe navdar bû wek generalê Artêşa Neteweyî ya kurd tayîn kir.[896]

Di heyama serhildanê da şerên herî dijwar di 12ê hezîrana 1930yî da dest pê kir. Rohat Alakom destnîşan dike ku tenê di harekata tîrmeha 1930yî da du qolordî û 80 balafir hatine bikaranîn. Hin ji van balafiran hatine rûxandin. Hin çavkanî dibêjin ku kurdan 12 balafir rûxandine.[897] Li gor ragihandina Dr Bletch Chirguh "Li Gelîyê Zîlanê 220 gund hatin şewitandin. 4500 jin, ciwan, keç û îxtîyar hatin qetilkirin. Tûxaya di bin fermandarîya General Cevat Paşa da dema meşa ji Beytuşşebabê ber bi Şemzînan ve 120 gund xera kir."[898] Rohat Alakom di vê hengameyê da hejmara malbatên ku sirgûnî wîlayetên Rojavayê Tirkîyeyê bûne bi qasî 1400î qeyd dike.[899]

Ayşe Hür ji hejmara Rojnameya Cumhuriyetê ya 16ê tîrmehê 1930yî da hatîye weşandin ji mixabîr Yusuf Mazhar neqildike: "Di harekata Zeylanê da hejmara kesên hatine îmhakirin bi qederî 15.000 kes in. Çemê Zîlanê lebaleb bi cesedan tijî ye. Dê vê hefteyê Qumandan Salih Paşa (Omurtak) (1889-1954) dest bi harekata tenkîlê bike. Derfeta xelasbûnê ji vê nayê xeyal kirin.[900]

Piştî bûyera Gelîyê Zîlanê, Mahmut Esat Bozkurt (1892-1943), wezîrê edaletê yê wê demê, li navçeya Ödemiş a girêdayî wîlayeta Îzmîrê ye axaftinek kir. Di wê axaftina xwe ya meşhûr da weha destnîşan dikir ku: "Tirk, yekane efendî û xwedîyê vê dewletê ne. Yên ku ne ji secereya tirkan a saf bin, tenê mafekî wan heye: ev jî mafê xizmetkarî û koletîyê ye. Dost û dijmin hetta çîya bila vê heqîqetê bizanibin."

---

[895] Dr. Bletch Chirguh, *Kürt Sorunu Kökenleri ve Nedenleri*, Avesta, İst., 2009, r. 75.
[896] Arshak Safrastian, *Kurd ü Kurdistan*, Wer. Ergin Opengin, Avesta, İstanbul, 2007, r. 99.
[897] Rohat Alakom, *Hoybun Örgütü ve Ağrı Ayaklanması*, Avesta, İstanbul, 2020, r. 107.
[898] Dr. Bletch Chirguh, *Kürt Sorunu Kökenleri ve Nedenleri*, Avesta, İst., 2009, r. 85.
[899] Rohat Alakom, *Hoybun Örgütü ve Ağrı Ayaklanması*, Avesta, İstanbul, 2020, r. 116.
[900] Ayşe Hür, *Öteki Tarih III Kemalist Devrimler ve İsyanlar*, Profil Yay., İstanbul, 2013, r. 39.

[901] Ev gotin, rasterast berhema mejîyekî nijadperest e ku ji bilî nijada xwe cihê tu kesî di bin sîwana komara Tirkîyeyê da nabîne.

Serhildana Agirî bi xwe ra hin guhertinên sîyasî anîn. Robert Olson derheqê encama Serhildana Agîrî da dibêje ku "Serhildana Çîyayê Agirî ji bo têkilîyên Îran û Tirkîyeyê û pirsgirêka kurdan kevirekî kîlometreyî ye. Ev serhildan bû sedema ku tuxubên di navbera Tirkîye û Îranê da di mejûya 23. 01. 1932yan da bê guhertin. Di sala 1937an da deverên nêzî Maz Bîcho û hin cihên rojavayê Ûrmîyeyê bi ser sînorên Îranê hatin berdan.[902]

Piştî şikestina Serhildana Şêx Seîd (1925) tevgera kurd a sîyasî li derdora Cemîyeta Xoybûnê civîya bû. "Tevgera Xoybûnê di sala 1927an da hatîye damezirandin û heta dawîya sala 1946an jî hebûna xwe domandîye." [903] Xoybûn li bajarê Bhamdun a Lubnanê hatîye damezirandin." [904] Li gor Rohat Alakom "Xoybûnê di nava salên 1927 û 1930yî da pêşengî ji Serhildana Agirî (Ararat) kirîye û mora xwe li vê şoreşa domdirêj xistîye." [905] Li gor agahîyên Alakom dide, Xoybûnê wek serokê Serhildana Agirîyê, İhsan Nurî Paşa (1893-1976) û wek walîyê herêmê jî Biroyê Heskê Têlî tayîn kirîye.[906] Memduh Selim Beg (1880-1976) jî di nava vê tevgerê da wek endamekî ji kar û barên sîyasî berpirsyar tê dîtin. Di destpêka serhildanê da komarê, qanûneke sirgûnê derxist (10ê hezîranê 1927 / Jimare: 1097) Alakom, destnîşan dike ku li gor vê qanûnê 1400 malbatên kurd sirgûnî rojava bûne.[907] Serhildana Agirî bi şikestina hêzên kurdan têk çûye.

Îhsan Nurî Paşa dibêje ku: "Tirkîye ji bo ku şoreşa Kurdistanê bişikîne 66 hezar leşker û cendirme û ji 100î zêdetir balafir şand û êrîş kir." [908] Rojnameya Cumhuriyetê di jimareya xwe ya 16ê tîrmeha 1930yî da weha dinivîse: "Di harekata Zîlanê da jimara kesên hatine îmhakirin bi qasî 15.000 e. Çêmê Zîlanê, lebaleb bi

---

[901] Hür, h., b., r. 40-41.
[902] Robert Olson, *Kürt Meselesi ve Türkiye İran ilişkileri,* Avesta, İst., 2010, r. 47.
[903] Rohat Alakom, *Hoybun Örgütü ve Ağrı Ayaklanması*, Avesta, İstanbul, 2020, r. 15.
[904] Alakom, h. b., r. 28.
[905] Alakom, h. b., r. 16.
[906] Alakom, h. b., r. 16.
[907] Alakom, h. b., r. 116.
[908] İhsan Nuri Paşa, *Ağrı Dağı İsyanı,* Med Yayınları, 1992, r. 92.

cendekan tîjî bûye."[909] Wek tê dîtin Serhildana Agirî ji alîyê sîyasî û demografîk ve gelek encamên giring derxistîye holê.

Mehmed Uzun di Sîya Evînê da li ser jînenîgarîya Memduh Selim Beg disekine û derheqê Serhildana Agirî da jî gelek agahîyên dîrokî dide. Uzun, dema serokê serhildanê Îhsan Nûrî Paşa û berpirsyarê sîyasî Memdûh Selîm Beg teswîr dike van her du hevalan wek şirîkên dîrokeke bextreş dişayesîne. [910] Uzun di tevgera Xoybûnê û kar û barên serhildanê da her du kevnedostên şoreşê, carcaran tîne cem hev û li ser qedera kurdan û pêvajoya şerê giran wan dixe nava fikarên kûr. Dîyalogên bi vî rengî, nîqaşên li ser dîrokê û hin rexneyên vebêjê Uzun ên derheqê dîrokê da li ber çavan radixe. Mehmed Uzun ji devê vebêjê xwe dibêje ku Dewleta Tirkîye sed û bîst hezar leşker şandîye herêmê û dixwaze serhildanê bi tanq û topan bitepisîne.[911] Vebêjê Uzun, rexneya kuştin û mirinê li ser dika dîrokê dike û dibêje havîna 1930yî bi xwînê hatîye avdan, Agirî xwîn vedirişe. [912]

Mehmed Uzun di heyama serhildana Agirî da cih dide rexneyên tevgera artêşa Tirkîyeyê û ji devê vebêjê xwe dibêje ku artêşa tirkan êrîşî gundan kirîye û gund xira kirine. Vebêjê Uzun, destnîşan dike ku artêş, bi van êrîşan dixwaze heyfa xwe ji kurdan hilîne û ji bo vê yekê li derdora Agirî sed û sih û li derdora Zîlanê jî bi qasî du sed gund hatine şewitandin, hejmara kuştîyan jî ser deh hezarî ye.[913] Uzun, wek raportorekî mafên mirovan di romana xwe da cih dide gelek hejmaran û dixwaze encamên serhildanê bi zimanê reqeman li ber çavan raxe.

Serhildana Agirî wek mijareke dîrokî bala Mehmed Uzun kişandîye û Uzun ji perspektîfa dîrokî û sîyasî ve li ser vê mijarê hin rexneyên tund li artêşa Tirkîye û kiryarên wê kirîye. Bûyera Gelîyê Zîlanê di rexneyên Uzun da bi hûrgilî tê şayesandin û tê destnîşankirin ku dewletê ji bo tepisandina vê serhildanê serî li her rêyê daye.

---

[909] *Cumhuriyet gazetesi*, (16 Temmuz 1930).
[910] Uzun, *Siya Evînê*, r. 144.
[911] Uzun, *Siya Evînê*, r. 158.
[912] Uzun, *Siya Evînê*, r. 161.
[913] Uzun, *Siya Evînê*, r. 166.

4.3.3. Bûyera Dêrsimê û Seyîd Riza (1937/1938)

Serokê Serhildana Dêrsimê Seyîd Riza (1863-1937) di sala 1863yan da li gundê Lirtik ê girêdayî Dêrsimê (Tuncelî) hatîye dinê. Serokê eşîra Hesenan bû. Piştî serhildana Şêx Seîd, dewletê zor û zextên ser derdora Dersimê zêde kiribû û eşîrên kurdan di nava hin çalakîyan da bûn ku ev tevger bala komara tirkîyeyê kişandibû. Heta hin kesan derheqê meseleyê da rapor amadekiribûn. Yek ji van kesan Mifetîşê Milkîyeyê Hemdî Beg bû. Wî, di sibata 1926an da raporek pêşkeşî hikûmeta wê demê kiribû. Di raporê da digot ku "Dêrsim ji bo hikûmeta Komarê 'kunêr' (çiban) e. Ji bo selameta welêt lazim e ku li ser vê kunêrê operasyoneke teqez bê kirin.[914]

Di sala 1930yî da mifetîşê ûmûmî İbrahîm Tali Öngören (1875-1952), reçeteya çareserkirina vê meseleyê weha formule kiribû: Bi birçîhiştinê terbîyekirin û mecbûrî kirina îltîcayê yanî asîmîlasyon. Ayşe Hür destnîşan dike ku Reîsê Erkani Harbîye Mareşal Fevzî Çakmak (1876-1950), di vê meseleyê da hîn sarîh axivîye: "Xelkê Dêrsimê bi mizdayînê nayên ser rê. Midaxaleya Hêzên Çekdarî dê Dêrsimê bike hêsîr û islah bike. Divê Dêrsim wek kolonîyekê bê belavkirin û pişt ra di nava camîaya tirkan da kurdîtî bê helandin.[915] Pêşnîyaza Fevzî Çakmak rasterast asîmîlasyona kurdan e.

Serhildana Dersimê bi xirakirina Pira ser Çemê Xarçikê dest pê kir. Ji alîyê hêzên eşîrên demenan û heyderan ku di bin pêşengîya Seyîd Riza (1863-1937) da ne ev pir hate xirakirin. Ayşe Hür dide ragihandin ku di 1ê gulanê da 3 fîloyên balafiran ku ji Dîyarbekirê bi hewa ketin, dest bi bombebarana herêmê kiribûn. Yek ji pîlotên van balafiran jî keça Mustafa Kemal Atatürk a manewî Sabiha Gökçen (1913-2001) bû.

Ayşe Hür destnîşan dike ku dewletê "Di belavoka 4ê gulana 1937an da ku ji balafiran hate avêtin banga teslîmbûyînê li xelqê herêmê dikir û bi bir dixist ku kesên jixweber teslîm bibin dê ji bilî edaleta komarê tiştekî din nabînin lê kesên ku teslîm nebin û bi ya me nekin - me we dorpêçkirîye - hûn dê ji alîyê artêşên qehhar ya

---

[914] Ayşe Hür, *Öteki Tarih III Kemalist Devrimler ve İsyanlar,* Profil Yay., İst., 2013, r. 281.
[915] Hür, h., b., r. 282.

komarê ve bên mehvkirin."[916] Ev, operasyoneke mezin e ku dê bandora wê ji alîyê demografîk ve ne tenê li ser herêma Dersimê li Enedola navîn jî bibe.

Ayşe Hür dibêje ku di mehên hezîran û tîrmehê da gund hatin şewitandin û xirakirin. Tevî jin û zarokan gelek kes bi tivingên mekîneyî hatin gule barandin. [917] "Di 9ê tîrmeha 1937an da pêşengê serhildana Koçgîrî Alîşêr Efendî (1882-1937) û hevjîna wî Zarîfe Xanim hatin kuştin. Serên jêkirî yên jin û mêr ji Hüseyin Abdullah (Alpdoğan) Paşa (1878-1972) ra hate şandin. Di nava meha tebaxê da tevî law û hevjîna Seyîd Riza 33 kes hatin kuştin."[918] Seyîd Riza di 10ê îlona 1937an da teslîmî qereqolekê bû. (…) "Rojnameyan, bûyer weha ji raya gişti ra ragihand: Sergerdeyê herî mezin hate zeftkirin."[919]

Ayşe Hür ji İhsan Sabri Çağlayangil (1908-1993) neqil dike ku temenê Seyîd Riza -ji bo ku wî îdam bikin- daxistin 57an û yê lawê wî jî ji 17yan derxistin 21ê. Seyîd Riza û lawê wî di şeva 14ê mijdarê bi 15ê mijdarê ve girê dide li Elezîzê hatin daliqandin.[920] Di 6ê tîrmeha 1938an da harekata duyemîn a Dêrsimê dest pê kir. Li gor gotinên Midirê Ewlehîya Meletê İhsan Sabri Çağlayangil "Xelqê herêma Dêrsimê xwe li şikeftan girtibû. Artêşê gaza bijehr bi kar anî. Mîna mişkan hatin jehrkirin. Ji heftan heta heftêyan kurdên Dêrsimê jêkirin. Harekateke bixwîn bû. Da'wa Dêrsimê jî qedîya."[921] Di yekê gulanê da sê fîloyê balafiran ku ji Dîyarbekirê bi hewa ketibûn, dest bi bombeberanê kiribûn. (…) Di mehên hezîran û tîrmehê da gund hatin şewitandin jin û zarok jî bi ser da bêjimar kes bi tivingên makîneyî hatin gulereşandin[922]

Altan Tan ji xatirata şahidê îdama Seyîd Riza, İhsan Sabri Çağlayangil neqildike: "Mûyên min şûjin şûjinî bûn. Vî zilamê îxtîyar, rep rep meşîya çîngene (celad) de'f da kendîr xiste stûyê xwe, bi lingê xwe sendelî qulipand û xwe înfaz

---

[916] Ayşe Hür, *Öteki Tarih III Kemalist Devrimler ve İsyanlar*, Profil, İst., 2013, r. 283.
[917] Hür, h. b., r. 284.
[918] Hür, h. b., r. 284.
[919] Hür, h. b., r. 285.
[920] Hür, h. b., r. 286.
[921] Hür, h. b., r. 304.
[922] Hür, h., b., r. 284.

kir."[923] Ayşe Hür derheqê meseleyê da weha dibêje: İhsan Sabri Çağlayangil dibêje ku berîya Seyîd Riza bê daliqandin, gotîye "Em ewladê Kerbaleyê ne, em, bêxeta ne, eyb e, zilm e, cînayet e."[924] "Pişti mejûya 15 mijdara 1937yî li wîlayeta Elazîze daliqandina Seyîd Riza û deh rêhevalên wî, tirkan; navê Dêrsimê ji nexşeyan rakir û li şûna wî navî, Tunceli lê kirin. Herêm heta 1946an jî bi qanûnên rêvebirîya tund hate îdarekirin."[925]

Mehmed Uzun di *Bîra Qederê* da bûyera Dêrsimê wek "qetlîam" binavdike û ji devê Celadet Bedirxan, dibêje ku di van bûyeran da li gor hin agahîyan 10.000, li gor hin agahîyan jî 40.000 kes û li gor hin agahîyan jî 100.000 kes mirin. Uzun tevî ku bi hezaran kes hatibûn kuştin û gelek kes hatibûn daliqandin bêdengîya kurdên derûdora Dêrsimê rexne dike.[926] Li gor Celadet Bedirxan, li Dêrsimê bêhiqûqî, bêexlaqî û bêwijdanîyeke mezin pêk hatibû û hem dinyayê hem jî kurdan tenê temaşe kiribû.

Jan Dost di *3 gav û 3darek*ê da tevî ku mijar Serhildana Şêx Seîd e jî bi nêrîna kesekî ji wextekî dûr ve li dîrokê binêre û şîroveya dîrokê bike, bi gotinên vebêjê xwe rexneyekê li bextê kurdan dike: *"Li Qoçgîrê, Dêrsimê dîsa kurdan gwîzê xwe avêtin ser quba xewna azadiyê. Ew gwîz jî ber bi jêr ve gindirî û şikest."* [927] Dost, serhildanên Qoçgîrî û Dêrsimê bi bîr tîne û leîtmotîva sembolîk ku di romana xwe ya *3 gav û 3darek*ê da gelek caran dubare kiribû dîsa bi kar tîne.

Jan Dost di dema Serhildana Şêx Seîd da bêdengmayîna Seyîd Riza û eşîra wî jî ji devê Şêx Seîd rexne dike. Şêx Seîd ji bo Seyîd Riza dibêje: *"Wê rabe kurê min, wê rabe lê di buharekê de ku, dê rabûna wî bi kêrî min neyê."* [928] Dost bi van gotinan tunebûna yekîtî û hevgirtina kurdan rexne dike û şikestinên serhildanên kurdan bi vê sedemê ve girê dide.

---

[923] Altan Tan, *Kürt Sorunu*, Timaş Yayınları, 8. Baskı, İstanbul, 2011, r. 297.
[924] Ayşe Hür, *Öteki Tarih III Kemalist Devrimler ve İsyanlar*, Profil Yay., İstanbul, 2013, r. 287.
[925] Vladimir Minorsky, Thomas Bois, *Kürt Milliyetçiliği*, Örgün Yay., İst., 2008, r. 120.
[926] Uzun, *Bîra Qederê*, r. 260.
[927] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 136.
[928] Dost, *3 gav û 3darek*, r. 171.

Jan Dost, cih dide rexneya guherandina navê Dêrsimê û bi gotinên ku Badînê Amêdî ji Hisênê Kanzade neqil dike, navê Tuncelî ku li şûna Dêrsimê hatîye bi cihkirin bi etîmolojîyê ve rave dike. Hisênê Kanzade, dibêje ku Dersim di wateya derîyê zîv da ye lê dewletê navê wê kirye Tuncelî. Jan Dost vî navê nû bi kîn û xereza nijadî ve girê dide. Li gor Jan Dost, nav buguhere jî xwîna kurdên Dêrsimê hîn jî resen e. Bîranîna Seyîd Riza hîn jî wek roja ewil jîndar e. [929]

Di *Mijabad*ê da Jan Dost, daliqandina Seyîd Riza bi bîr tîne û cendekê wî yê bi sêdarê ve daliqandî, dişibîne stûneke ji ronahîyê ku di tarîya şevê da li ba dibû.[930] Jan Dost, kuştina mirovên sîvîl bi şêwazeke realîst li ber çavan radixe û rexne dike. Jan Dost ji devê Hisênê Kanzade dibêje:*"Bi sedan keç avêtin çemê Mûnzûrê, heta mehekê hineya bişaftî, çem reş kiribû."*[931] Vebêj-lehengê Jan Dost, Hisênê Kanzade, bi giştî rexneyekê li serhildanên kurdan dike û ji alîyê rêxistinbûyînê ve tevgera kurdan naecibîne Hisênê Kanzade, serhildanên kurdan dişibîne govenda koran.[932] Bi vê teşbîhê ji alîyê leşkerî û sîyasî ve bêpergalbûna kurdan rexne dike.

Serhildana Dêrsimê hem ji alîyê meteda tepisandinê hem ji alîyê bêtifaqîya kurdan di romana kurdî ya dîyasporayê da hatîye rexnekirin. Rexneyên Mehmed Uzun û Jan Dost, li ser bêhiqûqîyên qewimîne kom dibin. Rexneya kuştina kesên sîvîl di vê mijarê da derdikeve pêş. Romannûsan ji alîyê rexneya hişmendîya neteweyî têkilî di navbera serhildana Seyîd Riza û Şêx Seîd da danîne û kurd di warê organîzasyon û birêvebirina şeran da nezan nîşan dane.

4.3.4. Cuntaya 12 Îlonê (1980)

Cuntayên leşkerî bi destxistina îqtîdarê dawî li demokrasîyê tînin û heta demeke nedîyar li ser hikim dimînin. Di rêvebirîya xwe da qayîdeyên hiqûqê datînin alîyekî û bi awayekî destpotîk îqtîdareke tirsê ava dikin. Ev rewşa aloz dibe sedem ku însan ji vî halê awarte bireve û xwe rizgar bike. Binpêkirina qayîdeyên hiqûqê, li hember mafên mirovan ên bingehîn bêtoleransbûn, girtina ser malan, ezîyetên di

[929] Dost, *Mijabad*, r. 40.
[930] Dost, *Mijabad*, r. 41.
[931] Dost, *Mijabad*, r. 41.
[932] Dost, *Mijabad*, r. 41.

girtîgehan da li mirovan dibin, êşkence, xebatên îstîxbaratê yên derveyî qanûnan fikira derketina derveyî welêt bi mirovan ra çêdike.

Li Tirkîyeyê di sala 1980yî cuntayeke leşkerî pêk hat. Sina Akşin dibêje ku "TSKyê bi navê "Harekata Bayraqê" sibeha 12ê îlona 1980yî dest danî ser rêvebirîya Tirkîyeyê. Destdirêjahîya rejimê bêyî tu berxwedanê, gihaşte armanca xwe. Cunta di nava hîyerarşîya fermandeyê da pêk hatibû."[933] Cunta di bin pêşengîya Orgeneral Kenan Evren (1917-2015) da qewimî û bi dehan salan tesîra vê rejîma cuntayê li ser Tirkîye û hemwelatîyên Tirkîyeyê bi awayekî aşkere berdewam kir. "Bi vê darbeyê serokê giştî yê artêşa tirk Kenan Evren hem bû serokê Konseya Ewlehîya Neteweyî hem jî bû serokê dewletê. Kesên ku ev cunta pêk anîn, zagona bingehîn a 1982an amadekirin. Di 7e mijdara 1982an da Kenan Evren bû serokkomar.

Cuntaya 12 îlonê ya leşkerî wek her kesên ku li Tirkîyeyê dijîn darbeyeke mezin li kurdan jî xist. Wek encam gelek kurd hatin desteserkirin û ketin girtîgehan."[934] Konseya Ewlehîya Neteweyî, "Grev, civîn, xwepêşandan qedexe kir, weşanên rojname û kovaran sekinand û peywira ji wezîfeyê menkirina personelê dewletê girte destê xwe.[935] Cuntaya Kenan Evren, micadeleya kurdan ji xwe ra kire armanca sereke. "Desteserkirinên grûbên mezin, operasyonên leşkerî, tepisandina bi darê zorê ya fikirên cîyaxwaz û faalîyetên asîmîlasyonê qismekî mezin ji sazîyên kurdan ji holê rakirin."[936] Rewşenbîr, nivîskar, pêşengên civaka kurdan bi îdîayên pûç hatin hepskirin û tûşî êşkenceyên nedîtî man. "Zilm û zexta li ser nasnameya kurdî gihişte wê asta ku êdî hemû awayên bikaranîna zimanê kurdî hatine qedexekirin."[937]

Altan Tan dibêje ku "Cuntaya 12ê îlonê ya leşkerî darbeya herî mezin li kurdan xist. Êşkence û zilmeke di dîroka însanetîyê da nimûneyên wê kêm tê dîtin, hate pratîzekirin û Girtîgeha Leşkerî ya Dîyarbekirê (5 No'lu) ji bo dîroka însanetîyê û pirsgirêka kurdan bû mîlat.[938] Di kitêba Hasan Cemal a bi navê *"Kürtler"* (Kurd) da Felat Cemiloğlu bi hûrgilî behsa êşkenceyên vê girtîgehê yên bi emirê midûrê

---

[933] Sina Akşin, *Türkiye Tarihi 5 Bugünkü Türkiye 1980-1995*, 3. Baskı, Cem Yay., İst., 2000, r. 26.
[934] İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler*, Nûbîhar, İstanbul, 2017, r. 355-356.
[935] William Hale, *Türkiye'de Ordu ve Siyaset*, (Çev.) Ahmet Fethi, Alfa Yay., İst., 2014, r. 299.
[936] Martin Van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, Wer. Banu Yalkut, İletişim, İst., 2010, r. 61.
[937] Kerîm Yildiz, *Kurdên Sûrîyeyê Gelekî Jibîrkirî*, Avesta, 2009, Stembol, r. 35.
[938] Altan Tan, *Kürt Sorunu*, Timaş Yayınları, 8. Baskı, İstanbul, 2011, r. 380.

girtîgehê Yüzbaşı Esat Oktay Yıldıran (1949-1988) pêk hatine, dike û weha dibêje: "Rojekê desteke gû bi min dane xwarinkirin. Ez li ser lingekî li goşeya dîwar wek ceza sekinîm. Pişt ra ez westîyam, ez ketim xwarê, cezayê bêîteata emir dane min. Li ber dîwar devê kanalîzasyonê vekirin û destkek gû xistin devê min. Pişt ra tevî pîsîyê di devê min da ez ketim pozîsyona amadehîyê. (Hazir ol)"[939]

Di encama cuntaya 12ê îlonê da ji alîyê demokrasî û mafên mirovan ve tabloyeke gelek xirab derkete holê: "TBMM hate girtin, zagona bingehîn ji holê rabû, kilît li derîyê partîyên sîyasî hate xistin, piranî kurd 650.000 kes hate binçavkirin, 1.683.000 kes hate fîşkirin, 50 kes hate daliqandin, 30.000 kes ji kar hatin avêtin, 14.000 kes ji hemwelatîya Tirkîyeyê hate derxistin, 30.000 kes wek miltecîyên sîyasî derketin derveyî welêt, 300 kes bi awayekî şikbar mirin, bi belge 171 kes bi êşkenceyê hatin kuştin. 23 hezar û 677 komele hate girtin, rojname 300 rojî weşan nekirin, li girtîgehan bi tevahî 299 kes mirin, 43 kesan întîhar kirin.[940]

Hıfzı Veldet Velidedeoğlu heyama 12ê îlonê wek "serdema zagonîkirina neheqîyan" [941] binavdike. Lewra leşkeran li gor daxwaza qanûn saz dikirin. Çağlar Kırçak îdîa dike ku: "12ê îlonê dewlet ber bi paş da bi şûna reş da bir, makezagoneke azadî û mafên bingehîn tune dihesibîne bi darê zorê bi milet da qebûlkirin."[942] Li gor Bülent Tanör rejîma 12ê ilonê; îstîqrara hiqûqê û mafên ku bidest ketine xira kirîye, pergaleke bêdad anîye, binpêkirinên mafên mirovan meşrû kirîye û esasên dijraberî prensîbên hiqûqî yên li hemû welatên medenî tên pejirandin bi cih kirîye. [943]

Murat Belge destnîşan dike ku "Geşedana PKKyê esas bi rêvebirîya awarte ra dest pê kir. Li wê herêmê li gundan, li wir û vir da kesên ku şahîdî li bûyerên qewimîne kirin, çîrokên mûyê mirov şûjin şûjinî dikin dibêjin. Pişt ra jî me çîrokên dişibin hev seh kir. Hema bêje agahîya gundîyên ku pîsîya însên bi wan hate xwarinkirin li hemû dinyayê olan da. Ne tenê tiştên li girtîgehan pratîkên li derve jî hebûn. Tiştên ku li girtîgehan dihate kirin cureyeke hunera ezîyet û êşkenceyan

---

[939] Hasan Cemal, *Kürtler*, Doğan Kitap, 2003, İstanbul, 2003, r. 23-32.
[940] Senar Turgut, *Mezopotamya'da Kürt Uygarlık Tarihi*, Belge Yayınları, İst., 2011, r. 135.
[941] H. V. Velidedeoğlu, *12 Eylül, Karşı-devrim*, Evrim yay., İstanbul 1989, r. 440-445.
[942] Çağlar Kırçak, *Türkiye'de Gericilik 1950-1990*, İmge Kitabevi, 2. Baskı, Ankara, 1993, r. 295.
[943] Bülent Tanör, *Türkiyenin İnsan Hakları Sorunu*, BDSYayınları, İstanbul, 1991, r. 342-343.

bûn."[944] Midûrên girtîgehan, li gor kêfa xwe miamele bi girtîyan ra dikirin û tu mafên girtîyan tune bû ku li ber vê zilmê derkevin. Ji xwe erka hiqûqê, ji holê rabûbû. "Di 12ê ilonê da pîvaneke binçavkirinê an jî derdestkirinê tune bû. Çavê wan di kê da bibirîya wî/ê dixistin hundir.[945] Kesên nivîskar, rojnamevan, akademîsyen, hunermend wek potansîyela talûkeyekê dihatin dîtin û ev kes bîlasebeb dihatin girtin.

Mahmut Baksi di romana *Hêlîn*ê da piştî 12ê îlonê tevgera leşkerên artêşa tirk û operasyonên wan ên li ser gundan ji devê Hêlîna zarok rexne dike. Baksi di vê rewşa awarte da ku ewlehîya sîvîlan nemaye û heq û hiqûq bûye gotineke vala, neheqî û zilma leşkeran a li meydanên gundan li gundîyan dikin, bi şêwazeke dramatîk dişayesîne. Li gor vebêj-lehenga bi navê Hêlînê, leşkeran bi şîşên tivingan li mirovan dixistin û hemû zilm û zordarî li ber çavên zarokan diqewimî. [946] Êşkenceya ku bi destê leşkeran li xelkê herêmê dihate kirin û qareqara mirovên bêhêvî, dîmeneke tîjî xof li ber çavên xwîneran radixe.

Baksi, bûyerên piştî 12ê îlonê ku li gundan dihate qewimîn, wek xezeba hikûmetê dinirxîne û bêhêvîbûna mirovan radigihîne. Baksi, bi navgînîya Hêlînê, dibêje ku rizgarbûna ji destê wan ne pêkan bû, mirov di destê wan da wek hêsîran bûn.[947] Li gor Hêlînê çawa ku efendîyên xwedîyên hêsîran tu rehm li wan nedikirin, kesên ku zilm li mirovan dikirin jî tu rehm nediket dilê wan. Baksi, ji devê Helînê dibêje ku *"Leşkeran carinan dest diavêt çiçikên jinan, gavên wan ji hev vedikirin û dikeniyan."*[948] Hêlînê, dema behsa kirinên ne li rê yên leşkeran dike dibêje ku kêsên mêr jî leşkeran bi zorê 'telîma leşkerî bi wan dikirin ku ev jî cureyeke ezîyetê bû. Marş bi wan dihate xwendin, bi emirê serbazan di nava stîrîyan da li ser zikê xwe dihatin kaşkirin. [949] Vebêjê Baksi destnîşan dike ku hikûmetê namûs û şeref ji gel ra nehiştîbû. Jin di nava lingên wan da mabûn û mirin ji halê wan çêtir bû. [950]

---

[944] Murat Belge, *Linç Kültürünün Tarihsel Kökeni: Milliyetçilik*, Agora, İstanbul, 2006, r. 202.
[945] Çağlar Kırçak, *Türkiye'de Gericilik 1950-1990*, İmge Kitabevi, 2. Baskı, Ankara, 1993, r. 295.
[946] Baksi, *Hêlîn*, r. 42.
[947] Baksi, *Hêlîn*, r. 42.
[948] Baksi, *Hêlîn*, r. 43.
[949] Baksi, *Hêlîn*, r. 43.
[950] Baksi, *Hêlîn*, r. 43.

Mehmed Uzun di romana *Tu*yê da bi zimanekî îronîk rexneya 12ê îlonê dike. Uzun ji devê lehengê xwe dibêje ku general (qaşo) ji bo parastina gel dest danîbûn ser rêvebirîyê. Ji bo çêyîya gel her tişt dianîn serê gel. Lêdan û îşence her tişt di nava vê çêyîyê da bû! [951] Dîsa ji bo çêyîya wan mafên wan ên însanî û hiqûqî ji destên wan digirtin. Uzun bi van gotinên vebêjê xwe, şêwaza naveroka axaftinên generalên cuntager rexne dike û bal dikêşe ser encamên cuntaya 12ê îlonê ku di ser her tiştî ra mîna gundorekî derbas bû. Vebêjê Uzun, generalên cuntager rexne dike û li Tirkîyeyê tradîsyona cuntayan bi bîr tîne. Vebêjê Uzun, dibêje ku generalan cunta kirine adet û her cara ku derbe çêdibû mirov dihatin sûcdarkirin: [952] Li gor Hêlînê, leşkeran digirtin ser gund û bajaran û gel bêzar dikirin, kêfa wan kê bixwesta ew digirtin û bi xwe ra dibirin. [953] Ev dîmenên realîst, tabloya Tirkîye ya wê demê li ber çavan radixin.

Di derketina holê ya dîyasporaya kurdî da sedemeke giring, encamên cûntaya 12ê îlonê ne. Gelek kurd, piştî 12ê îlona 1980yî hatin binçavkirin, di hepsan da man, êşkence dîtin û talîyê ji bêgavî berê xwe dane dîyasporayê. Di romana kurdî ya dîyasporayê da bi taybet di romanên nivîskarên bakur da şopên 12ê îlonê gelek in. Ji ber vê yekê 12ê îlonê di dîroka wêjeya kurdî da jî xwedî şopên reş e.

4.4. Rexneyên li Dîroka Îranê

4.4.1. Komara Mahabadê (1946)

Mahabad ji alîyê sîyasî û îdarî ve bajarekî girêdayî Îranê ye. Wîllîam Eagleton Jr, bajarê Mahabadê weha terîf dike: "Mahabad li başûr û jorî qeraxa rûbara zelale ku bi çemên başûr ên li bilindahîyên Megûrê xwedî dibe. Li herêmê ji vê rûbarê re Çemê Saûcbûlaq tê gotin. Loma ji Mahabadê re hê jî Saûcbûlaq an jî Seblax tê gotin."[954]

Serokê Komara Mahabadê Qazî Mihemed (1893-1947), kurê Qazî Elî û nevîyê Qazî Qasim bû. Dîya wî ji eşîra Feyzûllah Begê Saqizê bû. "Di 22yê çileya

---

[951] Uzun, *Tu*, r. 26.
[952] Uzun, *Tu*, r. 26.
[953] Uzun, *Tu*, r. 27.
[954] William Eagleton Jr, *Komara Kurdistanê ya 1946'an*, (Wer.) Fahrîye Adsay, Avesta, Stenbol, 2019, r. 46.

1946an gelê bajêr û eşîrîyên ji derveyî bajêr li Qada Çarçirayê kom bûbûn.(…) Qazî hilkişîya ser platforma darînî. (…) û got: kurd, şîyar bûne û dostên wan î xurt hene. Ji niha şûn de Komara Kurdistanê ya Otonom hate damezirandin. Di nav qêrînên gel de Qazî, spasîya Komîteya Navendî û gelê Kurdistanê kir.[955] Belê, Komara Mahabadê ava bû û Qazî Mihemed wek serokkomarê ewil hate pejirandin. Di 26ê adarê de Yekîtîya Sovyetan ji nişka ve helwesta xwe guhert ku hemû yekîneyên leşkerî yên Sowyetî, wê di nav penc an şeş hefteyan de ji Îranê derkevin.[956] General Humeynî piştî hişyarî da piştî çil û heşt saetan di 22yê sibatê de artêşa Îranê çû Neqedeyê, kes li hemberî wan derneket. Mele Mistefa Barzanî (1903-1979) (Fermandarê giştî yê Artêşa Komara Mahabade) hêzên xwe dan hev û berê xwe da alîyê sînor.[957]

Di 23yê çileyê da piştî dadgehkirina li mehkemeya leşkerî cezayê îdamê dan Qazî Mihemed. Seîd Veroj radigihîne ku berîya îdamê, Qazî Mihemed weha got: "Xwedayê min! Tu şahîd î ku ji bo vê neteweyê çi ji destê min hat, min kir. (…) Xwedayê min! Li vê dinyayê û li qiyametê tola mezlûman ji zaliman bigire. (…) Xwedayê min ê ku ji her tiştî agahdar î, hemû neteweyên tên binpêkirin û neteweya kurd ji nîrê zaliman xelas bike!" [958] Qazî Mihemed, tevî 13 serokên kurdan di sala 1947an li hember gel hate daliqandin. Barzanîyan, heta sînorên Sowyetan şer kirin berxwedaneke dîrokî nîşan dan. Barzanî, îltîca kir. [959]

Robert Olson îdîa dike ku Komara Mahabadê ji bo tevgera neteweperwer ku nû li Tirkîyeyê derketîye holê, bûye çavkanîya îlhamê. Ji Peymana Sevrê (1920) û pê ve cara yekem pirsgirêka kurd bi temamî bû pirsgirêkeke navneteweyî. [960] "William Eagleton Jr ji rojnameye Newyork Times jimareya 4ê adara 1946an weha neqil dike: Di 26ê adarê da bi îlana Gromyko, Yekîtîya Sovyetan şertên peymana avakirina şîrketeke Îranî-Sovyetî ya neftê jî îlan kirin. [961] "Artêşa Mahabadê bi temama xwe 70 efserên wê yên çalak hebûn 40 jî nefser (astsubay) û 1200 serbaz. Piranîya efseran di hikûmetê de jî di karên îdarî de peywirdar bûn. Di nav hêzên Mahabadê de û dûre di

---

955 Eagleton Jr, h., b., r. 84.
956 Eagleton Jr, h., b., r. 110.
957 Eagleton Jr, h., b., r. 159.
958 Seîd Veroj, *Dadgehkirina Serokkomar Qazî Mihemed*, Bîr, Dîyarbakir, 2007. r. 85.
959 Senar Turgut, *Mezopotamya'da Kürt Uygarlık Tarihi*, Belge Yayınları, İstanbul, 2011, r. 13.
960 Robert Olson, *Kürt Meselesi ve Türkiye İran ilişkileri*, Avesta, İst., 2010, r. 49.
961 Eagleton Jr, h. b., r. 110.

enîya bi Barzanîyan re donzdeh zilamên xort hebû ku berê di artêşa Îraqê de bûne û bi Mele Mistefa re bûn an beşdarî Komara Kurdistanê bûbûn." [962]

Jan Dost xisûsî li ser Komara Mahabadê romaneke dîrokî bi navê *Mijabad* nivîsîye û gelek rexneyên dîrokî di çarçoveya tevna vê romanê da bi cih kirîye. Jan Dost ji devê Emîral Axa, dibêje: heger girêdana Komara Mahabadê bi behrê ra çênebe dê komara bihedime.[963] Jan Dost, bi navgînîya lehengê xwe Badînê Amêdî dibêje Komara Mahabadê di tizbîya dîroka kurdî da dişibîne daneyekê û lê zêde dike ku ev tizbî dê di nava tilîyên çerxa felekê da birize. Dost, piştî damezirandina komarê bi du mehan tevgera rûsan ku li hember wan guherîye bi bîr tîne û destnîşan dike ku rûsan sozên xwe ji niha ve xwarin. [964] Badînê Amêdî, bi van gotinan dixwaze bibêje ku dewleta tena serê xwe nikaribe li ser xwe bisekine tu siberoj ji wê ra tune ye. Jan Dost, rewşa Qazî Mihemed û Komara Mahabadê bi navgînîya Kalikê Badînê Amêdî (Entranîk) weha dinirxîne: *Ew mirovekî heta tu bixwazî saf û dilpak e, lê ketiye konukê pîrê û ez bawer nakim ku ew bikaribe xwe jê rizgar bike."* [965] Konikê pîrê metafora kêmînê ye ku ji bo rewşa Qazî Mihemed şênber bike hatîye bikaranîn. Lewra Sowyetan û Îranê bi peymanên veşartî destê xwe dane hev û Sowyetan Qazî Mihemed xapandine.

Îxanet di dîroka kurdan xaleke giring e ku bûye mijara rexneyan. Di dîroka serhildanên kurdan û dema mîrektîyan da gelek îxanetan, herikîna dîrokê guherandine. Binbaşı Qaso ku hevlingê Şêx Seîd bû û li wî îxanet kir, aqûbeta serhildanê guherand. Ezdînşêr ku pismamê Mîr Bedirxan bû û îxanet li wî kir, bû sedema şikestina Serhildana Mîr Bedirxan.

Jan Dost bi rêyê lehengê xwe Badînê Amêdî dibêje ku rewşa komarê xirab e Emerxan û Şah Riza destê xwe dane hev û tê gotin ku Emerxan di nava xiyanetê da ye.[966] Li gor Badînê Amêdî, serokeşîrê şikakîyan bi Şahê Îranê Hemê Riza ra li hev

---

[962] Eagleton Jr, h. b., r. 115.
[963] Dost, *Mijabad*, r. 26 .
[964] Dost, *Mijabad*, r. 35.
[965] Dost, *Mijabad*, r. 205.
[966] Dost, *Mijabad*, r. 226.

kir û pişta xwe dan komarê [967] "Di 6ê nîsanê de serokwezîrê Îranê Qewam Siltan û Balyozê Sovyetî yê li Tehranê I. G. Sadçikov li ser peymanekê li hev kirin. Vebêjê Jan Dost, Badînê Amêdî, derheqê vê peymanê da weha dibêje: *"Rûsan peymana petrolê bi xwîna Mehabadîyan îmze kir."*[968] Li gor peymanê wê hêzên Sovyetî di 6ê gulanê de ji Îranê derkevin." [969] Jan Dost, vê peymanê wek peymeneke îxanetê dinirxîne.

Di romana kurdî ya dîyasporayê da emirqutîya Komara Mahabadê gelek caran bûye mijara rexneyan. Rexneya ku sînorên komarê nagihêje behrê û ji ber vê yekê jî dê emirqutî bibe, wek tespîteke giring derdikeve pêş. Komara Mahabadê, wek metafora têkçûyîna xeyalên kurdan hatîye dîtin û bawerîya kurdan a bi rûsan ve hatîye rexnekirin.

4.4.2. Serhildana Simko Axayê Şikakî (1918 -1922)

Îsmaîl Axayê Şikakî (1887-1930) serokê eşîra şikakîyan bû. "Di navbera salên 1918 û 1922yan da piranîya Kurdistana Îranê xistibû bin hikmê xwe. Piranî bi leqeba Simko tê bi bîr anîn. Simko Axa, lawê serokê eşîra şikakan bû. Piştî kuştina birayê wî Cafer Axa li Tebrîzê ji alîyê walîyê Ezerbeycanê wek serokê eşîra şikakan dest bi tevgera xwe ya sîyasî kir."[970] İsmail Axa, di Şerê Mîandobad ê sala 1922an da serleşkerê artêşa Îranê Halo Qurban kuşt. Hêza wî gîhaştibû 10.000 leşkerî. Lê pişt ra di şerê Sarıtacê da têk çû. Fermandarekî Îranî Hassan Mukaddem ji wî ra nameyek şand û nûçeya efûkirina wî gihandê û ew vexwende Ûşnûyê. Li vê deverê di kêmînekê da hate kuştin. (30 tîrmeh 1930).[971] Piştî mirina wî serhildanên eşîran li rojhilata bakur domand. Serhildanên li dewletên wek Tirkîye û Îraqê jî di bin bandora vê serhildanê da man.[972]

İsmail Ağaye Şikaki (1887-1930), Şikaki kabilesinin lideriydi. "1918-1922 yılları arasında Kürdistan'ın büyük bir kısmını hakimiyeti altına aldı. Çoğu Simko takma adıyla hatırlanıyor. Simko Axa, çocuk Shikakan klanının lideriydi. Kardeşi

---

[967] Dost, *Mijabad,* r. 228 .
[968] Dost, *Mijabad,* r. 238 .
[969] William Eagleton Jr, *Komara Kurdistanê ya 1946an*, Avesta, Îst., 2019, r. 110.
[970] İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler*, Nûbîhar, İstanbul, 2017, r. 406.
[971] İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler*, Nûbîhar, İstanbul, 2017, r. 406 - 407.
[972] Senar Turgut, *Mezopotamya'da Kürt Uygarlık Tarihi***,** Belge Yayınları, İstanbul, 2011, r. 86.

Cafer Axa'nın Tebriz'de Azerbaycan valisi tarafından öldürülmesinin ardından Şikakan kabilesinin lideri olarak siyasi hareketine başladı.[973]

Dr Abdurrahman Qasimlo destnîşan dike ku: "Simko (İsmail Axa) Hemû herêma rojavaya Gola Ûrmîyeyê bi dest xistîye û ji bo azadîya Kurdistanê têkoşîn kirîye." [974] Qedrîcan di nivîsa xwe ya bi navê "*Kurdên Ecemistanê û Halên Wan*" ya Kovara Hawarê da dibêje ku: "Berîya Şahê Pehlewî "Ecemistan dewleteke mirî bû. Smaîl Axayê şikakî yê ko bi navé Sîmko deng daye ji walîyên Ecemistanè xweykî (xoki) distandin. Di gel vé hindê eceman sîyasetek di heqê kurdmancan de hebù. Ewan jî wek tirkan dixwest kurdan temsîl bikin, yanî kurdan bikin ecem." [975] Dewletên serdest micadeleya bi kurdan ra ji şûr û mertal bêtir bi rêya asîmîlasyonê kirine û xwestine kurdan di nava neteweyên xwe da bihelînin

Îngilizan di herêmê da dixwestin roleke dîzaynker bilîzin ji ber vê çendê "Di sala 1925an da Îngilizan, Riza Xan, vê dawîyê Riza Şah, li Îranê anîn îqtîdarê. Riza Xan dixwest ku dewleteke navendî pêk bîne. Ji bo vê armancê Simko, di 21ê hezîrana 1930yî da ji bo ku li Ûşnû bi rêvebirên leşkerî yên Îranê ra hevdîtinan pêk bîne hate vexwendin pîşt ra hate kuştin."[976] Ervand Abrahamian radigihîne ku "Serokê kurd Simko ji bo vegere welêt hate xapandin û kuştin." [977]

Abbas Vali, derheqê Serhildana Simko Axayê Şikakî da dibêje ku "Tevgera Şêx Seîd a li Tirkîyeyê û Serhildana Simko ya li Îranê ji alîyê xisûsîyet û armancên wan ve hinekî cuda bin jî di nezera fermî ya li hember kurdan da bûne sedema bandorên mîna hev." [978]

Jan Dost di *Mijabad*ê da Serhildana Simko bi bîr tîne û definkirina wî weha dişayesîne: *"Du leşkerên îranê hatin nava kuştiyan ku termê Simko hilgirin, qelûnek*

---

[973] Robert Olson, *Kürt Meselesi ve Türkiye İran İlişkileri*, (Wer.) Hikmet İlhan, Avesta, İst., 2010, r. 44.
[974] Dr. Abdurrahman Qasimlo, *İran Kürdistanı*, Belge Yayınları, Birinci Baskı, İstanbul, 1991, r. 28.
[975] *Hawar*, 2 Hejmar 24-57, (1934-1943) Weş. Nûdem, Stockholm, 1998, r. 855.
[976] Dr. Abdurrahman Qasimlo, *İran Kürdistanı*, Belge Yayınları, Birinci Baskı, İstanbul, 1991, r. 28.
[977] Ervand Abrahamian, *Modern İran Tarihi*, (Çev.) Dilek Şendil, Türkiye İş Bankası Yay., 4. Basım, İst., 2017, r. 122.
[978] Abbas Vali, *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, Çev: Fahrîye Adsay, Ümît Aydoğmuş, Sema Kılıç, Avesta, İstanbul, 2005, r. 126.

zîvkirî vala di nav lepê wî yê bi xwîn de bû.[979] Meseleya ji alîyê Îranê ve xapandina Simko û kuştina wî ya bi dek û dolab, bandoreke mezin li ser eşîra şikakan kirîye. "Simkoyê ku xwedî kesayeteke sîyasî ya bi nîqaş e ji alîyê gelek kesên dema xwe ve wek 'feodal' û "eşqîya" dihate dîtin." [980] Jan Dost, derheqê vê meseleyê da ji devê kalekî werîsfiroş, dibêje ku Simko Axa, êrîşî Mahabadê kirîye û gelek mal talan kirîye. Malên ku talan kirîye jî li pişta xwedîyaên kirîye.[981] Bi van gotinan vebêjê Dost, rexneyeke neyênî li Simko Axa û tevgera wî jî dike ku wan, ji bo armanca xwe zilm û zor dane ser xelqê Mahabadê.

Serhildana Simko Axa, di peywenda romanên dîyasporayê da tenê di romana *Mijabad*ê ya Jan Dost da cih digire û li ser vê bûyerê hin rexne li dewleta Îranê hatine kirin. Simko Axayê Şikakî jî bi hin kiryarên xwe yên şakîtîyê para xwe ji rexneyên Jan Dost girtîye.

4.5. Rexneyên li Dîroka Îraqê

4.5.1 Serhildana Şêx Mehmûdê Berzencî (1919)

Şêx Mehmûdê Berzencî (1854-1956) di salên 1920î da li başûrê Kurdistanê hem wek şêxekî qadirî hem jî wek serokekî neteweyî dihate nasîn. Şêxê qadirî û serokê neteweperwer Şêx Mehmûdê Berzencî (1878-1956) piştî Cenga Cîhanê ya Yekem di sala 1919an da li hember mandaya îngilizan serî hilda û herêma Silmanîye bi dest xist. "Şêxê mûxterîs û karîzmatîk Mehmûd Berzencî, daxwaz dikir piştî şer Kurdistaneke xweser ava bike."[982]

Di meha Berfanbarê ya sala 1918an da Serdarê îstîxbarata ingilizan Noel, Şex Mehmûdê Berzencî wek walîyê Silêmanîye tayîn kir û erka birêvebirina hemû eşîrên kurdan da destê wî. Piştî gulana 1919an Şêx Mehmûdê Berzencî xweserîya Kurdistanê îlan kir. Di 17 hezîrana 1919an da di Şerê Bazyan da têk çû û sirgûnî Hindîstanê bû. Şêx Mehmûd Berzencî di îlona 1922an da vegerîya Silêmanîye. Di mijdara 1922an da xwe wek qiralê Kurdistanê îlan kir. Hikûmeteke ji 8 wezîran pêk

---

[979] Dost, *Mijabad*, r. 34.
[980] İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler*, Nûbîhar, İstanbul, 2017, r. 407.
[981] Dost, *Mijabad*, r. 193 .
[982] İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler*, Nûbîhar, İstanbul, 2017, r. 97.

tê, ava kir. Pûlên postayê çap kir ji tûtinê bac stend.[983] Piştî tepisandina serhildanê Şêx Mehmûd Berzencî, di 1931ê da nefyî Nasirîye ya li Başûrê İraqê ye bû. Şêx, di 1956an da li Silêmanîye koça dawî kir.

Serhildana Şêx Mehmûdê Berzencî, tevgereke netewperwerî ye û armanca vê serhildanê, avakirina xweserîya Kurdistanê ye. Ji ber vê yekê di diroka serhildanên kurdan da cihekî taybet digire. Hişmendîya neteweyî ya Şêx Mehmûdê Berzencî ji gelek dûajoyên wî ra bûye çirûska netewperwerîyê. Encamên vê serhildanê û serhildanên din ên meteweyî yên kurdan, tova dîyasporaya kurdî avêtin transkafkasya û Ewropayê.

"Şêx Mehmûdê Berzencî, di heyama Şêrê Cîhanê yê Yekem da ji alîyê dewleta Osmanîyan ve arîkarîya pereyan û çekan dît, pîştî şer li Silmanîyê bû hêza herî otorîter a herêmî. Di gulana 1919an da piştî serhildana wî ya li hember îngilizan ji alîyê wan rêvebirîya wî ya li Silêmanîyê hate nasîn. Piştî şer, Şêx Mehmûdê Berzencî ku neytê wî avakirina Kurdistaneke serbixwe bû, peywirdarên leşkerî û sîyasî yên îngilizan derdest kir û xwe wek "Qralê Kurdistanê" îlan kir. Hêzên wî di meha hezîranê da li nêzî Silêmanîyê li Derbend Bazyan têk çûn û Şêx Mehmûd ji alîyê îngilizan ve hate derdestkirin û sirgûnî Hindistanê bû." [984] Piştî vê sirgûnê bi demekê Şêx Mehmûd, xwe li Îranê girt. Di sala 1930yî da dîsa serî hilda. Di 1931ê da sirgûnî Nasirîyê bû. Vegerîya Silêmanîyê û heta dema wefata xwe li Silêmanîyê ma. Di 1956an da mir. [985] Şêx Mahmûdê Berzencî, di dîroka kurdan da yek ji nûnerê netewperwerîya kurdî tê hesibandin ku armanca wî avakirina dewleteke kurdan a serbixwe bû.

Jan Dost di *Mijabad*ê da şikestina Serhildana Şêx Mehmûdê Berzencî bi gotinên kesekî bi navê Emîral Axa, rave dike: *"Bêgane can dezanî bo çî Şêx Mehmûd be ser nekewt? Şarî Silêmanî bender nebû, çîya hîç in."* [986] Tenê di destê wî da çîya hebûn û çîya jî dema bêne dorpêçkirin cihê revê jî namîne û arîkarî jî nagihêjin tu kesî. Jan Dost, neşandina arîkarîyê ji devê Refîq Hilmî, rexne dike û

---

[983] Vladimir Minorsky, Thomas Bois, *Kürt Milliyetçiliği*, (Wer.) Kolektîf, Örgün Yay., İst., 2008, r. 126-127.
[984] İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler*, Nûbîhar, İstanbul, 2017, r. 97.
[985] İbrahim S. Işık, h. b., r. 99.
[986] Dost, *Mijabad*, r. 26.

dibêje: *"Tu kes bi hawara Şêx Mehmûd ve nehat. Di civînan de me kumik li serê hev sor dikir, zengelokên me qetiyan, hingî em bibêjin divê alîkariya wî bibe."* [987] Li ser meseleya arîkarîyê lehengê Jan Dost, Şêx Mehmûdê Berzencî, rexneya Sovyetan jî weha dike: *"Em çi bikin! Xwîna kurdan li bazara her dewletê erzan e."*[988] Ev gotin tena serê xwe rexneyên li ser dîroka kurdî xulase dike.

Romannûsên dîyasporayê hem bûyer û kesayetên dîrokî di peywenda dîroka Kurdistanê da rexne kirine hem jî di peywenda dewletên desthilatdar da rexneyên mijarên dîrokî kirine. Mehmed Uzun, Jan Dost, Helîm Yûsiv, Mahmut Baksi di romanên xwe da bi gelek boneyan cih dane rexneyên dîrokî.

[987] Dost, *Mijabad,* r. 78.
[988] Dost, *Mijabad,* r. 104-105.

ENCAM

Di romana kurdî ya dîyasporayê da bi awayekî şênber rexneyên civakî, sîyasî û dîrokî bal dikêşe. Mijar her çi dibe bila bibe nivîskaran bi gelek celeban rexneyên xwe di tevna romanan da bi cih kirine û bi rêya edebîyatê peyam dane xwînerên xwe. Mahmut Baksi, Mehmed Uzun, Hesenê Metê, Firat Cewerî, Helîm Yûsiv û Jan Dost ku me çarçoveya teza xwe bi romanên wan berteng kirîye di romanên xwe da rexneyên tund li civak, sîyaset û dîrokê kirine.

Rexneyên di romana kurdî ya dîyasporayê da ji alîyê civakî ve piranî li ser van meseleyan tîr bûne: gundîtî û pergala eşîrî û axatîyê, serdestîya began, şerên di navbera êl û eşîrên kurdan diqewimin, xizanîya gundîyan, fesadî û sîxurîya di nava civakê da gwîr û geş dibe û hwd. Romannûs, mîr axa û begên civaka kurdan wek sedemeke paşdemayîna gelê kurd nirxandine û gelek çavkanîyên arîşeyên civakê bi pergala axatîyê ra girê dane.

Di romanên ku mijara vê xebatê ne mîr, bi serhişkîya xwe û bi cahiltîya xwe bûne mijara rexneyan. Hêza rêvebirîyê ku ji mîrên layiq, derbasî kesên bêlîyaqat dibe, hatîye rexnekirin. Romannûsan, mîrên kurdan piranî ji hişmendîya neteweyî dûr nîşan dane û îmaja ku ji bo berjewendîyên xwe dikarin hevkarîyê bi dijminan ra jî bikin, bi wan ve zeliqandine. Romannûsên dîyasporayê, gelek rexne li partîyan û partîzanîyê kirine. Jan Dost, Helîm Yûsiv û Firat Cewerî, rexneya sîyasî ya partîyên kurdan kirine. Nakokîyên polîtîk û tunebûna yekîtîya neteweyî temaya hevpar a rexneyan e.

Gundi di romana kurdî ya dîyasporayê da bi nezanî û bêmirêzîyê herweha bi berjewendîparêzîyê hatine teswîrkirin Jan Dost û Mahmut Baksi, bêtir li ser gundîyan sekinîne û jîyan û ramanên wan kirine mijara rexneyên xwe yên civakî. Nivîskarên navborî ji alîyekî din ve wek ferdên ku civakê ava dikin li ser însan sekinîne. Têkilîyên di navbera jin û mêran, nêrîna civakê ya li jinan û pirsgirêkên malbatî di rexneyan da derdikevin pêş. Însan, ji alîyên fesadî, durûtî, nezanî, nankorîyê û xizanîyê ve hatîye rexnekirin. Di romanên dîyasporayê da rexneya xizanî û belengazîya kurdan gelek caran derdikeve pêşberî xwîneran û romannûs,

dîmenên xizanîya kesên giregir û berevajîyê vê rastîya civakê, aramîya kesên dewlemend, wek nakokîyeke çînî di tevna romanan da bi cih kirine.

Dîn û bawerî jî di rexneyên civakî da xaleke giring e ku di romanên dîyasporayê da xwedî cihekî berfireh e. Di serî da rexneya Xweda û pêxemberan, a şêx û meleyan û bi gişti rexneya dînê îslamê giranîya rexneyên civakî teşkîl dike. Romanên dîyasporayê, Xweda wek sersebebê azarên ku mirov dikêşin nîşan dane û romannûsan bêdengîya Xweda ya li hember zilmê rexne kirine. Pêxember jî piranî bi pasîvîzebûnê tewanbar kirine. Carinan jî pêxember wek sedema nakokî û pevçûnên nava civak û miletan destnîşan kirine. Romannûsan, mela û seydayên civaka kurdan ji ber kiryarên wan ên berjewendîparêz di civakê da wek rolmodelên neyênî şayesandine.

Rexneya sîyasî di romana kurdî ya dîyasporayê da berbelav e. Romannûsên dîyasporayê bi xwe ji ber sedemên sîyasî ji welatên xwe derketine û li wargehên dîyasporayê bûne penaber û jîyana xwe li van deveran borandine an jî diborînin. Şert û mercên sîyasî yên dewletên ku terk kirine, bûne sedema naskirina wan a jîyana dîyasporayê. Romannûsên dîyasporayê di warê sîyasî da ji mîrên kurdan bigire heta partîyên kurdan û ji dewletên terîtoryal ên desthilatdarê Kurdistanê bigire heta dewletên teşe dane sîyaseta cîhanê -Îngilîztan, Fransa û Rûsya- rexne kirine. Nasnameya neteweyî, êşkence, ziman, asîmîlasyon, dîktatorî, îdeolojî û binpêkirina mafê mirovan hin xalên giring in ku di rexneyan da derdikevin pêş.

Nivîskarên ku em li ser romanên wan xebitîne, wekî çavkanîya arîşeyên sîyasî, civakî û dîrokî li meseleya zimên nêrîne û qedexekirina zimên bi tundî rexne kirine. Li gor wan, qedexeya zimanê zikmakî ne li gor dadwerîya îlahî ye. Romannûsan, piranî polîtîkayên zimên ên dewletên serdest rexne kirine û diyar kirine ku guvaşa li ser zimên, mebesta asîmîlasyonê dihewîne. Asîmîlasyon bi gişti di warê ziman, perwerde û nasnameya neteweyî da hatîye rexnekirin. Romannûsên dîyasporayê li gor mercên sîyasî û çandî nêzî vê meseleyê bûne û encamên tirkîfîkasyon, erebîfîkasyon û persîfîkasyonê li ber çavan raxistine û ev rewşa sîyasî rexne kirine.

Gelek karakterên romanan ji ber têkilîyên bi ziman û çanda xwe ra tûşî êşkenceyan bûne. Romannûsan, hûrgilîyên van êşkenceyan bi kitekit resimkirine û bi awayekî dîrekt carinan jî endîrekt ev êşkence rexne kirine herweha wek wesîqeyên demekê, xwestine ku van bûyeran di tevna romanên xwe da bi cih bikin. Romannûsên dîyasporayê ji ber ezmûnên xwe yên mişextîyê piranî bi navgînîya karakterên xwe li ser jîyana mişextîyê û zehmetkêşîya mişextîyan sekinîne.

Rexneya îdeolojîyan piştî gelek ezmûnan wek poşmanîyekê derdikeve ser dika romanan. Karakterên ku jîyana xwe di rêya bîrdozîyekê da serf kirine, pey xeyala şoreşê ketine û talîyê li rastîya cemidî likumîne û têgihiştîne ku veguhestina dinyayê ne şuxleke ew qasî hêsan e, bi şikestina xeyalên xwe li demên borî zîvirîne û mihasebeya jiyana xwe kirine. Di monolog an jî dîyalogên romanan da ev kirîtîk û otokirîtîkên nostaljîk, bûne navgînê derbirîna kul û keserên romannûsan.

Rexneyên binpêkirina mafên mirovan di romanên dîyasporayê da cihekî fireh digire. Girtina ser malan a ji alîyê hêzên ewlehîyê û kiryarên wan ên derveyî zagonên navneteweyî bûne mijarên rexneya romannûsan. kuştin, bêrûmetkirin, şewitandina gundan, bêhurmetîya li hember termên kuştîyan di rexneyên nivîskaran da hin xalên giring in ku derdikevin pêşberî xwîneran

Dîrok di romana kurdî ya dîyasporayê da ji bo rexneyan qadeke hevpar e. Nivîskarên dîyasporayê, xisûsî li ser kesayet an jî bûyerên dîrokî roman nivîsîne û xwestine dîroka kurdan bê famkirin. Hişmendîya dîrokê, meseleya keldanî û nastûrîyan û fermana Mîr Bedirxan Paşa, peymanên ku qedera kurdan tayîn kirine, serhildanên kurdan, Şerên Cîhanê yê Yekem û Duyem. û Komara Mahabadê heta Cuntaya 12ê îlonê; hin mijarên di romana kurdî ya dîyasporayê da bûne mijara rexneyên dîrokî.

Serhildana Şêx Seîd di romana kurdî ya dîyasporayê da wek şikestina hêviyên neteweyekê hatîye nirxandin. Sedemên serhildanê, pêvajoya wê û encamên wê yên

giran, bala nivîskaran kişandîye û ev bûyer ji perspektîfa dîrokî û sîyasî ve hatîye rexnekirin.

Mahmut Baksi di romanên xwe da eşîrî û axatîya di civaka kurdan da bi tundî rexne kirîye. Zor û zilma axayên ku li ser gundîyan dikin, feqîrî û bêgavîya gundîyan û orf û adetên civakê ku li pişta jinan wek gundorekî barkirî ne, mêrxasîya kurdên li hember zextên zaliman û şikestinên dîroka kurdan, bûne armanca tîrên rexneyên Mahmut Baksi.

Mehmed Uzun piranî jînenîgarîya navdarên kurdan û enînivîsa wan a parçebûn û belavbûnê di tevna romanên xwe da dirêse û hewl dîde hebûna kurdan a tê înkarkirin, bi ziman û naveroka romanên xwe yên dîrokî û civakî pûç bike. Uzun, di heft romanên xwe da dîrok, sîyaset û civakê bi gelek dirûvên rasteqîn rexne kiriye. Rexneya mîrektîyên kurdan, xeletîyên wan, şer û pevçûnên di nava kurdan, xayintî û çavsorîya wan a li hember hev, nezanî û xemsarîya wan a kevnare, di warê sîyasetê da kêmasî an jî şaşîtîyên wan û rûpelên dîrokeke bi pênûsa dijminên wan hatîye nivîsîn, bi şêwazeke mixabinî bûne armanca tîrên rexneyên Mehmed Uzun. Rexneyên Uzun, carinan ji devê karakterekî carinan jî bi vegêraneke alegorîk ango nixumandî hatine vegotin.

Hesenê Metê, gelek caran cih daye rexneyên civakî, sîyasî û dîrokî. Di romanên Metê da rexneyên tund li hember dîn û bawerîyan jî hene. Bêtoleransîya dînan a li hember hev û xurafeyên kesên bawermend, navenda rexneyan e. Metê, rexneyên xwe yên tûj, bi derfetên berfireh ên vegêrana îronîyê kirîye.

Firat Cewerî, tevna romanên xwe li ser hal û mercên serborîya penaberîya kurdan ava kirîye. Cewerî, serencama Tirkîye ya pêncî salên dawî, heyf û mixabinîyên dem û dewranên borî, qiriktalîya şoreşgerên çogşikestî, serdestîya mêran, guherîna jinan a civakî, poşmanîya penaberên diltenik û hestên tevlihev ên dîyasporayê kite bi kite vegotîye û rexneyên tûj li civak, sîyaset û dîroka kurdan kirîye. Nîvê panoramaya rexneyên Cewerî, 1980yî temsîl dike. Nîvê din jî jîyana kurdan a piştî 1980yî li ber çavan radixe.

Helîm Yûsiv di romanên xwe da gelek rexneyan li civak, sîyaset û dîroka kurdên Sûrîyeyê kiriye. Rewşên têkel ên zarokatîyeke bicoş, sergermîya şoreşgerîya ciwantîyeke şerpeze, civakeke nezan a serhişk, mirovên belengaz ku di bin sîya peykerên dîktatoran da ji taqîbat û êşkenceyên mixabiratê bêzar û bêziman bûne û haletî rûhîyeya welatekî seranser kavil û wêran bûye di romanên Helîm Yûsiv da bi şêwazeke îronîk hatîye rexnekirin.

Jan Dost, mijarên romanên xwe piranî ji bîyografîya navdarên dîroka kurdan girtîye. Romanên Jan Dost, bi tevahî rexneya civak, sîyaset û dîroka kurd û Kurdîstanê ne. Romanên wî yên *3 gav û 3darek*, *Mijabad*, *Mîrname* li ser dîroka kurdan rexneyên tund dihewînin. Nivîskar di romanên xwe da bi hûrbînî li dîroka kurdan nêrîye û hem xeletîyên kurdan, şer û pevçûnên di navbera wan û hesûdî û çavnebarîya civakeke qîmeta xwendin û nivîsê nizanin û hem jî bi hemû durûtîya sîyaseteke qirêjî, îxanet û şikestinên dîrokê carinan bi şêwazeke îronîk carinan bi zimanekî alegorîk li ber çavan raxistîye û rexneyên tund li civak, sîyaset û dîroka kurdan kirîye.

Romana kurdî ya dîyasporayê, çavkanîya xwe ji rastîya jîyana kurdan girtîye. Romannûs ji alîyekî ve xwedî ezmûnên vê jîyanê ne ji alîyekî ve jî qehra dîyasporayê kişandine. Bi vê boneyê asoyên wan fireh bûne û hem bi çavekî rexneyî hem jî xwerexneyî li meseleyên civakî, sîyasî û dîrokî nêrîne.

ÇAVKANÎ

A) Kitêbên Teorîk

1. ABRAHAMİAN, Ervand, *Modern İran Tarihi*, (Çev.) Dilek Şendil, Türkiye İş Bankası Yay., 4. Basım, İst., 2017.
2. ADAK, Abdurrahman, *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk,* Nûbihar, Stenbol, 2013.
3. AHMED, Aijaz, *Teoride Sınıf, Ulus ve Edebiyat*, (Wer.) Ahmet Fethi, Alan, İst., 1995.
4. AHMEDZADE, Haşim, *Romana Kurdî û Nasname*, Avesta, Îstanbul, 2011.
5. AKÇAM, Taner, *Ermeni Meselesi Hallolunmuştur Osmanlı Belgelerine Göre Savaş Yıllarında Ermenilere Yönelîk Politikalar*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2008.
6. ALAKOM, Rohat, *Hoybun Örgütü ve Ağrı Ayaklanması***,** Avesta, İstanbul, 2020.
7. ALAN, Remezan, *Bendname li ser ruhê edebîyatekê*, Avesta, Stembol, 2009.
8. ALAN, Remezan, *Destpêkek ji bo Zanista Edebîyata Modern*, Peywend, Stenbol, 2015.
9. ALAN, Remezan, *Li Dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyîn Folklor û Roman*, Peywend, Îst., 2013.
10. ALAN, Remezan, *Keşkûl*, Peywend, Stenbol, 2019.
11. ALAN, Remezan, Engîn Öpengîn, *Tîr û Armanc***,** Peywend, Stenbol, 2014.
12. ALİNİA, Minoo, *Diaspora Mekânları,* (Çev.) Fahriye Adsay, Avesta, İstanbul, 2007.
13. ALLISON, Christine, *Yezidi Sözlü Kültürü*, (Çev.) Fahriye Adsay, Avesta, İst, 2007.
14. ALTINKILIÇ, UMRAN, *Rengvedanên Postmodernîst di Romana Kurdî de*, Zanîngeha Dîcle, Enstîtuya Zanistên Civakî, Teza Doktorayê ya Neweşandî, 2022.
15. AKŞİN, Sina, *Ana Çizgileriyle Türkiye'nin Yakın Tarihi 1.Cilt*, (1789-1980) Cumhuriyet, İstanbul, 1997.
16. AKŞİN, Sina, *Türkiye Tarihi 5 Bugünkü Türkiye 1980-1995*, 3. Baskı, Cem Yay., İst., 2000.
17. ANDERSON, Benedict, *Hayali Cemaatler*, (Wer.) İskender Savaşır, Metis, İst., 2017.
18. ARCHER, Christon I., John R. Ferris, Holger H. Herwig, Timothy H.E. Travers, *Dünya Savaş Tarihi*, (Çev.) Cem Demirkan, Tüm Zamanlar Yay., İstanbul, 2006.
19. AYDEMİR, Şevket Süreyya, *Makedonya'dan OrtaAsyay'a Enver Paşa III. cild*, Remzi Kitabevi, İst., 1972.
20. AYDOGAN, Îbrahîm Seydo, *Guman 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*, Weş. Rûpelê, Stenbol, 2014.
21. BAYEZÎDÎ, Mela Mehmûdê, *Adat û Rûsûmatnameê Ekradîye*, Lêkolîn: Jan Dost, Nûbîhar, Çapa 2., Îstanbûl, 2012.
22. Bakhtin, Mikhail, *Karnavaldan Romana*, (amd.) Sibel Irzık, (Wer.) Cem Soydemir, Ayrıntı Yay., İstanbul, 2001, r. 165.
23. BELGE, Murat, *Genesis*, İletişim Yay., İstanbul, 2009.
24. BELGE, Murat, *Linç Kültürünün Tarihsel Kökeni: Milliyetçilik*, Agora, İstanbul, 2006.
25. BEŞİKÇİ, İsmail, *Doğu Anadolu'nın Düzeni,* Yurt Yayınları, Ankara, 1992.
26. BEŞİKÇİ, İsmail, *Devlet ve Kürtler*, İBV Yayınları, İstanbul, 2015.

27. BEŞİKÇİ, İsmail, *Kürt Aydını Üzerine Düşünceler*, İBV Yayınları, İstanbul, 2016.
28. BOZARSLAN, Hamit, Cengiz Gunes end Veli Yadırgı, *The Kurdish*, Cambridge University Press, 2021.
29. BOZDAĞ, İsmet, *Kürt isyanları*, Truva Yayınları, İstanbul, 2009.
30. BLAU, Joyce, Sandrine Alexie, Shahab Vali, Amr Tahar Ahmed, *Kürt Edebiyatı,* Avesta, İstanbul, 2017.
31. BRİSARD, Christophe Quêtel, Claude *Diktatörlerin Çocukları,* (Çev.) Okay Kunal, YKY, İstanbul, 2018.
32. BRUİNESSEN, Martin Van, *Ağa, Şeyh, Devlet*, (Wer.) Banu Yalkut, İletişim Yayınları, İst., 2010.
33. BRUİNESSEN, Martin Van, *Kurdistan Üzerine Yazılar*, (Wer.) Kolektîf, İletişim Yayınları, İstanbul, 2010.
34. CALLİNİCOS, Alex, *Toplum Kuramı Tarihsel Bir Bakış*, (Çev.) Yasemin Tezgiden, İst., 2013.
35. CAMPANİLE, R. P. Giuseppe, *Kurdistan Tarihi*, Avesta, İstanbul, 2013.
36. CELÎL, Celîlê, *1880 Kürt Ayaklanması Şeyh Ubeydullah Nehri,* (Wer.) Yaşar Abdülselamoğlu, Avesta, İst., 2014.
37. CEMAL, Hasan, *Kürtler*, Doğan Kitap, İstanbul, 2003.
38. CIBO, Nezîrê, *Havêrkan Sultanları I*, Komal, Îstanbul, 2010.
39. CHİRGUH, Bletch, *Kürt Sorunu Kökenî ve Nedenleri*, (Wer.) Nîhat Nuyan, Avesta, Îst., 2009.
